



K.T.

**ZANÎNGEHA MARDİN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TURKIYEEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

**DÎWANA NAMÎ (FEHMÎ BEGÊ PÊÇARÎ): “MEĞMURU’D-
DEWAWÎN”
(METN Ê LÊKOLÎN)**

Yunus DEMİR

16711002

Şewirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

MARDİN 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYEDE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum **Dîwana Namî (Fehmî Begê Pêçarî): “Meğmuru’-d-Dewawîn” (Metn û Lêkolîn)** adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../.....

Yunus DEMİR

KABUL VE ONAY

Yunus Demir tarafından hazırlanan *Dîwana Namî (Fehmî Begê Pêçarî): “Meğmuru’ d-Dewawîn” (Metn û Lêkolîn)* adındaki çalışma, 12/06/2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

PÊŞGOTIN

Edebiyata Kurdî ya klasîk di seyra xwe ya tarîxî de demeke dirêj e ku hebûna xwe bênavber dewam didomîne û şairan dikişîne qada bandora xwe. Îrora gelek şairên Kurd li ser rê û rêçikên edebiyata klasîk helbestên xwe dihonin. Bereksê milletên din, serdema edebiyata me ya klasîk hêj neqediyaye û ber û bereketa wê didome. Li hêlekê şairên li ser rêçên edebiyata modern berheman didin hene, li hêlekê jî şairên li ser rêçên klasîk berheman didin. Helbet ev ji bo milletê me şanazî ye. Şairê me Fehmî Begê Pêçarî bi nasnav “Namî”, nimûneyek e ji bo vê mijarê ku di sedsala 20. de jiyaye lê bi temamî li ser rê û rêbazên klasîk helbesta xwe honaye.

Fehmî Beg wekî ji navê wî jî diyar e ji malbateke beg û mîran e, ji ber hindê wek “beg” hatiye naskirin. Yanî ew, wek piraniya şairên me yên klasîk mela û şêx an jî kesatiyeke dînî nîne. Fehmî Beg herçendî li herêma Licê, Genc, Pasûr û Hezro bi kurtî li herêma Diyarbekir û Gencê hatibe nasîn jî lê mixabin nav û dengê wî ji van sînoran neboriye. Herwiha xala balkêş ew e ku li van herêmên navborî jî zêde wek şairekî nehatiye naskirin.

Fehmî Begê Pêçarî di serdema dawîn ya Osmaniyan de hatiye dinê û qîsmekî zêde yê emrê xwe di serdema Cumhûriyetê de borandiye. Ji ber ku ew hem di serdema Osmaniyan de hem di serdema Cumhûriyetê de jiyaye, wî êkolên edebî yên herdu serdeman nas kirine. Lê wekî em dibînin bala wî bi giştî li ser nerît û tradîsyona edebiyata klasîk bûye. Kêm be jî wî di yek du helbestên xwe yên derveyî dîwanê de mijareke (li gor edebiyata klasîk) nûjen lê dîsa di forma klasîk de ceribandiye. Ev mijara nûjen jî netewperwerî ye. Namî digel ku kesatiyeke netewperwer e, ji ber pêgiriya xwe ya bi adab û rusûmê helbesta klasîk re di dîwana xwe de mijara netewperweriyê tê de tu mijarên nûjen û civakî bi kar neanîne. Ji ber vê wî ev cûre helbestên xwe negirtine dîwana xwe. Pêçarî hem ji aliyê mijarê ve hem ji aliyê fehmbariya helbesta xwe ve neketiye nav hewldaneke taybet, lewra li gor wî divê asta helbestê neyê daxistin.

Namî şairên sereke ên edebiyatên klasîk ên Kurd, Ereb, Faris û Tirk xwendine û ew şopandine. Namî di dîwanê de şopên ji van her çar edebiyatan têra xwe bi cî kirine û dibe ku ji ber vê sebebê be navê dîwana xwe wek *Meğmûru'd-Dewawîn* danîbe ku ew jî tê wateya “Windahiyên Dîwanan”. Namî di hêla hunerî û edebî de

herî zêde di edebiyata Kurdî de ji Melayê Cizîrî û di edebiyata Farisî de ji Hafîzê Şîrazî bandor girtiye.

Fehmî Beg şairekî li derveyî medreseyê gihiştî ye. Wî herî dawî di Ruşdiyeya Farqînê de xwendîye û bi zamanên Kurdî (Kurmancî û Zazakî), Farisî, Erebî û Tirkî baş zanibûye.

Aqûbeta destxetên me yên din hatibû serê vê dîwanê jî, lê xweşbextane ji şewat û windabûnê difilite û digihîje roja me. Dîwana Namî dîwaneke muretteb e û yekane nusxe ye ku ew jî bi xetê şair bixwe hatiye nivîsîn. Herwiha digel naverokê, xetê dîwanê bixwe jî ew çend balkêş û xweş e. Me xebata xwe li ser vî xetê resen saz kir. Di dîwanê de li ser hev 62 helbestên wî cî girtine û 6 helbestên şair yên din jî ji derveyî dîwanê hatin peydakirin. Ji 68 helbestên wî tenê helbestek bi Erebî ye, helbestên din tev bi Kurdî ne.

Keda gelek kesan gihişte vê xebatê û hemî jî spas û şukranê heq dikin. Di serî ji ber rehberiya wî ji şewirmendê xwe Abdurrahman Adak re; ji ber xwendin û wergerandina hin xalên Erebî ji Edhem Şêxo û Mihemed Çetinkaya re; ji ber tehqîqa metnê dîwanê ji Roşan Lezgîn û Semih Gezer re û ji bo her cure alîkarî û bersivandina muşkileyên li ser metnê ji hevalê xwe Huseyn Şemrexî re spasîyên xwe pêşkêş dikim.

Yunus DEMİR

Mêrdîn, 2019

KURTE

DÎWANA NAMÎ (FEHMÎ BEGÊ PÊÇARÎ) “MEĞMÛRU’D-DEWAWÎN” (METN Û LÊKOLÎN)

Yunus DEMİR

Fehmî Beg (1910-1969) li gundê Pêçarê ya bi ser navçeya Liceyê hatiye dinê û diwana xwe ya bi navê *Megmûru’ d-Dewawîn* di Adara sala 1956an de qedandiye. Şair ku di helbestên xwe de mexlesa Namî bi kar aniyê, di dîwana xwe de hemî rêçikên edebiyata klasîk sepandine. Wî edebiyatên Kurdî, Osmanî, Îranî û Erebî baş şopandine û em dîwanê rastî bondora hin şairên van edebiyatana tên.

Asta helbesta Namî di nav edebiyata Kurdî ya klasîk de ji aliyê hunerî û edebî ve xwedî cîgehekî mustesna ye. Di dîwanê de bi teşeyên nezmê ên xezel, qesîde, mesnewî, murebbe‘, muxemmes, texmîs, museddes û musemmen helbest hatine nivîsîn, lê bi piranî -ji sê paran du par- cûreyê xezelê hatiye tercîhkirin. Herwiha bi cûreyên edebî ên wek munacat, ne‘et, mersiye û medhiyeyê helbest hatine rastin. Dîwana Namî ji aliyê hunerên edebî ve têra xwe dewlemend e, lewra Namî hema bêje hemî hunerên edebî di helbesta xwe de ceribandine. Ev jî tê wê wateyê ku şair, ji aliyê şeklî û naverokî ve edeba klasîk baş şopandiye û xwendiyê.

Megmûru’ d-Dewawîn bi her awayî dîwaneke muretteb e ku herfên qafiyeyê li gor rêza alfâtîk hatiye çêkirin. Şair ji bilî îstisnayan bi awayekî tekûz wezna erûzê pêk aniyê. Dîwan xwedî zimanekî giran lê ewçend dewlemend e.

Ev xebata me ji destpêkek û çar beşan pêk tê. Di beşa destpêkê qala çavkaniyên sereke û rêbaza bo xebatê şopandin hat kirin; di beşa yekê de em li ser jiyana şair û serdema ku şair tê de jiyayî sekinîn; di beşa duduyan de zimanê dîwanê û kesayeta edebî ya şair hat şîrovekirin; di beşa sisêyan de vekolîna dîwanê ya ji aliyê ruxsarî ve hat kirin; di beşa çaran de jî metnê dîwanê yê transkrîbekirî hat dayin.

Bêjeyên Sereke: Fehmî Begê Pêçarî, Namî, dîwan, edebiyata klasîk, vekolîn

ÖZET

NAMÎ'NİN (FEHMÎ BEGÊ PÊÇARÎ) “MEĞMÛRU'D-DEWAWÎN” ADLI DİVANI (METİN-İNCELEME)

Yunus DEMİR

Lice'ye bağlı Peçar (Güldiken) köyünde doğan Fehmî Beg (1910-1969) *Meğmûru'd-Dewawîn* adlı divanını Mart 1956'da tamamladı. Şiirlerinde Namî mahlasını kullanan şair, divanını tamamıyla klasik edebiyatın unsur ve kurallarına göre tertip etmiştir. Kürt, Osmanlı, İran ve Arap edebiyatlarını yakından takip etmiş şairin divanında bu edebiyatların etkilerine rastlayabiliyoruz.

Namî'nin divanı sanatsal ve estetik-edebi seviye açısından klasik Kürt edebiyatı içinde müstesna bir yere sahip. Divanda gazel, kaside, mesnevi, murabba, muhammes, tahmis, museddess ve müsemmen gibi edebi türlerle şiirler yazılmış, fakat daha çok gazel tarzı tercih edilmiş. Ayrıca nazım türlerinden münacat, naat, medhiye ve mersiye ile yazılmış şiirler bulunmaktadır. Namî'nin divanı edebi sanatlar açısından oldukça zengin, hemen hemen bütün edebi sanatları şiirinde kullandığını müşahade edebiliyoruz. Bu da şairin klasik edebiyatını şekilsel ve içerik bakımından iyi takip ettiğini gösteriyor.

Meğmûru'd-Dewawîn qafiye harfleri alfabetik sıraya göre dizilmiş her açıdan müretteb bir divandır. Şair divandaki aruz vezinlerini istisnalar dışında sorunsuz uygulamıştır. Divan, zengin fakat nispeten ağır bir sözcük dağarcığına sahip.

Çalışmamız bir giriş ve dört bölümden oluşmaktadır. Giriş bölümünde başlıca kaynaklar ve çalışmada izlenen yöntem konusu açıklandı; birinci bölümde şairin hayatı ve yaşadığı dönem üzerinde duruldu; ikinci bölümde divanın dili ve şairin edebi kişiliği yorumlandı; üçüncü bölüm divanın şekilsel açıdan incelenmesine tahsis edildi; dördüncü bölümde ise divanın transkripsiyonlu hali verildi.

Anahtar Kelimeler: Fehmî Begê Peçarî, Namî, divan, klasik edebiyat, inceleme

ABSTRACT

NAMÎ'S (FEHMÎ BEGÊ PÊÇARÎ) DIVAN OF "MEĞMÛRU'D-DEWAWÎN" (TEXT AND ANALYSIS)

Yunus DEMİR

Fehmî Beg (1910-1969), who was born in village of Peçar (Güldiken) in Lice, had completed his divan which is called *Meğmuru'd-Dewawîn* in March of 1956. Poet, who used his pen name as Namî, absolutely arranged his divan according to elements and rules of classical literature. Poet had been a close follower of Kurdish, Ottoman, Persian and Arabic literatures, therefore we might find traces of impressions of these literatures in poet's divan.

Namî's divan is steeped in classical Kurdish literature in terms of artistic and esthetic-literary degree. In divan, poetries were composed as gazel, qaside, mesnewi, murabba, mukhammes, takhmis, museddes and musemmen, but gazal was more preferred. There are poetries which are composed as munacat, naat, medhiye and mersiye (elegy). Namî's divan is rich with literary arts, so we may observe that he had used all sorts of literary arts in his studies, and it also demonstrates that the poet was a close follower of classical literature with regards to form and content.

Meğmuru'd-Dewawîn is well-arranged in terms of rhyme scheme. The poet smoothly implemented the aruz meter out of exceptions. Divan has rich but heavy vocabulary at the same time.

Our study consists of an introduction and four chapters. Main references and the method which was applied are explained in the introduction. In the first chapter, it was mentioned about poet's life and the period when he lived. Divan's language and poet's literary personality are interpreted in the second chapter. Third chapter was allocated to formal examination of divan and transcript of the divan is available in the fourth chapter.

Key Words: Fehmî Beg Peçarî, Namî, divan, classical literature, analysis

NAVEROK

PÊŞGOTIN	III
KURTE	V
ÖZET	VI
ABSTRACT	VII
TABLO-GRAFÎKÊN TEZÊ Û LÎSTEYA PÊVEKAN	XI
KURTEBÊJE	VII
DESTPÊK	1
GIRÎNGÎ, ARMANC, ÇARÇOVE, RÊBAZ Û ÇAVKANIYÊN MIJARÊ	1
1.1 Girîngî û Armanca Mijarê	1
1.2 Çarçove û Rêbaz	2
1.3 Çavkaniyên Tezê	3
1.3.1 Çavkaniyên li ser Jiyana Fehmî Beg.....	3
1.3.2 Çavkaniyên li ser Hereketa Pêçarê	3
1.3.3 Çavkaniyên Analîza Edebî.....	5
BEŞA YEKEM	6
1.1 SERDEMA NAMÎ	6
1.1.1 Di Sedsala 19. de Rewşa Kurdan a Giştî.....	6
1.1.2 Beriya Serhildana 1925an Rewşa Giştî.....	9
1.1.2.1 Hewldanên Kurdan û Encamên wan.....	9
1.1.2.2 Cemiyeta Azadî.....	11
1.1.3 Serhildana Şêx Seîd.....	12
1.1.3.1 Amadekariyên Serhildanê.....	12
1.1.3.2 Destpêkirina Serhildanê	13
1.1.3.3 Geşbûna Serhildanê	13
1.1.3.4 Têkçûna Serhildanê.....	14
1.1.4 Piştî Serhildana Şêx Seîd	15
1.1.5 Hereketa Tenkîlê ya Pêçarê.....	15
1.1.5.1 Beriya Hereketê	15
1.1.5.2 Hereketa Tedîb û Tenkîla Pêçarê.....	17
1.2 JIYANA NAMÎ	21
1.2.1 Navê wî û Mexlesa wî.....	21
1.2.2 Eşîra û Mîrektiya wî.....	22
1.2.3 Gundê wî Pêçar	24
1.2.4 Jidayikbûn, Perwerdehî û Pişeya wî.....	26
1.2.5 Fehmî Beg û Hereketa Pêçarê	27
1.2.6 Zarokên wî.....	30
1.2.7 Jiyana wî ya li Diyarbekirê.....	30
1.2.8 Wefata wî	31
BEŞA DUYEM	32
2.1 ZIMANÊ WÎ	32
2.1.1 Unsûrên Kurdî ên Resen	34
2.1.2 Unsûrên Zazakî	35
2.1.3 Unsûrên Xeyrî Kurdî.....	35

2.1.3.1 Unsûrên Farisî.....	35
2.1.3.2 Unsûrên Erebi	40
2.1.3.3 Unsûrên Tirkî.....	42
2.2 KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ	43
2.2.1 Helbestvanên ku Bandor li Namî kirine.....	44
2.2.1.1 Melayê Cizîrî	45
2.2.1.2 Ehmedê Xanî.....	48
2.2.1.3 Siyahpoş.....	50
2.2.1.4 Hafizê Şîrazî	51
2.2.1.5 Se‘diyê Şîrazî.....	53
2.2.1.6 Fuzûlî	54
2.2.1.7 Ferezdeq.....	55
2.3 HUNERÊN EDEBÎ / CIWANKARÎ	57
2.3.1 Beyan.....	57
2.3.1.1 Teşbîh.....	57
2.3.1.2 Mecaza Mursel.....	58
2.3.1.3 Îsti‘are	58
2.3.2 Bedî	59
2.3.2.1 Tenasub.....	59
2.3.2.2 Husnê Te‘lîl	60
2.3.2.3 Leff û Neşr.....	60
2.3.2.4 Mubalexe	61
2.3.2.5 Tecahulê ‘Arif.....	61
2.3.2.6 Tecrîd	62
2.3.2.7 Tekrîr	62
2.3.2.8 Tezad.....	63
2.3.2.9 Telmîh.....	63
2.3.2.10 Cînas	64
2.3.2.11 Î‘ade	64
2.3.2.12 Îştîqaq.....	65
2.3.2.13 Tersî‘	65
2.3.2.14 Alîterasyon.....	65
2.3.2.15 Asonans.....	66
2.3.2.16 Akrostîş.....	66
2.3.2.17 Telmî‘	69
2.3.2.18 Tarîx.....	70
BEŞA SÊYEM.....	71
3.1 TERTÎB Ê DANASÎNA GIŞTÎ YA DÎWANÊ.....	71
3.2 TEŞEYÊN NEZMÊ	76
3.2.1 Helbestên ku ji Malikan pêk tên.....	77
3.2.1.1 Qesîde	77
3.2.1.2 Xezel	77
3.2.1.3 Mesnewî.....	78
3.2.2 Helbestên ku Bendan pêk tên	79
3.2.2.1 Murebbe‘	79
3.2.2.2 Muxemmes.....	79
3.2.2.3 Texmîs	80
3.2.2.4 Museddes	80

3.2.2.5 Musemmen.....	81
3.3 CÛREYÊN NEZMÊ	81
3.3.1 Munacat.....	81
3.3.2 Ne‘et.....	82
3.3.3 Mersiye.....	83
3.3.4 Medhiye.....	87
3.4 WEZN	88
3.5 QAFIYE	90
3.5.1 Qafiyeya Mucerred.....	90
3.5.2 Qafiyeya Murekkeb.....	91
3.5.2.1 Qafiyeya Murdef.....	91
3.5.2.2 Qafiyeya Muqeyyed.....	91
3.5.2.3 Qafiyeya Muesses	92
3.6 REDÎF	93
BEŞA ÇAREM.....	95
4.1 DI AMADEKIRINA METNÊ DÎWANÊ DE RÊBAZA HATÎ ŞOPANDIN Û DANASÎNA DESTXETÊ DÎWANÊ	95
4.1.1 Di Amadekirina Metnê Dîwanê de Rêbaza ku Hatiye Şopandin	95
4.1.2 Danasîna Destxetê Dîwanê	96
4.2 METNÊ DÎWANA NAMÎ.....	99
4.2.1 Helbestên Fehmî Beg yên li Derveyî Dîwanê.....	209
ENCAM	220
ÇAVKANÎ.....	222
PÊVEK.....	227

TABLO-GRAFÎKÊN TEZÊ Û LÎSTEYA PÊVEKAN

TABLO-GRAFÎK **RÛPEL**

Tablo 1 Rêz, Hejmar û Herfa Qafiyeyê ya Helbestan 74

Grafik 1: Grafika rêjeya teşeyên nezmê 76

Tablo 2: Tabloya behr û qalibên erûzê yên di dîwanê de 89

PÊVEK

Pêvek 1: Rûpela yekem ya destxeta dîwanê 228

Pêvek 2: Dîbaceya Dîwanê 229

Pêvek 3: Beşa Duayê 230

Pêvek 4: Wêneyê Fehmî Begê Pêçarî 231

pêvek 5 Hîdayet Beg û maliya wî Zînet Xanim 232

KURTEBÊJE

amd. : amadekar

b. d. : bêdîrok

bnr. : binêrin

BOA: Başbakanlık Osmanlı Arşivi

c. : cild

ç. : çap

edît. : edîtor

h. b. : heman berhem

h. g. : heman gotar

hwd. : her wekî din

j. : jimar

r. : rûpel

s. : sal

ss. : sedsal

TDV: Türkiye Diyanet Vakfı

werg.: wergêr

weş. : weşanxane

DESTPÊK

GIRÎNGÎ, ARMANC, ÇARÇOVE, RÊBAZ Û ÇAVKANIYÊN MIJARÊ

Dema edebiyata klasîk ya gelên Îslamî dibe mijar bi giştî nezim dertê pêşiya mirov, lewra wan ji nesrê zêdetir girîngî dane nezmê û ji bo vegotina fikr û nêrînên xwe û nîşandana hunerên xwe bi giştî nezm hilbijartine. Şîrên klasîk, helbestên ku dinivîsîn di defterekê de li gor hin rêzikên diyar dicivandin û rêz dikirin. Piştra ew dîwan êdî dibû berat û nasnameya şair. Ji ber hindê ye ku di hin edebiyatên wek edebiyata Tirkî de edebiyata klasîk, wek “edebiyata dîwanê” hatiye binavkirin.

Ev edebiyat, xwedî rê û rêçikan e û li ser sistemeke diyarkirî hatiye avakirin. Ev edebiyata xwedî sistem, di nav gelên Îslamî de wek edebiyateke “navneteweyî” karîger bûye û di nav van gelan de ji aliyê mijar û metaforan ve jî hevpariyeke girîng çêkiriye.

1.1 Girîngî û Armanca Mijarê

Berhemên edebiyata Kurdî ya klasîk jî wek mîrateyeke gelek hêja ji bo çand û edebiyata me mane. Wekî tê zanîn, ji ber şert û mercên jiyana Kurdistan ya civakî û siyasî gelek berhemên wan ên klasîk ji holê winda bûne an jî telef bûne. Serdemek tune ku berhemeke Kurdistan ya nû neyê kifşkirin. Ji ber hindê ye ku hêj sînorê edebiyata Kurdî ya klasîk tam nayê zanîn û xebatên tematîk têr baş nikarin bîn kirin. Her berhemeke me ya klasîk hewce ye li gor usûlên navneteweyî bîn trasnkrîbekirin û li serê xebatên vekolînê û tehlîlê bîn kirin.

Şairê me Fehmî Begê Pêçarî (Namî), hem ji aliyê naverokê ve hem ji aliyê teşeyî ve li pey edebiyata klasîk çûye û dîwaneke murettib li qada edebiyata Kurdî ya klasîk zêde kiriye. Dîwana Namî heya niha nedihat zanîn û li tu derê helbesteke wî nehatiye weşandin. Ev dîwana ku dê ji bo avahiya xebatên akademîk û neakademîk ên li ser edebiyata Kurdî bibe xîmekî nû, bû mijara xebata me. Armanca tezê ew e ku

cihê vî şairê me yê têra xwe serkeftî di nav tradîsyona edebiyata Kurdî ya klasîk de bide nîşandan û wî bide nasandin.

1.2 Çarçove û Rêbaz

Berhemên Fehmî Beg ji bilî vê dîwanê tunene û xebata me jî di çarçoveya vê dîwana wî de ne.

Ev xebata me ji çar beşan pêk tê. Di beşa yekê de em li ser serdema beriya şair û serdema şair tê de jiyayî û bûyerên wê demê li herêma wî pêk hatine sekinîn. Herwiha di vê serdemê de bûyerên ku şair û malbata wî jê bandordar bûne bi awayekî giştî hatin vegotin. wekî din em li ser jiyana şair, malbata wî, zarokên wî, perwerdehî û pîşeyê wî sekinîn. Herwiha li vê derê bûyerên serekê yê jiyana şair û serboriya malbat/eşîra wî hatin neqilkin.

Di beşa duduyan de zimanê dîwanê û kesayeta şair hat şîrovekirin. Li vê derê em li ser unsûrên zimanê biyanî ên di dîwanê de, kesayeta şair ya edebî, şairê li ser wî bandor kirine û hunerên edebî ên di dîwanê de hatine bikaranîn sekinîn. Me hunerên edebî ên di dîwanê de yek bi yek pênase kirin û ji bo her hunerekê ji dîwanê mînakê da.

Beşa sisêyan me terxanî vekolîna dîwanê ya ji aliyê ruxsarî ve kir. Di vê beşê de em li ser şiklê tertîba dîwanê, teşeyên nezmê ên di dîwanê de, cureyên nezmê, wezn, qafiyê û redîfên di dîwanê de hatine emilandin sekinîn.

Di beşa çaran de destxetê dîwanê hat nasandin û rêbaza di dema trasnkîrîptekirina metnê de hatî şopandin hat ravekirin. Herwiha metnê dîwanê yê trasnkîrîbekirî hat dayin ku rêbaza bo amadekirina metnê me hatî şopandin di beşa çarem de bi berfirehî rave kiriye. Wekî din li ser metnê trasnkîrîbekirî wergera beyt û misrayên Erebî û Farisî wek jêrenot hatine dayin. Herwiha di beşa encamê de jî xalên sereke û girîng yê dîwanê û şairê wê hatin ravekirin.

Herwiha ji bo malikên îqtîbaskirî ên ku di dema xebatê de ji wan hatine îstifadekirin bi rehetî bîna dîtin, me li rexê wan navşîna wan da; ya yekê jimara helbestê ye û ya duyem jimara malikê ye.

1.3 Çavkaniyên Tezê

1.3.1 Çavkaniyên li ser Jiyana Fehmî Beg

Mixabin heta niha tu xebat li ser jiyana Fehmî Beg û dîwana wî nehatiye kirin. Cara yekem ji aliyê me ve li ser jiyana Fehmî Beg û dîwana wî xebatek tê kirin. Herwiha heta niha tu helbesteke wî jî li tu derekê -çi metbû çî li qada mecazî- nehatiye weşandin. Li ser jiyana Fehmî Beg, Yusuf Ziya Döger di pirtûka xwe ya *Şeyh Said Hareketi Sonrası Pêçar Tenkil Hareketi/1927* de, Xurşîd Mîrzengî di romana xwe ya bi navê *Sala Şewatê* de û Orhan Zuexpayic di meqaleya xwe ya bi navê “Farqin’li Şêx Faxri Bukarkî’nin Yaşam Öyküsü” (www.zuexpayic.com) de di çarçoveya serhildana 1925an û pêvajoya piştî wê de qismen agahî dane. Herwiha Amed Tigris di pirtûka xwe ya bi navê *Licê* (Apec, 2008) de û Abdurrahman Adak di meqaleya xwe ya bi navê “Liceli Şairlere Genel Bir Bakış” (Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri, Şarkiyat Araştırmaları Derneği, 2012.) de jî bi çend hevokan qala wî kirine û îşaretî dîwana wî kirine. Me ji xebatên van nivîskaran tevan îstifade kir. Ji bo agahiyên li ser Fehmî Beg çavkaniya me ya yekem Hidayet Begê (Melayê Amedî) kurê Fehmî Beg e. Herwiha çavkaniya Döger, Mîrzengî, Zuexpayic û Tigris jî birêz Hidayet Beg e. Wan di çarçoveya xebatên xwe yê navborî de bi Hidayet Beg re gotûbêj kirine. Ji bo jiyana Fehmî Beg, ji bilî Hidayet Beg û malbata wî, me digel Mela Xalîte Licî û Xurşîd Mîrzengî ku demekê bi re Fehmî Beg hevaltî kirine, hevpeyvîn kirin.

1.3.2 Çavkaniyên li ser Hereketa Pêçarê

Çavkaniyên nivîskî yê di der barê vê tenkîla ku di mehên Cotmeh û Mijdara 1927an de pêk hatine de kêma in. Çavkaniyên heyî, ku me ji wan îstifade kirin, ev in:

1- “Kürt Davası ve Hoybun”, Prens Süreyya Berdirhan: Di beşek ji vê berhema hecimpîçûk de di esnayê vê hereketê de jimara kesên hatî qetilkirî û lîsteya gundên hatine şewitandin tê dayin. Nivîskar ev agahiyên han ji gelê herêma dora Licê ku hingê ji ber zilmê reviyabûn Sûriyê wergirtiye.

2- “Türkiye Cumhuriyetinde Ayaklanmalar”, Reşat Hallı: Ev berhem cara pêşîn di 1972an de ji aliyê çapxaneyê Serekerkaniya Giştî ya dewletê (Genelkurmay

Harp Tarihi Başkanlığı) ve tê çapkirin. Paşê bi navê “Genelkurmay Belgelerinde Kürt İsyancıları” ji aliyê weşanxaneyê Kaynak ve tê çapkirin. Serekerkaniya Giştî, di bin siya çavkaniyên xwe de ev pirtûk bi Serheng (Albay) Reşat Hallı daye nivîsin. Di vê pirtûkê de beşek ji bo hereketa tenkîlê ya Pêçarê hatiye terxankirin. Ev pirtûk ji bo hereketa Pêçarê herwiha piraniya serhildanên Kurdan çavkaniya berfireh ya yekem e. Dîsa ev pirtûk nêrîna dewletê a li serhildanên Kurdan radixe ber çavan.

3- “Şeyh Said Hareketi Sonrası Pêçar Tenkil Harekâtı/1927”, Yusuf Ziya Döger (weş. Nûbihar: ç. yekem 2016, ç. duyem 2018): Berhema Döger ji bo mijara me gelek muhîm e, lewra pirtûk bi giştî li ser hereketa Pêçarê û qonaxa beriya wê ango Serhildana 1925an hatiye nivîsîn. Döger ku bixwe jî ji wê herêmê ye, zêdetir ji çavkaniyên devkî îstifade kiriye.

4- “Sala Şewatê”, Xurşîd Mîrzengî: Sala Şewatê romaneke ku li ser hereketa tenkîlê ya Pêçarê an jî bi îfadeya gelê herêmê Sala Şewatê hatiye nivîsîn. Kitabê nehateye çapkirin, lê birêz Mîrzengî pirtûk ji bo îstifadekirinê erzî me kir. Ev romana dîrokî jî dîsa çavkaniya xwe ji vegotina kesên herêmê digire. Nivîskar ku bi salan e li ser pirtûkê dixebite ji bo bûyerê serî li dehan kesan daye.

Di pirtûkên navborî yên Yusuf Ziya Döger û Xurşîd Mîrzengî de li ser Fehmî Beg û malbata wî der barê maweya tenkîlkirina gelê herêma Pêçarê de agahiyên girîng hene. Döger û Mîrzengî di dema nivîsandina pirtûkên xwe yên navborî de ji bo bûyerên demê û jiyana malbata Fehmî Beg serî li Hîdayet Begê kurê Fehmî Beg dane. Ev herdu pirtûk ji bo qonaxa tenkîla Pêçarê û agahiyên li ser şairê me Fehmî Beg têra xwe girîng in.

Ji ber ku çavkaniyên dewletê yên di vî warê de ji bo vekolîneran girtî ne, ji bo neqilkirina serdemê çavkaniya sereke tarîxa devkî dimîne. Döger ji bo vê mijarê mînakeke baş e ku di kitêba xwe de bi îsrar balê dikişîne ser girîngiya tarîxa herêmê/devkî, bi giştî bûyerê ji devê kesên ku li herêmê bi malbatî ziyar ji wê hereketê û zilmê dîtine neql dike. Pirtûka Döger kêmasiya çavkaniyan ya di vî warê de dadigire û ji bo me bû çavkaniyeke baş.

1.3.3 Çavkaniyên Analîza Edebî

Ji bo analîza edebî me ji gelek çavkaniyên Kurdî û Tirkî îstifadekirin. Ji wan çavkaniyan çend hebên sereke ev in: *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz* ya Haluk İpekten; *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk* ya Abdurrahman Adak; *Klasik Edebiyat Bilgisi-Belagat* ya M. A. Yekta Saraç; *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı* ya Muhsin Macit û Uğur Soldan; *Eski Türk Edebiyatı El Kitabı* ya İsen-Horata-Macit-Kılıç-Aksoyak; *Açıklamalar ve Örneklerle Edebî Sanatlar* ya Numan Külekçi; *Belagat Meanî-Beyan-Bedî'* ya Ali Bulut hwd.



BEŞA YEKEM

SERDEM Û JIYANA NAMÎ

1.1 SERDEMA NAMÎ

Fehmî Begê Pêçarî (Namî) di serê sedsala 20. de (sala 1910an) ji dayik bûye. Ev serdem ji bo Kurdan herwiha ji bo coxrafyaya Îslamî, rastî dewreke krîtîk û gelek girîng tê. Lewra împaratoriya Osmanî belav dibe; gelek dewletên nû li ser esasê nijadiyê ava dibin û digel vê Kurd bi dewleta Osmanî û gelê Tirk re tevdigerin û ji bo dewleteke nû têkoşin, lêbelê beşeke Kurdan jî ji bo sîstemeke cuda û xwemalî divekin nav tevgerê. Ji van tevgeran ya herî ewil Hereketa Şêx Seîd e ku şairê me Fehmî Beg û malbata xwe jê rasterast bandordar dibin.

Divê rewşa beriya Hereketa 1925an û ya piştî wê ji aliyê civakî û siyasî ve bi berfirehî li ber çavan bê raxistin da ji vê jî em bigihîjin serboriya çîroka jiyana Fehmî Beg û fikrên wî yê siyasî û civakî. Herwiha wekî tê zanîn rewşa serdemê ya civakî û siyasî bivê nevē li ser fikra nivîskar û rewşenbîrên wê demê bandorê dike, ji ber vê dema rewşa siyasî, civakî û ilmî ya demê bê zanîn fikrên wan rewşenbîr û nivîskaran jî baştir tê fehmkirin.

1.1.1 Di Sedsala 19. de Rewşa Kurdan a Giştî

Serdema Siltan Mehmûdê 2. di tarîxa dewleta Osmaniyan de yek ji serdemên herî biarîşe û nearam e. Digel nearamiya hundirî û derveyî, wî bi bandora Ewropayê reformên wek “nûjenbûn” û “navendîbûn”ê ji bo dewleta Osmanî anîn. Siltan Mehmûdê 2., ev reformên navborî bê plan û bê program li ser navenda dewletê û gelên girêdayî dewletê da ferzkirin. Mîrekiyên Kurdan ku ji dema Siltan Yawûz Selîm ve (sala 1514an) li gorî peymana digel Osmaniyan nivserbixwe rêveberiya Kurdan dikirin, li dû reforma navendîbûna Siltan Mehmûd êdî ji aliyê dewletê ve nehatin naskirin, yanî statuya wan hat fesixkirin. Heya dema Siltan Mehmûdê 2. li herêmê hêz û îqtidar di destê mîrên Kurdan de bû û şêx û kesên ayînî jî di bin otorîteya wan de bûn, lê piştî navendîkirina Mehmûdê 2. li herêmê mîzana hêzê

guherî. Lewra êdî rêveber ji navendê ji aliyê dewletê ve hatin tayînkirin. Piştî ku mîrekiyên Kurdan hatin rakirin li herêmê valahiyeke hêzê çêbû û rewşeke anarşîk peyda bû.¹ Ji aliyê din ve, projeya nûjenbûnê ya bi rêya reforman dihat sepandin bû sedema hilweşîna aboriya dewletê û vê jî bi xwe re dayina tawîzên siyasî anî. Bi jîdestdana erdên împaratoriye û tengbûna sînoran re bacên ku dikete kaseya dewletê kêmbûn û li ser vê dewletê ji aliyê malî û leşkerî barên gelên nav sînorên xwe zêde kir.² Cara yekem di vê serdemê de bi awayekî ciddî Kurd û dewleta Osmanî ji hev çûn û pirsgirêkên reveberî û siyasî ketin nav wan. Herwiha polîtîkaya Osmaniyan a nenaskirina otorîteyên din û wergirtina erkê reveberiyê a giştî di vê demê de dest pê kir. Di encama vê polîtîkaya navendî û bacên giran de ji aliyê Kurdan ve di demên cuda de wek bertek gelek serhildan hatin lidarxistin: serhildana Ebdurehman Paşayê Babanî (1806), serhildana eşîrên Zaza (1818-20) serhildana Mîr Mihemedê Rewandizî (1833), serhildana Xan Mehmûd (1838), serhildana Mîr Bedirxan (1843-47), serhildana Êzdîn Şêr (1855), serhildana Şêx Ubeydullah (1880) hwd. biçûk mezin Kurdan bi dehan serhildanên wiha pêk anîn.

Ji ber jîholêrabûna mîrekan Kurd ên ku bi sedsalan bû li herêmê hukim dikirin, li Kurdistanê valahiyeke siyasî, civakî, çandî û aborî rû dide.³ Planên dewletê ên navendîkirinê encamên neyînî derxist meydanê; ne êdî mîrekan hukim dikir ne jî dewletê dikaribû tam hukim bike, ango li tu derê huqûq û nîzama civakî namîne. Piştî ku li herêmê hêz û têkiliya dewletê ji ber vê rewşê zêf dibe û nikare vê valahiye dagire,⁴ dewlet ji bo vê valahiye li navbeynkarên nû digere. Ji bo vê dewlet, şêx û serokên eşîran dike navbeynçî ku vê bêîstiqrarî û anarşiyê berteref bike. Yanî dema dewleta Osmanî ev valahiya îqtidarê ya ku li dû mîrekan mayî dît, xwest bi rêya şêx û axayên ku ji mîrekan lawaztir bûn, gel kontrol bikin û li ser wan zal bibin.⁵ Heta wê demê şêx û aliman di bin siya mîrekiyan de hebûna xwe berdewam dikirin, lê wexta ku hêz kete destê van kesên dînî û ulema, bi demê re wan bi mecbûrî rolên polîtîk jî leyîstin. Ev kesên ku heya wê demê bi karên 'edlî û navbeynkariyê re mijûl bûn, êdî bûn serokên polîtîk jî. Ji ber ku îdareya navendî li herêmê hê hakimiyet tam negirtibû

¹ Wadie Jwaideh, *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi-Kökenleri ve Gelişimi* (ç. 7.), werg.: İsmail Çekem û Alper Duman, İletişim Yayınları, İstanbul, 2012, r. 157-158

² Nihat Karademir, *Sultan Abdulhamid ve Kürtler*, Nûbihar, Stenbol, 2016, r. 25

³ Nihat Karademir, *Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler*, Nûbihar, Stenbol, 2017, r. 327

⁴ Robert Olson, *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, wer.: B. Peker, N. Kırac, Özge Yayınları, Ankara, 1992, r. 21

⁵ Martin van Bruinessen, *Kürdistan Üzerine Yazılar*, werg.: N. Kırac, B. Peker, L. Keskiner, S. Somuncuoğlu, L. Kafadar, İstanbul İletişim Yayınları, 1993, r. 109

destê xwe, şerr û dewayên di nav eşîran de û pîrsgirêkên di nav gel de bi destê şêxan dihatin çareserkirin. Vê jî hêzeke civakî û îdarî dida wan. Ev hêza nû piranî şêxên terîqetên Qadîrî û Neqşî bûn. Şaxa terîqeta Neqşebendî ya Xalidî ku bi saya rêxistkerî û çalakiya civakî ya Mewlana Xalid di demeke kin de mezin dibe û bi rêya xelîfeyan digihije her derê, di dewra rabûna mîrekên Kurd û lawazbûna otorîteyê de⁶ li herêmê dibe terîqeta bêreqîb, herwiha şêxên vê terîqeta ku li temamî erdên Osmanî belav bûbûn, wekî mînaka şêxên Nehrî û Barzan, dibin xwedî hêzeke wekî ya mîrektiyan.⁷ Neqşebendîtiya ku li seranserê Kurdistanê bi lez belav dibe, êdî ne tenê di jiyana Kurdan a rojane û baweriya dînî de, di tevgera wan a polîtîk de jî dibe xwedî hêza diyarker.⁸ Şêxên Neqşebendî bi demê re dibin figurên polîtîk ên ku hereketên siyasî ên Kurdan bi rê ve dibin. Ji van, nimûneya herî baş Şêx Ubeydullahê Nehrî ye ku piştî rakirina mîrektiyan û bandora xirabker ya şerên li ser erdê wan ji bo gelê Kurd ê ku di qeyraneke civakî de bû wek rêç û îdealekê dertê holê û ji herdu aliyên (Osmanî û Îran) piştewaniya Kurdan bi dest dixe û di 1880an de li hemberî dewletên Osmanî û Îranê serî hildide. Şêx Ubeydullah serokên eşîran digel hêzên wan ên çekdar dikişîne bal xwe, serokeşîrên ku di navbera wan de neyarî hene li hev tîne û bi armancên serxwebûnê û yekîtiya Kurdan wan di bin alayekê de berhev dike.⁹ Herçendî tevgera Şêx Ubeydullah ji ber sebebên wek neberamberiya hejmara hêzan, çekên hêzan, awayê rêxistinî, perwerdeyî, disiplîn û serokatîyê, nekarî tu serkeftineke bitesîr bi dest bixe jî¹⁰ lê di aliyê fikra serxwebûnê û netewperweriyê ve di bîra Kurdan de bandoreke girîng hişt.

Dewleta Osmanî ji serdema Siltan Mehmûdê 2. ve hewl dida ku Kurdan di nav artêşa nîzamî de bi cî bike û ji wan îstifade bike. Lê digel hemû cûreyên seferên tedîbê û zilm û çewisandinê, Kurdan bac nedidan û leşker nedişandin artêşa nîzamî. Osmaniyan nedixwestin ji hêza wan hevdînen xwe bêpar bimînin û herwiha wan piştî şerê 1877-78an hewldanên Ermeniyan ên cudahîxwazî dîtibûn; dewleta Osmaniyan ji ber van egeran bi mecbûrî biryara guherandina polîtakaya xwe ya der barê Kurdan de da. Êdî wan dev ji israra daxilkirina Kurdan a nav artêşa nîzamî berdand, lewra Kurdan ku miriyê azadiya bûn, ji leşkeriya nîzamî nefret dikirin. Osmaniyan çareseriyeke nû

⁶ Martin van Bruinessen, *Ağa Şeyh, Devlet*, werg.: Banu Yalkut, İletişim Yayımları, İstanbul, 2010, r. 343

⁷ Jwaideh, r. 158

⁸ Karademir, 2017, r. 417

⁹ Nejat Abdullah, *İmparatorluk, Sınır ve Aşiret: Kürdistan ve 1843-1932 Türk-Fars Sınır Çatışması*, werg.: Mustafa Aslan, Avesta, Stenbol, 2012, r. 262

¹⁰ Salih Mihemed Emîn, *Kurd û Ecem: Dîroka Siyasî ya Kurdên Îranê*, Nûbihar, Stenbol, 2017, r. 211

dîtibûn; êdî Kurdan dê wezîfeya xwe ya leşkerî di alayên siwarî ên bânîzam û taybet de bidîtana, lewra ev çareserî li gor jiyana Kurdan ya resen bû jî.¹¹ Bi vê armancê, di sala 1884an de waliyên ku ji aliyê Ebdulhemîd ve hatibûn peywirdarkirin û rasterast girêdayî wî bûn, ji eşîrên Kurdan daxwaza piştgiriye kirin û ew çekdar kirin.¹² Ev alayên han ku bi navê Ebdulhemîd bixwe hatine binavkirin, di dawiya sedsala 19. de bi armanca kontrolkirina wîlayetên dûrî navendê, pêşîlêgirtina mezinbûna eşîran¹³ û astengkirina faktora Ermeniyên hatin avakirin. Hebûna alayên Hemîdiye heta ketina Ebdulhemîd (sala 1908) bi heman awayî dewam kir, lê hukûmeta nû ya Îttihad û Tereqqî bi reformekê navê wan wek “Aşîret Hafîf Suvarî Alaylari” guherand û raye û bandora wan daxist, di 1914an de jî bi temamî ev alay fesix kirin.

1.1.2 Beriya Serhildana 1925an Rewşa Giştî

1.1.2.1 Hewldanên Kurdan û Encamên wan

Piştî Meşrûtiyeta 2. ku Ebdulhemîd ji aliyê cemiyeta Îttihad û Tereqqî ve ji text tê daxistin, ji hêla azadiya fikrî û rêxistinbûnê ve rehetiyek tê. Kurdên siyasî /ronakbîr û ciwanên ku li Stenbolê di mektebên eskerî de dixwendin ji vê pêvajoyê îstifade dikin û li Stenbolê rojnameyan derdixin û cemiyetan ava dikin. Yek ji wan rêxistinên herî girîng ên Kurdan, Cemiyeta Kurd Teawûn û Tereqqî¹⁴ ye ku hema bêje hemî ronakbîrên wê demê ên li Stenbolê li dorê dicivin.¹⁵ Bi lawazbûna dewleta Osmanî re, ev Kurdên ku li vir ji bo mafê Kurdan tê dikoşin dikevin nav tevgerê. Li Stenbolê beşek ji van Kurdan ku serokê wan Seyîd Ebdulqadir Nehrî ye ji bo Kurdistanê otonomiyê dixwazin û beşek ji wan jî ku serokê wan Emîn Elî Bedirxan e ji bo Kurdistanê serxwebûnê dixwazin. Siyasiyên Kurd, ji bo Kurdistanê bi dewletên Îngilîz, Fransîz û Rûsyan re dikevin têkiliyê û ji wan piştgiriye dixwazin, lêbelê ji ber teredduda van dewletan û astengkirinên kadroyên Îttihad û Tereqqiyê piştgireyeke ku

¹¹ P. I. Averyanov, *Osmanlı İnan Rus Savaşlarında Kürtler (19. yy.)*, Avesta, Stenbol, 2010, r. 198

¹² Olson, h. b., r. 27

¹³ Janet Klein, *Hamidiye Alaylari: İmparatorluğun Sınır Boyları ve Kürt Aşiretleri*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2014, r. 113

¹⁴ Kurdên ku li Stenbolê di mektebên eskerî (ên eşîran) de dixwînin wê demê ji ber vê hewayê polîtîk û mayîna li paytextê dewletê, ji dinyayê haydar dibin û dibin xwedî nêrîneke siyasî. Dûre ev kesên han dibin serkêşê doza Kurdan ku Xalid Begê Cibrî yek ji van kesan e.

¹⁵ Armancên sereke yên vê cemiyetê ev in: Li Kurdistanê vekirina mekteb û zanîngehan, fermîkirina zimanê Kurdî, bi zimanê Kurdî derxistina kovar û rojnameyan, geşkirina aboriya Kurdan û zêdekirina hebûna Kurdan di meclîs, rêveberî û sazîyên dewletê de û hwd.

divên nikarin bigirin.¹⁶ Li aliyê din ji Kurdan beşeke mezin jî naxwazin ku ji dewleta Osmanî ango ji Xîlafetê veqetin; mesela, dema ku Şerîf Paşa wek nûnerê Kurdan û Bogos Nûbar wek nûnerê Ermeniyên li Parîsê di Konferansa Aştiyê de ji bo serxwebûna Kurdistan û Ermensitanê li hev dikin, ji Kurdistanê gelek telgrafên îtirazê tînin belavkirin û Şerîf Paşa red dikan.

Di Şerê Cîhanê yê Yekem de Kurd -hem wek leşker hem wek grûbên eşîran- li bal Osmaniyên li hember Rûsan, Îngilîzan û Fransîzan şer dikan. Di Şerê Cîhanê yê Yekem de dewleta Osmanî digel mutefîqê xwe Almanya derbeyeke mezin dixwin û erdên wan tînin dagirkirin. Helbet di encama şerê ku li ser erdê Kurdan qewimî de, Kurd mecbûrî ji mal û meskenên xwe derdikevin û koçber dibin. Bi hezaran Kurd ji ber şer û sefaleta di esnayê koçkirinê de jiyana xwe ji dest didin. Ev koçberî demeke dirêj dikêşe û ev salên han di nav Kurdan de wek “Salên Mihaciriyê an jî Seferberlikê” tînin binavkirin.

Piştî bidawîbûna Şerê Cîhanê yê Yekem ji bo jinûvexêzkirina sînoran ya li gor prensîbên Wîlson li Anatoliyê ji aliyê hin dewletên Rojava ve (Dewletên Yekbûyî/Îtilaf) gelek dever hatin dagirkirin. Li gor prensîbê Wîlson diviyabû her miletekî dewleteka wî hebûya. Kadroyên dewletê, ji bo ku ev prensîbên han neyên sepandin bi pêşdahiyan Kurdan re têkiliyên xurt danîn¹⁷ û bi wehd û peymanên şirkatiya dewleta nû ew kişandin bal xwe. Bi vê, xwestin ku hem Kurd serxwebûnê nexwazin hem jî bi Ewropiyên bidin zanîn ku Kurd dixwazin tevî Tirkan di binê banê Tirkiyeya nû de cî bigirin. Li gor vê, di nîzamnâmeya makezagona 1921an de hin mafên wek otonomiyê ji Kurdan re hat dayin, lêbelê piştî ku dewlet cihê xwe qahîm dikan û êdî tirsadagirkirina Ewropiyên radibe, di 1924an makezagonê nû tê çêkirin û hemî mafên gelên tînin fesixkirin û herkes wek Tirk tê qebûlkirin. Lewra kadroyên nû nedixwestin ji xeynî Tirkan tu netewe bi xwediyê dewletê û navê tu neteweyê di dewleta nû de derbas be, yanî dewleteke neteweyî/nijadî hatibû avakirin. Herwiha li gor qanûnên nû Xîlafet -ku pewayendîya Kurdan a herî xurt bû bi dewletê ve û Kurdan ji bo vî meqamî xwe wek pêgiriya dewletê hîs dikirin- hat rakirin. Li ser makezagona 1924an di daxilê dewleta nû ya Tirkiyê de ji aliyê Kurdan ve wek bertek gelek hereket

¹⁶ Chris Kutschera, *Kürt Ulusal Hareketi*, Avesta, Stenbol, 2013, r. 46,47-48

¹⁷ Herwiha diviyabû li gor prensîbên Wîlson Ermenistaneke serbixwe jî bê avakirin û Ermeniyên li ser parçeyê mezin ya erdê Kurdan heq îdîa dikirin. Yanî dema prensîbên Wîlson bihatana sepandin digel avakirina Kurdistaneke diviyabû nîvekî erdê Kurdan jî biçûya. Ji ber vê Tirkan Kurd bi vê jî didan tirsandin bê ku eger prensîbên Wîlson bînin sepandin nîvê erdê we jî diçe. Döger, r. 46

pêk hatin. Lewra argumanên wek “biratiya dînî” û “yekbûna qederê” ku heta wê rojê dihatin bikaranîn, ji aliyê dewleta nû ve hatibûn rakirin¹⁸ û li şûna wê netewe-dewleteke laîk hatibû avakirin.

1.1.2.2 Cemiyeta Azadî

Hêj piştî Şerê Cîhanê yê Yekem siyasiyên Kurd ên li Stenbolê ketibûn nav tevgerê û ji bo serxwebûna Kurdistan li rêyan digeriyan, lewra hem Tirkperestiya kadroyên Tirkan ên wek dora Îttihad Tereqiyê û koma dora Mistefa Kemal hem jî ber bi rûxandinê ve çûna dewleta Osmanî dixwestin mafê Kurdistan biparêzin. Hin ronakbîrên Kurd¹⁹ û malbatên Kurd ên wek Bedirxanî, Babanî, Şemzînî û Cemîlpaşazadeyî li Stenbolê di 1918an de bi armanca “parastin û bidestxistina menfîetên giştî yê Kurdistan”²⁰ Cemiyeta Kurdistan Tealî li dar dixin û ji bo vê li gelek bajarên Kurdistan şaxên wê tên vekirin. Li hêla dîn Albay Xalid Begê Cibrî ku li Stenbolê di mektebên leşkerî de perwerdehî dîtibû û tecrubeya wî ya leşkerî hebû, li herêma Dersimê ku hingê (1919) leşker bû eşîrên Kurd ên herêmê tîne bal hev û hêdî hêdî dikeve nav rêxistineke leşkerî-siyasî. Di sala 1920an de di navbera Xalid Beg û ên wek wî difikirin û herwiha şêx û melayan de propagandaya li hember Kemalîstan dest pê dike. Di vê demê de Kurdên li Stenbolê û Cemiyeta Kurdistan Tealî (ku hemî di bin banê wê de bûn) bi wan re di nav têkiliyê xurt de nin. Dewleta Tirkîyê ji ber çalakiyên Xalid Beg jê şikber dibin û wî tayînî Erziromê dikin.²¹ Ji ber alozî û tevliheviya di nav Cemiyeta Kurdistan Tealî de, Kurdên li Erziromê ku êdî ev bajar dibe navenda rêxistinbûna Kurdistan, di 1921an²² de rêxistineke îllegal a bi navê Azadî dadimezirînin. Ev rêxistina leşkerî-siyasî ji aliyê 24 efserên Kurd ên wek Xalid Begê Cibrî, Îhsan Nûrî Paşa, Îsmail Şawesy hwd²³ ve tê damezirandin û ev kesên han tev hingê di artêşa Tirkîyê de peywirdar bûn.²⁴

¹⁸ Yusuf Ziya Döger, *Şeyh Said Hareketi Sonrası Pêçar Tenkil Harekatı/1927*, Nûbihar, Stenbol, 2018, r. 22

¹⁹ Ji van ronakbîran yê sereke ev in: Seîdê Kurdî, Hemzeyê Miksî û Xelîl Xeyalî. Bnr. Zinar Silopî, *Doza Kürdüstan*, Stewr Basımevi, Beyrût, 1967, r. 52

²⁰ İsmail Göldaş, *Kürdistan Tealî Cemiyeti*, Doz, Stenbol, 1991, r. 249

²¹ Olson, h. b., r. 52- 53

²² Olson, h. b., 54

²³ Hin damezirînerên navdar ên Azadiyê ev in: Xalid Begê Hesenî, Kor Huseyn Paşa, Hecî Mûsa Begê Xoytî. Bnr. Mahmut Akyürekli, *Şark İstiklal Mahkemesi (1925-1927)*, Tarih Kültübü Yayınları, İstanbul, 2016, r. 97

²⁴ Tahsin Sever, *1925 Hareketi Azadi Cemiyeti*, Nûbihar, Stenbol, 2018. r. 99

Bi avakirina dewleta Tirkiyê re ev kadroyên han li rêyeke din digeriyan û nihayet di bin banê Azadiyê de organîze dibin. Yûsif Ziya Beg jî ku ji ber mûxalifiya xwe neketibû nav listeya nû ya wekîltiyê, vedigere Kurdistanê û bi kadroyên Azadiyê re dikeve têkiliyê. Kadroya Azadiyê ku tev jî xwediyê tecrubeya leşkerî-siyasî bûn, bi veşarî bi pêşdahatiyên Kurd re dikevin peywendiyê û ji bo hereketeke li herêmê sefên xwe berfirehtir dikin. Cemiyeta Azadî, rêxistina hucreyî û têkiliya veşarî (bi dizî) esas digire. Ji ber rûdanên di dewleta nû ya Tirkiyê de îmkanên wan ê belavbûnê zêdetir dibe. Rakirina Xîlafetê û qebûlkirina makezagona 1924an di nav gel de hestên dînî û millî livandibû.²⁵ Di encama van rûdanên siyasî-civakî ên ku di 1924an de pêk hatibûn de Şêx Seîd jî tevli Azadiyê dibe.²⁶ Armanca tevlêkirina Şêx Seîd ya nava cemiyetê, ji hêza Şêx Seîd ya dînî dihat; Şêx Seîd şêxekî Neqşebendî-Xalidî bû û li herêmê xwedî nufûz bû. Digel vê gelek malbat û eşîrên sereke ên Kurd²⁷ jî tevli Azadiyê dibin û li gelek bajarên Kurdan şaxên wê (bi xefî) vedibin. Herçendî endamên rêxistana Azadî bi dizî û veşarî bixebitin jî lê dîsa jî haya dewletê ji çalakîyên wan hebûn. Dewlet ji bo ku van kadroyan desteser bike li benda demeke musaîd û guncav an jî hereketeke di eleyhê wan de dimîne. Di encamê de dewlet serhildana ku li Beytuşebabê diqewime²⁸ dixê behane û serokên Azadiyê ên wek Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya Beg digire û dişîne hepsa Bedlîsê.²⁹ Piştî vê bûyerê endamên Azadiyê bêser dimînin û dema xebera biryara îdama Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya Beg belav dibe ji naçarî Şêx Seîdê Paloyî hereketê bi rê ve dibe.

1.1.3 Serhildana Şêx Seîd

1.1.3.1 Amadekariyên Serhildanê

Piştî desteserkirina Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya Beg serokatiya hereketê mecbûrî dikeve ser milê Şêx Seîd. Şêx Seîd bêtî ku şîkekê bikişîne ser xwe li herêmê

²⁵ Cemalettin Canlı - Halil İbrahim Uçak, *Hattın Dört Yanında Cemilpaşazadeler*, Dipnot, Ankara, 2012, r. 227

²⁶ Ferzende Kaya, *Mezopotamya Sürgünü*, Alfa, İstanbul, 2005, r. 18

²⁷ Xalid Begê Hesenî, Kor Huseyn Paşa û Hecî Mûsa Begê Xoytî ji wan kesan in ku xwedî eşîr û hêz in.

²⁸ Yekîneyên dewletê yê li Hekariyê hingê bi piranî Kurd bûn û têkiliya efserên wan bi rêxistina Azadî re hebûn. Li gor gotinan, Yûsif Ziya Beg ji birayê xwe yê ku di van yekîneyan de peywirdar e re nameyekê dişîne û tê de dibêje “xwe amade bikin”. Birayê Yûsif Ziya, Riza û hevalên wî vê peyamê di maneya serî hildin de fehm dikin û tevî yekîneya ji 1300 kesan pêk tê serî hildidin. Di encamê dewlet vê serhildanê ditepisîne û li ser têkiliya wan û Azadiyê serokên Azadiyê digirin.

Canlı - Uçak, h. b., r. 230

²⁹ Döger, h. b., r. 52

dest bi propagandayê dike. Şêx li her derê behsa rakirina Xîlafetê û înkarkirina mafê Kurdan û pêkutiya li ser Kurdan dike. Bacên giran û desttengiya aborî ya di dewleta nû de gel aciz kiribû.

Şêx Seîd li herêmê xwedî nufûzeke mezin bû û ji aliyê gel ve dihate hezkirin. Şêx Seîd vê nufûza xwe bi kar tîne û ji gelek serokeşîr û şêxan re nameyên dişîne. Herwiha bixwe jî ji Xinisê derdikeve li herêma Bîngol, Darahênê (Genç), Hênî û Licê digere û gel ji bo serhildanê amade dike. Şêx Seîd nifûza xwe ya şêxîtiyê jî bi kar tîne û şêxên li herêmê dikişîne sefên xwe. Herwiha Şêx gelek eşîran jî haydar dike da ku di desptpêkirina serhildanê de ew jî li herêma xwe rabin û kontrolê bigirin destê xwe. Lê di fikra wî de diviyabû serhildan di biharê de dest pê bikira, lewra di şertên zivistanê de serkeftina wan pir zor bû.

1.1.3.2 Destpêkirina Serhildanê

Şêx Seîd dema digere tevî hêza li dora wî berhevbiyê berê xwe dide gundê Pîranê, li vir civînekê dike. Dema Şêx Seîd li wir e, hin jenderme tîn û dixwazin çend firariyên ku bo dîtina Şêx Seîd hatibûn wî gundî bibin.³⁰ Di 13yê Sibata 1925an de li Pîranê di navbera jendermeyan û hêzên Şêx Seîd de ji bo teslîmkirina van firariyan mînaqêşe dertê û di encama vê mînaqêşeyê de çend heb jenderme tîn kuştin. Li ser vê garnîzona Diyarbekirê pênc tabûr leşkeran dişîne ser hêzên Şêx Seîd û di demeke kin hêzên Şêx Seîd tevan dikuji. Ji ber xirabûna rewşê dewlet li Riha, Diyarbekir û Elezîzê rêveberiya awarte (îdareya urfî) îlan dike û gelek pêşdahiyan Kurd ên li herêmê digire. Serhildan belavî herêmê dibe, di 26-27ê Sibata de serhildêrên Kurd Erxenî, Palo, Pîran û Elezîzê werdigirin.³¹ Li ser vê xeber li herêmên din tê bihîstin û serhildan berfireh dibe. Serhildan ji nişkê ve û bêkontrol pêk tê, lewra di fikra kesî de tunebû ku di wê mehê û demsalê de pêk were. Li gelek herêman di navbera hêzên Şêx Seîd û leşkeran de pevçûn dest pê dikan.

1.1.3.3 Geşbûna Serhildanê

Li herêmên Diyarbekir, Bîngol, Merdîn, Wêranşar, Licê, Siwêrek, Sîlwan, Mûş û Serhedê şer dest pê dike. Terefdarên Şêx Seîd di demeke kin de Elezîz, Erxenî, Palo û Gencê werdigirin. Şêx Seîdê ku hingê li nêzî Diyarbekirê ye piştî 10ê Adarê

³⁰ Felat Özsoy - Tahsin Eriş, *Öncesi ve Sonrasıyla 1925 Kürt Direnişi*, Pêrî, Stenbol, 2007, r. 138

³¹ Kutschera, r. 105-106

ber bi bakur û rojava ve hereketeke berfireh dide destpêkirin; Sîlwan, Hezro, Erxenî û Çermîkê werdigire û berê xwe dide Siwêrekê. Di vê navberê de Şêx Seîd dîsa nameyan ji serokeşîr û şêx û melayên Kurd re dişîne û ji wan daxwaza piştgiriya dîke. Ji wan hinek tevlê nabin, mînak; Bişarê Çeto, Şêxên Kufrewî û yên Norşînê.³² Germa şer gurr dibe, hêzên Şêx Seîd leşkerên Tirkîyê têk dibin û Bîngol û Gêxîyê jî werdigirin û heta Bilanix û Milazgirê pêşde diçin. Herwiha serhildêr erîşî Meletî û Mêrdînê dikin. Ji rojavayê Wanê destpê bike hema hema hemî herêma Kurdistana Tirkîyê hatibû wergirtin.³³ Herwiha bi serektiya Şêx Seîd Diyarbekir hatibû dorpêçkirin û di navbera leşkeran û hêzên Şêx Seîd de pêvçûnên tund rû didan.

1.1.3.4 Têkçûna Serhildanê

Piştî demekê dewleta Tirk xwe dide hev û di Nîsana 1925an de dest bi serkutkirina serhildanê dîke. Pêşiyê bi rêya Sûriyê hêzên xwe sewqî Mêrdînê dîke û balafiran radîke. Rêveberên dewletê biryaran digirin û bi hezaran leşkeran jî bo tepeserkirinê dişînin ser hêzên Şêx Seîd. Bi hatina leşkerên jî aliyê Mêrdînê ve dorpêça Diyarbekirê tê şikandin. Leşkerên ku berê xwe didin bajarokên din di demeke kin de gelek deran jî hêzên Şêx Seîd distînin. Di 15ê Nîsanê de Yûsif Ziya Beg û Xalid Begê Cibrî li Bedlîsê tîd dardakirin. Serkutkirineke bêeman dest pê dîke, gelek kesên ku tevli serhildanê bûbûn tîd kuştin an girtin. Xetên Kurdan ên parastîna tev belav dibin. Piştî ketina eniya Diyarbekirê Şêx Seîd berê xwe dide Gencê, lewra tenê Genc di destê wan de mabû. Ji vir jî Şêx Seîd tevî 50 hevalên xwe bi armanca çûna ser sînora Îranê berê xwe didin aliyê Vartoyê. Di 15ê Nîsana 1925an de Şêx Seîd tevî hevalên xwe li nêzî Vartoyê tîd girtin. Herwiha hin serok û pêşdahiyanê Kurd ên wek Xalid Begê Hesenî, Ferzende Begê Hesenî, Keremê Qolaxasî û lawê Şêx Seîd Elî Riza Beg berê xwe didin Îranê.

Li Diyarbekirê “Mehkemeyên Îstiqlalê” tîd lidarxistin û Şêx Seîd û hevalên xwe tîd darizandin. Di berbanga 29ê Hezîrana 1925an de Şêx Seîd tevî 40 hevalên xwe yê pêşek tîd dardakirin.

Mirov dikare sebebên têkçûna Kurdan wiha rê bike: Kêmasiya erzaq û lojîstîkê, dijwariya demsalê (zivistan), serdestiya yekîneyên dewletê ya jî aliyê jimar û

³² Özsoy-Eriş, h. b., r. 151

³³ Kutschera, r. 107

teknîkê ve,³⁴ lawaziya serokatî û organîzasyonê, tekiliyên dewletê yên bi hin malbat û pêşdhatiyên Kurd re û hwd.

1.1.4 Piştî Serhildana Şêx Seîd

Tam li vê derê çîroka serboriya şairê me Fehmî Beg û Serhildana 1925an ra rastî hev tên. Dema ku Şêx Seîd li herêma Licê ji bo piştgiriya serhildanê digere muhtemel e bi malbata Fehmî Beg yanî mîrên Pêçarê re jî tîkiliyê datîne û ji wan sozê destekê distîne. Mîrên Pêçarê ji Şêx Seîd re rêz û hurmeteke zêde digirin herwiha ji aliyê Neqşebendîtiyê ve jî xwe nêzîkî wî dibînin. Fehmî Beg di dîwanê de du helbestên tije hez û pesn li ser Şêx Seîd nivîsîne û tê de wî wek “Şahê Delal” û “Qutbul-Ulema” bi nav dike. Heta Fehmî Beg di van du helbestan yekê de ji bo payeya şerkerên serhildana Şêx Seîd bilind digire û mehera wan dixwaze: “Bi cuz wan mêrxasên Palo nexwahim sayê sîwanê” (61/15).

Ev qonaxa piştî Serhildana 1925an û bi taybet hereketa dewletê ya Pêçarê ji bo mijara me girîng e, lewra hem malbata Fehmî Beg ji vê hereketê zerardîde dibe hem Fehmî Beg bixwe dûre tevli berxwedana li hember dewletê dibe. Herçendî tê gotin ku Serhildana 1925an di dawiya Nîsana 1925an de bi temamî hatiye serkutkirin jî lê serhildanên Kurdan biçûk bin jî dewam dikin. Kurdên ku ji seroktî û rêxistinê bêparbûn bi awayê grûban şerên gerîllayî dikin û carcaran êrîşî leşkeran dikin.³⁵

1.1.5 Hereketa Tenkîlê ya Pêçarê

Piştî ku serhildana Şêx Seîd tê serkutkirin, serhildêrên ku neketibûn destê dewletê xwe li gund û deverên herêmê vedişêrin û carcaran êrîşî hêzên dewletê dikin. Hebûna van serhildêran û desteka gelê herêmê ku dabûn serhildanê dibe sedema hereketa dewletê ya tenkîlkirinê (tepeserkirin, cezakirina tund, mişextkirin) li ser herêma Pêçarê.

1.1.5.1 Beriya Hereketê

Piştî serhildana Şêx Seîd, dewletê Plana Şerq Islahetê (Şark Islahat Planı) xistibû dewrê, da ku Kurdên ji bo wan potansiyela zirardayînê ne bi rehetî û bêyî ku

³⁴ Özsoy-Eriş, h. b., r. 199

³⁵ Kutschera, h. b., r. 110

astengên qanûnî derkevin ji holê rake. Bi vê jî ji bo Kurdan ku bi hereketên li dijî Serhildana 1925an re hatibûn lawazkirin, rêka operasyonên leşkerî dabûn pêşiya xwe. Dewlet ji bo ku bajarên Kurdan di kontrola xwe de bigire qanûnên îskankirinê (bicîkirina li cihekê ya li gor daxwaza dewletê) û rêveberiya awarte dixwe dewrê û li gor vê berpirsiyariya hemî herêmê ji walî, esker û memûran re dihêle. Ji van berpirsiyarên ku her tişt teslîmî însafa wan tê kirin, gelek kiryarên keyfî rû didin.

Dewlet ji bo ku Kurdan têxe bin kontrola xwe gelek hewl dide, ber vê jî heta ji destê wê tê giraniyê dide ser “çareseriyên” bi destê artêş û jendermeyan. Hingê gelek rêveberên dewletê ji bo tehlîla rewşa herêmê tên şandin û ev gotinên Celal Bayarê ku ji aliyê Mustafa Kemal ve bo vekolîna herêmê tê şandin balkêş in: *“Wilayetên Şerqê heta rejîma me bi awayekî teqez neketine bin hakimeyeta me. Hukumetên berê xwestine hakimiyeta xwe bi rêya axa û şêxan li ser xelkê bidomînin. Axa û şêxan beşek ji malên ku şêlandine dane rêveberên dewletê (ya navendî) û bi vî awayî bi hevparî heyameke îdareya meslehetî pêk anîne. Heta îro jî meriv nikare bêje em li Şerqê tam bi cî bûne.”*³⁶ Dîsa em dibînin Bayar jî hekimiyeta dewletê ya li herêmê bi şertê hebûna artêş û jendermeyan ve girêdide.

Gundên herêma Erxenî, Pîran, Hênî, Palo, Genc, Licê û Pêçarê bi giştî piştgirî dabûn Serhildanê û piştî wê jî serhildêrên ku neketibûn destê dewletê -bi taybetî zivistanan- di nav xwe de dihewandin. Serhildêr ku di çavê dewletê de “asî” bûn, havînan li çiya û geliyan, zivistanan li gundan diman û ji gelê herêmê alîkariya zad û xwarinê tedarik dikirin. Hêzên Kurd, carcaran erîşî tabûrên leşkeran dikin û cardin vedikişin deverên asê, lê divê neyê jibîrkinin ev kesên han bi piranî xwedî mal û milk û îtibar bûn ne ku tenê karê wan şer bû. Dewlet ji bo çareserkirina vê kêşeyê û tedîb û teqîba serhildêran, bi serperîştîya Qolordûya 7. ya herêmê, çend mufrezeyan amade dikin û dişînin. Li gor Reşat Hallî, ji aliyê Qolordûya 7. ve ji Diyarbekirê ji Tabûra 2. ya Alaya 25. mufrezeyekê dişînin devera Hewêdan û Alaya 7. ya Jendermeyên Seyar ji bo teqîbê dişînin devera Botyan-Lîsê. Lêbelê hêzên Kurd, Alaya 7. ya Jendermeyên Seyar li dora Çiyayê Lîs perîşan dikin, efser û leşkeran dikujin. Herwiha hêzên Şêx Fexrî Bûkarkî û Şêx Fewzî jî li devera Hewêdan Tabûra 2. ya Alaya 25. ji holê radikin. Hallî encama vê têkçûnê wiha tîne ziman: “Hem aqûbeta elemnak ya Alaya Seyar ya Jendermeyan hem tirsonekiya ku Tabûra 2. ya Alaya 25. nîşan dabûn moralê

³⁶ Nejat Bayramoğlu (amd.), *Celal Bayar'ın Şark Raporu*, Kaynak Yayınları, İstanbul, 2009, r. 63

serhildêran zêde kiribû û wan çalakiyên xwe zêde kiribûn heta wisa ku henekê xwe bi hêzên hukumetê dikirin. Diviyabû ku ev menzereya ji bo artêşa me gelek kirêt û ev rewşa ku nufûzê hukumeta me û şerefa artêşa me payîmal kiribû bihata çareserkinin.”³⁷ Ji bo vê çareseriyê dewlet Mustafa Muğlalîyê ku di Îlona 1926an de li herêma Dêrsimê bi behaneyê serhildana eşîra Qoçuşaxî gelek Kurdan qir dike, di Hezîrana 1927an de dişîne wê herêmê ku serhildêr lê çalak in da ku ji bo rewşa herêmê lêkolîneke berfireh bike. Lewra ji ber asêbûna herêmê dewlet nizane bê ka hejmara serhildêran çi ye, li kîjan deran xwe vedişêrin û kîjan gund pişgiriye didin wan. Li gor Hallî, “M. Muğlalî piştî gera 34 rojan (Cotmeha 1927) tesbît dike ku li herêma Sîlwan, Licê, Pêçar, Genc, Çepaxçûr û Paloyê nêzî 20 serokên³⁸ serhildêran hene û bi piranî li bakurê Licê ye çiyayî çalak in. Herwiha gelê herêmê jî hemî wekî serhildêran difikirin û hereket dikin.”³⁹ Ji vê jî tê xuyan ku armanc ne tenê tepeserkirina serhildêran e, armanceke sereke jî ew e ku gelê ku piştgirî dane Serhildana 1925an bi tevahî bîn cezakin û ji eşrafan bîn paqijkirin.⁴⁰ Herwiha begên Pêçarê ji berê de serxbixwe tevdigeriyan û bi dewletê re zêde li hev nebûn, wek herêmeke muxalif ya Kurdî dixuya di nezera dewletê, ev jî dibe sedemeke din a armancgirtin û tenkîlkirina wan.

Di encamê de M. Muğlalî ji bo tedîb û tenkîla gelê herêmê û serkutkirina serhildêran tê peywardarkirin. M. Muğlalî tê Licê û derbasî serê hêzan dibe (meha Cotmehê).

1.1.5.2 Hereketa Tedîb û Tenkîla Pêçarê

Hereketa Tedîb û Tenkîla Pêçarê di navbera 7ê Cotmehê û 17yê Mijdarê ya 1927an de pêk hatiye. Wekî li jorê jî hat gotin, ji ber ku Fehmî Beg û malbata xwe rasterast ji vê bûyerê bandor girtine ji bo mijara me girîng e.

³⁷ Reşat Hallî, *Genelkurmay Belgelerinde Kürt İsyanları 1*, Kaynak Yayınları, İstanbul, 2013, r. 359

³⁸ Li gor gotina Hallî 20 serokên “asî”yan li herêmê serî dikişînin. Lêbelê ev kesên han ji eşraf û pêşdahiye herêma Licê, Pêçar û Gencê ne û ji ber ku tevli serhildana Şêx Seîd bûne bi vî navî tên binavkirin. Hin ji wan kesên ev in: Şêx Fexrî (biraziyê Şêx Şemseddînê hevrêyê Şêx Seîd e ku li Diyarbekirê tev tên dardakirin), Mistefa Beg (Ji begên Pêçarê ye), Şêx Ebdurehîm (birayê Şêx Seîd), Şêx Huseyn (birayê Şêx Şerîf), Ömerê Faro û çendîn pêşdahiye herêmê. bo agahiye zêdetir. Bnr. Döger, h. b., 90-93

³⁹ Hallî, h. b., r. 360

⁴⁰ Heta piştî Serhildana Şêx Seîd di Mehkemeyên Şaq Îstiklalê de, gelê Gencê di nav bersûcên tîn darizandinan de di rêza yekem de bûn. Di nav jimara bersûcan de gelê Hênî, Hezro, Licê, Maden, Palo, Çepaxçûrê sedî heştê teşkîl dikirin. Ev bersûcên han bi giştî ji herêma serhildanê bûn û ji destpêka serhildanê ve di nav de bûn. Bnr. Akyürekli, h. b., r. 138

Qada hereketa çewisandin û tedîba Pêçarê ew e ku ji bakur Çemê Muradê; ji rojhilat Çemê Sarumê (Batman); ji başûr Farqîn-Hezro-Egil û ji rojava xeta ji Egilê dîsa ber bi - Çemê Muradê diçe pêk tê. Lewra herêma ku di navbera van xetan de dimîne ku tê de çiyayên wek Çotela, Arşik, Lîs, Faso, Cibir, Mîr Îsmâil û geliyên kûr û daristanên gur cî digirin ji serhildêran re bûbû penagah.⁴¹ Navê vê herêmê ku zêdetir de vera Licê û Darahênê û Solxan û Hênîyê digire nava xwe wek Pêçar tê zanîn.⁴² Lewra navê hereketa tenkîl û tedîbê hem belgeyên dewletê hem di nav gel de wek Pêçarê binavkirin.

Di 7ê Cotmeha 1927an de di bin serweriya M. Muğlalı de hereket dest pê dîke. Ji bo hereketa tepeserkirinê, plana dorpêçkirina herêma ku hêzên Kurd lê bûn tê qebûlkin; dê pêşiyê herêm bihata dorpêçkirin û hêdî hêdî bihata teng kirin, dûre dê bi temamî ji holê bihatana rakirin.⁴³

Tenkîl û tedîba Pêçarê li gor pîrbûna mintiqeyên hêzên Kurd bi destê leşkeran di sê qonaxan de pêk tê:

Qonaxa yekem: Li dora Pêçarî tê pêkanîn. Di 7ê Cotmeha 1927an dest pê dîke û 5 rojan diajo, bi dehan gund tîr şewitandin.

Qonaxa Duyem: Li Seyfan, Ziktê, çiyayê Arşik û rojavayê Arduşenê pêk tê. Di 13yê Cotmehê de dest pê dîke û 22ê Cotmehê de diqede û di encamê de 60 gund tê şewitandin û herî kêr 5 hezar însan tîr qetilkirin.

Qonaxa Sêyem: Li gundên dora Licê û Hênî pêk hatiye. Heta 17ê Mijdarê domiyaye û ji vê tarîxê şûnda êdî hereket diqede.⁴⁴

Di esnayê vê hereketa tenkîlê ya ku bi giştî di sêgoşeya Genc, Licê û Pasûrê de li hember hezên piştî Serhildana 1925an pêk hatiye de gelek gundî malê xwe bi jin û zarokan ve vala dikin û leşker li gund, çiya, gelî û baniyan li wan digerin û mîrên ku digirin gulebaran dikin. Gelek gund tîr şewitandin û leşker pez û heywanên gundiyan berhev dikin ji bo xwarina xwe serjê dikin û yê mayî jî dibin Diyarbekir û Elezîzê

⁴¹ H. b., r. 357

⁴² Orhan Zuexpayic, "Bingöl ve Çevresinde Halk Arasında da Kullanılan Kırdi/Zazaki Coğrafi Bazı İsimler", www.zuexpayic.com

⁴³ H. b., 366

⁴⁴ Döger, h. b., r. 194

dikin malê îdareya wir.⁴⁵ Li gor îfadeyên gelê herêmê jî jin û zarokên kurîn ên di bin çardeh salan re jî di mal û merêk û goman de dicivînin û wan dişewitînin.⁴⁶

Ev sala tenkîlê (1927) li herêmê bi Kurmancî wek “Sala Şewatê” û bi Zazakî wek “Serê Veşnayış” tê binavkirin. Di dema Sala Şewatê de yekîneyên leşkeran li Pêçarê bi cî dibin û ji wir li çiyayên dora Pêçarê operasyonan dikin. Li Pêçarê Ahmed Begê bavê Fehmî Beg tevî 45 mêrên ji Pêçarê digirin û dixin gomekê. Sibehê tevan dibin li geliyê Solesen yê li pişt Pêçarê dest û piyên wan bi hev ve girê didin û tevan bi singû û xençeran dikujin. Li vê derê Ahmed Begê bavê Fehmî Beg û mam û pismamên Fehmî Beg tev tî kuştin. Leşkerên ku vedigerin Pêçarê heman rojê, bêyî ku bihêlin kesek tişteke xwe hilde Pêçara 400 xaneyî tev dişewitînin. Cesedên mêrên Pêçarî heta xilasiya hereketê li wê derê wisa dimînin, kes newêre nêzîk be. Piştî hereketê jî ji ber ku kesek namîne wan çal bike, cesedên wan dibin armanca heywanên hov. Gundên dora Pêçarê dema ku wê şewat û zilmê dibihîzin, tev bi mal û zarokan ve xwe dispêrin çiya, gelî û şikeftan.⁴⁷ Ji gundiyan ku xwe dispêrin derên asê gelek îxtiyar, jin û zarok ji ber serma û bêerzaqiyê jiyana xwe ji dest didin.

Wek encam hereketa tenkîlê ya Pêçarê nêzî 40 rojan diajo û li gor Hallî di vê heyamê de 280 gund tî şewitandin⁴⁸ û li gor Döger heya xilasbûna vê hereketê nêzî 15 hezar însan tî kuştin⁴⁹. Li gor îfadeyên gelê herêmê li Darahênê ji xeynî du gundan hemî gund tî şewitandin, herwiha ji gundê navbera Hênî û Licê hema hema gundê ku nehatiye şawitandin namîne.⁵⁰

Li gor dewletê “asî”yên bermayiyê serhildana Şêx Seîd li herêmê hêj hêzdar bûn, diviyabû koka wan bihata qelandin û hêzeke herî piçûk ya ku li hember dewletê serê xwe rake nemîne. Ji ber asêbûn û koyistaniya herêmê dewletê nikaribû herêm her wextê kontrol bikira, ji ber wê dixwest ku li wan deran tu hêzeke dijber nemîne û tu gundiyeke destê xwe dirêjî wan neke. Bi vê armancê hereketa tedîb û tenkîlê di bin serweriya Mustafa Muğlalî de dest pê kir. Di encamê bi sedan gund hatin şewitandin û bi hezaran însan hatin kuştin, bi ser de dever ji însanan hat paqijkirin. Zilm û kuştariya M. Muğlalî ku di wê heyamê de kir, hêj di hafizeya civaka herêmê de heye û tê gotin.

⁴⁵ Hallî, h. b. r. 371-372 û 381

⁴⁶ Döger, h. b., r. 104

⁴⁷ Döger, h. b., r. 110-111; herwiha ji roportaja bi Hidayet Begê lawê Fehmî Beg re.

⁴⁸ Hallî, h. b., r. 283

⁴⁹ Döger, h. b., r. 162

⁵⁰ h. b., r. 125-162

Li gor me sefera li ser Pêçarê, parçeyek ji navendîkirina dewletê ya li ser war û bajarên Kurdan e. Ew navendîkirina ku di dema Siltan Mehmûdê 2. ê Osmanî de bi serdemeke sancûdar dest pê kiribû, di destpêka dewleta Tirkiyê de jî dihate ceribandin. Heta ev cûre kiryarên navendîkirinê piştî Hereketa Pêçarê jî bi destê Mufetişiya Umûmî⁵¹ tê domandin.

Bi hereketa Pêçarê re hêzên Kurdan ên piştî Hereketa 1925an bi giştî hatin tesfîyekirin, ji xeynî yek du grûban. Di dema hereketa Pêçarê de di nav van hêzên Kurdan de ya herî hêzdar hêza Şêx Fexrî û ya kurmamê wî Şêx Feyzî bû ku di vê hereketê de leşker herî zêde bi wan re mijûl bûne û derbeyên herî giran wan li hêzên dewletê dane. Digel ewqas leşker û tertîbatê hêzên dewletê nekarîn Şêx Fexrî û Şêx Feyzî digel hêzên wan bigirin. Hêzên dewletê gelek caran bi hêzên Şêx Fexrî û Şêx Feyzî re dikevin pevçûnê. Şêx Fexrî piştî hereketa Pêçarê derbasî Binxetê dibe û di 1928an de vedigere û heya sala 1933an têkoşîna xwe li herêmê didomîne.

⁵¹ Piştî Mufetişiya Umûmî ya Yekem tê damezirandin di 1ê Kanûna Duyem a 1928an de İbrahim Tali Öngören tevî kadroyeke 29 kesî li Diyarbekirê wek Mufetişê Umumî dest bi kar dike. Navenda Mufetişiya Umûmî ya Yekem Diyarbekir e. Armanca herî girîng ya avakirina Mufetişiyên Umûmî ew bû ku cihê rêveberiya awarte ya ku di 5ê Berfanbara 1927an de qediyabû bihata tijîkirin û asayiş û zebta herêmê bihata temînkirin. Bnr. Ercan Çağlayan, *Cumhuriyet'in Diyarbakır'da Kimlik İnşası (1923-1950)*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2014, r. 91

1.2 JIYANA NAMÎ

1.2.1 Navê wî û Mexlesa wî

Navê şairê me di nav malbatê û gel de Fehmî bûye û her bi vî navî hatiye naskirin, lê di qeyda fermî de navê wî “Hasan” û paşnavê wî jî “Akgül” e. Fehmî Beg jî hem di dîwana xwe de hem di jiyana xwe ya rojane de her tim navê Fehmî bi kar aniyê. Fehmî Beg ji ber ku ji malbateke mîr û beg e, wekî hemî endamên malbata wî ji wî re jî “Beg” hatiye gotin.

Wekî ku di edebiyata klasîk de kevneşopiyek e, hemû helbestvan di dawiya helbesta xwe de mexlesa xwe bi kar tînin. Helbestvanê me jî wekî ku di dîwana xwe de hemû xalên hevbeş ên edebiyata klasîk şopandine, carinan di beyta dawiya helbestê de carinan jî di beyta berî dawiyê yan jî di nîveka helbestê de mexlesa xwe bi kar aniyê. Helbestvanê me bi piranî mexlesa “Namî” û carinan jî mexlesên “Fehmî” û “Fehîm” bi kar anîne. Hema bêje di her helbesta wî de mexlesa Namî heye, heta di pêşeka dîwanê de jî navê xwe wek “Namîyê Pêçarî” qeyd kiriye. Ji ber van egeran, emê jî tabîê helbestvan bibin û di xebata xwe de ji bo navê wî bêhtir navê “Namî” bi kar bînin. Ji bo bikaranîna mexlesa Namî mînak:

Namî bi teswîdê xeber der tê ji dil dağ û keser
Ma pê nizanî ev qeder zanî bi halet kes ‘eceb (7/18)

Carinan jî bi awayê nîdayê wek Namiya bi kar aniyê:

Ez gemê hicran şikayet **Namiya** ber kê dikî
Gemxwuret nîne çu kes belkî pê şad in reqîb (8/14)

Her wiha carinan navê xwe yê eslî “Fehmî” jî wek mexles bi kar aniyê, lê em mexlesa Fehmî tenê di 4 helbestên wî de dibînin:

Fehmî ji nadanê xeber go, pê rijand abê keser
Ger yek di vê me‘na ji vê jî ev demûc heftê nuhûc (12/15)

Ji xeynî van carinan mexlesa “Fehîm” jî bi kar aniye, wî li ser hev di 5 helbestên xwe de mexlesa Fehîm bi kar aniye:

Te di megmûrê gelek herze beyan kerdî **Fehîm**

Te ji van herzeê bê reng û me‘anî çî ye hez (30/26)

Wekî dixuyê wî bi giştî mexlesa “Namî” tercih kiriye û di kêm helbestên xwe de jî mexlesên “Fehmî” û “Fehîm” bi kar anîne. Dîsa em dibînin di hin helbestên xwe de ji van mexlesan du heban bi hev re bi kar tîne:

Gencûrê van daê nehîn, **Namî** ji mêj şed aferîn

Ger tu nebî bê dilneşîn kes dê ji van ew ket xurûc (12/11)

Fehmî ji nadanê xeber go, pê rijand abê keser

Ger yek di vê me‘na ji vê jî ev demûc heftê nuhûc (12/15)

1.2.2 Eşîra û Mîrektiya wî

Fehmî Beg dema di dawiya dîwanê beşa duayê de xwe dide nasîn wiha dibêje: “*Katibê heqîr kemterê cumleê mu‘minîn Fehmî bin Ehmed bin Hesên bin Emîr Muhammed‘ul-Pêçarî es-Suweydî*”, ango “Fehmî kurê Ehmed kurê Hesên kurê Mîr Mihemedê Pêçarê yê Suweydî”. Fehmî Beg ji malbata mîrên Suweydî ye ku li Pêçarê îqamet dikirin. Suweydî di serî de navê eşîreke ye û dûre dibe mîrektî û ev mîrektî çend sedsalan dewam dike. Ji bo eyanbûna paşxaneyê malbata şair, divê em geşteke li tarîxa xanedana Suweydî bidin.

Wekî tê zanîn di sala 1515an de 24 mîr û begên Kurdan piştî Şerê Çildêranê bi peymanekê tevli îdareya dewleta Osmanî dibin. Wekî hemî herêmên Kurmancan herêmên Zaza/Dimiliyan ên wek Etax (Licê), Egil, Genc, Palo, Çepaxçûr (Bîngol), Erxenî, Pertek, Siwêrek hwd jî wekî berê bi destê mîrekên herêmî tîrêvebirin. Mîrekên Suweydî di tarîxê, herwiha di îdareya dewleta Osmanî de wek Zaza hatine binavkirin û zimanê xelefê van mîrekan ta îro jî Zazakî ye. Mîrektiya Suweydî li herêma ku bajarên Çepaxçûr, Genc, Darahênî (Genc), Meneşkurd (Solhan), Xançûk û

Xinisê dihewîne hukim kiriye.⁵² Genc⁵³ navenda Mîrektiya Suweydî ye û dema ku di 1515 mîrektî tevli dewleta Osmanî dibe Genc wek sancaxekê jî bi wîlayeta Diyarbekirê ve tê girêdan. Mîrektiya Suweydî ji sê mîrgehan; mîrekên Gencê, mîrekên Xançûkê û mîrekên Çepaxçûrê pêk tê. Mîrgeha Xançûkê di dawiya sedsala 18. de ji ber nakokiya digel dewleta Osmanî tê fesixkirin. Mîrgehên Genc û Çepaxçûrê jî hetanî serdema navendîkirina dewleta Osmanî (Siltan Mehmûdê 2.) hebûna xwe diparêzin.⁵⁴ Mîrekên Pêçarê ku mîhengê mijara me teşkîl dike ji mîrekên Gencê bûne.

Li gor *Şerefnameyê* hoza Suweydî, ji tîreyên Kurd bû ku li herêma Gencê nişteci bûn. Mîrekên wan ji binemala Bermekiyan in ku piştî derbederiyê, Bexdayê terk dikin û xwe dispêrin derûdora Kurdistanê û piştî çend nifşan ziman û adabên Kurdan digirin. Paşê ji ber sezawerî û têgihîştîbûna xwe, derbasî serê hoza Suweydî dibin û ji xwe re li Gencê mîrnişîniyekê saz dikin.⁵⁵ Di *Şerefnameyê* de li ser binyada mîrekên Suweydî du rîwayet tene neqilkin; li gor rîwayeta yekê, koka mîrekên Suweydî digihîje Bermekiyan û ya eşîrê jî digihîje sehabeyekê Pêxember yê bi navê Eswed, li gor rîwayeta duduyan jî, welatê eslî yê eşîra Suweydî digihîje gundê Suweydê yê nêzî Medîneyê. Lêbelê Mihemed Elî Ewnî ku *Şerefnameyê* werdigerîne zimanê Erebî, li vê derê di jêrenotê de îtirazê li vê fikra Şeref Xan dike û wiha dibêje: “Ya nêzî eqil û rastiye ev e ku; Ev eşîreta kevn ya Kurdan, ji kela xwe ya Suweydan ya ku tê de nişteci bûn û xwe diparastin, yanî ji kela Sûrek (Siwêrek) ya di navbera Amid û Rihayê de, ji ber dagirkirina Xaçperestan ya herêma dora Şam û Cizîrê û ji ber wergirtina herêmê ya bi destê Rom û Ermeniyan, koç kirine. Eleqeya wan bi gundê Suweydê yê li nêzî Medîneyê û herwiha bi herêm û welatên din tune.”⁵⁶

Şeref Xan di *Şerefnameyê* de bi rêzê navê mîrekên Suweydî (Xançûk, Genc û Çepaxçûr) ên ku hukim kirine dinivîse û der barê wan de agahiyan dide. Li gor wê

⁵² Ercan Çağlayan, “16. Yüzyılda Süveydi ve Hoy Zaza/Dumbeli Emirlikleri”, *Osmanlı Devleti ve Kürtler*, edit: İbrahim Özcoşar-Shahab Vali, Kitap Yayınevi, İstanbul, 2017, r. 54

⁵³ Genca navenda mîrektiyê û navçeya “Genç”ê ya îro heman der nînin. Genc li devera gundên Solhanê yê bi navê Genc, Kale û Yenibaşak e. Bo bêhtir agahiyan bnr. Ercan Çağlayan, “Hükümet Merkezi’nden Periferileşmiş Bir Köy’e: Genc”, *2. Sosyal Bilimler Genç Araştırmacılar Sempozyumu Bildirileri 24-25 Nisan 2010*, Şarkiyat Araştırmaları Derneği, Diyarbekir, 2012, r. 36-46

⁵⁴ Çağlayan, h. b., r. 60

⁵⁵ Baba Merdox Rûhanî (Şîwa), *Tarîxê Meşahirê Kurd, Emîr û Xanedanha*, Cild. 3, amd.: Macid Merdox Rûhanî, weş. Surûş, Tehran, 1371/1992, r. 331

⁵⁶ Şeref Han, *Şerefname Kürt Tarihi*, wergera li ser Tirkî: M. Emin Bozarlan, Yöntem Yayınları, İstanbul, 1975, r. 314

rêzê mîrekên Suweydî ên ku heta xilasbûna nivîsîna *Şerefnameyê* (1597) hukim kirine ev in: Mîr Şehab, Mîr Celal, Mîr Mihemed, Mîr Fexreddîn, Mîr Hesên, Mîr Fexreddînê Duem, Mîr Mihemedêd Duyem, Evdal Beg, Mîr Subhan Beg, Siltan Ehmed Beg, Meqsûd Beg, Murad Beg û Mihemed Beg Silêman Beg. Yekemîn kesê ku navê wî bi nasnavê Mîrê Suweydî di pirtûkên dîrokê de derbas bûye Mîr Şehab e, ku bîngeha vê hikûmetê ji aliyê wî ve hatiye avakirin û xurtkirin.⁵⁷

Mixabin ku agahiyên der barê mîrên Suweydî de ta dîroka qedandina *Şerefnameyê* (sala 1595an) ne, ji vê şûnde behsa wan di pirtûkên dîrokê de tune. Dema Fehmî Beg xwe di dawîya dîwanê de dide nasîn, herî dawîn navê kalê xwe yê “Mîr Mihemed Suweydî” dide. Wekî dixuyê, Mîr Mihemedê kalê wî xelekek ji zincîreya mîrên Suweydî ye. Lewra mîrekên Suweydî ên herêma Genc-Pêçarê heta çaryeka duyem a sedsala 19. hebûna xwe diparêzin û nîvserbixwe rêveberiyê dikin.

Herçendî ji aliyê dewletê/fermî ve ji wê demê şûnde nayên naskirin û qebûlkirin jî mîrekên Pêçarê heta Hereketa 1925an ji aliyê madî û manewî ve li herêmê qismen hêza xwe diparêzin. Ji ber piştgiriya wan a bo Serhildanê, gelek pêşdhatî û giregirên Pêçarê li Diyarbekirê tên dardakirin û yê mayî jî di esnayê Hereketa Pêçarê de tên qetilkirin. Piştî Hereketa Pêçarî dewlet dest dide ser mal û eraziyên wan jî. Hêj niha jî malbata Fehmî Beg li herêmê wek “mala mîran” tê naskirin.

1.2.3 Gundê wî Pêçar

Pêçar ku di çavkaniyên Osmanî de wek Bîcar û Peçar/Piçar jî derbas dibe, di demên cuda de ji aliyê teqşîmata îdarî ya Osmanî ve wek gund, nehîya, qeza û miteserîfî hatiye îdarekirin. Pêçar xwedî dîrokeke kevn e. Pêçar, beriya ku herêmên Kurdan bikeve destê dewleta Osmanî ji aliyê mîrekên Suweydî ve dihat îdarekirin û piştî ku mîrekên Kurdan tevli îdareya Osmanî dibin (sala 1514an) jî dîsa heman îdare didome.

Di salnameyên Diyarbekirê de ji sala 1856an heta 1870an wek qezayeke girêdayî wilayeta Diyarbekirê ye, lê ji sala 1870an heta 1896an jî wek nehîyayeke girêdayî sancaxa Gencê ya girêdayiyê wilayeta Bidlîsê di sîstema dewleta Osmanî de cî

⁵⁷ Rûhanî, h. b., r. 331

digire.⁵⁸ Pêçar, li gor teqşîmata îdarî demeke dirêj girêdayê sancaxa Gencê (wîlayeta Bedlîsê) dimîne, lê ji bo cardin girêdana bi qezaya Licê (wîlayeta Diyarbekirê) ve çend caran daxwazname tên şandin,⁵⁹ lêbelê hukûmeta navendî van red dike û diyar dike ku ya bi minasib ew e girêdayî bi Gencê bimîne (1889).⁶⁰ Dîsa li gor belgeyeke ku ji aliyê navendê ve wek bersiv hatiye şandin, hin kes li ser navê gel bi mohrên sexte van daxwaznameyan dişînin da ku Pêçar bi Liceyê ve were girêdan, lêbelê gel ji navenda ku pê ve girêdayî ne memnûn in û divê li van kesan îtibar neyê kirin (1890).⁶¹ Herwiha di dewra Cumhûriyetê de di qeydên Mehkemeyên Şerq Îstîqlalê de jî Pêçar wek nehiyayeke xwedî çendî gund û mezrayan dibore.⁶²

Ji ber piştgiriya gelê Pêçarê ya ji bo Hereketa 1925an, piştî têkçûna serhildanê Pêçar tê talankirin û şewitandin. Herwiha di esnayê Hereketa Tenkîlê ya Pêçarê (1927) de jî bi temamî tê şewitandin. Pêçar beriya vê şewatê nêzî 400 xaneyî bû.⁶³ Piştî Cumhûriyetê jî di teqşîmata îdarî ya nû de wek gund tê diyarkirin.

Ji berê de di Pêçarê de Kurd û Ermenî tev dijiyan. Di serdema Osmaniyan de Ermeniyên Pêçarê ayîn û îbadetên xwe serbest dikirin û di navbera wan û Kurdan de pîrsgirêkên cidî tunebûn.⁶⁴ Heta salên 1940î jî yek du malbatên Ermenî li Pêçarê hebûne, lê piştî hingê ew jî koç dikin.⁶⁵ Kurdên Pêçarê bi giştî Zaza ne, lê mîrên Pêçarê digel ku Zaza ne di nava malên xwe de bi Kurmancî diaxivîn. Hîdayet Begê kurê Fehmî Beg, vê yekê bi zewaca digel jinên Kurmanc ve girêdide. Ji ber hindê ye ku malbata Fehmî Beg di nav malê de zêdetir bi Kurmancî û di nav gel de bi Zazakî diaxivîn û ferdên malbatê niha jî herdu zaravayan baş bi kar tînin.

Di dewra Osmaniyan de li Pêçarê medrese hebû û muderisên navdar tê de ders didan. Meselen şairê “Mewlûda Zazakî” Ehmedê Xasî demekê li Pêçarê xwendiyê.⁶⁶

⁵⁸ Tahir Sezen, *Osmanlı Yer Adları*, T.C. Başbakanlık Devlet Arşivleri Genel Müdürlüğü, Ankara, 2017, r. 118; Hatice Kele, *Salnamelere Göre Van ve Bitlis Vilayetlerinde Dini-Sosyal Yapı*, Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, teza lîsansa bilind ya çapnebûyî, Elazığ, 2009, r. 43 û 63-64

⁵⁹ BOA, DH.MKT., 1628/2

⁶⁰ BOA, DH. MKT., 165/89; 1681/81; DH.TMIK.S., 51/10

⁶¹ BOA, DH. MKT 1638/26

⁶² Akyürekli, h. b., r. 158

⁶³ Döger, h. b., r. 110

⁶⁴ BOA, HR.TH., 203/45, (tarîx: 07.11.1897)

⁶⁵ Ji hevpeyvîna digel Hîdayet Beg (Sibat 2018)

⁶⁶ İbrahim Dağılma, “Ahmedê Xasî'nin Hayatı ve Mewlid Adlı Eserinde Tema”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Entitüsü Dergisi*, s. 1, j. 1, 2015, r. 128

Îro jî Pêçar gundekî girêdayîyê navçeya Liceyê ye û navê wî yê fermî Güldiken e. Pêçar gundekî şîn ê di nav çiyayên bilind de ye û wek coğrafya di nav çiyayên bakur-rojhilatê Licê de cî digire. Vêga ev mezreyên han girêdayî Pêçarê ne: Bûbik, Gavnor, Gozêrik, Hesîg, Maştag, Neban, Şêxmûs, Ziktê û Xilboç.⁶⁷ Dema ku di salên 90î de gundên Kurdan tên şewitandin, Pêçar jî ji vê karesatê para xwe digire û cara sêyem tê şawitandin (sala 1993an). Beriya vê şewatê di Pêçarê de nêzî 150 mal hebûn û lê piştî şewatê gund bi salan vala dimîne û çûna wê derê tê qedexekirin. Van çend salên dawîn piştî rabûna qedexeyan, hin malbat vegeeriyane gund û li wir havîn û zivistanan dimînin.

1.2.4 Jidayikbûn, Perwerdehî û Pîşeya wî

Fehmî Beg di sala 1910an de li nehiyeya Pêçarê ku niha gundekî girêdayî Licê ye û navê wê yê fermî Güldiken e, ji dayik bûye. Navê bavê wî Ehmed û navê dêya wî Sidîqe ye û ew zarokê mezin yê xwişk û birayan e.

Fehmî Beg di pênc saliya xwe de li Pêçarê dest bi xwendin û perwedeyê dike û li bal Mela Ebdulqadirê Bidlîsî (katibê mehkemaya şer'î ya Pêçarê) Quranê û hin parçeyên dînî dixwîne. Piştî li Licê mekteba seretayî (îbtîdî) ya fermî dixwîne,⁶⁸ hingê li bal malxana dimîne. Ji ber zîrekî ya wî û malhebûna malbata wî, wî ji bo mekteba navîn dişînin Ruşdiyeya Farqînê. Fehmî Beg di ruşdiyeyê de çend salan dixwîne em nizanin, lê tiştê em dizanin ji ber bûyerên li Pêçarê ên piştî Hereketa 1925an ruşdiyeyê berî qedandinê diterikîne. Lêbelê dema em temenê Fehmî Beg ye hingê esas bigirin ku 17-18 salî bûye, muhtemel e li ber qedandinê bûye.

Ruşdiye ew cure mekteb e ku ji aliyê dewleta Osmanî ve cara pêşîn bi wesfê sîvîl hatiye vekirin. Herçendî di 1847an de dest bi damezirandina ruşdiyeyan hatiye kirin jî li bajarên Kurdan ruşdiyeya ewil li Diyarbekirê di sala 1868an de hatiye vekirin.⁶⁹ Ruşdiyeya Farqînê jî di 1894an de tê vekirin.⁷⁰ Perwerdehiya ruşdiyeyan çar sal e. Zarokên ku ruşdiye xilas dikirin derbasî mekteba îdadî (lîse) dibûn ku di

⁶⁷ Bnr. Murad Caşad, "Pêçar", www.zazaki.net

⁶⁸ Adak, h. g., 442

⁶⁹ Selçuk Akşin Somel, "Taşranın Denetimi ve Asimilasyonu: Diyarbakır'da Sivil Devlet Eğitimi'nin Ortaya Çıkışı (1868-1908)", *Diyarbakır Tebliğleri: Diyarbakır ve Çevresi Toplumsal ve Ekonomik Tarihi Konferansı*, HDV Uluslararası Hrant Dink Vakfı, İstanbul, 2013, r. 140

⁷⁰ Li gor belgeyê dewleta Osmanî, gelê Farqînê di navbera xwe de bi awayê îaneyê (alîkariyê) mekteba ruşdiyeyê vedikin li bajêr û bi nameyekê jî ji dewletê daxwaza mamosteyan dikin. Bnr. BOA, MF.MKT. 195/71 (10.2.1894)

qedemeya perwerdehiyê de di ser ruşdiyeyê re bû, herwiha zarokên ku ji ruşdiyeyan mezûn dibûn dikaribûn di qedemeyên dewletê yê cûrbecûr de bûbûna memûr.⁷¹ Bi giştî di ruşdiyeyan de ev dersên han dihatin dayin: Tecwîd û ilmên dînî, hesab, hendese, coğrafya, tarîx, resim, husnê xet (xweşnivîsî), serf û nehew, dersên zimanên Tirkî, Erebi û Farisî, malûmatên der barê ticaret û ziraetê de, hunerên destî hwd.⁷²

Fehmî Beg di ruşdiyeyê de dest bi hînbûna zimanên Erebi û Farisî kiriye û jixwe pêşiyê ji ber perwerdehiya di mekteba seretayî (îbtîdaî) de bi Tirkî hîn bûbû. Wisa dixuyê wî zimanên Farisî û Erebi di hepsê de bi pêş xistine. Lewra li gor agahiyên me girtî, dema ku di hepsê de ne gelek pirtûkên bi Erebi û xaseten bi Farisî dixwîne. Heta dersan dide hin mehkûman.⁷³

Fehmî Beg dema di 1940an de ji hepsê dertê wek kar, karên necariyê û temîrkariya sîlehan dike. Ew li herêma Licê heya sala 1960an ji mobîlyayan bigire ta çêkirina derî û paceyan her cûre karê necariyê dike, herwisa temîrkarî û çêkeriya sîlehan. Ew bi vê pisporiya xwe li herêmê nav û deng dide. Dibe ku Fehmî Beg bingehê vê hunerweriya xwe di mekteba ruşdiyeyê de avêtibe, lewra hingê di mufredata ruşdiyeyan de dersên hunerên destî jî hebûn. Xuya ye Fehmî Beg di hemî hunerên destan de têra xwe mahir bûye, lewra em vê di nexşdarî û xemilandina xetê dîwana wî de dibînin. Dîwana wî ji aliyê husnê xet, xweşnivîsî û resimandinê ve di edebiyata Kurdî ya klasîk de emsala şahkarî û zerafetê ye. Helbet di vê de para dersên “husnê xetê” û “hunerên destî” yê di ruşdiyeyan de hatine dayin hene, lê bal û heweseke Fehmî Beg ya taybet li ser vê hunerên bedew û hunerên destî hebûye.

1.2.5 Fehmî Beg û Hereketa Pêçarê⁷⁴

Hinek mêrên ji malbata Fehmî Beg ji ber ku di Hereketa Şêx Seîd de cî digirin an tîr kuştin an jî tîr dardakirin û hinek mêrên malbata wî jî di esnayê Hereketa Pêçarê de tîr qetilkirin. Hereketa Pêçarê di jiyana Fehmî Beg de xala werçerxê ye.

⁷¹ Ayşegül Altınova, *Osmanlı Modernleşmesinde Rüşdiye Mektepleri*, Teza Doktorayê, Gazi Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Bölümü, Ankara, 2010, r. 404

⁷² H. b., r. 256-270

⁷³ Ji hevpeyvîna digel Mela Xalîte Licî (Sibat 2018).

⁷⁴ Agahiyên vê beşê bi piranî ji van hevpeyvînan sadir bûne: Hevpeyvîna digel Hîdayet Beg (Sibata 2018an); Hevpeyvîna digel Mela Xalîte Licî (Sibat 2018); Hevpeyvîna digel Xurşîd Mîrzenîgî (Gulan 2018).

Lewra heta hingê xwendekarekî dibistanî bû, lê piştî vê bûyerê jiyana wî tevlihev dibe; malbata wî tê qirkirin, dibe şervan, bi îdamê tê darizandin...

Dema ku Pêçar di Cotmeha 1927an de tê şewitandin û Ehmed Beg tevî gundiyan xwe tê kuştin, hingê kurê Ehmed Beg, Fehmî Beg, li Farqînê ruşdiye dixwend. Piştî şewitandina Pêçarê hefteyek şûnda dema Fehmî Beg li sûkê digere, di bin efserekî Tirk de hespê bavê xwe dibîne. Diçe bi hefsarê hespê bavê xwe digire û dibêje “ev hespê bavê min e, te diziye”. Efsere Tirk dibêje “jixwe em jî li te digeriyan” û yekser Fehmî Beg desteser dike. Li ser vê mamoste û hevalên wî dikevin navberê û bi zor û bela wî ji nav lepê leşkerên li wir xilas dikin û dûre wî hişyar dikin ku jiyana wî di xetereyê de ne û dibe ku wî jî bikujin. Li ser vê Fehmî Beg mektebê berdide û berê xwe dide Pêçarê.⁷⁵ Fehmî Beg piştî hingê xeberdar dibe ku gundê wan tev hatine şewitandin û malbata wî tev hatiye qirkirin. Li Pêçarê ji xeynî dêya wî, birayên wî Cewdet û Mehmûd û du xwişkên mezinên malbata wî hatibûn qirkirin û mal û milkên wan hatibûn şewitandin. Li ser vê Fehmî Beg diya xwe û xwişk û birayên xwe dibe gundê kalikê xwe Xurûcê yê bi ser Pasûrê û ji ber ku zarokê herî mezin e êdî hemî barê malbatê dikeve ser milê wî. Bi vî awayî Fehmî Beg demekê li herêmên dûrî navendê û koyistanî dimîne û piştî ku Şêx Fexrî di 1928an de ji Binxetê vedigere, ew diçe digihîje hêzên Şêx Fexrî⁷⁶ û bi salan li çiyayan dimîne.⁷⁷ Fehmî Beg li gor şervanên din xwendî û mektebdîtî bû, lewra Şêx Fexrî wî dike katibê xwe. Ew li

⁷⁵ Döger û Zuexpayic diyar dikin ku dema ev bûyer rû dide, Fehmî 12 salî bûye. Lêbelê ev agahî û wîladeta Fehmî Beg hev nagirin, lewra Fehmî Beg di sala 1910an ji dayik bûye, yanî hingê 17 salî bûye.

⁷⁶ Şêx Fexrî di sala 1899an de li gundê Qamişlî yê li ser Farqînê (niha li ser Bismilê ye). Ji ber ji malbateke şêxên Neqşebendî ye wek “şêx” hatiye naskirin. Bûkark navê zozanê wan e li dora Solxanê ye.

Piştî ku Serhildana 1925an tê serkutkirin Şêx Fexrî tevî jimareke zêde şervanên xwe li xeta Farqîn-Hezro-Pasûrê li ber xwe dide. Di dema Serhildana 1925an de pêşengê vê xetê Şêx Şemseddînê mamê Şêx Fexrî bû, lê dema ku Şêx Şemseddîn li Diyarbekirê di Mehkemeyên Îstiqlalê de tevî 47 pêşengên serhildanê tê dardakirin, piştî serhildanê Şêx Fexrî dikeve şûna wî. Şêx Fexrî piştî Hereketa Pêçarê (1927) derbasî Binxetê dibe. Li wir tev li civînên rêxistina Xoybûnê dibe. Piştî ku dewleta Tirkîyê di sala 1928an de efûyê derdixe ew ji Binxetê vedigere tê gundê xwe Qamişloyê. Dema ku hay ji politikayên dewletê dibe çend mirovên xwe digire cardin derbasî Binxetê dibe. Li wir di civîna Xoybûnê de mijar tê axaftin û di encamê de Şêx Fexrî hevalên xwe çekdar dike û tê li gundê Malêgir ya li ser Hezroyê (di navbera Farqîn, Hezro û Pasûrê de) qerargeha xwe dadimezirîne. Di heman demê de Ihsan Nûrî Paşa jî ji bo herêma Araratê tê şandin ji aliyê Xoybûnê ve. Bi demê re li herêmê hêza Şêx Fexrî digihe jimareke zêde. Şervanên Şêx Fexrî ji sala 1928an heta sala 1933an li dora Malêgirê perwerdehiya çekdarî dibînin û li herêmê dimînin. Heta tepeserkirina Serhildana Araratê dewlet têkilî Şêx Fexrî û hêzê wî nabe. Di 17ê Cotmeha 1933an de dewlet bi hêzeke mezin di sêgoşeya Farqîn-Hezro-Pasûrê de ji bo wan operasyonê dide destpêkirin. Pevçûn bi rojan didome. Di encamê de Şêx Fexrî û hin hevalên wî tên kuştin û qismek jî tên girtin. Bo agahiyên zêdetir bnr. Orhan Zuexpayic, “Farqîn’li Şêx Faxri Bukarkî’nin Yaşam Öyküsü”, www.zuexpayic.com

⁷⁷ Xurşîd Mîrzengî, *Sala Şewatê*, romana tarîxî ya neçapkirî.

çiyayan digel şervaniyê, bo Şêx Fexrî karê namenivîsîn û wergêriyê jî ew pêk tîne. Heta di hevdîtînên fermî de jî wek turcumanê Şêx Fexrî cî digire.

Di sala 1930an⁷⁸ de dema Mufetişê Umûmî İbrahim Tali (Öngören), waliyê Diyarbekirê Nizamettin Beg (Ataker), mudîrê îstixbaratê Osman Beg û tevî konvoyeke leşkeren ji Çemê Also yê li dora Farqînê derbas dibin rastî hêzên Şêx Fexrî tîn. Hêzên Şêx Fexrî pêşiya wan digirin û herdu hêz çekan dikişînin hev. Şêx Fexrî ji ber zimanzaniya wan Fehmî Beg û kesekî din dişîne pêşiya wan, İbrahim Tali ku ew herdu wergêr beriya çendekê li Diyarbekirê ji hevdîtineke digel Şêx Fexrî nas kiribû, ji wan daxwaza danûstandin û axaftina şertan dike. Di nav hêza Şêx Fexrî de yê ku bi Tirkî dizane tenê Fehmî Beg e. Fehmî Beg di nav herdu koman de tercumaniyê dike. Koma leşkerên Tirk diyar dikin ku ew ne ji bo operasyoneke leşkerî, lê ji bo gereke rûtin di wir re derbas dibin. Her du alî li hev dikin û bêyî şer jî hev diqetin.

Di Cotmeha 1933an de dema Şêx Fexrî xebera livîneke leşkerî hildide, Fehmî Beg bi dizî dişîne Farqînê da ku der barê bûyeran de agahiyên sehîh bistîne û rewşê tehqîq bike. Li gor Hîdayet Beg, Fehmî Beg li Farqînê dibe mêvanê kesekî bi navê Emerê Nokê, lê mazûvan mêvanê xwe îxbarî hêzên leşkerî dike û li wir tê girtin. Di heman demê li hemberî hêzên Şêx Fexrî şerekî dijwar diqewime û di encama demeke dijwar Şêx Fexrî tevî hinek şervanên xwe tîn kuştin, yên mayî tîn girtin. Wê demê Fehmî Beg li Farqînê hatibû girtin û dûre ji bo mehkemekirinê tevan dibin Diyarbekirê. Fehmî Beg demeke dirêj di hepsê de dimîne û dûre derdixin mehkemeyê. Ew di vê mudetê jî ji bo girtiyan wergêriyê dike û nameyên wan dinivîse. Li Diyarbekirê gelek kesên ku hatibûn girtin tîn dardakirin. Dema ku Fehmî Beg dibin mehkemeyê li wir bi saya bûyerekê ji dardakirinê xilas dibe, bûyer wiha diqewime: Dema Fehmî Beg li salona mehkemeyê ji bo darizandinê destkelemçekirî li benda dora xwe ye, li wir di navbera Fehmî Beg û yek-du leşkeran de minaqeşe çêdibe. İbrahim Tali tê ser qerebalixê. İbrahim Tali, Fehmî Begê ku çend sal ewil li Çemê Also dîtibû nas dike û jê dipirse “Tu ne ew tercumanê di nav hêza Şêx Fexrî de yî?”. Fehmî Beg dibêje “belê” ew ez im. İbrahim Tali wiha dibêje: “Ew roj te bi kesayetiya xwe ya çêker jiyana min û ya hevalên min xilas kir. Ezê jî ya te xilas bikim.” Bi

⁷⁸ Orhan Zuexpayic, “Medeni Bukarki ile Şêx Fexrî Bukarkî Hakkında Röportaj”, www.zuexpayic.com

navbeynkariya İbrahim Tali Öngören ew ji dardakirinê xilas dibe û cezayê hepsê lê tê birrîn.

Fehmî Beg 7 salan li Diyarbekirê di hepsê de dimîne. Di sala 1940an de ji hepsê dertê û heman salê dizewice.

1.2.6 Zarokên wî

Fehmî Beg di sala 1940an de bi dotmama xwe Zubeyde Xanimê re dizewice û sê kur û sê keç li ser hev 6 zarokên wan çêdibin. Li gor rêza temendariyê zarokên wan ev in: Hidayet (di sala 1941an ji dayik bûye), Fikriye (di sala 1963an de di temenê 18 salî xwe de wefat kiriye), Nîhal, Xanim, Elî (di sala 1953an de hatiye dinê û di sala 1981an de wefat kiriye) û Ehmed (di sala 1958an de hatiye dinê û di sala 1992an de wefat kiriye).

Niha Hîdayet Beg û xwişkên xwe Nîhal û Xanim li jiyane ne. Hîdayet Beg demekê melatî kiriye, lê ji ber hin mijarên siyasî di salên 90î de tê girtin û di bin nezaretê de ji ber îşkenceyê çavên wî ronahiya xwe winda dikan. Ji hingê pê ve geh li Almanyayê û geh li Diyarbekirê demên xwe diborîne. Herwiha zarokên Fehmî Beg, wek bavê xwe ji hêla nivîsê ve bi şîir û edebiyatê re têkildar nebûne.

1.2.7 Jiyana wî ya li Diyarbekirê

Fehmî Beg di 1960an de kar û pîşeya xwe ya li herêma Liceyê vediguhêze navenda Diyarbekirê. Ew li navenda Diyarbekirê li hemberê Mizgefta Mezin ji xwe re dukaneke temîrkariya sîlehan vedike û bi vî karî re mijûl dibe.⁷⁹ Paşê di 1965an de malbata xwe jî tîne navendê. Herwiha ji vê salê şûnda êdî tşkiliya malbatê bi gund re diqete.

Wî beriya bicîbûna li navenda Diyarbekirê dîwana xwe qedandibû, lê li gor malbata wî, ew li Diyarbekirê jî hin caran helbestan dihane û diyariyî dostên xwe dike. Ev helbestên ku me li dawiya dîwanê zêde kirin ji helbestên wan salan in.

⁷⁹ Amed Tigris, *Licê*, weş. Apec, Stenbol, 2008, r. 145; Abdurrahman Adak, "Liceli Şairlere Genel Bir Bakış", *Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri 05-06 Eylül 2008*, Şarkiyat Araştırmaları Derneği, Mardin, 2012, r. 442

Têkiliya Fehmî Beg van salan li Diyarbekirê, bi sîmayên netewperwer ên Kurd re xurt in û ew bi kesatiyên wek Fehmiyê Bîlal, Terzî Şemsî, Esad Cemîlpaşazade (Cemiloglu), Reşîd Îskenderoğlu, Reçaî Îskendeoğlu, Selaheddîn Cîzrelîoglu, Wefîq Pîrîncîoglu û Seîd Elçî re hevaltiyê dike.

Fehmî Beg ta dawiya jiyana xwe di dukana xwe ya temîrkariya sîlehan de pîşeyê xwe didomîne.

1.2.8 Wefata wî

Fehmî Beg di 16yê Berfanbara 1969an de ango di 59 saliya xwe de li Diyarbekirê koçî cîhana cawîdanî dike. Gora wî li Diyarbekirê, li goristana Çiftehewzeyê ye.

BEŞA DUYEM

ZIMAN Û KESAYETIYA EDEBÎ YA NAMÎ

2.1 ZIMANÊ WÎ

Namî wek helbestvanekî edebiyata klasîk hakimî zimanên Kurdî (Kurmancî, Zazakî, Soranî), Erebî, Farisî û Tirkî bûye. Wî ev hemî ziman û zarava bi awayekî gelek serekftî digel hev heta hin caran di yek rêzê de bi kar anîne. Wekî mînak wî, di risteya yekem a vê beyta jêr de peyvên bi Kurdî, Farisî, Erebî û Tirkî digel hev bi kar anîne:

Wadiyi mihnetde pûyanim tek û tenha gerîb

Dûr ez ruxsarê yar im mam di gurbet bê hebîb (3/2)

Dema mirov bi awayekî giştî li dîwanê dinêre, ji ber mijarên metafîzîkî û derûnî û hunerên wek teşbîh, îstiare û temsîlê zimanê wê zimanekî giran û girîft e, lê digel vê bi hêz e û peyam û armanca wî tê fehmkirin. Herwiha Namî di wê baweriyê de bûye ku ziman çiqas sade û rojane be, asta edebiyatê kêr û nizm dibe. Wekî me behs kir, dema lawê wî û hevalên wî lê îtiraz dikin û dibêjin zimanê te pir giran e em jê fehm nakin. Ew di bersiva xwe de dibêje: “Ez nikarim sewiyeya edebiyatê daxim.” Lêbelê ew paşê li hember van rexneyan ber bi qedandina dîwanê ve hinekî zimanê xwe sade dike. Lê wî ev helbestana piştî qedandina “qafiyeya helbestan” li dîwanê zêde kirine. Herwiha hin helbestên wî yê piştî qedandina dîwanê nivîsîne hene ku gelek sade û fehmbar in. Lê wî ev helbestana tevli dîwanê nekirine. Ji bo têgihiştinê jî emê çend beytan ji wana veguhêzin vir:

Ey serê xwaza bi derdan tava hîva bextê reş

Wer li ser çavê birîndarê dîyîna xwe bimeş

Te j’ me dil birye ji zûda dîn û jîn qerya dila

Lew wekî goyîn dinalin gav û dem bê tab û heş

Ger dikê pirsê ji van miryên di gorê de dijîn

Dê çikim ji dewleta te merhema cergê nexweş (65/1-2-3)

Ji vê jî tê fehmkirinê ku Namî ew terza giran û girîft a di dîwanê de bi zanetî tercîh kiriye. Digel ku wî bi zimanekî sade jî kariye helbesteke xurt bihone, dîsa jî zimanekî girift û giran tercîh kiriye.

Gelek peyvên bi Farisî û Erebî ên ku di dîwanê de hatine bikaranîn ji aliyê mirovên ji rêzê ve nayên fehmkirin. Ew cûre peyv, nexasim di helbestên serî de zêde ne.⁸⁰ Lê ber bi dawiyê ve ziman hêsantir dibe.

Şair, li gelek cîyan di heman rêzê de du zimanan bi kar tîne, ku ev wek hunera telmî'ê jî tê zanîn. Ev awayê zimanê muxtelîf an jî telmî'ê hin caran ji ber nezîrebûna wê helbestê wer tê, lê wî bi giştî wî ev wek terzekê bi kar aniye. Wekî mînaka li jêr nivê malikê bi Kurdî ye nivî jî bi Farisî ye:

‘Usr û yusrên pev muradif ba nişate îm umîd

Her çi reng mewcûdi bit der wesl û şadê î'tiyaq (36/18)

Zimanê helbestên Namî yên ku nezîre ne, ji yên serbixwe girantir in. Zimanê helbestên serbixwe sadetir û Kurdîtir e. Herwiha Namî, bandora zimanê şairê ku nezîre lê kiriye, bi form û peyvên wî zimanî bi aşkera di wê helbestê de -lê bi piranî di qafiyê û redîfê de- dide nîşan. Meselen formên Tirkî tenê di helbesteke wî de dixuyê, ew jî nezîreya li helbesteke bi Tirkî ya Fuzûlî ye. Peyv û formên Farisî herî zêde di nezîreyên li helbestên Hafiz û Se‘dî de dixuyên. Herwiha bo mînakê, di nezîreyeke li helbesteke Ferezdeq de di qafiyeyê de bi temamî peyvên Erebî ên kêmnas bi kar tîne ku bêyî ferhengeke Erebî ne mimkun e bê fehmkirin:

Dîsa bi kel tê qulzema derd û humûmê ba **emûc**

Ehşar' û 'ezmê pur cefa ez pihîşan in der **lu'ûc** (12/1)

⁸⁰ Lê divê bê gotin ku li hin cihan ji ber zêdehiya peyvên biyanî û kêmnas fesaheta helbestê kêmbûye û ev kadroya peyvên kêmnas muxateb diwestînin û fehmbariya helbestê kêmbûye.

Zimanê Namî bi hêz e û ew xweş hakimî Kurdiyê ye. Ji ber repertûara wî ya berfireh a peyvên û hakimiyeta wî ya zimanî ew hevok û ravekên cuda çêdike. Wekî mînaka li jêr, ew hin caran ravekên gelek dirêj bi kar tîne ku ev jî ji huner û aşînbûna zimanî wer tê:

Tu cewlangahê eşwaqê supehrê şebçirağan î

Esîrê turreê wan newnihalan î dilê bêkes (24/13)

2.1.1 Unsûrên Kurdî ên Resen

Li vir ji resenbûnê meqsed ew e ku peyv bi eslê xwe bi Kurdî ye, lê îro di nav gel de kêma an jî hatiye jibîrkirin. Di dîwana Namî de tiştên balkêş ew e ku pir peyvên arkaîk ên Kurdî hatine bikaranîn. Lewra Namî di demeke gelek nêzîk de jiyaye û di dewra me de ew peyvên arkaîk nayên bikaranîn. Di berhemekê de bikaranîna peyvên arkaîk û resen diyardeyeke girîng e ji bo waqîfiya nivîskar yan jî helbestvan ya li ser wî zimanî.⁸¹ Namî jî di dîwana xwe de têra xwe ji peyvên kevn û resen ên Kurdî îstifade kiriye:

Newaê dê netê goş im divê ez belkî bê hoş im

Bi **benca** hicrê serxweş im çî san goşê **bivandin** em (41/11)

Lê biken **geşt û guzarê** gavekî ba zewq û keyf

Dîdeyan rewşen **bidêrin** em bi wan xeddê neqîb (8/2)

Sohtin ji ma taqet **birand** cerhên di nû dîsan **vejand**

Meşbûb û ferma hem revand hiştim ji weşlê teşneleb (7/13)

Agahê vî halî **nîye** her çî kê firqet nadiye

Şekwayê halet ba kî ye, ber kê didî destê teheb (7/16)

⁸¹ Önder Beyter, Dîwana Mela Ehmedê Heyderî (metn û lêkolîn), Teza Lîsansa Bilind ya çapnebûyî, 2013, r. 37

Eşla **nehin** însafê wê, naê beyan ewşafê wê
Xûn **rihtine** eltaşê wê, ev Rustemê edwarê çerx (14/10)

Gencûrê van daê **nehîn**, Namî **ji mêj** şed aferîn
Ger tu nebî bê **dilneşîn** kes dê ji van ew ket xurûc (12/11)

2.1.2 Unsûrên Zazakî

Xaleke din a balkêş a dîwana Namî jî ew e ku di dîwanê de peyvên Zazakî jî hene. Lewra di dîwanên Kurdî ên din de mirov rastî vê yekê nayê. Wekî ku me li jor got, Fehmî Beg bi eslê xwe ji Kurdên Zaza ye, lê di mala xwe de bi Kurmancî jî xeber didan. Helbestvanê me di dîwana xwe de xwestiye bi peyvan (kêm be jî) cî bide Zazakî jî. Bo nimûne, emê çend malikên ku peyvên Zazakî ên wek “vengdest” (destvala), “fixanroş” (fixanfiroş), çixandin (pekandin) di wan de diborin bidin:

Siyahpoş î bi çeşmê dil zehernoş î bi cerhê kul
Figanroş **îm** wekî bulbul gulan ez dil hejandin em (41/12)

Bi geflet ‘eqreban gestim bi dagên firqetê mest im
Hinan zanî kê **vengdest** im ewan lewra **çixandin** em (41/17)

2.1.3 Unsûrên Xeyrî Kurdî

2.1.3.1 Unsûrên Farisî

Wekî ji pirbûna peyv û ravekên Farisî ên di dîwanê de dixuyê, Namî gelek ji zimanê Farisî hez kiriye. Jixwe wê di beşa xwe de bê gotin, Namî piraniya berhemên klasîk ên bi Farisî xwendine, ji wan bondor girtiye û hinek helbestên Hafizê Şîrazî û Se‘diyê Şîrazî nezîre kirine. Heta Namî digel peyv û ravekên Farisî têra xwe cînavên Farisî bi kar anîne, ku ev yek di kêm şairên klasîk de dixuyê. Wek mînak di malika jêr de du cînavên Farisî li cem hev hatine bikaranîn:

Cama firaqê şabê min der şeb revandî xwabê min
Jana dilê kebabê min taqet birand **ez** canê **ma** (4/4)

Heta li hinek ciyan ji ber bikaranîna cînavên Farisî fehmbariya metnê dijwar dibe. Wek mînak, di malika jêr de çar caran “û” hatiye bikaranîn; “û”ya sêyem (naz û xende) gihanek e, lê hersê “û”yên din di Farisî de cînava kesê seyem (yanî “ew/wê”) e:

An kes kê bî pabendê û ez le‘lê naz û xendê û
Noş kit nebatê qendê û dê pê vedî reşmarê çerx (14/11)

Herwiha şair hin caran lêkerên bi Farisî jî bi kar tîne ku ev jî xaleke ciyawaz e. Lewra di edebiyata Kurdî hetta di edebiyata Tirkî de dema ku berê helbest dihatin nivîsandin, bi giştî lêkerên xwemalî û kelîmeyên ismî ên Erebi û Farisî dihatin bikaranîn. Lê Namî li hin cihan fîlên Farisî tercîhî lêkerên Kurdî kirine; ger ji ber mecbûriyeta erûzê ger ji ber daxwaza keyfî, em dibînin ku şair ev formên Farisî tercîhî Kurdî kirine. Wek mînak, şair li gelek cihan peyva Farisî a “Kerden” û tercîhî peyva Kurdî a “Kirin”ê kiriye:

Sernigûn **kerden** gelek textê milûkan hane çerx
Çi dibit ger ma reha kê ez gemê hicranê çerx (54/9)

Herwiha li vir jî li şûna “dibînim”a Kurdî, “mîdîdem”a Farisî tercîh kiriye:

Her çî ku **mîdîdem** bê bîdarîst û ya Reb yan bi xwab
Ey Yûsufê te’wîli dan xwabê me ra te’bîri nîst (10/5)

Dîsa em dibînin ku Namî, di peyvên Kurdî-Farisî ên hevpar de gelek caran forma Farisî tercîh dike. Bo rohnnîbûna mijarê çend mînak; li şûna formên Kurdî ên wek “hesp”, “jimar” û “ewr”; formên Farisî ên “esp”, “şumar” û “ebr” bi kar tîne:

Derbaz kin çend rozeha, ez qeydê muhnet bin reha
Ahim bi afaqan giha, **espê** felek berdaye xar (21/20)

Şumara ahê dil nîne elemdar im ji hicranê
Ji mehcûrî me dil ker bû dîkin lew ah û efğanê (61/1)

Sa‘iqên **ebrê** firaqê tîn peyapey bê mecal
Gestiyyê marê şevînî zehr ber canet resîd (17/5)

Çawa Namî hin caran formên Farisî tercîhî formên Kurdî dike, hin caran jî hem forma peyvê ya Kurdî hem ya Farisî li pey hev bi kar tîne, mînak;

Bo tennê jar û rezdirû ez destê dilber camê nû
Bîn an peyapey zû bi zû der **xilwetê şebhayê** tar

Der **xelweta şevtarîyan** peyganê ber dil meygiyan
Derman bikî yar hemiyan, ron bin me çavê eşkibar

Nûr jî bi qe‘rê dil bigê derdê ku tê da jê derê
Ava heyat û kewşerê em jî vexwun carek du car

Em jî vexwun **abê heyat** ez çêşmeya feyzê necat
‘Umrek nedamet pê nehat derbazi kin bê ah û zar (21/16-17-18-19)

Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku Namî ji zimanên biyanî herî zêde ji Farisî bandor girtiye û îstifade kiriye. Di dîwanê de gelek malik hene ku mişt ji peyv û ravekên Farisî pêk tînin. Wekî mînak emê hin nimûneyan veguhêzin vir:

-Çend nimûne ji ravekên Farisî:

Xalê numaî (2/9)

Seylabê eşkê xûnmişal (4/3)

În soxen (4/8)

Çeşmê siyah (4/9)

An an perîmehweş (26/2)

Tabê husneş (54/2)

Hemsengê erkanê edeb (7/5)

Sengê maydanê şebat (7/6)

-Çend nimûne ji misreyên Farisî:

-Subhan tu ra ey şani‘ê şena‘atê bedî⁸² (2/16)

-Gonçê bext û umîdem le‘lê xendanê tu da⁸³ (3/1)

-Der şebê yelda û tarîk raħet û aram kocast⁸⁴ (8/11)

-Şod mukeħħel ez ğubarê an derîbarê hedîş⁸⁵ (11/11)

-Der rehê yar û wişalê canê xwod kerdem nişar⁸⁶ (20/4)

-Daimen yeksan numaned ħalê dewran xem mexwo⁸⁷ (53/2)

-Namiya der gencê hezn û xelwetê şebhayê tar⁸⁸ (53/15)

-Der dilet men keşfi kerdem meylê cuz men baleê⁸⁹ (57/6)

-Xiyalê rûyê zîba meykerdi dîde pur xûn⁹⁰ (48/8)

-Malikên Farisî:

Meqtûlê seyfê ebrûyet dil bendê damê keysûyet

Leb teşnê camê meynûyet ez kes murad û meqşedek⁹¹ (37/16)

⁸² Subhan ji te re ey çêkerê hunerên bedew

⁸³ Xonçeya bext û hêviya min di wan hinarkên te yên kenok de ne

⁸⁴ Di şeva yelda û tarî de raħet û aramî li ku ye (tune)

⁸⁵ Kildayî bû ji toz û xubarê ew derîbarê cîhanê

⁸⁶ Di rêya yarê û pevgihaştinê de min canê xwe kir qurban

⁸⁷ Her tim wek xwe namîne rewşa dewranê xem mexwe

⁸⁸ Namiyo di kuncê huznê û tenahiya şevên tarî de

⁸⁹ Min di dilê te meyleke ji xeynî meyla xwe delalê keşf kir

⁹⁰ Xeyala rûyê delal çavan tije xûn dike

⁹¹ Kuştîyê şûrê birûyên te dil giriftarê dafika zulfên te

Bes ke Namî z' în soxenhayê bisûzê ateşîn
Z' an bi cergên ehlê dil bêtin elîm yek îhtiraq⁹² (36/22)

Ah çî goyem hesretê leb-teşneê abê Ferat
În dilê bêtabî ra zehrê fena yî ya Huseyn⁹³ (43/16)

An kîstî ke z' rûyê kerem ba min heqîrê dil bi gem
Xêrxwahi kerde fekkê fem ber halê gemxwarî koned⁹⁴ (16/8)

Her çî ku mîdîdem bê bîdarîst û ya Reb yan bi xwab
Ey Yûsufê te'wîldan xwabê me ra te'bîrî nîst⁹⁵ (10/5)

Mişqelê elbabê tarest û evînê şan yeqîn
Mikyelê rehîmê fezayest qenc binasîn ya feta⁹⁶ (6/4)

Seylê gem amed be nagah mulkê dil texrîbî kerd
Çûn me weşl û şadimanî suflê hergamet resîd⁹⁷ (17/8)

Bê dost zendeganî zewqê çunan nedared
Der în cihanê fanî dil lew me derdinak e⁹⁸ (48/2)

Lêv têhniyê cama zimrûda te ye nîne ji kesî murad û meqsedek

⁹² Bes e bêje Namî van gotinên sofîner ên agirîn

Ji wan bi cergên ehlê dil têtin eş û şewat

⁹³ Ah çawa bêjim hesreta lêvtêhniya ava Feratê

Ji vî dilê bê tab û qudûm re zehra tuneker î ya Huseyn

⁹⁴ Ew kê ye ku ji rûyê keremê li min belengazê dilbixem

Xêrxwazî kiriye û devê xwe vekiriye bo halê me xemxwariyê dike

⁹⁵ Her tişta ku dibînim bi halê hişyariyê ye yan bi halê xewnê

Ew Yûsûfê xewnşîroveker ji xewna me re şîrove nîne

⁹⁶ Cîlaya hişên tarî ye ew, evîna wî yeqîn

Pîvana rehîma fezayê ye qenc binasîn ey ciwan

⁹⁷ Sêlava xemê hat ji nagah û mulkê dil wêran kir

Ji ber wê ye hêza me ya pevgihîn û şadimaniyê nema

⁹⁸ Bêyî dost zewqeke jiyanê a wisan tune

Di vê cîhana fanî de dilê me ji bo vê derdnak e

Ba hîç kes nîşanî z' an dilsitan nedîdem
Cuz yarê dilşikarim an kîst dil dewa ke⁹⁹ (48/3)

2.1.3.2 Unsûrên Erebî

Di edebiyatên klasîk ên gelên Îslamî de Erebî hem ji aliyê peyvvan û hem ji aliyê teşeyên helbestê ve zimanê herî serdest e. Di edebiyata Kurdî de ji Melayê Cizîrî bigire ta helbestvanên îro ên ku li ser rêbaza klasîk dimeşin, di helbestên tevan de Erebî giraniya xwe dide nîşan.

Di dîwana Namî de helbestek bi serê xwe bi Erebî hatiye nivîsîn (helb. 32) ku ev tenha helbest e di dîwanê de bi zimanekî biyanî. Herwiha di dîwanê de zimanê Erebî bi bêje, têgeh, îstilah û îqtibasên ji ayet û hedîsan ciyekî giring digire. Ji wan hinekan emê veguhêzin vir:

Rohniya dil da cewaba *irci 'î cael-qeða*¹⁰⁰
Terki da faniyyê erzel şud *îla darul-beqa*¹⁰¹ (5/3)

*Qultu ya 'eyne 'l-fuadî minke îhsanul-murad*¹⁰²
Ber me 'ebdalê xwe ke ey şebçiraxa xaneê (57/4)

*Leyse fihî hubbe xeyrin bel huwe qeşdu 'l-fuad*¹⁰³
Min ji û aramê dil tê bûme ew Nîlê murad (20/5)

*Ĥesbunallahu*¹⁰⁴ *we kefa*¹⁰⁵ bêj ayetên şebrê bixwûn

⁹⁹ Min digel tu kesî nîşanek ji wê dilstanê (dilber) nedît
Ji bilî yara dilnêçîr ew kê ye dê dil dewa bike

¹⁰⁰ Vegere ji xetaya îşyanê

¹⁰¹ Bi bal warê mayinde

¹⁰² Min go ey eynika dilê min, ji te ye ew başiya ku meriv digihîne miradan

¹⁰³ Di hezkirina wî de başî nîne, belkî ew meqseda dilan e

¹⁰⁴ “Xwedê her besî min e.” Ev ayeta sebrê ye ku îşarefî sûreya Tewbe ayeta 129an dike. Ayet tev wiha ye: “Tevî vî awayî ger berê xwe biguherînin, tu ji wan re bibêje: “Ellaħ besî min e, ji wî pêve tu îlahên din nînin. Min xwe spartîye wî, xwediyê 'erşê ezîm ew e.” (Abdullah Baykan, *Sîwana Qur'anê*, Nûbihar, Stenbol, 2017, r. 208)

Şebrê bê payan ji wan tê pê bizan û gem mexwo (53/13)

Goşi kon ez Namî ey can der sulûkê în siyaq

*Hehuna heqqu bî heqqin qed heqeql-heqqe fil-heqqîs-sena*¹⁰⁶ (6/6)

Bêj tu ya Cewwadê Qadir agehê halê me î

*Qul minel-qelbî tewekkeltu ‘ele Rebbil-‘ibad*¹⁰⁷ (18/10)

Ma nesîni fil-hisabi nûre ‘eynî el-eman

*Ya Resûlallah dexîlek ya Ebeṭ-Ṭahir dexîl*¹⁰⁸ (39/6)

Ji qewsê her du ebrûyan peyapey berqê lami‘ tèn

*‘Elen-necfil-fuadî kullu ewqatî biha el-mexşûs*¹⁰⁹ (27/2)

Çi dibet bikî carek nîgeh ey nazika rû muhr û meh

*Ya rewzete ‘l-amalî meh ezlim bike ya ze ‘s-simat*¹¹⁰ (9/6)

Teḥrîqî dan xanê wucûd vîra dikîtin tê wuqûd

*Xellişnî minhu ya Wedûd*¹¹¹ *bêje tu Namîyê bêqerar* (21/23)

Agir û pihta nihanî cerg û dil kirye şedîd

*Kullema ezdet kurûben qale lî ‘indî mezîd*¹¹² (20/2)

¹⁰⁵ “Ew bes e”. Ev der jî ayeta sebrê ye ku îşaretî sûreya Ehزاب ayeta 3an dike. Ayet tev wiha ye: Tewekkula xwe bi Ellah bike. Wekîltiya wî besî te ye.” (Baykan, *Sîwana Qur’anê*, r. 419)

¹⁰⁶ Divê li vir li hember başiyê bi başiyê bê muqabelekirin, me bi başiyê muqabele kiriye der barê spasîyê de.

¹⁰⁷ Bêje ji dil tewekuliya xwe didim ser Rebê evdan

¹⁰⁸ Min di roja hesabê de ji bîr neke rohnîya çavê min

Ez xwe davêjim degahê te ya Resûlallah ya Bavê Tahir

¹⁰⁹ Di kûrahiya dilê min de di her zemanê taybet de

¹¹⁰ Ya baxçeyê daxwazên min êdê bes e ew çi tişt e te wînda kiriye ey xwedî nîşan

¹¹¹ Ya Wedûd (hezkirox) min jê xelas bike

¹¹² Kul û derdên min çiqas zêde be, dibêje li cem min pirtir heye

*Muttu fî behril-firaqî leyte lî bedren feteq*¹¹³

Şefqe ber hali neda û zêde kir qehr û geder (20/3)

Çendekî hemdem bûyin der cumle anê dilxweşî

*Haza firaqu beynena tabi qudûman elweda*¹¹⁴ (31/2)

Min penah geyrê te nîne ey Mudeşşir ey Xelîl

*Ya Hebîbellah dexîlek ya Ebel-Qasim dexîl*¹¹⁵ (39/1)

2.1.3.3 Unsûrên Tirkî

Di dîwana Namî de ji zimanê Tirkî gelek kê m hatiye îstifadekirin. Digel ku Fehmî Beg zimanê Tirkî baş zanibûye û beşek ji dîwanên Tirkî jî xwendine, lê di dîwana wî de şopa Tirkî gelek kê m e. Şopa Tirkî tenê di helbesteke wî de dixuyê (helb. 3) ku ew jî muxemmesa li ser helbesta Fuzûlî a bi navê “Aşiyane Murxê dil zulfê perîşandindadir”¹¹⁶ e. Mînakên mê jî dê ji vê texmîsê bin. Li jêrê di risteya yekem û sêyem de daçek û qertafên Tirkî hene, herwiha herçendî peyv bi eslê xwe Tirkî nebin jî rêzê yekem bi sentaksa Tirkî hatiye nivîsin:

Wadiyi mihnetde pûyanim tek û تنها gerîb

Dûri ez ruxsarê yar im mam di gurbet bê hebîb

Raziyim zîra ‘uşaqan gem digel derde nesîb (3/2)

¹¹³ Ez di deryaya firaqê de mirim, tune ye ji bo min hîveke nû ku derkeve û rohnî bike

¹¹⁴ Ji firaqê hêza qudûmê nema da (ez berpê biçim) elweda

¹¹⁵ Ez xwe diavêjim ber dergahê te ya Hebîbellah ya Bavê Qasim

¹¹⁶ *Fuzûlî Divanı Şerhi*, Hazırlayan: Ali Nihat Tarlan, Akçağ Yayınları, Gazel: 90, r. 244

2.2 KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ

Namî ji bo derbirîna fikrên xwe, cûreyê edebî yê gerdîşî û rûniştî hîlbijartiyê. Wî helbestên xwe bi uslûba şairên gewre û navdar ên klasîk ên gelên Îslamî honandine û helbestên xwe ji aliyê naverok, mane, wezn, qafîye û dîmenê ve mînandiye helbestên gewreyên wek Melayê Cizîrî, Hafîzê Şîrazî, Se‘diyê Şîrazî, Fuzûlî, Ferezdeq hwd. Mirov bi rehetî dikare bibêje ku di vî karî de bi ser ketiye jî.

Namî pir bi dîqet û meharet şairên wek Melayê Cizîrî û Hafîz û Se‘dî şopandine û nezîre li helbestên wan kirine. Di van nezîre û musemmetan de ast û hunera wî ya edebî xweş xwe dide der û delîlên serkeftîbûna wî baştir dixuyên.

Namî bi giştî ji aliyê teşeyê ve şopînerê edebiyata klasîk e. Ew di rêça şairên klasîk de çûye û di şîirê de li pey nûjeniyê neketiye. Di dîwanê de ji aliyê naverokê ve jî mijarên nûjen neceribandîye. Lê wî di naveroka helbestên xwe yê derveyî dîwanê de hin mijarên nûjen ceribandine ku dîsa ew jî di teşeya klasîk de ne. Li vir ji “mijarên nûjen ceribandîye” meqsed netewperwerî ye ku ev mijareke nû ye û ji ber vê di helbesta klasîk de naxuyê. Ji derveyî dîwanê 6 heb helbestên Namî li ber destê me ne ku ji wan di du helbestan de bi sergirtî û di helbestekê de bi aşkerayî¹¹⁷ mijara netewetiyê behs dike. Bi kurtî mirov dikare bibêje ku Namî dîwana xwe bi giştî -hem ji aliyê naverokê ve hem ji aliyê teşeyê ve- li ser rêça helbesta klasîk honandiye; mijarên nûjen û fikrên xwe yê civakî (wek netewperweriyê) tevli dîwanê nekiriye.

Di dîwana Namî de mijar û pirsgirêkên civakî pir kêr in, yê heyî jî nerasterast hatine gotin. Meselen Namî di helbesta rêza 4. de mijara derd, kul û şikayetên xwe yê civakî û koçkirina gundiyên wan ên Ermenî û valabûna gund vedibêje, lê dema meriv paşxaneyê ristina helbestê nizanibe meriv pê dernaxe ka mijara helbestê ew e. Wek mînak ji wê du malik:

¹¹⁷ Wek nimûne, ji wê helbestê çend malik:
Bê muradê serbixwoyî mane çil milyon çeleng
Tev bi yek derdî dinalin sed hezar kom û civat

Giş bi yek êşî nesax in keç û xortê Kurdistan
Ser li rê dane wek min, terki dan xeml û xebat

Ger di cerda serbixwoyî bême kuştin rojekî
Nîne kuştin ew ji bo me belkî tîmar û xelat (63/8-9-10)

Dîsa li dû hev dane gar derd û kulê şûzanê ma
Yegma kirin şebr û qerar ez rûhê purêşanê ma (4/1)

Rûmet nema der ruwê ‘am dûr e ji ma şehraê Şam
Naê ji dest neql û qiyam yek yek revîn cîranê ma (4/14)

Namî xwedî ferhengeke berfireh û repertûareke dewlemend a edebî ye. Li hêla din, di dîwanê de peyvên biyanî têra xwe hene û xuya ye Namî seba afirandina helbesteke bihêz xwe ji wan nedaye aliyekî û rêya edebiyateke bi sewiye daye pêşiya xwe. Armanca wî ji fêhmkirin û xwendina herkesî bêhtir, helbesteke bihêz û asteke bilind a edebî bûye. Ji ber wê ye, tevî ku Namî helbestvanekî sedsala 20. e, helbesta wî li gor xwendin û Kurdiya îro giran e. Namî hema hema di her beyta xwe de peyvên Kurdî, Farisî û Erebî têkil hev dike; ne tenê bi navan bi fiil û cînavkan jî vê yekê dike. Wek mînak:

Nabit muyesser **în** soxen êşa sebeb lehd û kefen
Za’il bibê cewr û mehen nîne der **în** eyqanê **ma** (4/8)

Helbestên Namî, ji aliyê mijar, kêş, qafiye, hêma û şêweya vegotinê ve herî zêde dişibe helbestên Melayê Cizîrî. Wî herî zêde nezîre li helbestên Melayê Cizîrî kirine. Wekî din mirov bandora Mela bi awayekî berbiçav di gelek helbestên wî de dibîne û ferq dike.

Dema ku meriv dêhna xwe dide dîwana Namî, temayên ku herî zêde dertên pêşiya mirov ev in: evîn, cewr û stema maşûqê, dûrî û hicran, gazinda ji felekê, evîna Pêxember û ehlê beytê hwd.

2.2.1 Helbestvanên ku Bandor li Namî kirine

Namî di helbestê de ji gelek şairan bandor girtiye û ew vê bandorgiriya xwe bi rêya nezîreyan nîşanî xwendevanan jî dide. Di tradîsyona helbesta klasîk de şairê ku helbesteke beriya wî hatî nivîsîn pir biçibanda helbesteke şibhê wê dinivîsî û ji vê re

jî di lîteratûrê de nezîre dihat gotin. Lêbelê nezîre, bi şertê parastina heman wezn (kêş) û qafiyeya helbesta model tê nivîsîn.¹¹⁸

Şairên Rojhilata Navîn, hînbûna ziman, kultur û edebiyata gelên Îslamî ji xwe re wek pêwîstiyêke ilmê û şairiyê dîtine. Jixwe wan di dema medresexwendinê de bi giştî ziman û kultura wan gelan nas dikir û berhemên bi wan zimanan hatine nivîsandin dixwendin. Ji ber ku di dema Osmanîyan de mektebeke şairperwerdekirinê tunebû, şairên nû bi rêya nezîreyê wek hosta-çirax digihîjyan.¹¹⁹ Ji ver vê ye hema hema di her dîwana ku li nav gelên Îslamî hatiye nivîsîn de şop û esera helbestên gelên din ên li herêmê hene. Di nezîreyê de hem hostatiya şairê tenzîrkirî dertê holê, hem jî diyar dibe bê ka şairê ku nezîre nivîsiye ji kê çiqasî bandor girtiye.¹²⁰ Sebebê nezîrekirinê pir in, her wekî; daxwaza honandina helbesteke ji ya tenzîrkirî tekûztir û kamiltir, xwepêşxistin, xweşibandina şairê hoste, derbasbûna ji şairê hoste... Ji ber nezîre û bandordariyê bivê nevē naverok û estetîka helbesta van gelan bi giştî dişibe hevdu.

Namî, wekî ji nezîre û referansên di dîwanê de dixuyê, ji edebiyatên Kurdî, Farisî, Tirkî û Erebi baş haydar bûye. Ji bandorgirî û nezîreyên wî diyar e ku wî gewreyên edebiyata klasîk a van her çar gelan xwendine. Lewra di dîwanê de em bandora gewreyên van edebiyatan bi aşkera dibînin; wek mînak, ji edebiyata Erebi Ferezdeq, ji edebiyata Farisî Hafizê Şîrazî û Se‘dîyê Şîrazî, ji edebiyata Tirkî Fuzûlî û ji edebiyata Kurdî Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî...

Emê li jêr li ser helbestvanên ku li ser Namî bandor kirine rawestin:

2.2.1.1 Melayê Cizîrî

Dema meriv li dîwana Namî dinêre, meriv bi awayekî vekirî dibîne ku wî herî zêde ji Melayê Cizîrî tesîr girtiye. Li hin cihan, ji aliyê metafor, raman û şeklî ve bi temamî xwestiyê şîira wî wek ya Mela be. Heta wisa ku di dîwanê de helbestên wî destêpêkê yên rêza yekem û duyem li helbestên Melayê Cizîrî nezîre ne.

¹¹⁸ Ali Bulut, *Belagat Terimleri Sözlüğü*, Marmara Üniversitesi İFAV yayınları, 2015, İstanbul, r. 354

¹¹⁹ Cemal Kurnaz, "Osmanlı Şair Okulu", *Journal of Turkish Studies TUBA*, 2003, 27/II, r. 403

¹²⁰ Mustafa İsen, *Divan Şiirinde Nazire Geleneği*, Ötelerden Bir Ses, Akçağ yay., Ankara, 1997, r. 327

Helbesta Namî a rêza yekem, li helbesta Melayê Cizîrî a “Ellah sehergaha ezel” ku bi redîfa “da”yê hatiye nivîsîn, nezîre ye. Wezna herdu helbestan jî “Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun” e.

Melayê Cizîrî:

Ellah sehergaha ezel yelmûmê ‘îşqê şu‘**le da**
Nûra cemala lem yezel zatê tecellaya xwe **da**

Zatê tecella bû li zat bê ism û asar û sifat
Sirra hurûfên ‘aliyat xef bû di sitr û perde **da**¹²¹

Namî:

Ellah çi zatek qadir e mahir di tehbîra xwe **da**
Lewn û liyaqet sair e cîkir di cîmên cilwe **da**

Lamên çu le‘lê durfeşan aşûbê edwar û zeman
Aram û îfnaê dilan xef da di ‘eynê perde **da** (1/1-2)

Herwiha helbesta Namî a rêza duyem li helbesta Melayê Cizîrî ya bi navê “Ismê te ye mektûb di dîwanê qidem da” nezîre ye. Namî di vê nezîreyê de heya dawiya helbestê, pêşiyê malikeke Mela dûre malikeke xwe daye û bi vî şeklî du helbest têkilhev kirine. Di encamê de ji 10 malikên Mela û 10 malikên Namî helbesteke 20 malikî derketiye holê.

Beytên ewil:

Ismê te ye mektûb di dîwanê qidem da
Herfek qelemê `ilm e bi teqwîmê reqem da (2/1)

Herf û nuqet û zêr û zuber cumle te gotin

¹²¹ *Dîwana Melayê Cizîrî*, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, çap. 2, weş. Spîrêz, Duhok, 2005, r. 51

Şeklek me jî zanîbû di wê rozê ezel da (2/2)

Beytên dawîn:

Minnet ji Xwedai ku bi 'ebdê xwe Melaî

Eksîrê gem û 'îşqê ne di dînar û direm da (2/19)

Namî ne ji bo 'erzê huner gohtine ev qal

Belkî ji nezanîyê xwe ev çendî xeber da (2/20)

Dîsa em dibînin ku helbesta Namî ya rêza 14. li helbesta Melayê Cizîrî ya bi redîfa “çerx” hatî nivîsîn nezîre ye. Herdu helbest jî bi kêşa “Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun” hatine honandin.

Herdu malikên pêşîn ên helbesta Melayê Cizîrî:

Ahê ji derdi dil dikit herçî nedî zarê çerx

Derbê li nêva dil didit lami'şifet nûbarê çerx

Tên sîneyan peykan nihîn amanca wan tîran em în

Dema belayê der kemîn her guşe dor madarê çerx¹²²

Herdu malikên pêşîn ên helbesta Namî:

Bê 'eql û pur megrûr e ew herçî ji dil bê yarê çerx

Der 'eqdê xwe megdûr e ew xefbestê zennarê çerx

Ba şed esef bê nefî' bûn sankî li dunyâ nebûn

Yek yek li dû hev mehwi bûn ba dilkulê simsarê çerx (14/1-2)

¹²² Melayê Cizîrî, h. b., r. 83

Herwiha helbesta Namî ya bi redîfa “çi ye hez” jî li helbesta Melayê Cizîrî a “çi hez” nezîre ye. Her du jî bi kêşa “Fe‘ilatun fe‘ilatun fe‘ilatun fe‘ilun” hatine nivîsîn. Lê em dibînin ku helbesta xwe ji ya Melayê Cizîrî dirêjtir kiriye; helbesta Melayê Cizîrî tenê 8 malik in, ya Namî 26 malik in. Ev şîira Mela ku bêhtir bi awayê pîrsê ye, bi çend pîrsan xilas dibe, lê Namî ev pîrs dirêjtir kirine.

Herdu malikên pêşîn ên helbesta Melayê Cizîrî:

Bê lebê lê‘lê Mela min ji meya ali çi hez

Suħbeta tê nebitin yari bi herhali çi hez

Qedehek bade bi destê xwe li qelbê me birêj

‘Aşiqê sûxite bê atêşê seyyali çi hez¹²³

Herdu malikên pêşîn ên helbesta Namî:

Di vê halê esefara dil û canî çi ye hez

Ji heyatê bi nişara hiş û danî çi ye hez

Ku nebî perdenêşînê heremê şadiyê ezel

Bi emanet di derê bagê cinanî çi ye hez (30/1-2)

2.2.1.2 Ehmedê Xanî

Bandora Ehmedê Xanî hema bêje li ser hemû şairên li dû wî hatine çêbûye. Li gor agahiyên me bi dest xistî, Namî helbestên Xanî gelek dixwend û jê hez dikir. Herdu şairan jî bi redîfa “im ez” helbestek honandine. Ev herdu helbestên navborî ji aliyê mijarê ve dişibihin hevdu û wezna herdu helbestan jî eynî ye, ango “fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun” e. Lê qafiyeya helbesta xanî “az” e û ya helbesta namî “an” e.

Her du malikên Xanî ên ewil:

¹²³ Melayê Cizîrî, h. b., r. 125

Seydê cengala serê zulfa şeha şebaz **im ez**
Mestê cama îşweya şehnazê nazik-naz **im ez**

Remz û î‘cazê di xûban bê îbaret medh dikem
Murşidê kamil ez im îrohe sahibraz **im ez**¹²⁴

Her du malikên Namî ên ewil:

‘Endelîbê bagê derd im ‘aşıqê nalan **im ez**
Ey kemanabr, şehîdê xencerê mijgan **im ez**

Yek nigahet ey perî papendi kerdim wê bi zulf
Min diye feyzê huner ez tu, tu ra qurban **im ez** (22/1-2)

Helbesteke Feqiyê Teyran jî ya bi qafiyeya “im ez” heye. Herçendî helbesta Feqiyê Teyran û helbesta Namî ji aliyê teşe û mijarê ve bişibin hev jî, ji ber ku aliyê weznê ve ne wek hev in mirov nikare bibêje helbesta Namî nezîreya wê ye. Wezna helbesta Feqî “Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun” e, lê ya helbesta Namî “Fa‘îlatun fa‘îlatun fa‘îlatun fa’îlun” e. Malikek ji helbesta Feqiyê Teyran:

Îro ji dest husna hebîb sergeşte û heyran im ez
Min eşq û muhbet bûn nesîb sewdayê sergerdan im ez¹²⁵

Herwiha helbesta Melayê Cizîrî jî bi redîfa “im ez” heye. Lê ew helbesta Mela û ya Namî jî ji aliyê weznê ve ne wek hev in. Wezna heman helbesta Mela “Mef’ûlu mefa’ûlu mefa’ûlu fe’ûlun” e. Malikek ji helbesta Melayê Cizîrî:

Cana ji cemala te muqeddes qebes im ez
Ger xob û perîzade nezer kî te bes im ez¹²⁶

¹²⁴ Tehsîn Îbrahîm Doskî (berhevkar), *Dîwana Ehmedê Xanî*, weş. Spirêz, b. d., Dihok, r. 32; Kadri Yıldırım (çeviri ve analiz), *Ehmedê Xanî Külliyyatı, Dîwan*, weş. Avesta, Stenbol, 2014, r. 153; Ebdullah M. Varlî, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmed ê Xanî yêd Mayîn*, weş. Sîpan, Stenbol, 2004, r. 128

¹²⁵ *Feqiyê Teyran Jîyan, Berhem û Helbestên wî*, amadekar: Xalid Sadînî, çapa 5., weş. Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 127

Wek encam helbesta Namî ji aliyê wezn, qafiyê û şekl ve bi tamamî dişibe helbesta Xanî. Belkî tesîra helbestên navborî ên Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî li ser wê helbesta Namî çêbûbe, lê li gor daneyên ruxsarî ên helbestan Namî nezîre li helbesta Xanî kiriye.

Herwiha helbesta Namî ya bi navê “Kanê gelo”, helbesta Xanî ya bi navê “Kanê Mihemmed Beg gelo?” tîne bîra mirov ku her du helbest ji hêla derekî ve gelekî dişibin hev, herwiha wezna herduyan jî “Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun” e.

Du malik ji helbesta Xanî:

Kanê Mihemmed Beg gelo kan padişahê serhedan?

Îro ji dil bigrîn de lo padişahê serhedan?

Kanê ezîzê Misriyan kanê eduwwê Waniyan?

kan hevrikê Mehmûdiyan kan padişahê serhedan?¹²⁷

Du malik ji helbesta Namî:

Kanê gelo mahê felek kan dêmdura sîretmelek

Jê ra dinalê dil gelek kan dilfirîba çavbelek (37/1)

Kanê hebîba çavbikil kanê dihanê şubhê gul

Kan gemrevîna bal û dil kan biskê qumralê xelek (37/2)

2.2.1.3 Siyahpoş

Belgeyeke sehîh ya ku welatê Siyahpoş û zarotiya wî bide nîşan tune. Lêbelê li gor vekolînerên wek Reşo Zîlan û Ebdureqîb Yûsif ku di encama vekolîna ji di nav gel de gihîştine wê qenaetê, Siyahpoş ji Farqînê ji gundê Narikê ye. Herwiha li

¹²⁶ Melayê Cizîrî, *Dîwan*, transkrîpsiyon: Arif Zêrevan, weş. Nefel, Stockholm, 2004, r. 99

¹²⁷ Doskî. h.b., r. 60

gor Kurdnasên Rojavayî Yevgenî Prûm û Albert Socin, Siyahpoş bi eslê xwe ji Amêdiyê ye. Li gor hesabê ebcedê ku Siyahpoş di destana xwe *Seyfulmulûk* de bi malikan daye xuyakirin, wî ev destan di 1200 Hicrî de nivîsiye ku ew jî beramberî derdora 1800ê zayînî tê. ¹²⁸ Her çî be jî xuya ye Siyahpoş di sedsala 19. de piraniya temenê xwe derbas kiriye û demekê li Farqînê jiyaye. Helbestên Siyahpoş li derveyê mesnewiya wî ya bi navê “Seyfulmulûk û Bedîl-Cemal” jî hene, lê bi temamî nehatine berhevkin.

Helbesteke Namî û helbesteke Siyahpoş gelekî dişibin hevdu. Li vê derê du ihtimal dertê pişya me; yan Namî helbestên Siyahpoş wek destxet xwendine û yan jî Namî ev helbesta wî ji zarê hin kesan bihîstiye û jê bandor girtiye. Lewra helbestvanê Farqînî Rojen Barnas ji bo heman helbesta Siyahpoş wiha dibêje: “Ev xezela Siyahpoş li tu derê nehatiye weşandin. Gelek şêx û melayên Farqînê ku ji edeba klasîk ya Kurdî hez dikin, vê xezelê ji ber dizanin û bi giştî li ser hemfikir in ku ev xezel ya Siyahpoş e.”¹²⁹ Ji ber ku Namî û Siyahpoş ji heman herêmê ne, ihtimala ku ji hin kesan bihîstiye qewî ye. Lêbelê dema meriv li heman helbesta Namî dinêre, nemaze ew di yek du malikên di serê helbestê de zêde di bandora helbesta Siyahpoş de maye.

Nimûne ji helbesta Siyahpoş:

Hey felek dîsa te kul kir derd û êşanê di min
Mislê bilbil meylê gul kir jan û efxanê di min¹³⁰

Nimûne ji helbesta Namî:

Hey felek dîsa te kul kir cerg û nalanê di min
Agirek tê de te hil kir herişîn kovanê min (45/1)

2.2.1.4 Hafizê Şîrazî

Hafizê Şîrazî ji şairên herî mezin ên edebiyata Îranê ye. Hafiz sîmayekî bandordar û rêçveker e. Hafiz hem helbesta Îranê hem helbesta Ereban baş xwendiyê û wî ev agahî û daneheva xwe digel felsefe û nêrîna xwe ya li helbestê xweş

¹²⁸ Siyahpûş, *Seyfulmulûk*, amadekar: Celîlê Celîl, Institut fur Kurdologie, Wîen, 2000, r. 9

¹²⁹ “Rûpelek ronîdayî ji dîroka wêjeya Kurdî: Siyahpûş”. www.welateme.net

¹³⁰ Keşkûla Şêx Ehmedê Feqîr (di nava destxeta dîwana wî de), pirtûkxaneya taybet ya Hayrullah Acar.

civandiye.¹³¹ Heta dema Hafiz, di edebiyata Îranê de cureyê xezelê wek cureyên destan, qesîde, rubaî û mesnewiyê zêde belav nebûbû, lêbelê piştî Hafiz di edebiyata Îranê de di hêla cûreyê xezelê de pêngaveke mezin û qahîm tê avêtin. Hafiz tesîreke mezin li dû xwe hişt; hemî welatên Îslamî ji xezelên wî bandor girtin. Gelek mezmûn û têgehên Farisî ên di helbestên edebiyata Osmanî û Îranî de ji wî hatine girtin.

Herwekî piraniya şairên klasîk, Namî jî ji vî şairê ezamet pir bandor girtiye û hin nezîre li helbestên wî kirine. Wek mînak, Namî nezîre li helbesta meşhûr a Hafizê Şîrazî a bi navê “Xem mexwor” kiriye û helbesta xwe bi redîfa “Xem mexwo” ristiye. Wezna herdu helbestan jî “Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa’ilun” e.

Malika ewil û ya dawîn ji helbesta Hafizê Şîrazî:

Yûsufê gomgeşte baz ayed be Ken‘an gem mexwo
Kulbeyê ehzan şevêd rûzî gulistan gem mexwo

Hafiz der gencê feqr û xelwetê şebhayê tar
Ta buwed wurdet dua û dersê Qur’an gem mexwor¹³²

Malika ewil û ya dawîn ji helbesta Namî a li heman helbesta Hafiz nezîre:

Namiya emrê muqedder layugeyer e gem mexwo
Xaş nehin ew yek tu ra, bo teva ye gem mexwo (53/1)

Namiya der gencê hezn û xelwetê şebhayê tar
Tu bike wurdê zebaneş dersê Qu‘ran gem mexwo (53/15)

Hewiha Namî helbesta xwe ya rêza 48. jî li helbesteke Hafiz nezîre kiriye. Wezna herdu helbestan jî “Mef‘ûlu fa‘ilatun mef‘ûlu fa‘ilâtun” e. Ji van nezîreyan em fehm dikin ku piştî Melayê Cizîrî kesê herî zêde li Namî bandor kiriye, Hafizê Şîrazî ye.

¹³¹ Tahsin Yazıcı, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 15, maddeya Hafiz-i Şîrazî, İstanbul, 1997, r. 104

¹³² Dîvanê Hafiz, Teshîh û amd.: Behram Eşterî (li ser nusxeya Xelxalî), weş. Ageh, Tehran, 1391/2013, r. 255

Malika ewil ji helbesta Hafizê Şîrazî:

Can bî cemalê canan meylê cihan nedared
Her kesê ke în nedared heqqa ke an nedared¹³³

Malika ewil ji helbesta Namî:

Can bê cemalê canan meyla cihan qe nake
Çibkim bi xan û manan yar lê deran venake (48/1)

Dîsa em divê helbesta nezîreyî ya Namî de dibînin ku wî, misrayeke Hafiz bêyî guherîn girtiye nav helbesta xwe. Malika Hafiz:

Ba hiç kes nişanî z' an dilsitan nedîdem
Ya men xeber nedarem ya û nişan nedared¹³⁴

Malika Namî:

Ba hiç kes nişanî z' an dilsitan nedîdem
Cuz yarê dilşikarim an kîst dil dewa ke (48/3)

2.2.1.5 Se‘diyê Şîrazî

Se‘diyê Şîrazî di nav gelên Îslamî de ji wan şairên herî muhteber ê klasîk e, ku heya îro jî bandora helbest û hunera wî dewam dike. Helbest û pexşanên wî li gelek zimanan hatine wergerandin û hatine teqlîdkirin. Bandora helbesta wî di sînorê edebiyata Farisî de nemaye, digel Rojhilat li cîhana Rojava jî şopên girîng hiştine.¹³⁵ Namî jî ku edebiyata Îranê ji nêz ve şopandiye û pir zêde di bin ziman û edebiyata Farisî de maye, helbesta xwe ya rêza 10. li helbesteke şairê gewre yê Îranî Se‘diyê Şîrazî nezîre kiriye. Namî li serê helbesta xwe ya navborî “nezîre ber xezelê Se‘dî” nivîsiye û di nav dîwana Se‘dî de jî herî zêde helbesta bi qafiyeya “nîst” dişibe vê helbesta Namî. Lêbelê xuya ye Namî di vê helbestê de ji sînorên nezîreyê boriye û

¹³³ Dîvanê Hafiz, h. b., r. 155

¹³⁴ Dîvanê Hafiz, h. b., r. 155

¹³⁵ Mustafa Çiçekler, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 35, maddeya Sa‘dî-i Şîrazî, İstanbul, 2008, r. 406

helbesta xwe xwemalîtir kiriye, lewra wezna helbesta wî ya Se‘dî hevdu nagirin. Herwiha li gor regezên nezîreyê, diviyabû redîfa helbesta wî bi temamî “nîst” bûya, lê wî di redîfê de “nîst” û “çîst” têkel bi kar anîne.

Malika ewil ji helbesta Se‘diyê Şîrazî:

Derd îst derdê eşq kê hîçeş tebîb **nîst**
Ger derdmendê eşq benaled gerîb **nîst**¹³⁶

Malika ewil ji helbesta Namî:

Goftem bi hicret dilkul im derdê me ra dermani **çîst**
Goft an bi hicran dilkulan nîk haziqani dewa’ **nîst** (10/1)

2.2.1.6 Fuzûlî

Şairekî din ê ku Namî jê bandor girtiye şairê gewre Fuzûlî ye. Namî helbesta “Aşîyan-i Murg-i dil” a Fuzûlî texmîs kiriye, lê wî helbesta Fuzûlî pêşiyê wergerandiye û wisa texmîs kiriye. Wergerandina berhemeke hostayekî, sewiye û daneheva kultur û hunera şair dide nîşan. Li jêr emê malika yekem a helbesta Fuzûlî û wergera wê ya aîdî Namî bidin.

Malika Fuzûlî:

Aşîyan-i murg-i dil zulf-i perîşanındadır
Kande olsan ey perî gönlüm senin yanındadır¹³⁷

Malika Namî:

Aşîyanê murgê dil zulfê perîşanê tu da
Ger li ku bî ey perî dil min di seyranê tu da (3/1)

¹³⁶ <https://ganjoor.net/saadi/divan/ghazals/sh114/>

¹³⁷ Tarlan, *Fuzûlî Divanı Şerhi*, r. 244

2.2.1.7 Ferezdeq

Şiarê mezin ê edebiyata Erebî Ferezdeq (641-728) li Besrayê hatiye dinê û navê wî yê tam Ebû Firas Hemmam bin Xalib bin Se‘se‘e ye. Ferezdeq, digel Cerîr û el-Extel, ji sê şairên herî navdar ên hîcwê ye di dewra Emewiyan de. Lê ji şairên xwe bêhtir bi zîrekî û hişmediya xwe hatiye nasîn. Hemî dijberên wî ji zimantûjî û hîcwa wî para xwe girtine. Ferezdeq di cûreyên hîcw û fexriyeyê de pir serkeftî bûye û piraniya helbestên wî ji van cûreyan pêk tên. Di fexriyeyan de bêhtir pesnê xwe û eşîra xwe daye.¹³⁸ Lê ew di xezelan de jî pir serkeftî ye û di xezelên wî de temaya jinê girîng digire.¹³⁹

Namî di serê helbesteke xwe ya ku bi qafiyeya “cîm”ê hatiye nivîsîn “nezîretun lî Ferezdeq” ango nezîre li Ferezdeq nivîsiye. Ferezdeq bi qafiyeya “cîm”ê pir kêr helbest honandiye, misrayên helbestên bi bi cîmê hatine nivîsîn li ser hev deh tunene. Di rastiya xwe de Namî ev helbesta xwe li helbesteke Ferezdeq nezîre nekiriye, li goftûgoyeke wî kiriye. Ferezdeq rastî mirovekî tê (navê wî tune) û herdu diavêjin ber hevdu ango muaşere dîkin, lêbelê ev muaşere pir kurt e, bi tenê her yek sê misrayan dibêje. Namî di vê helbesta xwe de wek kesê sêyem tevdigere û helbesteke dirêj wek nezîre dihone.

Nimûne ji muaşereya Ferezdeq¹⁴⁰:

Kesê dîn:

*Hace el-hewa bi fuadîkê el muhtac*¹⁴¹

Ferezdeq:

*Fenzur bî tewzîhe bakîr el-Ehdac*¹⁴²

¹³⁸ İslam Ansiklopedisi, Ferezdak (<https://islamansiklopedisi.org.tr/ferezdak>)

¹³⁹ Carl Brockelmann, *Emeviler Döneminde Şam ve Irak'ta Arap Edebiyatı*, werg.: Selman Yeşil, Bingöl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, j.: 3, 2014, r. 252

¹⁴⁰ *Dîwan el-Ferezdeq*, amd. Ustaz Elî Fa‘ur, Darul Mektebetul-İlmiye, ç. 1., Beyrût, 1987, r. 112

¹⁴¹ Evîn di dilê te de gur bûye

¹⁴² Baş binêre li warê Ehdacê [kavilek e li dora Yemamê]

Herdu malikên ewil ji helbesta Namî:

Dîsa bi kel tê qulzema derd û humûmê ba emûc
Ehşa' û 'ezmê pur cefa ez pihtîşan in der lu'ûc (12/1)

Ev canê bê tab û seqîm hetta bi kengî dê wuha
Bi nale saz û derdînak der halê ye'sê bit numûc (12/2)



2.3 HUNERÊN EDEBÎ / CIWANKARÎ

Di helbesta klasîk de bikaranîna hunerên edebî taybetiyeke jê neger e ku bêyî wan nezm wek helbesteke baş nayê dîtin. Bi bikaranîna hunerên edebî maneya helbestê kûrtir dibe û tevî wê hevok kurttir dibe. Her şairî xwestiye di hunerê de bigihîje lûtkeyê, heta ev bûye daxwaza yekane ya şair. Hêmanên sereke ên edebiatê ên wek ziman, raman, gotin, hest û xeyal tev ketine bin emrê hunerê. Ji bo şairekî edebiyata klasîk huner û marîfet bûne çalakiya sereke. Şair dixwaze serdestiya xwe li hember selef û hevçaxên xwe bi vê rêyê nîşan bixe.¹⁴³

Hema hema di hemî berhemên li ser vê mijarê de tesnîfa hunerên edebî wek “beyan”, “bedî” û “meanî” binbeşên wan tê kirin.¹⁴⁴

Di vê beşê de em ji dîwana Namî hin mînakên hunerên edebî bidin. Dîwan ji aliyê hunerên edebî ve gelek dewlemend û serkeftî ye, hema bêje ji her hunerî mînak hene. Ji bo ku mijar dirêj nebe emê ji her hunerê tesbîtîkirî mînakekê bidin:

2.3.1 Beyan

Peyva *beyan* bi binyata xwe tê maneya derxistina holê, xuyan, ravekirin û derbirina meqsedê. Wekî beşeke edebiyatê *beyan*, zanyariyek e ku dabaşa rêbaz û rêçikên derbirina meqsedekê dike.¹⁴⁵ Kesê ku diaxive û dinivîse maneya ku dixwaze bîne ziman dikare bi gelek awayan îfade bike. Meqsed, çawa ku bi maneya rastîn a peyvan dikare bê îfadekirin, wisa jî bi peyvên derveyî maneyên xwe û şibandinan dikare bê îfadekirin.¹⁴⁶ Pîleya aşkerabûnê a têkiliya di navbera peyvê û maneyê de dikeve qada zanyariya *beyanê*.¹⁴⁷ Emê li vir ji wan hunerên dikevin nav vî ilmî hinekan ji dîwanê bineqînin:

2.3.1.1 Teşbîh

Teşbîh bi maneya xwe ya ferhengî şibandin e. Wek têgeh, ji bo hêzdarkirina maneyê ji du heyberên ku di navbera wan de têkiliya mecazî an jî heqîqî heye,

¹⁴³ Numan Külekçi, *Açıklamalar ve Örneklerle Edebî Sanatlar*, çapa 7., weş. Akçağ, Ankara, 2016, r. 13

¹⁴⁴ Külekçi, h. b., r. 11

¹⁴⁵ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi-Belagat*, çapa 7. weş. Gökkuşbu, İstanbul, 2010, r. 97

¹⁴⁶ Saraç, h. b., r. 97

¹⁴⁷ Külekçi, h. b., r. 12

şibandina ya qesl bi ya ji wê hêzdartir e.¹⁴⁸ Teşbîh, ji çar hêmanan pêk tê: muşebbeh (tiştê dişibe), muşebbehun bîh (tiştê lê hatî şibandin), daçeka teşbîhê û wecha şebah (aliyê şibandinê). Di teşbîhekê de “wechê şebah” hebe ew dibe teşbîha mufessel, tunebe dibe teşbîha mucmel.

Sehergahan nesîm weqta ji alê gul‘izaran bê
Wekî bulbul di bağê hicrê nalan î dilê bêkes (24/2)

Di vê beytê de “teşbîha mufessel” heye. Dil ji aliyê “bêkesî”yê ve “ji ber hicranê” mîna bulbul tim dînale. Muşebbeh: dil; muşebbehun bîh: bulbul; daçeka teşbîhê: wekî; wecha şebah: nalîn.

2.3.1.2 Mecaza Mursel

Mecaz di edebiyata klasîk de hunerekî berbelav e. Di jiyana rojane de jî însan bêyî hemdê xwe ji mecazê îstifade dikin. Mecaz ji têkiliya di navbera mane û lefzê (gotin) dertê holê. Mecaza mursel bi van sê şertan çêdibe: divê gotin li derveyî maneya xwe bê bikaranîn b- bo fehmkirina maneya gotinê ya rastîn divê astengiyek hebe c-di navbera maneya mecazî û rastîn de divê peywendiyek hebe. Mînak;

Wuhareng e eger zanî çira ‘umrê bi erzanî
Didî bo luqmeê nanî dikî pê cem‘ê ekdare (49/6)

Şair li vir ji bona hemî xwarinan, luqmeyê nanî a ku cuzek/parçeyek ji wê ye, zikr dike û pê (hemî) xwarinê qesd dike.

2.3.1.3 Îsti‘are

Dema bi meqseda şibandinê peyvek di şûna peyvek din de tê bikaranîn îsti‘are dertê holê. Îsti‘are hem hunerê mecazê ye hem jî hunerê teşbîhê ye. Dema ku ji van du hêmanên teşbîhê muşebbeh (tiştê dişibe) û muşebbehun bîhê (tiştê lê hatî şibandin)

¹⁴⁸ Muhsin Macit-Uğur Soldan, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri*, çapa 8., Ankara, 2016, r. 85

yek neyê gotin îsti'are çêdibe.¹⁴⁹ Yanî di îsti'areyê de ji van du hêmanan yek tê bikaranîn. Mînak;

Lehze lehze têne peygan her ji qewsê malzirav
Lew her an efgan dikêşim tim bi dil giryan im ez (22/9)

Di vê beytê de hunera îsti'areyê heye. Lewra şair, têgiha peygan (ango tîr)bêyî ku muşebbehê bîne ziman, li şûna mijangan bi kar aniyê. Dîsa di têgiha “qewsê malzirav” de jî îsti'are heye, lewra di şûna “çav” de hatiye bikaranîn.

2.3.2 Bedî

Bi maneya xwe ferhengî, hem tê maneya kesê ku tiştêkî bi awayekî bêmînak çêdike hem jî tê maneya ew tiştê çêkirî a bêmînak.¹⁵⁰ Bedî' ilmekî belaxetê ye û hunerên ku dikevin nava vî ilmî, gotinê ji aliyê maneyê û lefzê ve dixemilînin.¹⁵¹

2.3.2.1 Tenasub

Dema du an jî ji duduyan zêdetir peyvên ku di navbera wan de peywendî û munasebet heye li bal hev bê bikaranîn -bi şertê ku tezaadê çêneke- hunera tenasubê çêdibe.¹⁵² Şairên edebiyata klasîk di hîlbijartina peyvên de pir bi nişmîtî tevgeriyane, ji ber vê ev huner pir hatiye bikaranîn.

Dîsa li dû hev dane gar derd û kulê şûzanê ma
Yeğma kirin sebr û qerar ez rûhê purêşanê ma (4/1)

Di vê beytê de hunera tenasubê heye. Lewra di navbera peyvên “derd, kul, şûzan, sebr, qerar, purêşan” de têkilî û peywendiyek maneyî û mijarî heye.

Herwiha di vê beytê de jî tenasub heye:

¹⁴⁹ M. İsen - O Horata - M. Macit - F. Kılıç - İ. H. Aksoyak, *Eski Türk Edebiyatı El Kitabı*, Çapa 3., Ankara, 2005, r. 278

¹⁵⁰ Bulut, *Belagat Terimleri Sözlüğü*, r. 41

¹⁵¹ M. A. Yekta Saraç, h. b., r. 155

¹⁵² Külekçi, r. 221

Şorgul û sosin di bağan pişkivîn şînber geha

Sunbulê ma naxwuya ne çagê efganet **resîd** (17/12)

2.3.2.2 Husnê Te‘lîl

Ji bo xweşikkirina vegotinê, dema ku bûyerek li derveyî sedema xwe ya eslî, bi sedemek din a xweşiktir bê beyankirin hunera husnê te‘lîl pêk tê.¹⁵³ Yanî şair sedema eslî diyar nake, li şûna wê li gor fikra xwe sedemeke li derveyî wê lê xweşiktir dide nîşan. Mînak;

Sed Zîn û Zeynê xûnşirîn bûyin xecîl ez lem‘eyek

Da ez ruxê guldengê ma yan yek eşer ez an buhûc (12/5)

Di vê beytê de husnê te‘lîl heye ku şair mijareke normal bi mijareke din (a eleqa wê pê tune) ve girêdaye. Ango bi vê mijar xweş kiriye.

2.3.2.3 Leff û Neşr

Di ferhengê de leff tê maneya “berhevkirin”ê û neşr jî tê maneya “belavkirin”ê. Wek hunerekî edebî; dema ku du an jî ji duduyan zêdetir peyv an jî daraz bîn beyankirin, li dû wan peyv an jî darazên bi wan re têkildar bîn rêzkirin hunera leff û neşr pêk tê.¹⁵⁴ Şair pêşiyê hin hêman zikir dike (vedike) û dûre hin hêmanên din ên bi wan re peywendîdar rêz dike.

Mişbahê tali‘ vêkevit îqbalê qani‘ pêkevit

Badê mumani‘ lê nehit rewneq bidit eywanê ma (4/7)

Di vê beytê de hunera leff û neşrê heye. Lewra şair li vir bûyerekê vedike û dûre digihîne encamê. Eger misbaha tali’ (bext) vekeve, îqbala (şans, betewerî) qani‘ pêkeve û badê mumani’ (bayê astengker) lê nede, dê eywana me rewneq (ronî) bide.

¹⁵³ Ali Bulut, *Belagat-i Müeyssera Meanî-Beyan-Bedi’*, çapa 3., Marmara Üniversitesi İFAV yayınları, İstanbul, 2016, r. 204

¹⁵⁴ Saraç, h.b, r. 179

2.3.2.4 Mubalexe

Di edebiyatê de dema ku wesfek, kiryarek an jî rewşek bi astek derasayî û nepêkan bê îfadekirin hunera mubalexeyê pêk tê.¹⁵⁵ Kesê ku rewşê îfade dike (erênî-nerênî) zêde pêde diçe û îfrat dike.

Seylabê eşkê xûnmişal tê j' kaniya qafê xiyal
Ez berzeê mehbûbê bal mewcîn gihan mijganê ma (4/3)

Şair îfade dike ku ji ber windabûna mehbûba dil hêsirên wî weke xûnê ewqas ji “kaniya qafê xiyal” hatine ku mewcîn (pêl) wê gihane mijanganê wî.

Ji ber vê di vê beytê de hunera mubalexeyê heye, ku şair di îfadekirina fikrê xwe de tiştên derasayî dibêje û tiştên asayî ji normalê mezintir dike.

2.3.2.5 Tecahulê ‘Arif

Wek maneya ferhengî; arif “zana” ye û tecahul jî “xwe li nezanîne danîn” e. Lê wek têgeheke edebiyatê; tevî ku mirov rastiyeke bizanibe, lê bi nukteyekê xwe li nezanîne dayne hunera tecahulê arif pêk tê.¹⁵⁶ Di vê rewşê de bi piranî pirs tê pirsîn û armanc peyam dayin e.

Bê wefa ye, pur cefa ye, zalim e, geddar e, dîn
Hiç tîne qet ji bo kes rehmê û hem ‘edl û dad? (18/5)

Di vê beytê de hunera tecahulê ‘arif heye. Şair di misraya yekem de taybetiyên felekê rîz kirine, ku dibêje felek zalim e, xeddar e bê wefa ye, pur cefa ye û dîn e. Lê misraya duyem de wek pirsêke dibêje “ma qet li kesî rehm û ‘edl û dadê dike?”. Şair cewabê dizane, lê dîsa jî wek pirs dibêje.

¹⁵⁵ Ali Bulut, *Belagat Meanî-Beyan-Bedî*, çapa 5., Marmara Üniversitesi İFAV yayınları, İstanbul, 2015, r. 314

¹⁵⁶ Külekçi, h. b., r. 111

2.3.2.6 Tecrîd

Di edebiyatê de, dema ku mirov xîtabî heyberekê bike û bi wê xwe qest bike hunera tecrîdê pêk tê. Herwiha dema mirov wek kesekî din xîtabî xwe û dilê xwe bike dîsa dibe tecrîd.¹⁵⁷

Namî dibêjî her we‘iz, lêk pê tu nabî mutte‘iz
Dûr î ji hâlatê yeqiz, zinhar nebî xewwarê çerx (14/20)

Di vê beytê de hunera tecrîdê (tecrîda xîtabî) heye. Li vir Namî li şûna kesekî sêyem xîtabî xwe dike.

2.3.2.7 Tekrîr

Tekrîr, di eynî maneyê de dubarekirina peyvan e. Ji dubarekirinê meqsed pihêtkirin û zexmkirina îfadeyê ye. Bi tkrarê hem îfade zelal dibe hem jî bi balkişandina xwendevan bandora gotinê zêde dibe.¹⁵⁸

Elwida‘ Namî dibêjî lê pir in hogir heval
Elwida‘ ey aşîyanê mahitaban **elwida‘** 31/11)

Di vê beyta jor de bi tekrarkirina peyva “elwida” hunera tekrîrê hatiye çêkirin.

Herwiha di vê beytê de jî Tekrîr heye:

Kan ew çehvê reşhela **kanê** zulfê ta bi ta
Kan cewa min **kan** kewa min **kan** lub û xendanê min (45/6)

Di vê beytê de jî bi peyvên “cî cî” tekrîr hatiye kirin:

Reybê beqa ma der cîger pê xweş kirin de‘wa û şer
Zenga ‘inadan girte ser **cî cî** ‘enaşir firqe da (1/9)

¹⁵⁷ Ali Bulut, *Belagat-i Müyessera*, r. 200

¹⁵⁸ Saraç, h. b., r. 196

2.3.2.8 Tezad

Dema ku di rêz an jî malikekê de peyvên dij-mane bîn bikaranîn tezad (dijberî) çêdibe. Dijberî çawa ku navbera maneya rastîn a peyvên de çêdibe wisa jî di navbera maneya mecazî a peyvên de çêdibe.¹⁵⁹ Di dîwanê de ji vî hunerî pir hatiye îstifadekirin. Mînak;

Tabê liqa xef da sehab xurşîdê bextim kir şîtab
Mumkin dibê ab ez serab yar bê û bit mihmanê ma (4/6)

Di vî beytê de hunera tezadê heye. Lewra şair li vir di nav van peyvên de tezad çêkiriye:

Tab-sehab
Xurşîd-şîtab
Ab-serab

2.3.2.9 Telmîh

Ger di nava gotinê de îşaret bi şexsiyetekî dîrokî an jî bûyereke kevn a ku ji aliyê her kesî ve tê zanîn bê kirin telmîh pêk tê. Tiştên ku telmîh lê hatiye kirin bi berfirehî nayê îzahkirin, tenê navê (an jî cih) bûyer an jî şexsiyetê tê dayin.¹⁶⁰ Armanc ji henerê telmîhê, bibîrxistin û ramandin e.

Ah çi goyem heşretê leb-teşneê abê Ferat
În dilê bê tabê ra zehrê fena yî ya Huseyn (43/16)

Di vî beytê de hunera telmîhê heye. Lewra li vir îşaretî bûyera Kerbelayê û venexwarina ji ava Feratê tê kirin. Lewra wexta ku Hz. Huseyn û ehlê wî ji Mekkeyê ber bi Kûfeyê bi rê dikevin, li Kerbelayê ji aliyê hêzên Yezîd ve dora wan tê girtin. Ehlê Hz. Huseyn bi rojan li nava çolê tî dimînin, berê xwe didin çemê Feratê, lê leşkerên di bin emrê Umer bîn Se‘d de nin, pêşiya wan digirin û li serê çem disekinin û nahêlin ew vê av vexwin.

¹⁵⁹ Muhsin Macit-Uğur Soldan, h. b., r. 95

¹⁶⁰ M. İsen - O Horata - M. Macit - F. Kılıç - İ. H. Aksoyak, h. b., r. 292

Ew bûyer bi rojan bi hesreta avê diajo... lê ew nahêlin ji ava Feratê vexwin...
Piştî ku Hz. Huseyn û ehlê wî şehîd dikevin jî “leb-teşne” ne...

2.3.2.10 Cînas

Di metnekê de dema peyvên ku maneyên wan cuda lê ji aliyê nivîsîn û telaffuzê ve yek in nêzî hev bîn bikaranîn hunera cînasê dertê holê. Ji bo van peyvên, çî nav çî fiil bin, çî qertaf girtibin çî jî negirtibin rewş naguhere,¹⁶¹ dîsa dibin cînas.

Ey dilbera zalim **çira** winda te kir şîrîn **bira**

Dilkul te hiştim bê **çira** ah û enîn ah û enîn (47/5)

Di vê malika jor de di nava peyvên “çira” de cînas heye. Dema di nav peyvên ku cînasê pêk tînin de tîpên binoqte hebin û di navbera van peyvên de ji hêla noqteyê ve cudahî hebe, hinhê “cînasa muxeffef” pêk tê.¹⁶² Ji ber vê di malika jor de di navbera peyvên “çira” û “bira” de jî cînasa muxeffef heye.

2.3.2.11 Î’ade

Dema peyva dawîya malikekê di serê malika dû xwe de bê bikaranîn hunera î’adeyê pêk tê.¹⁶³ Wek mînak;

Bizan ev rubhê bê kare ji min bişnew tu guftare

Felek na doste bed yare mebe vêre **giriftare** (49/13)

Giriftar bê kesê ba an diçit rêza telxikaman

Di her subhê û di her şaman ber an espê felek gare (49/14)

Di vê beytê de hunera î’adeyê heye. Lewra peyva di dawîya beyta yekem de derbas dibe, di beyta duyem de dîsa tê.

¹⁶¹ Saraç, h. b., r. 245

¹⁶² Saraç, h. b., r. 247

¹⁶³ Saraç, h. b., r. 263

2.3.2.12 Îştiqaq

Îştiqaq bi maneya xwe ya ferhengî “dariştin” e. Wek têgeheke edebî; dema ku reha peyvêkê û peyvên ji wê rehê dariştî di îfadeyekê de bên bal hev îştiqaq pêk tê.¹⁶⁴

Ya **Şebûr** b’ ismê **şebar şebrê** bide bo mucteba
Hem ji wî mehcûr nedêre min di der Yewmul-ceza (5/17)

Di vê beytê de hunera îştiqaqê heye. Lewra şair peyvên ji heman kokê tîn “sebr- sebûr- sebr” ku ji heman rehê tîn bi kar aniye.

2.3.2.13 Tersî‘

Dema peyvên di rêzên malikekê de aliyê hejmara herfan, kêş û qafiyeyê hevtayê hev bin, ango sîmetrîk bin hunera tersî‘ê pê tê.¹⁶⁵

Ji nagah berqê **bañin bû li** dil da **wî verandin em**
Ji ebrê hicrê **mañin bû ji** taqet **wî birandin em** (41/1)

Di vê beytê de hunera tersî‘ê heye. Lewra herdu rêzên malikê ji aliyê hejmara herfan, kêş û qafiyeyê ve eynî ne.

2.3.2.14 Alîterasyon

Ev huner bi dubarekirina heman dengê bêdeng pêk tê. Şair bi piranî ji bo aheng û mûsîqaya helbestê ji vî hunerî îstifade dike.

Çi reng teswîri da **xellaqê van xal û xuûtê xweş**
Di wechê van meleksîma û dildamê çu gul dilgeş (26/1)

Di misraya yekem ya vê beytê de hunera alîterasyonê heye. Lewra herfa bêdeng a “x”yê bi awayekî mûsîqal gelek caran hatiye tekrarkirin.

¹⁶⁴ Muhsin Macit-Uğur Soldan, h. b., r. 102

¹⁶⁵ Külekçi, h. b., r. 290

2.3.2.15 Asonans

Ev huner bi dubarekirina heman dengê dengdar pêk tê. Ev huner jî ji bo aheng û mûsîqaya helbestê ye.

Xurrem û xendan e her kes ez tenê mame ne şad
Leşkerê derd û geman hat û bi derbanet resîd (17/4)

Di vê beytê de hunera Asonansê heye. Lewra li vir herfa “e”yê pir hatiye tekrarkirin û pê mûsîqayek hatiye çêkirin.

2.3.2.16 Akrostîş

Ji serê helbestê ber bi jêr bi serê herfa yekem a her rîzê nav çêkirin e. Nivîsîna vî cureyê helbestê gelek dijwar e û di edebiyata klasîk de zêde meriv lê rast nayê. Namî di vê şîira xwe ya jêr de bi serê herfên yekem ên rîzên helbestê hunera akrostîşê çêkiriye. Ku bi wan herfan jî îşaretî van herdu ayetan kiriye: ¹⁶⁶ اللَّهُ لَطِيفٌ بِعِبَادِهِ يَرْزُقُ مَنْ
¹⁶⁷ وَهُوَ الْقَاهِرُ فَوْقَ عِبَادِهِ ۗ وَيَشَاءُ ۗ وَهُوَ الْقَوِيُّ الْعَزِيزُ .

Ellah çî zatek qadir e mahir di tedbîra xwe da
Lewn û liyaqet sair e cî kir di cîmên cilwe da

Lamên çu le‘lê durfeşan aşûbê edwar û zeman
Aram û îfnaê dilan xef da di ‘eynê perde da

Hil kir ji nûrê narê dil ber xilqetê îh hişk û şil
Lewhê hurûfên mu‘tedil anî wucûd û nuqte da

Terhê çu gul tê afirand ba terzê dilkeş neqqîşand
Yumnê celadet lê civand wek afîtabê şu‘le da

¹⁶⁶ Xweda ji evdên xwe re lutufkar e, kê bivê rîziq dide wî. Ew xwedanhêz û xeletdar e. (Şûra, 19)

¹⁶⁷ Xweda serdestî evdên xwe ye. (En ‘am, 18)

Feyzek nihan da şu‘leê avête puşta perdeê
Berqek ez û da nuqteê dalan û tê da lem‘e da

‘Alem heme kir pur xiyal z’ an qîtreê afet-mişal
Bang û şela û nalenal ji ber tîbaqê tis‘e da

Erbabê tedqîqê nukat maîn di seyranê şîfat
Der kahinan ma mest û mat telpêk li bedrê hale da

Hingî bi hev bûn muttesil nabin ebed ew munfeşil
Yadê hinan ma munfe‘il komek muxalîf helqê da

Reybê beqa ma der cîger pê xweş kirin de‘wa û şer
Zenga ‘inadan girte ser cî cî ‘enaşîr firqê da

Qefla tîlismên zîweran ma der fusûna efseran
Meyla evîna mehferan girtî cihat û fuqre da

Nîl û meqşîd hate coş rabûne reqsê badenoş
Yek z’ an numayed perdepoş giştan di yemmê gewte da

Şeklê xwe der cama meyyê dîtin dema çûn secdeê
Asayîşê vê madeê dîtin di nêv ayîne da

Elwanê alam û wişal der neşşê erqamê cemal
Wehya evîna pur meal xwendin di dersê wehde da

Hatin yeka-yek şahibaz der keşşê naz û niyaz
Waqif dema bûn dilnewaz cî dan xewasê xemse da

Eşkalê derrarê ‘ecîb dîn bel di elwahê neqîb
Lêk man di amalê firîb ressamê neqşê firçe da

Qibla dilan anî ji dûr wer kir muşeyqel bê quşûr
Wefqa cizabê xettê hûr kêşa di sethê hidqe da

Yek mîmekê muhte dilan nûnek şemîn da muqbilan
Avête payê dilkulan zencîrê keysû tev neda

Lef da li dalan wî demî ta pêşê xelqa Ademî
‘Alem ne mewcûd bûn hemî çeşmên xumarî surme da

Zeyta muhebbet ba nişab avête qendîlê hubab
Yek yek kişandin încizab jê ev telaşum surpe da

Zulfê siyah keziyyê dirêj subhê ezel xaliq ji mêj
Weqta nebûn dana û gêj terhên şilalê turre da

Hefsarekî nûrîn-kemel pur muhkem û hem bêxelel
Wehhabi pê murgê emel best û merakid cumle da

Iqlîmê elbabê ‘uşaq avêta çerxa insihaq
Lehnê eqawîlê firaq xweş kir di tîlên negme da

Qelbê nigaran hem qetî çêkir ji sengê afetî

Agir ji wan sengan ketî cergên ‘uşaqan hîrçe da

Hatin hilakê ehlê dil geztin du reşmarê li mil
Rencek mudamî abê kil kefte û tê lenger veda

Ferwarê nakit li kesek der meħbesê hicr û helek
Wêkra dilê wan bê durek ma û peyapey teşne da

Qeṭ kes nebû ez ‘aşiqan şadanê ħubbê xaniqan
‘Ewrê fîraq û şa‘iqan daîm li tûran berqe da

Belkî ne ew pansed hezar bêçare kirdîn rexnedar
Avête dil ‘işqa gedar wan can û dil tev fidye da

Daniye ev ‘adet qedîm pê kir cunûn ‘eqlê selîm
Hey hey we mayîn wer seqîm der în dewwarê teqle da

2.3.2.17 Telmî‘

Hunerê telmî‘ê an jî mulemme‘ ew huner e ku herî kê m bi du zimanan tê nivîsandin. Di edebiyata Kurdî de bi giştî risteya yekê bi Kurdî ye û risteya din jî bi zimanên Erebi, Farişî an jî Tirkî ye. Di dîwana Namî de ji hunerê telmî‘ê pir hatiye îstifadekirin û giştî jî bi zimanên Erebi û Farişî telmî‘ hatiye kirin. Ji dîwanê ji bo hunerê telmî‘ê du nimûne:

Gote min zanî çira min wer li te kerdem ‘itab
Der dilet men keşfi kerdem meylê cuz men bale‘¹⁶⁸ (57/6)

Çendekî hemdem bûyin der cumle anê dilxweşî
Haza fîraqu beynena tabi qudûman elweda¹⁶⁹

¹⁶⁸ Min di dilê te meyleke ji xeynî meyla xwe delalê keşf kir

2.3.2.18 Tarîx

Ew cure şîir e ku bi herfên Erebî, dîroka qewimîna bûyerekê hesabê ebcedê dide nîşan. Ji çêkirina vê hunerê jî *tarîxdanîn* tê gotin.

Ji tarîxê mucewher tu helîne herfê ser ey can

Ġurûb kir şems û nûnê dil zewal da textê Îranê

Wekî em dibînin Namî di vê beyta xwe de tarîxek daniye, lê di risteya yekem de gotina “ji tarîxê mucewher” zikir dike. Gotina *tarîxa mucewher*, têgeheke ilmê ebcedê ye û ji hesabkirina herfên bixal tenê re tê gotin. Yanî di malikê de ji hemî herfan tenê herfên bi xal têne hesabkirin, yê din li derveyê hesab in.¹⁷⁰ Namî balê dikişîne ser risteya duyem û dibêje bi usûla tarîxê mucewher tenê herfên bixal hilde û herwiha ji wan jî (peyvan) tenê herfê ser hilde. Dîsa di destxetê de wî bixwe bi nivîseke piçûk di binê herfên ser de, ango di binê ğ (غ), ş (ش), n (ن) û z (ز) de nîrxê wan ê ebcedî bi rêzê wiha nivîsîne: 100, 300, 50, 7. Dema meriv van jimaran berhev dike tarîxa 1357 dertê holê ku ew jî bi hesabê mîladî dibe 1938.

¹⁶⁹ Ji fîraqê hêza qudûmê nema da (ez berpê biçim) elweda

¹⁷⁰ Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 1983, r. 504

BEŞA SÊYEM

VEKOLÎNA DÎWANA NAMÎ

3.1 TERTÎB Ê DANASÎNA GIŞTÎ YA DÎWANÊ

Ji wê dîwana şair a tê de helbestên wî li gor pergala û tertîbekê bikevî û rêkûpêk bûyî re dîwana murettêb tê gotin.¹⁷¹ Şairên ku dîwanê tertîb dikin helbestên xwe ji windabûn û belavbûnê xilas dikin, lê şairên ku helbestên xwe di dîwanekê de berhev nekiribin bi piranî di nava demê de helbestên wan wînda dibin. Lêbelê çawa ku dîwanek ji aliyê şair bixwe ve tê tertîbkirin, piştî mirina şair ji aliyê kesekî din ve jî dikare bê tertîbkirin. Di dîwanan de, hinek şair helbestên xwe li gor kronolojiya elifbêyê (elifbêya Erebi) tertîb dikin û hinek jî li gor teşe û cûreyên nezmê tertîb dikin. Lê bi giştî ev awayê tertîbê li gor nerîta edebî diyar dibe, yanî şair li gor dilê xwe dîwana xwe tertîb nakin. Di edebiyata Kurdî de jî bi giştî dîwan li gor kronolojiya elifbêyê hatine tertîbkirin.

Dîwana Namî *Meğmuru'd-Dewawîn* dîwaneke murettêb e û helbestên wê li gor kronolojiya elifbêyê hatine rêzkirin. Namî bi hemû herfên di alfabe ya Erebi de helbest nivîsîne. Wî herwiha li derveyê herfên Erebi, bi hin herfên Kurdî-Farisî ên wek “v”, “ê” û “g” jî helbest nivîsîne. Namî 45 helbest li gor kronolojiya elifbêyê nivîsîne, lê piştî ku dîwan (bi herfa “yê”) xilas dibe, bi navê “Be‘de îtmamil-hurûf” (piştî temamkirina herfan) vê carê tevî dîbaceya dîwanê 6 heb helbestên din lê zêde dike. Namî di dawîya dîwanê de fihrista helbestan jî bi cî kiriye û di fihristê de navê van 6 helbestan jî cî digirin. Herwiha şair, di fihristê de “Dîbace” wek helbesta yekem nîşan daye. Xuya ye şair pêşiyê bo helbestên xwe wek dîwaneke tekûz nefikiriye, lê paşê dîwan temam bûye xwestiyê rêzika (adet) dîbaceyê jî pêk bîne. Ji van 6 heb helbestên ku paşê lê hatine zêdekirin, qafiyeya helbesta serî bi hemzeyê hatiye çêkirin ku ev jî cîyawaziyeke Namî ye, lewra hemze bi serê xwe herfek nîne, bi herekekirina elifê tê çêkirin û di edebiyata Kurdî de jî em rastî helbestên bi vê qafiyeyê nehatin. Li aliyê din, ev 6 helbestên ku paşê lê tên zêdekirin li gor rêza elifbêyê nînin. Şair ev helbestên

¹⁷¹ İskender Pala, *Ansiklopedik Divân Şiiri Sözlüğü*, (çapa 20.), weş. Kapı, İstanbul, 2011, r. 119

han piştî temamkirina dîwanê nivîsîne û yek bi yek li dîwanê zêde kirine. Helbet ev lêzêdekirin bûye sebebê şikestina rêza qafiyeya dîwanê jî, lê ji ber ku ji serê herfan (elif) heta dawîya herfan (yê) ev rêza qafiyeyê hatiye teqîbkirin dikare mazûr bê dîtinê.

Ji xeynî van 6 helbestan, şair 11 helbestên din jî li dîwanê zêde kirine, lêbelê navê van helbestan di fihristê de cî nagire, bi gotineke din, şair di fihristê de cî nedaye wan. Herwiha di navbera destxeta metnê pêşîn û destxeta van 11 helbestan de jî cudahiyeke berbiçav heye; metnê pêşîn xweşîktir û nexşdartir e, lê xetê van 11 helbestan zêde ehemmiyet pê nehatiye dayin û hin cihên wan baş nayên xwendin. Sebebê cihnedana di fihristê de û cudahiya xetê em nizanin, lêbelê ji ber ku dîwan hemî destxetê şair e û midaxele bi tu awayî ji derve li dîwanê nehatiye kirin, emê van 11 helbestan û her 6 helbestên ku ne li gor rêza qafiyeyê ne di nav metnê dîwanê de li gor rêza qafiyeya wan bi cî bikin.

Li gorî dîroka li dawîya van helbestên ku paşê li dîwanê hatine zêdekirin, ev helbest heman sala qedandina dîwanê yanî di sala 1956an de lê hatine zêdekirin.

Jixwe ev lêzêdekirina şairan tiştêkî asayî ye, lewra şairên klasîk nêzîkî wefata xwe hemî helbestên xwe yê berbelav berhev dikirin û wek dîwanekê li gor rêza qafiyeyê an jî cûreyê helbestan tekûz dikirin. Lê dema temenê wan dewam bikira û helbestên nû binivîsiyana, ew li dîwana xwe zêde dikirin. Namî jî piştî qedandina dîwanê li dawiyê bi maneya temam bû de “temmet” dinivîse, lê her carê çend helbestên nû lê zêde dike û temmet dinivîse. Bi vî awayî di dîwanê de 5 caran temmet nivîsiye.

Ji derveyî dîwanê, me 6 helbestên din ên Namî bi dest xistin. Namî di wextê xwe de gelek helbest nivîsîne an jî bi deng qeyd kirine û wek diyarî dane hevalên xwe. Bi rêya malbata wî, me 3 heb helbestên wî yê nivîskî ku şair dabû hevalekî xwe bi dest xistin, ku ew jî ev in: “Hat buhara dil bi kaman, me buhara dil nehat”, “Bi xêr hatî emîrzade li ser çavên xulamê xwo” û “Kewekî min di rewaqa cigerê de bû firî”.¹⁷² Herwiha 2 heb helbest jî ji kasetên ku wî bi dengê xwe qeyd kiribûn û dabû hevalekî xwe hatin deşîfrekirin, ku ew jî ev in: “Got were sola me dêne weqt e

¹⁷² Fehmî Beg dema ku li jiyanê bûye bi xetê xwe ev her sê helbest nivîsîne û diyariyê Mela Xalîte Licî kirine. Me jî ji wî peyda kir.

ey Kurdo sivik” û “Ey serê xwaza bi derdan tava hîva bextê reş”.¹⁷³ Digel van, beriya ku Namî wefat bike du kêlik çêkiribûn û li ser wan helbesteke bi navê “Rêwiyo ev reng mebare bê xem û azadeser” nivîsîbû ku dema wefat dike wan kêlikan li ber serê wî diçikînin,¹⁷⁴ me ew helbest jî girt nava xebatê. Lêbelê ji bo ku Fehmî Beg bi zanetî ev helbestên han nexistine nav dîwana xwe, emê jî tabî‘ê wî bibin û van helbestan nexin nav helbestên din û emê wan di bin serenavekî cuda de bi cî bikin. Helbet emê wan jî wek helbestên din binirxînin.

Di dîwanê de ji xeynî helbestên Namî munacateke Hz. Ebûbekir jî cî digire. Ev munacat di gelek keşkûlan de heye ku nisbetî Hz. Ebûbekir tê kirin. Xuya ye Fehmî Beg ji ber xweşikbûn û manedartiya wê ew hildaye nav helbestên xwe. Herwiha du helbestên piçûk ku yek ji du malikan û yek jî ji malikekê pêk tê li dawiya dîwanê bûn ku ew jî aîdî Namî nînin. Danîna van her du helbestan li dawiya metnan jî berê de kevneşopiyeke muntensixan e. Mustensixên berê li dawiya metna xilasbûyî şîirên wek van (wek dua-xatir) datanîn û li binê wê jî dîroka xilasbûna metnê dinivîsîn. Ji ber ku şairê me jî helbestên xwe bixwe nivîsîne ango katib bûye, wî jî ev kevneşopî dewam kiriye, lê ji ber ku şairê me bi giştî du caran dawî li dîwanê aniye, du caran daniye (cara pêşîn helbesta du malik daniye û cara paşîn jî ya yek malik). Ji ber ku ev helbest yê Namî nînin û herwiha wî ew danîbûn dawiya dîwanê, emê jî van du helbestên biçûk tevî munacata Hz Ebûbekir di dawiya helbestan (dîwanê) de wan bi cî bikin.

Namî di rêzkirina helbestan de rêzika helbestavanên Kurd ên klasîk şopandiye û her helbestek bi navê qafiyeya wê bi nav kiriye, mînak: qafiyetul-elîf, qafiyetul-ba, qafiyetul-cîm... Lê di hin qafiyeyan de çendîn helbest hatine nivîsîn, şair jî ji bo vê di maneya dîsa û tegerê de “eyzen” an jî “welehu eyzen” gotiye, wekî “qafiyetul-elîf eyzen”, “qafiyetul-ba eyzen”...¹⁷⁵ Heta ku sê helbest û an jî ji sisêyan zêdetir be “kezalîke” gotiye. Ji bo ku tevlihevî û teger çênebe, me tenê navê qafiyeyê li serê helbesta yekem nivîsî û helbestên din ên bi wê qafiyeyê li binê wê rêz kirin. Herwiha

¹⁷³ Fehmî Beg dema ku li jiyane bûye bi dengê xwe gelek helbest qeydkirine û wek diyarî dane lawê Şêx Abdurahîmê birayê Şêx Seîd. Mixabin ji wî tenê ev her du helbest hatin peydakirin.

¹⁷⁴ Mixabin dema gora wî nûjen dikan, ew kêlikên ber serê wî diçikên.

¹⁷⁵ Di dîwanê de di qafiyeya “ra” de tenê helbestek hebû, lê wek “qafiyetul-ra eyzen” hatibû binavkirin. Li gor mentîqa rêzkirinê diviyabû li pêşiya wê helbesteka din a bi qafiyeya “ra” hebaya, ku ev jî fikra windabûna wê helbestê dide mirov. Lêbelê dema mirov li rêza rûpelan dinêre tu kêmasî naxuyê, yanî ji rûpela 19 derbasî 20an bûye. Herwiha di heman rûpelê de nivê helbesteka bi qafiyeya “zal” heye, ku ev jî nîşan dide di rêzê de kêmasî tune. Xuya ye şair li kêleka navê qafiyeyê bi xeletî “eyzen” nivîsiye.

Namî bixwe nav li hin helbestên xwe kirine, mînak: “Mersiye li sêr Şahê Delal (Hz. Huseyn)”, lê piranî bê nav in, ji bo diyarbûnê me risteya yekem a helbestê kir navê helbesta bênav. Jixwe di fihrista dîwanê de jî şair dema rêza helbestan çêkiriye, her helbestek bi rêza wê ya yekem bi nav kiriye.

Dîwan bi ser hev ji 68 helbestên Namî pêk tê (hat). Di dîwanê de bi hin herfan helbestek û bi hinekan du, sê, çar an jî pêncan helbest qafiye hatine çêkirinê. Emê niha li jêr şemaya helbestên di dîwanê de, ji aliyê herfên qefiyeyê û jimara helbestên bi eynî qafiyeyê hatine nivîsîn bidin:

Herf	Hejmara helbestan	Rêza Helbestan a di dîwanê de
ا - a	5	1, 2, 3, 4, 5
ء - ’	1	6
ب - b	2	7, 8
ت - t	3	9, 10, 63
ث - s	1	11
ج - c	1	12
ح - h	1	13
خ - x	1	14
د - d	4	15, 16, 17, 18
ذ - z	1	19
ر - r	3	20, 21, 64
ز - z	2	22, 23
س - s	2	24, 25
ش - ş	2	26, 65

ص - ş	1	27
ض - z, ð	1	28
ط - t	1	29
ظ - z	1	30
ع - ‘	2	31, 32
غ - ğ	1	33
ف - f	1	34
ف - v	1	35
ق - q	1	36
ك - k	2	37, 66
گ - g	1	38
ل - l	2	39, 40
م - m	2	41, 42
ن - n	5	43, 44, 45, 46, 47
ه - h	5	48, 49, 50, 51, 52
و - w	3	53, 54, 67
لا - la	1	55
ی - y	2	56, 68
ئ - ê	5	57, 58, 59, 60, 61


Tablo 1 Rêz, Hejmar û Herfa Qafiyeyê ya Helbestan

Wekî dixuyê Namî, herî zêde bi herfên ١ (a), ٤ (n), ٣ (m) û ٤ (ê) helbest nivîsîne ku bi her yekê 5 helbest nivîsîne. Li vir ya herî balkêş herfa “ê” ye ku ev herfa Kurdî di dîwanên Kurdî de zêde nehatiye bikaranîn, lê Namî ew pir bi kar aniye. Herwiha bi helbestekê be jî Namî bi hemî herfên di albeya Erebî de helbest nivîsîne. Di dîwanê de helbestek bi awayê mesnewiyê û 6 heb jî bi awayê bendan hatiye honandin, helbestên mayî hemî bi awayê xezel-qesîdeyê hatine nivîsîn.

3.2 TEŞEYÊN NEZMÊ

Teşeyê nezmê, hêmaneke jêneger a têkildarî estetik û şeklê helbesta klasîk e. Teşeyên nezmê bi giştî du awa ne: helbestên ku malikan pêk tînin û helbestên ku bendan pêk tînin.

Di vê beşê de emê li ser teşeyên nezmê yê dîwana *Megmûrud-Dewawîn* a Namî bisekinin û panoramaya wê ya teşeyên nezmê xêz bikin. Di dîwanê de cûreyên nezmê bi awayekî muretteb li bal hev nînin, belkî bi awayekî belave di dîwanê de cî digirin. Teşeyên nezmê yê 68 helbestên di dîwanê de wiha ye: 42 xezel, 19 qesîde, 1 mesnewî, 1 murebbe', 2 muxemmes, 1 texmîs, 1 museddes û 1 musemmen. Şair di 8 teşeyên nezmê de helbest nivîsîne û teşeya herî zêde pê helbest hatiye nivîsîn xezel e ku ew jî % 61ê helbestan dîke. Rêjeya helbestan di grafîka jêr de hatiye dayin.



Grafîk 1: Grafîka rêjeya teşeyên nezmê

3.2.1 Helbestên ku ji Malikan pêk tên

Yekeye herî piçûk a helbestê misra (riste) ye. Ji du risteyan malikek pêk tê û ji çendîn malikan (beyt) jî helbestek pêk tê. Qesîde, xezel û mesnewî ew teşe ne ku ji malikan pêk tên. Emê di vê binbeşê de tabloya teşeyên qesîde, xezel û mesnewiyên di dîwanê de diborin digel cûreyên wan derxin.

3.2.1.1 Qesîde

Qesîde û xezel ji aliyê şeklî ve pir dişibin hevdu. Lewra di herduyan de jî, herdu risteyên malika yekem di navbera xwe de bi qafîye ne û risteya yekem a hemî malikên din serbest e û risteya duduyan jî bi risteyên malika yekem re hemqafîye ye.¹⁷⁶ Yanî qesîde û xezel bi vê şemaya qafîyeyê tên nivîsîn: aa ba ca... Ji malika ewil re *metle* ' û ya dawîn re jî *meqte* ' tê gotin. Herwiha ji malika herî xweşik re *şah beyt* û ji malika ku mexlesa şair tê de dibore jî *tac-beyt* tê gotin.¹⁷⁷

Lê qesîde û xezel ji aliyê naverokê ve cihê dibin; di qesîdeyê de bi piranî li ser pesnê desthilatdarekî û kesayetekî siyasî an jî dînî tê rawestan.¹⁷⁸ Qesîde bi giştî ji 9 malikan heta 100 malikan dikare pêk bê, lê di edebiyata Kurdî de bi gelemperî qesîde di navbera 5 û 30 malikan de nin. Di dîwanê de ev helbestên han qesîde ne: 1, 2, 5, 23, 25, 30, 31, 33, 34, 43, 46, 47, 49, 51, 53, 63, 64, 67 û 68.

3.2.1.2 Xezel

Xezel peyveke bi Erebi ye û tê wateya sohbeta eşiqane a digel jinan. Herçendî mijara xezelê ya sereke eşq û sohbeta li ser evîne be jî di mijarên cuda jî xezel tên nivîsîn, herwekî; xezelên sofîyane, xezelên şoxane, xezelên hekîmane, xezelên rindane.

Di edebiyata Farisî û Tirkî de hejmara malikên xezelan ji yê qesîdeyan kêmtir in, lêbelê di edebiyata Kurdî de hejmara malikên xezel û qesîdeyê nêzikî hev in. Di

¹⁷⁶ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 367

¹⁷⁷ Haluk İpekten, *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, weş. Dergah, İstanbul, 2008, r. 38

¹⁷⁸ Adak, h. b., r. 368

edebiyata Kurdî de bi gelemperî xezel ji 5-7 malikan heta bi derdora 20-30 malikan pêk tê.¹⁷⁹

Di dîwana Namî de cûreyê herî zêde ku helbest pê hatine nivîsîn bi 42 helbestan xezel e. Xezela herî kurt a di dîwanê de bi 5 malikan xezela rêza 51an e. Herwiha xezela herî dirêj jî bi 35 malikan helbesta rêza 40. e.

3.2.1.2.1 Xezela Musemmet

Xezela musemmet cûreyek ji xezelê ye û hemî taybetiyên xezelê di xwe de didêre. Dema ku nîveka malikên li dû metle‘ê tên bi dawiya malika metle‘ê re hemserwa be xezela musemmet pêk tê. Yanî di xezela musemmet de digel qafiyeya li dû malikan qafiyeya navekî (tesmît) jî heye. Ji ber vê ye honandina vê cûre xezelê diwartir e, lê digel vê Namî 21 heb xezelên xwe (ji sedî 30yê helbestan) wek musemmet honandine, ku ew jî ev in: 1, 4, 7, 9, 14, 15, 16, 21, 25, 28, 35, 37, 38, 40, 41, 47, 49, 52, 58, 60 û 67.

Ji vê zêdebikaranînê jî dixuyê ku qafiyeya navekî ango tesmît bûye yek ji taybetiyên serekê ên helbesta Namî. Qafiyeya navekî, aheng û mûsîqayeke esktra li helbestê zêde dike.

3.2.1.3 Mesnewî

Mesnewî, ew teşeya nezmê ye ku her malikeke wê di navbera xwe de hemqafiye ye. Yanî wek qesîde û xezelê, mecbûrî nîne ku di dawiya her malikê de heta dawî heman qafiye bê çêkirin. Lewra li gor teşeyên din honandina mesnewiyê hêsantir e. Ji ber vê hêsaniyê di her mijarê de menzûmeyên pir dirêj (bi sedan an jî bi hezaran malik) bi vî teşeyî hatine nivîsîn.¹⁸⁰ Lê hin caran di dîwanan de hinek mesnewiyên bi qasî xezelan kurt jî tên dîtin.¹⁸¹ Di mesnewiyan de qalibên kurt ên erûzê tên bikaranîn. Herwiha maneya her malikê di nava xwe de temam dibe û ew mane derbasî malika din nabe.¹⁸² Di dîwanê tenê *xatime* (helbesta 62.) bi awayê mesnewiyê hatiye nivîsîn ku ji 36 malikan pêk tê. Ev helbest bi qalibê “Fe‘ûlun fe‘ûlun fe‘ûlun fe‘ul” ê erûzê hatiye ristin.

¹⁷⁹ Adak, h. b. r. 371

¹⁸⁰ Tahir-ül Mevlevî, *Edebiyat Lügati*, Enderun Kitabevi, İstanbul, 1994, r. 99

¹⁸¹ Adak, h.b, r. 380

¹⁸² İpekten, h. b. r. 59

3.2.2 Helbestên ku Bendan pêk tên

Bend ew e teşeyê ye ku ji duduyan zêdetir misrayên bi qafiye û kêşê pêk tê. Bend ji 3 misrayan heta 10 misrayan dikare biguhere. Ji her bendeke re qit'a jî tê gotin. Bendên helbestên bi vî cûreyî ji yekê zêdetir in. Em dikarin van cûre helbestan wiha rêz bikin: murebbe' û terbi', muxemmes û texmîs (herwiha teşîr û terdiyye), museddés û tesdîs, musebbe' û tesbî', musemmen û tesmîn, mutessa û tetsî, mu'eşşer û te'sîr, terkîbê bend û terciê bend. Ji helbestên ku ji bendan pêk tê re musemmet tê gotin. Di musemmetan de dema misraya dawî an jî her du misrayên dawî bi qafiyeyê ve were girêdan dibe "musemmeta muzdewic", lê dema ew misra an jî her du misra di her bendê de tekrar bibin dibe "musemmeta mutekerrîr".

Di dîwana Namî de 6 helbest bi teşeyê bendan hatiye honandin ku ev jî li gor teşeyê malikan rêjeyeke gelek biçûk e. Emê niha helbestên di dîwanê de ên ku ji bendan pêk tên digel mînakên wan tesbît bikin.

3.2.2.1 Murebbe'

Murebbe' tê wateya "çarîn, çargoşe"yê. Murebbe' ew teşeyê nezmê ye ku her bendeke wê ji çar misrayên hemwezn pêk tê. Murebbe' bi giştî ji 5-7 bendan pêk tê. Şeklê qafiyeya murebbe'ê wiha ye: her çar misrayên benda yekem di nava xwe de, her sê misrayên ewil ên bendên din di nava xwe de û misraya wan a çarem jî bi benda yekem re hemqafiye ye.¹⁸³ Murebbe' di edebiyata me ya klasîk de cûreyekî berbelav e.

Di dîwanê de tenê helbesta rêza 20an murebbe' e ku ew jî ji 6 bendan pêk tê.

3.2.2.2 Muxemmes

Muxemmes ew teşeyê nezmê ye ku her bendeke wê ji pênc misrayên hemwezn pêk tê. Bi giştî di navbera 4 û 8 bendan de hatine nivîsîn, lê yên ku bendên wan heta 12-13 bendan dirêj dibin jî hene.¹⁸⁴ Wekî hemî musemmetan, teşeyên wê yên muzdewic û mutekerrîr hene. Herwiha heman wekî şemayên qafiyeya musemmetên din, muxemmes jî xwedî van şemayên qafiyeyê ne:

¹⁸³ Îpekten, h. b. r. 84

¹⁸⁴ Îpekten, h. b. r. 95

Museddesa Muzdewic: aaaaaa, bbbba, cccca

Museddesa Mutekerrîr: aaaaA, bbbbaA, ccccA

Museddesa Mutekerrîr: aaaaAA, bbbbaAA, ccccAA¹⁸⁵

Di dîwanê de helbestên rêza 54 û 56an muxemmes in ku her du jî muxemmesên mutekerrîr in. Qafiyeya van her muxemmesan wiha ye: aaaaA, bbbbaA, ccccA... Muxemmesa rêza 54an ji 9 benda pêk tê û muxemmesa rêza 56an jî ji 13 bendan pêk tê.

3.2.2.3 Texmîs

Texmîs bi wateya xwe ya ferhengî “pênckirin” e. Lê wek teşeyê nezmê, li ser her malikeke xezel an jî qesîdeyeke şairekî bi heman qafiyê û kêşê sê malik zêdekirin û bi vî awayî helbesteke nû duristkirin e. Bi piranî helbestên şairên naskirî û mezin hatine texmîskirin. Divê texmîs, bi malikên texmîskirî re hev wate û lihev kirî be û ji çarçoveya mijara wê derneyê.¹⁸⁶ Qafiyeya texmîsê wiha ye: aaa(aa), bbb(ba), ccc(ca)...

Di dîwanê de texmîsek tenê heye ku ew jî helbesta rêza 3an e. Ev texmîs li helbesta Fuzûlî a bi navê “Aşiyân-ı murğ-i dil zülf-i perişanındadır” hatiye kirin. Texmîsa navborî ji 7 bendan pêk tê.¹⁸⁷

3.2.2.4 Museddes

Museddes ew teşeyê nezmê ye ku her bendeke wê ji şeş misrayên hemwezn pêk tê. Bi giştî di navbera 5 û 7 bendan de hatine nivîsîn. Xwedî teşeyên muzdewic û mutekerrîr e. Di dîwanê de bi tenê helbesta rêza 50yê museddes e ku ew jî museddesa mutekerrîr e. Ev museddes ji 5 bendan pêk tê û qafiyeya wê wiha ye: aaaaAA, bbbbaAA, ccccAA...

¹⁸⁵ M. İsen - O. Horata - M. Macit - F. Kılıç - İ. H. Aksoyak, *Eski Türk Edebiyatı El Kitabı*, Çapa 3., Ankara, 2005, r. 235

¹⁸⁶ Zahir Ertekin, “Di Edebiyata Kurdî de Texmîs û Texmîsên Mela ‘Eliyê Baqustanî’”, kovara *Mukaddime*, j. 6, s. 2012, r. 73

¹⁸⁷ Lêbelê Fehmî Beg malika dawîn ango malika ku navê Fuzûlî tê de derbas dibe texmîs nekiriye. Şiira Fuzûlî ji 7 malikan pêk tê, Fehmî Beg her 6 malikên pêşîn texmîs kirine û malika Fuzûlî a meqte‘ê bêyî navê şair li gor xwe durist kiriye. Em nizanin Fehmî Beg bê çima navê Fuzûlî nedaye, dema me helbesta Fuzûlî nas nekira me dê nizanibûya ku ev helbesta Fehmî Beg texmîsa wê ye.

3.2.2.5 Musemmen

Musemmen ew teşeyê nezmê ye ku her bendeke wê ji heşt misrayên hemwezn pêk tê. Xwedî teşeyên muzdewic û mutekerrîr e. Di dîwanê de tenê helbesta rêza 39an musemmen e ku ew jî musemmena mutekerrîr e. Qafiyeya wê wiha ye: aaaaaaaA, bbbbbbA, ccccccA... Ev mesemmen ji 9 bendan pêk tê.

3.3 CÛREYÊN NEZMÊ

Nezmên edebiyata klasîk, ji aliyê mijar û erkê ve ji hev cihê dibin. Dema cûreyên nezmê tên diyarkirin ji teşeyê bêhtir li naveroka nezmê tê nihêrîn. Teşeyê tezmê (yekeya nezmê/malik-bend, qafîye, kêş hwd.) û cûreya nezmê (naverok-mijar) du têgehên ji hevdu cihê ne.

Namî jî di dîwana xwe li ser hin cûreyan nezmê helbest honandine:

3.3.1 Munacat

Munacat bi giştî di maneya “lavakirin, libergerîn, dua, zarîn”ê de tê bikaranîn. Wek têgeheke edebiyatê jî ji wan cûre berheman re tê gotin ku tê de lavahî ji Xwedê tê kirin.¹⁸⁸ Munacat di edebiyata klasîk de xwedî cihekî berfireh e, lewra piraniya şairê klasîk munacat nivîsîne û hema bêje di hemî dîwanên muretteb de munacat hene. Namî jî di dîwanê de bi sernavê “Munacatul-Muellif” munacata xwe bi cî kiriye. Çend malik ji wê munacatê:

Ey Xaliqê heft asiman dermande yim feryadres

Sazendeê çerxê cihan dermande yim feryadres

Rehmê tu ber cumle ‘ibad dergahê tu kamê murad

Ey baniyê cah û ciyad dermande yim feryadres

Mewcûd bê bab û weled tebdîrê tu natêne ‘ed

Rezzaqê cumle nîk û bed dermande yim feryadres

¹⁸⁸ Muhsin Macit, “Münacat”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, c. 31, r. 563

Eltafê tu naên qiyas darendeê ussul-esas
Layiq te ne hemd û sipas dermande yim feryadres

Ey şafiyê zexmê elîm ey sami'ê ahê Fehîm
Ey gâfirê curmê 'ezîm dermande yim feryadres (25/1-2-3-4-5)

Divê mirov cûreyan tenê di teşeyên serbixwe de negere,¹⁸⁹ cûre di hin teşeyan de wek beş jî cî digirin. Di hin helbestên Namî de hin beşên helbestan munacat in, wek mînak:

Ya Şebûr b' ismê şebar şebrê bide bo mucteba
Hem ji wî mehcûr nedêre min di der Yewmul-ceza (5/17)

Ehmed û Mehmûd, Sedîq e hem di gel cewdet teba
Bo hebibê xwe Îlahî hem tamamê enbiya (5/18)

3.3.2 Ne'et

Ne'et ew cûre helbest in ku tê de pesnê Hz. Pêxember tê dayin, bi wesifandinê hezkirina li hember wî tê nîşandayin¹⁹⁰ û jê şefaet tê xwestin. Ne'et jî wek munacatê di tertîba dîwanan de xwedî cihekî taybet e. Ji bo şairên klasîk nivîsîna ne'etan wek kevneşopiyekê ye. Çavkaniya ne'etê evîn û hezkirina li hember Pêxember e. Wekî dixuyê li bal Namî evîna pêxember û ya ehlê wî zêde ye ku wî du ne'etên musteqîl û mersiyyek jî li ser neviyê Pêxember Hz. Huseyn nivîsîne. Di dîwanê de helbestên 39 û 51ê ne'et in; ji van ne'eta yekem bi teşeyê musemmenê hatiye honandin, qîteyek ji wê:

Şafi'ê zenbê giran î hamiê roja 'esîr
Mehderê me 'aşîyan î bal ewî Şahê Qedîr

¹⁸⁹ Metin Akkuş, "Türk Edebiyatında Türlerin Tasnifi ve Divan Edebiyatında Tasnif Problemi", *Osmanlı Edebiyat Araştırmaları*, Atatürk Üniv. Fen-Ed. Fak. Yay. Erzurum, 2000, r. 23

¹⁹⁰ Cemal Kurnaz, "Dini Edebiyat Türleri ve Dini Edebiyatımızın Bugünü Hakkında Düşünceler", *Divan Edebiyatı Yazıları*, Akçağ Yayınları, Ankara, 1997, r. 278

Ya Nebîyallah ricakar im nekî tu min ji bîr
Abê rûyê xwe me rihtiyye di van curmê keşîr

Min di dest nîne çiragê ta‘etê Rebbê xebîr
Lê umîda min tu yî her ey Muzemmil ey Beşîr

Der ewê roja ku sultân û melîk tê da esîr
Ya Resûlellah dexîlek ya Ebeţ-Şahir dexîl (39/2)

Ne‘eta din ku bi cûreyê qesîdeyê hatiye honandin, helbesteke kurt a 5 malikî
ye:

Bextê min her çend reş e tali‘ di başîn yawer e
Rehberê min pêşrewê min zâtê Şahê Xeyber e (51/1)

Fexrê ‘Alem an Hebîbê Kibriya şafi‘ me ra
Naêtin weşf û beyanê ni‘metullahê ekbere (51/2)

Lewhê dil ez ‘eşqê wî belkî ji mêj gulgûn bû
Der dehan namê wî lewra min wurûd û ezber e (51/4)

3.3.3 Mersiye

Mersiye tê maneya nivîsîna menzûmeya li ser kesekî mirî.¹⁹¹ Di edebiyata klasîk de mersiye ew helbestên lirîk in ku tê de aliyên qenc ên mirî û xem û kesera li dû mirina wî tê îfadekirin.¹⁹² Mijara şîngerandinê û mersiyeyê yek e; di herduyan de ji felekê şikayet, pesn û dua mijarên sereke ne.

Fehmî Beg bi giştî li ser 4 kesan mersiye nivîsîne: Hz. Huseyn, Şêx Seîdê Pîran, birayê xwe Cewdet û keça xwe Fikriye.

¹⁹¹ M. Nihat Özön, *Resimli Büyük Türk Dili Sözlüğü*, Arkın Kitabevi, İstanbul, 1971, r. 432

¹⁹² Mustafa İsen, *Acıyı Bal Eylemek Türk Edebiyatında Mersiye*, Akçağ yay. Ankara, 1993, r. 13

Mersiyeyên li ser Kerbelayê di nav cûreyê mersiyeyan de cihekî girîng digirin û ev cûre menzûme bi taybetî wek “meqtel” tên binavkirin. Meqtel, ku koka wê peyva “qetl”ê ye, tê maneya “cihê qetilkirina yekî an jî dema qetilkirina yekî; bi xeddarane qetilkirin; şerê ku dibe sebeba qetlan”.¹⁹³ Mersiyeyên Kerbelayê/meqtel ew cûre mersiye ne ku li ser şhadeta Hz Huseyn û ya hevrêyên wî yên ku di ber neviyê Pêxember Hz Huseyn û Ehlê Beytê de canê xwe feda kirine tê nivîsîn. Di edebiyata Kurdî de zêde helbest li ser Hezretî Huseyn û bûyera Kerbelayê wî nehatine nivîsîn. Li gor zanînên îro di edebiyata Kurdî (Kurmancî) de pêşiyê Şêx Ebdurrehmanê Axtepe (dûre hin şairên ji malbata Axtepeyan) li ser Hz. Huseyn wî û bûyera Kerbelayê helbest nivîsiye. Fehmî Beg di vê mijarê de ji Şêx Ebdurehman bandor girtiye yan negirtiye em nizanin¹⁹⁴, lê li gor neqla Hîdayet Begê kurê Fehmî Beg wî menzûmeya şair Fuzûlî a “Hedîqetus-Sueda” ku li ser şehîdên Kerbelayê hatiye nivîsîn gelek hez dikir û dixwend. Namî li ser Hz Huseyn û bûyera Kerbelayê mersiyeyeke 17 malik a dilsotîner nivîsiye. Namî xuya ye ji ber bandorgiriya ji bûyera Kerbelayê (ku malbata wî jî bi şibhê vê bûyerê tev tên qetilkirin) û ji ber hezkirina xwe ya li hember Hz Huseyn ku wî wek “Şahê Delal” bi nav dixe evê mersiyeya edebî dinivîse, ji wê mersiyeyê çend malik:

Rewneqê fushetsarayê Muştefa yî ya Huseyn
Werdê der gulşennewayê dilkula yî ya Huseyn (43/1)

Serwerê koma şehîdan aşinaê qurbê heq
Şahibazê şahiqê alê ‘eba yî ya Huseyn (43/4)

Ba‘işê xûndem‘ê çeşmê dûribînanê duhûr
Pêşîwaê cumle merdên canfida yî ya Huseyn (43/9)

Sengê meydanê şeca‘et cûyê kanê me‘rifet
Şaxê şemşadê gulistanê sexa yî ya Huseyn (43/10)

¹⁹³ Şeyma Güngör, “Maktel”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, c. 27, r. 455

¹⁹⁴ Herdu şair jî ji heman herêmê ne û herwiha li gor Hîdayet Beg “Rewdu Neîm”a Şêx Ebdurehman li bal bavê wî hebû û wî jê hez dikir û dixwend.

Wekî di beşa jiyana wî de jî borî, malbata Fehmî Beg tevli Hereketa 1925an bûne û tevan jî jê xisar dîtine. Piştî Serhildanê jiyana Fehmî Beg dikeve mecrayeke din û maddî-manewî jê bandordar dibe, digel vê hurmet û hezkirina wî û malbata wî a li hember Şêx Seîd kê mabe. Fehmî Beg di helbestên xwe de wî dike mijar û du helbestan li ser wî dihone; di wan yekê pesnê wî dide (medhiye) û di yekê jî şîna wî digerîne. Ji mersiyya ku li ser Şêx Seîd hatî nivîsîn 5 malikên ewil:

Şumara ahê dil nîne elemdar im ji hicranê
Ji mehcûrî me dil ker bû dîkin lew ah û efğanê

Fiğan û naleyan her dem dîkit ev rûhê purmurde
Meded min dil ez înan ahan kebab e şubhê buryanê

Cîger şîşa kebabê ye li ser narê firaqa wî
Di hicranê lehebsaz im be'îdê rewşen û 'anê

Be'îd ez durrê yekta û we hem dîdarê fermah im
Şecî'ek na murad im ez gerîbê qurb û dîwanê

Li meylakê dibarin tîr ji burca furqeda Palo
Enîsê balê feryad in wekî murgê şebustanê (61/1-2-3-4-5)

Birayê Fehmî Beg yê ji wî piçûktir yê bi navê Cewdet di 1948an de wefat dike û ev wefat gelek lê giran tê, ji ber vê daxdariyê ew mersiyyekê li ser wî dihone. Ji wê mersiyyê çend malik:

Dil kul kirim cewrê felek ah û enîn ah û enîn
Kan naxuyan çeşmê belek ah û enîn ah û enîn

Şed heyfê lêvê şekkirîn çûn û we êdî naxuyên
Qelb û cîger pê bûne xwîn ah û enîn ah û enîn

Ah û fiğan û şed hewar gaziy û nalîn bê qerar
Dil xûn kırım hicra geddar ah û enîn ah û enîn

Zulma felek mehcûr kırım nalende û rencûr kırım
Anîm di hev de hûr kırım ah û enîn ah û enîn

Ey dilbera zalim çira hunda te kir şîrîn bira
Dilkul te hiştîm bê çira ah û enîn ah û enîn (47/1-2-3-4-5)

Keça Fehmî Beg a bi navê Fikriye di temenê 18 salî de koçî dinyaya din dîke û Fehmî Beg bi zimanekî sivik bo şîna wê ku jê re dibêje “Kewa min”, mersiyeyekê dihene. Ev mersiye di nav dîwanê de nebû, me ew ji derveyî dîwanê peyda kir. Ji mersiyeya li ser Fikriyeyê çend malik:

Kewekî min di rewqa çigerê de bû firî
Me du çav mane li seyra ufuqan ka zivirî?

Buhurîn peyre gelek roj û meh û hefte û sal
Hê nehat şenga dilê jar û neçar û kesirî

Qediya sebr û qerara me ji hicran û xemê
Kêf û dilxweşî û zewqa me bi kerbê gewurî

Esef û tehlî û diltengî ye karê me her roj
Roj û gavê me qe neçin carek bê ah û girî

Dilê me j' derd û xemê bûye tijî dax û birîn
Bi evê zexmê nesax im ta bi kilê kevîrî (68/1-2-3-4-5)

3.3.4 Medhiye

Medhiye ku di ferhengê de tê maneyên pesndan, behskirina qencîya yekî û medihkirina yekî, di edebiyata klasîk de ji cûre û awayê vegotinekê re tê gotin.¹⁹⁵ Hem ji bo pêşdahtiyê dewletê ê wek padişah, wezîr û şêxulîslam hem ji bo 4 xelîfe û serokên terîqetan û dîn tê nivîsîn.¹⁹⁶

Bandora Şêx Seîdê Pîran li ser Fehmî Beg tim hebûye ku wî hem mersiye û hem medhiye li Şêx Seîd nivîsîne. Herçendî navê Şêx Seîd di vê helbestê de nabore jî, lê ji ber naverokê û ji ber gotina “Tu dimînî ez diçim bal şehre Pîran elweda” em fehm dikin ku helbest li ser Şêx Seîd e. Çend malik ji wê medhiyeya ku li ser Şêx Seîd hatiye nivîsîn:

Ey şebabet ey hevalê razê punhan elweda‘
Tu dimînî ez diçim bal şehre Pîran elweda‘ (31/1)

Ey enîsê dilrubayan ferr û tabê can û dil
Melceê renc û meşaqan rengê rûyan elweda‘ (31/6)

Ey emînê şeng û şoxê, ey şidaqê muhrîşan
Musterah û hem şuûnê keçkulahan elweda‘ (31/7)

Genc û ebnarê durûd î bê şumar û layu‘ed
Hemneşînê heşret û kerba hunavan elweda‘ (31/10)

Hin fîgurên millî ên Kurdan hene ku piraniya şairên Kurd li ser wan helbest honandine, ji wan fîgurên millî yek jî bêguman Mela Mistefayê Barzanî ye. Di navbera 1940an û 1970an de ji ber çalakiyên wî Mela Mistefa yê millî gelek şairan ew ji helbestên xwe re kirine mijar û pesnê wî dane. Dema ku di 1946an de Komara Kurdistanê a navenda wê li Mehabadê bû têk diçe, hêzê Kurdan tev belav dibin û

¹⁹⁵ Reyhan Keleş, “Örneklerle Türk Edebiyatında Medhiye”, *Selçuk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 2009, j.: 22, r. 216

¹⁹⁶ Dilçin, h. b., r. 263

Mela Mistefa tevî hevrêyên xwe berê xwe didin Rûsyayê. Mela Mistefa 12 salan li Rûsyayê wek penaber dimîne û di vî maweyî de hêvî û xeyalê Kurdan dişikên û serdemeke bêdengiyê çêdibe. Lê dema ku li Iraqê kûdeta/derbe çêdibê û Mela Mistefa di 1958an de ji Rûsyayê vedigere dîsa di nav Kurdan de hêvî û coşeke nû dest pê dike. Fehmî Beg jî ku netewperwerekî Kurdan ê wê demê ye, pir şa dibe û lê hêvî û kelecaneke nû peyda dibe. Tam di vê esnayê de Fehmî Beg li ser Barzanî medhiyeyekê dihone û bi gotina “Bi xêr hatî Emîrzade” hatina wî ya ji Rûsyayê pîroz dike. Ev medhiye di dîwana muretteb de tunebû, me ji derveyî dîwanê peyda kir, jixwe di dema nivîsîna vê helbestê de Fehmî Beg dîwan qedandibû. Ji wê medhiyeyê çend malik:

Bixêr hatî Emîrzade li ser çavên xulamê xwo
Çi xweş dewlet bû ev rade me dî ‘er‘er-xiramê xwo

Me dî şîrîn kelama dil dewa û darûwê aqil
Rû wê neşmî wekî sorgul di vî weqtê nekamê xwo

Di vê anê tenê mahî ne zewq û suhbet û şahî
Ji dil her îltifatxwah î di halê der melamê xwo

Di halê ye’sê mexmûmî her ro her ah û medyûmî
Xeber gohî ne mefhûmî ji ber êş û xeramê xwo (67/1-2-3-4)

3.4 WEZN

Wezn/kêş li gor fonetîka zimanê Erebi kurtî û dirêjîya hêceyan e. Wezna ji hinek qalib/pîvanên diyar pêk tê. Di lîteratûra edebiyata klasîk de ji van pîvanên ku helbestek an jî menzûmeyek ji serî heta dawiyê li gorî wan tê honandin re pîvanên wezna erûzê tê gotin.¹⁹⁷ Namî çawa di dîwana xwe rîayetî hemî rêzikên helbesta klasîk kiriye, wisa jî li seranserê dîwanê rîayetî wezna erûzê kiriye.

¹⁹⁷ Adak, h.b., r. 330

Wekî edebiyatên klasîk ên hemî gelên Îslamî, di edebiyata Kurdî a klasîk de jî wezna erûzê serdest û berbelav bûye. Li gor kêşa erûzê, hemî misrayên helbestekê li gor qalibekî erûzê tene nivîsîn. Her qalibekî erûzê ji sê yan çar parçeyan pêk tê û her yek ji van parçeyan di lîteratûra erûzê de wek “tefîle” tene binavkirin. Li gor vê, eger qalibek ji sê parçeyan pêk bê, tê gotin ku ew qalib ji sê tefîleyan pêk tê.¹⁹⁸ Bi guherîna van tefîleyan re ageng û rîtm helbestê jî diguhere, lewra kêşa erûzê ilmekî bi dengê heceyan û bêhereke û herekedariya herfan re têkilldar e. Bi ser hev 8 tefîle¹⁹⁹ hene û ji van jî 16 behr pêk tene.

Namî 68 heb helbestên xwe bi 5 behrên erûzê ve nivîsîne. Herwiha wî li ser hev 8 qalibên van behran bi kar anîye. Ji behra hezecê 3 qalib, ji behra remelê 2 qalib, ji behrên recez, muzari‘ û muteqaribê her yekê qalibek bi kar anîye. Namî bi giştî qalibên çar tefîle tercîh kirine, wî qalibên du tefîle qet bi kar neanîne, qalibên sê tefîle jî tenê di helbestekê de bi kar anîye (helb. 32). Çawa ku di edebiyata Kurdî a klasîk de herî zêde behrên remel, recez û hezec hatine bikaranîn, di dîwana Namî de jî ji 68 helbestan 65 heb bi van sê behran hatine ristîn. Dema em bi giştî dêhna xwe didine dîwanê, em dibînin ku Namî di hêla erûzê de xurt e û zêde serî li îmale û zîhafan nedaye. Niha emê li jêrê tabloya behr û qalibên erûzê ên di dîwanê de hatine bikaranîn bidin:

BEHR		QALIB	HEJMARA BIKARANÎNÊ	
			Hejmara Helbestan	Yekûna Helbestan
Remel	1	Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa’ilun	30	35
	2	Fe‘ilatun fe‘ilatun fe‘ilatun fe‘ilun	5	
Recez	1	Mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun	17	17
Hezec	1	Mefa‘ilun mefa‘ilun mefa‘ilun mefa‘ilun	10	

¹⁹⁸ Adak, h.b., r. 332

¹⁹⁹ Fe‘ûlun, fa‘ûlun, fa‘ilatun, mefa‘ilun, mustef‘ilun, mef‘ûlatu, mufa‘eletun û mutefa‘ilun.

	2	Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun	2	13
	3	Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	1	
Muzari'	1	Mef'ûlu fa'îlatun mef'ûlu fa'îlâtun	2	2
Muteqarib	1	Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ul	1	1

Tablo 2 Ev tablo behr û qalibên erûzê yê ku di dîwanê de hatine bikaranîn, nîşan dide.

3.5 QAFIYE

Qafiye (serwa) nîzama estetîk a deng, peyv û redîfan e ku li dawîya risteyan (misra) tê bikaranîn. Qafiye lihevkirina dengên e û xîtabî çavan dike, lewra gelek caran ji bo lêhatina qafiyeyê, dema pêyvên hevdeng ên zimanê menzûmeyê lê neyê, peyvên ji zimanên din tên bikaranîn. Qafiye her wekî weznê di helbestê de hêmaneke ahengê ye, herwiha qafiye di kifşkirina teşeyên nezmê de jî roleke sereke dilîze û hin teş bi wê ji hev tên veqetandin. Dema ku di navbera peyvên helbestê de hem ji aliyê deng hem ji aliyê maneyê ve ahengek hebe, hingê qafiye watedartir û karîgertir dibe.

Bi gotineke din qafiye, hevşibîna dengên heceya dawîn a peyvên dawîya misrayan e. Ji dengê dawîn ê ku di dawîya misrayan de tê dubarekirin re “rewî” tê gotin. Li gorî hevşibîna dengên dawîya misrayan du cûreyên qafiyeyê hene: qafiyeya mucerred û qafiyeya murekkeb. Ya qafiyeya murekkeb jî sê cûreyên wê hene: qafiyeya murdef, qafiyeya muqeyyed û qafiyeya muesses.

3.5.1 Qafiyeya Mucerred

Qafiyeya mucerred ji dubarekirina herfa dawiyê tenê pêk tê. Di qafiyeya mucerred de herfa dawiyê bê hereke ye û berî wê herfeke bi hereke heye.²⁰⁰ Wek mînak:

Heyhat ji derba firqetê nalende ma cerg û kezeb

Sohtîne narê heşretê der dil vebûne şed neqeb (7/1)

²⁰⁰ Adak, h. b., r. 360

Di dîwana Namî de ev helbestên han bi qafiyeya mucerred hatine tesîskirin: 7, 13, 16, 20, 26, 29, 32, 34, 37, 51, 58, 59, 60, 64, 65, 66 û 68.

3.5.2 Qafiyeya Murekkeb

Ji bilî herfa rewiye, bi tekrarbûna herfeke qafiyeyê ê beriya rewiye pêk tê. Li gor herfa beriya rewiye sê cûreyên qafiyeya murekkeb hene. Ji xeynî 17 helbestên bi qafiyeya mucerred ên jor, helbestên din tev bi qafiyeya murekkeb hatine rastin.

3.5.2.1 Qafiyeya Murdef

Qafiyeya murdef ew qafiye ye ku beriya rewiye ji herfên rîdfê (a, û, î) herfek tê.²⁰¹ Çend nimûne ji dîwanê bo qafiyeya murdef:

Saqî Xweda ra badeê bîne ez an le'lê zulal
Der zerfê an şehkaseê, dil teşneê camê wişal (40,1)

Sed xwezî ba an demanê bejnê yar menzûr bû
Bal û hiş min ba çiragê ru'yetan pur nûr bû (54/1)

Ey dilo werda biçîn em rewzê ruxsarê hebîb
Tê bikin seyr û temaşa pur ji wî maîn gerîb (8/1)

3.5.2.2 Qafiyeya Muqeyyed

Qafiyeya muqeyyed, beriya herfa rewiye dubarekirina herfên hemcins ên bêhereke ne²⁰² ku wek qeyd tîn binavkirin; her wekî “mest” û “elest”; “şeng” û “şeng”... Ev helbestên han bi qafiyeya muqeyyed hatine nivîsîn: 10, 14, 15, 19, 38 û 41. Çend nimûne ji dîwanê bo qafiyeya muqeyyed:

Goftem bi hicret dilkul im derdê me ra derman çîst
Goft an bi hicran dilkulan nîk haziqani dewa' nîst (10/1)

²⁰¹ Muhsin Macit, Uğur Soldan, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı*, Grafiker Yayınları, 8. Baskı, Ankara, 2016, r. 236

²⁰² Adak, h. b., 361

Kan dem û dewranê şadî, şuhbet û **bezmê** lîzaz
Kan surûrê ber muradî, cunbuş û **kedmê** lîzaz (19/1)

Dîsan ji qewseynê ebrûyan tîn cerg û mil tîr û **xedeng**
Amancê wan tîrên nihan dil min nemaye lewn û **reng** (38/1)

3.5.2.3 Qafiyeya Muesses

Eger beriya rewiye herfeke bi hereke û berî wê jî elîfek hebe qafiyeya muesses tê meydanê. Li gor diyarkirina Adak di edebiyata Kurdî a klasîk de bi vî cûreyî helbest kêr in ku wî jî ji ber nebûnê ji bo vî cûreyî tu mînak nedaye di kitaba xwe ya li ser edebiyata Kurdî a klasîk.²⁰³ Di dîwana Namî de bi qafiyeya muesses helbest hatine nivîsîn, wek mînak;

Zewq û eyyamên surûrê xetim bûn ah û fiğan
Şem‘ê îqbalet tefaye newbê **îdbaret** resîd (17/7)

Seylê gem amed be nagah mulkê dil texrîbi kerd
Çûn me weşl û şadimanî suflê **hergamet** resîd (17/8)

Coyê xûnînê rewan tîn ma ji çeşmê eşkibar
Mewcê tofanê durûdan wê bi **mujganet** resîd (17/9)

Digel van cûre qafiyeyan, di hin helbestan de ji xeynî qafiyeya dawîya risteyan, qafiyeya navekî jî heye. Ji helbestên du qafiyeyan re *zû-qafiyeteyn* tê gotin. Herwiha hin helbest jî hene ji du qafiyeyan zêdetir qafiyeyên wê hene ku ji wan re cûre helbestan re jî *zul-qewafî* tê gotin.²⁰⁴ Di dîwana Namî de di gelek helbestan de cûreyê *zû-qafiyeteyn* hene. Bo helbestên *zû-qafiyeteyn* du mînak; herwiha wekî van mînakên li jêr di hin helbestan de digel du qafiyeyan du redîf jî hatine bikaranîn:

Bê ‘eql û pur megrûr *e ew*, her çî ji dil bê **yarê çerx**

²⁰³ Adak, h. b., r. 361

²⁰⁴ Macit - Soldan, h. b., r. 237

Der ‘eqdê xwe megdûr e ew xefbestê zennarê çerx (14/1)

Ev sorgul e yan sûret e yan şûşê gulab e ev

Yan hûsn û anê fişret e ev, mah e yan mehtab e ev (35/1)

3.6 REDÎF

Di edebiyata klasîk de redîf (paşserwa) ku tamamkera qafiyeyê ye, xala navendî a aheng û maneyê ye. Redîf her cûre tekrarên piştî qafiyeyê û di dawiya misrayan cî digirin re tê gotin. Ji helbestên bi redîf re mureddef tê gotin.²⁰⁵ Redîf bi çend awayan di dawiya misrayan de cî digirin; 1. Qertaf, 2. Qertaf û bêje/kombêje 3. Tenê bêje/kombêje. Bi taybetî divê di navbera redîfên bi awayê bêje/kombêje û mijara metnê de têkiliyek hebe. Gelek caran mijara metnê redîfê diyar dike.²⁰⁶ Ji ber vê ye, redîfên ku hatî bikaranîn nêrîn û meşreba şair jî dide der.

Di helbestên nezîrekirî de hebûna redîfên muşterek tiştêkî asayî ye.²⁰⁷ Lewra redîfên helbestên Namî ên li şairên biyanî nezîrekirî, bi giştî bêjeyên biyanî ne. Lêbelê cûre redîfên ku Namî bixwe çêkirine jî gelek in. Mirov bi rehetî dikare bêje ku ji aliyê redîfên nû ve dîwana wî dewlemend e. Helbet hin wek cûreyekê hin helbestên wî bê redîf in. Di dîwana Namî de hemû cûreyên redîfan cî digirin.

Nimûne ji bo redîfên di awayê qertafan de ne:

Dilo dîsan bi gem bûyî di alamên giranbare

Bi dağan pur elem bûyî ze’îf û kemdem û jare (49/1)

Nimûne ji bo redîfên di awayê qertaf û kombêjeyan de nin (qertaf : “î” û kombêje: “çi ye hez”):

Di vê halê esefara dil û canî **çi ye hez**

Ji heyatê bi nişara hiş û danî **çi ye hez** (30/1)

²⁰⁵ Adak, h. b., 362

²⁰⁶ Macit - Soldan, h. b., r. 240

²⁰⁷ Bikaranîna peyvên biyanî a ji bo redîfê, bêhtir di helbestên li şairên biyanî nezîrekirî de dertê pêşiya me, lewra şair redîfên muşterek diemilîne di helbesta xwe de.

Nimûne ji bo redîfên tenê di awayê bêje/kombêjeyan de nin:

Ey şebabet ey hevalê razê punhan **elweda‘**

Tu dimînî ez diçim bal şehre Pîran **elweda‘** (31/1)

Di dîwanê li hin cihan pirsgirêkên redîfê hene ku li wan deran qusûra şair heye. Yanî şair rîayetî rêzikên redîfê nekiriye. Wek mînak di malika jêrê qertaf û bêjeya “ê min” redîf e, lê şair di misraya yekem de bêjeya “di” xistiye navbera wan. Di rastiya xwe de divê tu bêjeyek nekeve navbera pêvekên redîfê:

Hey felek dîsa te kul kir cerg û nalanê di **min**

Agirek tê de te hil kir herîşîn kovanê **min** (45/1)

BEŞA ÇAREM

METNÊ DÎWANA NAMÎ

4.1 DI AMADEKIRINA METNÊ DÎWANÊ DE RÊBAZA HATÎ ŞOPANDIN Û DANASÎNA DESTXETÊ DÎWANÊ

4.1.1 Di Amadekirina Metnê Dîwanê de Rêbaza ku Hatiye Şopandin

Metnê dîwanê yê bi tîpên Erebî-Kurdî li gorî rêbaz û dustûrên transkrîpsiyana navneteweyî hatin latînîzekirin. Digel vê hin xalên din ku hatine şopandin ev in:

1. Tu peyv û îzafeyeke di dîwanê de li gor zimanê îroyîn nehate standartkirin. Peyv û îzafê çawa boriye wisa hatiye latînîzekirin. Di vê mijarê heta ji dest hatiye rîayet û pêgirî hatiye nîşandan.

2. Li serê her helbestê wezna erûzê ya helbestê hat dayin.

3. Wekî şair jî di fihristê de jî diyar kiribû, risteya ewil ya her helbestê wek navê wê helbestê hat nivîsîn.

4. Ji bo her helbestê jimarek hat dayin. Herwiha malikên her helbestê jî di navbera xwe de hatin jimarekirin. Ev rêbaz ji bo dîtina helbest û malikan û ji bo dîtina qewareya helbestan karekî zerûrî ye.

5. Maneya Kurdî ya malik û misrayên bi Erebî û Farisî di jêrenotan de hatin dayin. Herwiha herdu helbestên Erebî bi temamî hatin wergerandin û di jêrenotê de hatin dayin. Digel vê misra û malikên bi Erebî û Farisî di metnê dîwanê de îtalîk hatin nivîsîn.

6. Di alfabeya Erebî-Kurdî ya klasîk de tîpa “ج”yê hem dengê “û” hem dengê “o” dide, di dema transkrîpsiyonê de me li gor konteks û koka pevyê ji wan dangan yek wergirt. Herwiha şair herçendî li gelek cihan ji bo dengê “ê”yê tîpa “ع”yê bi kar

anîbe jî li hin ciha tîpa “ى”yê (yanî ‘î’) bi kar anîbû, di rewşên wiha de me dîsa li gor konteksa peyvê li hin cihan “ê” û li hin cihan “î” bi kar anî.

7. Di berhemên klasîk de xalbendî tune, lê me li hin cihan xalbendî bi kar anîn (lê zêde kirin). Ev ji ber du sebebên bû; 1. Ji bo pêşiya tevliheviya maneyê û xeletfahmkirinê bê girtin li hin cihan bêhnok (,) hat bikaranîn. 2. Ji bo hin îfadeyên pirs û bangê rehet bîr ferqkirin li hin cihan hatin pirsêşan (?) û baneşan (!) bikaranîn.

8. Şeddeyên li ser tîpên Erebî bi dubarekirina heman tîpê hat nîşandan. Mînak; “şeyyad”, “muellam”, “geddar” hwd. Dîsa şair di dîwanê de ji ber zerûreta erûzê li ser hin peyvên Kurdî jî şedde danîbû, me ew jî her wisa bi dubareya tîpê da. Mînak; “xewwar”, “çille”, “dill” hwd. Wekî di me ji ber xwe tu tîpek bi şeddeyê nîşan neda.

9. Serê herfa her nav û nîşana taybet bi tîpa mezin hate nivîsîn.

10. Di terkîbên îzafe û sifetê yê Erebî de tîpa hemzeyê bi dabirê (‘) hat nîşandan û di navbera herdu peyvên de jî xêz (-) hat bikaranîn. Mînak; “daru’l-beqa”, “xeyru’l-wera” hwd.

11. Ji ber tekûzkirina weznê erûzê me “î”ya kurt û îtalîkkirî li cihên hewce danîn. Ev “î” di eslê peyvê de tune, dema ku erûzê lê neyê şair “î”yeke ferezî yan di nava peyvê de yan di dawîya peyvê de difikire. Ji ber ku di rênivîsa klasîk de tîpa “î”yê nayê nivîsîn, ew peyv wek xwe (yanî beyî ‘î’) tên nivîsîn. Lêbelê di alfabeya Latîni de tîpa “î”yê tê nivîsîn, ji ber wê me di metnê traskrîbekirî de ev “î” nivîsî. Mînak; “asiyab”, “dasitan”, “me’lûlî”, “dermanî” hwd.

12. Ji bo rehetfahmkirinê me xêzîkek (-) danî navbera du peyvên (navên) ku ji wan sifet hatibûn çêkirin. Mînak; “perî-mehweş”, “Tûba-nihal”, “peyker-perî” hwd.

13. Ji ber ku hinek helbest piştî qedandina destxetê li dîwanê hatibûn zêdekirin, tertîba rêza qafiyeyê şikestibû. Me helbestên ku ne li gor rêza dîwanê bûn di metnê transkrîbeyî de li gor rêzê qafiyeyê rast kirin.

4.1.2 Danasîna Destxetê Dîwanê

Ev dîwan tenha berhema Fehmî Beg e. Li gor malbatê Fehmî Beg ji xwe re keşkûlek jî durist kiribû, lê dema ku gundê wan Pêçar di sala 1993an de tê şawitandin

digel kitêbên wî yên din ew keşkûl jî dişewite. Dîwan jî ji ber ku li bal eqrebayeka wan bûye ji şewatê difilite.

Tenê nusxeyeke dîwana Fehmî Begê Pêçarî (Namî), *Meğmuru'd-Dewawîn*, heye ku ew jî nusxeya muellif bixwe ye. Ev nusxe bi destê şair bixwe hatiye nivîsîn û orîjînalê wê di destê malbatê de ye. Em di dema xebata xwe de li ser fotokopî û dijîtala heman nusxeyê xebitîn, lê me destxeta resen jî dît.

Destxet li Liceyê (Diyarbakir) hatiye îstinsaxkirin û di defterekê de serbixwe cih digire. Di serlewheya dîwanê de wiha hatiye nivîsîn: “Ya Xenî ya Muxnî”, ‘Meğmuru'd-Dewawîn’, ‘Namiyu'l-Pêçarî’, ‘Xeferallahu zenbe’”. Herwiha serlewheya dîwanê bi neqş û xeml hatiye çêkirin û du gulên mezin li dora van nivîsan hatine çêkirin. Piştî serlewheyê ango di destpêka helbestan de besmele heye. Di serê her helbestê de navê qafiyeyê hatiye nivîsîn, herwiha di serê hin helbestan de agahiyeke ji bilî navê qafiyeyê cî digire, wekî agahiya nezîreya li helbesta kesekî yan jî mersiyeya li ser kesekî. Piştî xilasbûna dîwanê bi maneya temambûnê “temmet” hatiye, lê ev agahî li sê cihan cî digire.

Şair dema di beşa “Dua”yê de dîroka temamkirina dîwanê dide, wiha dibêje: “bi ‘ewn û ‘inayeta Xudayê mute‘al tamam bo nivîsana me di salê hezar û sêsed û heftê û pênc ji tarîxê Hicrî di mahê Şe‘banê şerîf di rozê Sebtê di weqtê zewalê...” Yanî dîwan bi hesabê Hicrî, di meha Şe‘banê ya sala 1375an de roja Sebtê (Şemî) wextê esrê hatiye qedandin ku bi hesabê Mîladî di 24ê Adara 1956an de tamam bûye. Ev dîroka 1956an li du sê cihên din jî hatine nivîsîn. Lê paşê şair çend helbestên din li dîwanê zêde dike û li binê helbestekê jî vê dîrokê dide: “8ê Kanûnê Sanî 77”. Di teqwîma Hicrî de di nav mehan de meha “Kanûnê Sanî” tune, lê ev meh di teqwîma Romî û Mîladî de hene. Meh dibe wek teqwîmên Romî-Mîladî hatibe qeydkirin, lê sal li gor teqwîma Hicrî ye ku ew jî beramberî sala 1958an e. Lêbelê emê dîroka yekem qebûl bikin, lewra esas metn wê çaxê qediyaye, tenê çend helbest paşê li dîwanê hatine zêdekirin. Divê bê diyarkirin ku xetê van helbestên paşê lê hatine zêdekirin ji xetê ewil cuda ye. Xetê van helbestên dawî zêde pê ehemmiyet nehatiye dayin û xeml û desen li dora wan tune, herwiha tenê hubra reş di wan de hatiye bikaranîn.

Destxet bi awayekî tam û tekûz e û hemî rûpelên wê parastî mane. Destxet di deftereke ebadên wê 18x24 de hatiye nivîsîn û rengê kaxezê spî ye. Zimanê destxetê

Kurdî/Kurmancî ye û ji xeynî beşa “Dua”yê hemî menzûm e. Beşa Duayê ku bi qasî niv rûpelî ye, mensûr e. Xetê destnivîsê, xeteke têkel a şexsî ye û teybetiyên cûreyên nesx, rîq‘e û telîqê tê de dixuyên. Xetê nivîsê bi hubra reş e û herekekirin bi hubra sor e. Herwiha li dora xetan bi rengê kesk, sor, zer û şîn xeml û neqş hatine kirin. Li kêleka risteya, navbera risteyan, serê beşan, dora rûpelan hwd neqş û desen zêde ne û berhem bi yaldizê hatiye tezhîbkirin. Li rexê rêzên xetan hin caran bi hubra sor ayet, hedîs, gotinên pêşiyar, gotinên nivîskarên navdar hwd hatine nivîsîn. Di hemû rûpelan de li her çar kenaran cedweleke duxêzî heye û stûn û xêzên di nava rûpelê jî sê yan jî çar cedwel in.

Şair li cihekê tenê derkenar/jêrenot daniye ku ew jî ji ber xelet nivîsîna malikekê ye; şair dema dest bi îstinsaxkirina/rûnîsîna helbesteke kiriye bi xeletî malika helbesta ewil nivîsiye, ji ber wê vê jêrenotê ji bo hişyarkirina xwendox û bîneran dide: “Vê ferda hanê bi sehwa hatiye wezi’kirin, li vê derê mukerrer e, ne ji ferdê xezelê atî ye. Me‘lûm bit ji bo cumle xwendox û naziran.”

Di berhemê 62 helbestên şair hene ku ew jî 924 malik/bend dikan. Herwiha 6 malikên şair ên li derveyî berhemê jî 57 malik dikan. Berhem li gor rêzbendiya pirtûkên metbû bi jimarên Erebi hatiye jimarekirin û li ser hev jî 79 rûpelan pêk tê. Peyva te‘qîbê li binê her rûpelê heye. Şair li ser hin peyvên zor û kêmnas bi hubreke sor maneya wan a nasyar nivîsîne ku ev jî wek ferheng dikare bê qebûlkin.

4.2 METNÊ DÎWANA NAMÎ

QAFIYETU'L-ELIF

1. Dîbaceê Meğmûru'd-Dewawîn

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Ellah çi zatek qadir e mahir di tedbîra xwe da
Lewn û liyaqet sair e **cî kir** di cîmên cilwe da
2. Lamên çu le'lê durfeşan aşûbê edwar û zeman
Aram û îfnaê dilan xef da di 'eynê perde da
3. Hil kir ji nûrê narê dil ber xilqetê în hişk û şil
Lewhê hurûfên mu'tedil anî wucûd û nuqte da
4. Terhê çu gul tê afirand ba terzê dilkeş neqqişand
Yumnê celadet lê civand wek afitabê şu'le da
5. Feyzek nihan da şu'leê avête puşta perdeê
Berqek ez û da nuqteê dalan û tê da lem'e da
6. 'Alem heme kir pur xiyal z' an qîtreê afet-mişal
Bang û şela û nalenal **ji** ber tîbaqê tis'e da
7. Erbabê tedqîqê nukat maîn di seyranê şîfat
Der kahinan ma mest û mat telpek li bedrê hale da
8. Hingî bi hev bûn muttesil nabin ebed ew munfeşil
Yadê hinan ma munfe'il komek muxalif helqe da
9. Reybê beqa ma der cîger pê xweş kirin de'wa û şer
Zenga 'inadan girte ser cî cî 'enaşir firqe da
10. Qefla tîlismên zîweran ma der fusûna efseran
Meyla evîna mehferan girtî cihat û fuqre da
11. Nîl û meqaşid hate coş rabûne reqşê badenoş
Yek z' an numayed perdepoş giştan **di yemmê** gewte da
12. Şeklê xwe der cama meyyê dîtin dema çûn secdeê
Asayîşê vê madeê dîtin di nêv ayîne da
13. Elwanê alam û wişal der neşşê erqamê cemal
Wehya evîna pur meal xwendin di dersê wehde da

14. Hatin yeka-yek şahîbaz der keşşê naz û niyaz
Waqif dema bûn dilnewaz cî dan xewaşê xemse da
15. Eşkalê derrarê ‘ecîb dîn bel di elwahê neqîb
Lêk man di amalê firîb ressamê neqşê firçe da
16. Qibla dilan anî ji dûr wer kir muşeyqel bê quşûr
Wefqa cizabê xettê hûr kêşa di sethê hidqe da
17. Yek mîmekê muhte dilan nûnek semîn da muqbilan
Avête payê dilkulan zencîrê keysû tev neda
18. Lef da li dalan wê demê ta pêşi xelqa Ademî
‘Alem ne mewcûd bûn hemî çeşmên xumarî surme da
19. Zeyta muhebbet ba nişab avête qendîlê hubab
Yek yek kişandin încizab jê ev telaşum surpe da
20. Zulfê siyah keziyyê dirêj subhê ezel xaliq ji mêj
Weqta nebûn dana û gêj terhên şîlalê turre da
21. Hefsarekî nûrîn-kemel pur muhkem û hem bêxelel
Wehhabi pê murgê emel best û merakid cumle da
22. Iqlîmê elbabê ‘uşaq avêta çerxa insihaq
Lehnê eqawîlê firaq xweş kir di têlên neğme da
23. Qelbê nigaran hem qetî çêkir ji sengê afetî
Agir ji wan sengan ketî cergên ‘uşaqan hîrçe da
24. Hatin hilakê ehlê dil geztin du reşmarê li mil
Rencek mudamî abê kil kefte û tê lenger veda
25. Ferwarê nakit li kesek der mehbêsê hicr û helek
Wêkra dilê wan bê durek ma û peyapey teşne da
26. Qet kes nebû ez ‘aşiqan şadanê hubbê xaniqan
‘Ewrê firaq û şa‘iqan daîm li tûran berqe da
27. Belkî ne ew pansed hezar bêçare kirdîn rexnedar
Avête dil ‘işqa gedar wan can û dil tev fidye da
28. Daniye ev ‘adet qedîm pê kir cunûn ‘eqlê selîm
Hey hey we mayîn wer seqîm der îndewwarê teqle da

29. Ğalib dema bûn ev keser ‘alem hemî zêr û zeber
Şewqa evîn kir wale ser Namî ji dil ev nale da
30. ‘İlmê cunûnê tev elem hilda ji sehmê murtesem
Hem der xiyalê sade kem ma û demadem pal veda
31. Der buq‘eê ev xariqe anî nîzam ev bariqe
Ke’sê ħubabê ħadiqe bexşî li ehlê ev eda
32. Mulkê meramê îbtisam êxiste temlîkê kiram
Ev çendi qudret hate fam ez mi‘şerê fikrim geda
33. Hingî xeber tev naliyaq pev xistin min ba îlti‘aq
Anî zibanî îftitaq ez zexmê telfîqi da
34. Zer nîne gerçi paxir e lê zêde zehr û agir e
Rohnî ez û dil nagire fikra me ewqa tuħfe da

2. Ismê te ye mektûb di dîwanê qidem da

Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun

1. Ismê te ye mektûb di dîwanê qidem da
Herfek qelemê 'ilm e bi teqwîmê reqem da
2. Herf û nuqet û zêr û zuber cumle te gotin
Şeklek me jî zanîbû di wê rozê ezel da
3. Eşkal û xet in da'ire û nuqteê 'ilm in
Ev neqş û mişalên di xiyalatê 'edem da
4. Neqşek z' an te'alîmê di elwaḥê mezin bûd
Mîmek we numaî kê ji wê nûnê şefeq da
5. Mîm meṭle'ê şemsa Eḥed ayîneşifet kir
Lami' ji 'Ereb berqê li fexxarê 'Ecem da
6. Berqa kê ji nûra te Xuda anî zuhûrê
Şahid be hezar new'ê dibêjin di qesem da
7. Da şahidê esma bi hemî wechê benasîn
Yek mestê Şemed kir bi yekî neqşê şenem da
8. Mest in di evînet heme zû 'eql û xired
Yek medhê di enqaşê tû der camê şefef da
9. Yek girt bi zulf û bi yekî xalê numaî
Ayîne bi Eskender û hem camê be Cem da
10. Ayîne ji ber 'eksê cemalet bûye punyan
Erwaḥê resûlan ji te ebraq û eşer da
11. Erwaḥê muqeddes şeb qedre liqaê te dixwazin
Nûra te ye mişbaḥe di qendîlê herem da
12. Mişbaḥê kemala te ne ev şems û nucûm tev
Yaqût û durr û le'l in di ber payê ḥekem da
13. Yaqûtifiroşan di kef elmasî şikestîn
Ev sefḥê elmasî ku neqqaşê qelem da

14. Ev sefheê menqûş e di elwanê zerafet
Ya Reb te wucûd kir di wucûhanê hesen da
15. Ya Reb bi çî rû leb ji şenaê te kuşayem
*Subhaneke len uhşiyê fi şe'nike hemda*²⁰⁸
16. *Subhan tu ra ey şani'ê şena'atê bedî*²⁰⁹
Minnet ji te ra heq te bi me 'ilm û yeqîn da
17. Da weqtê liqaê bi te hey bin di beqaê
Min neqdê dil û can di fenaê bi selem da
18. Neqdê di me meskûk e bi feyza te muheqqeq
Rahet me umîd e di binê sayê 'elem da
19. Minnet ji Xudaî ku bi 'ebdê xwe Melaî
Eksîrê gem û 'işqê ne di dînar û direm da
20. Namî ne ji bo 'erzê huner gohtine ev qal
Belkî ji nezanîyê xwe ev çendî xeber da

²⁰⁸ Tu bêqusûr î, bi jimarê wesfên te nayên pêkanîn.

²⁰⁹ Subhan ji te re ey çêkerê hunerên bedew

3. Meşriqê amalê qelbim çeşmê tabanê tu da

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Meşriqê amalê qelbim çeşmê tabanê tu da
Ğonçeê bext û umîdem le'le xendanê tu da²¹⁰
Menbe'ê abê heyatim cahê zenexdanê tu da
Aşyanê murğê dil zulfê perîşanê tu da
Ger li kû bî ey perî dil min di seyranê tu da
2. Wadiyi mihnetde pûyanim tek û تنها gerîb
Dûri ez ruxsarê yar im mam di gurbet bê hebîb
Raziyim zîra 'uşaqan gem digel derde nesîb
Ez bi vî derdî xweş im min nevê destê tebîb
Ger biket derman hilakim zehrê dermanê tu da
3. Eşkê rîzanê me bûyin ba'isê pur qal û qîl
Mayeê hicran **buwed** an ateş û zeyt û fetîl
Sebri der dil min nemaye qatil e ew, em qetîl
Hilmede damen bi naz uftadegan ra rû cemîl
Ber semakê helneîn ew destê damanê tu da
4. 'Eql û îz'anîm perîşan kirne zulfê xum be xum
Tîrê mijganet di dil de vekirin sed zexmê gem
Zarê ez derdê firaqim key terehum ey şenem
Xûnê çavên ma bibîne leykê nifret mîdehem
Z' an nemekkê le'l û durr der şekerefşanê tu da
5. Kîrye bê tab û tuwan firqet **tine bê** carê min
Esti umîdem ger bipêçe yar can cerhanê min
Ez perîşani xilaş kit xatîrê awarê min
Mestê xwabê naz ku bê berhev bikî dilparê min
Çun ewî her parekî yek nûkê mijganê tu da
6. Nîne ez hicranê gem ger min nebî hêvî, necat
Ez qetîlê tîxê 'eşq im min nehîm xewfê memat
Her çîqa ezyet bidî min dê bikim şebr û şebat
Bes ke hicranê tu da xaşîyyetê qet'ê heyat
Heyranê wan ehlê muhebbet her di hicranê tu da
7. Namiya fariğ nemayî her çîqas ez naleyan
Çunkê tabê dil nehîm bê cewr û ba îşkenceyan

²¹⁰ Xonçeya bext û hêviya min di wan hinarkên te yên kenok de ne

Bernede destê umîd ez damenê durdaneyan
Ta bibînî nazenînê der şîbak û baceyan
Pê dizanî muşleqa yar can e der canê tu da



4. Dîsa li dû hev dane gar derd û kulê şûzanê ma

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Dîsa li dû hev dane gar derd û kulê şûzanê ma
Yeğma kirin şebr û qerar ez rûhê purêşanê ma
2. Main di nêv deryaê gem paşde me hişt Ferhad û Mem
Afat û gerdabê elem der ferqê ma, sîwanê ma
3. Seylabê eşkê xûnmişal tê j' kaniya qafê xiyal
Ez berzeê mehbûbê bal mewcîn gihan mijganê ma
4. Cama firaqê şabê min der şeb revandî xwabê min
Jana dilê kebabê min taqet birand ez canê ma
5. Dûr e, diraz e, muşkil e, dîdarê ferqê zerkul e
Derdan vedane silsile der xanê nûwêranê ma
6. Tabê liqa xef da şehab xurşîdê bextim kir şitab
Mumkin dibê ab ez serab yar bê û bit mihmanê ma
7. Mişbahê tali' vêkevit îqbalê qani' pêkevit
Badê mumani' lê nehit rewneq bidit eywanê ma
8. Nabit muyesser în soxen **êşa** sebeb lehd û kefen
Za'il bibê cewr û mehen nîne derîn eyqanê ma
9. Çeşmê siyah em kin ji bîr burhên keman mijganê tîr
Sar bê ji dil pihtê se'îr şadî bigih dîwanê ma
10. Camek ji dest yarê şepal dîsan vexwun ba zewqê bal
Gavek bijîn em bê melal geş bin gulê bostanê ma
11. Xweş bin demek dağê derûn rûde şeha eswed 'uyûn
Sakin bibîn eşkê bixûn ez çeşmê tim giryanê ma
12. Cilbabê xakî der nezer xef daye simayê qemer
An serwiyê meytazeter tiryaqê der fincanê ma
13. Hiştin wehîd û giryenak nalan û bê tab, sîneçak
Mey'ûs û mehzûn derdinak bû pê huba samanê ma

14. Rûmet nema der ruwê ‘am dûr e ji ma şehraê Şam
Naê ji dest neql û qiyam yek yek revîn cîranê ma

15. Namî helîn destê du‘a bal Xaliqê erd û sema
Bêj tû *bi heq xeyru’l-wera*²¹¹ mehfûz bikî îmanê ma



²¹¹ Bi heqê baştirê însanan.

5. Salê sêsed şêst û heşt borî ji hicrê Mustefa

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Salê sê sed şêst û heşt borî ji hicrê Mustefa
An hebîb û diltebîbê şafi'ê zenb û xeta
2. Duwanzdeê kanûnê sanî weqtê 'esrê ba sefa
'Îdê kullê mu'minan der cum'eê rehmetfeza²¹²
3. Rohniya dil da cewaba *irci 'î cael-qeða*²¹³
Terki da faniyyê erzel şud *îla daru 'l-beqa*²¹⁴
4. Ev deniyya bêwefa pur zehmet û cewr û cefa
Wadiyê hesret çunîne bo kullê mexlûqeha
5. Teşteki xûnê şehane ev 'ecûza bêwefa
Deşteke ez xakê xûban bê beqa ye ya feta
6. Şermê an nîne ebed ez fi'lehaê naseza
Bes ke van fi'lê nepaket bêhicaba bêheya
7. Hezz û lezzet nîne der ah û enîna dilkula
Zewq û ayîn nabitîn der gulsitanê zergula
8. Pur xetakarî di mehwê gemrevînan her wuha
Hemdemanê dilbirînan şab û şoxê mehliqa
9. Gewherên walaxeşaîl xûnşirînê xweşeda
Newresîdên kamiranî xweşxiramên lebşifa
10. Xedlual û xendedanê bêşekîb û dilruba
Tu dihingîvi bi derbê xef-elem her dem çira
11. Qeç tu ra nîne wefaek bedhîzalê daima
Xaşşeten bo min yetîmê dilbiderdê bêdewa
12. Bil ji min hetta bigîje günçeên bagê 'eba
Serweranê ser ewan matem dikir ehlê sema

²¹² Di herdu malikên jor de tarîxek hatiye dayin: 12 Kanûnê Sanî [1]368, weqtê 'esrê. Xuya ye ev tarîx, dema nivîsîna vê helbestê ye û ev sala Hicrî, di teqwîma Mîladî de beramberî sala 1949an tê.

²¹³ Vegere ji xetaya îsyane.

²¹⁴ Bi bal warê mayinde.

13. Bo evan bê rehmi hinde bo me dê şefqet çewa
Dê bikî ey gedriyabi dil çu sengê rûsiya
14. Zûlmê tû efzûni ji hed, malayûtaq in cewrê ta
Zehmê ba dil kê tu daî nîne wan eşlen dewa
15. Hêset û kerbê hunava ta bi axer ma û ma
Bang û qîrînê me ‘eksî dane ber saqê sema
16. Der hunavan daim e narê firaqa mehrûya
Ma bi cuz namê şebûr nîne ebed çare ji wa
17. Ya Şebûr b’ ismê şebar şebrê bide bo mucteba
Hem ji wî mehcûr nedêre min di der Yewmu’l-ceza
18. Ehmêd û Mehmûd, Şedîq e hem di gel cewdet teba
Bo hebîbê xwe Îlahî hem tamamê enbiya
19. Xame ber kağid te danî Namiya b’ ismê Xuda
Hilde wê dîsan bibêje bo ewî hemd û şena

QAFIYETU'L-HEMZE

6. Dî me der 'işmetserayê dilkeşê bağê wefa'

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Dî me der 'işmetserayê dilkeşê bağê wefa'
Dil di wê mehw û fenaê tê me dî 'eynê beqa'
2. Cewhera 'eynel-yeqîn qeṭ wî divê 'ilmel-yeqîn
Ger nebî destê du'ayê tê ji kes tabê liqa'
3. Ulfeta erbabê qurbê padişahan ger nebê
Dê her an nalende bê dil wî nehin daruṣ-şifa'
4. *Mişqelê elbabê tarest û evînê şan yeqîn*
*Mikyelê rehîmê fezayest qenc binasîn ya feta*²¹⁵
5. Destê himet kurti nîne j' gaiban gafil meşû
Ger tu danayê meded ke pêşrewê rahê Huda'
6. Goşî kon ez Namî ey can der sulûkê in siyaq
*Hehuna heqqu bî heqqin qed heqqnel-heqqe fil-heqqîs-sena*²¹⁶

²¹⁵ Cîlaya hişên tarî ye ew, evîna wî yeqîn
Pîvana rehîma fezayê ye qenc binasîn ey ciwan

²¹⁶ Divê li vir li hember başiyê bi başiyê bê muqabelekirin, me bi başiyê muqabele kiriye der barê spasiyê de.

QAFIYETU'L-BA'

7. Heyhat ji derba firqetê nalende ma cerg û kezeb

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Heyhat ji derba firqetê nalende ma cerg û kezeb
Sohtîne narê heşretê der dil vebûne şed neqeb
2. Tê da vebûne çil birîn eħşae bañin tev pijîn
Her dem ji wê muhnetkeş îñ sar in di dil tîrê gezeb
3. Têñ bê mecal peyganê gem ez firqeta burhên qelem
Can ma di gerdabê elem kan mehcebîna sorxîleb
4. Ev xweşxirama xweşxeber an qameta re'na û ter
Nergizqeda xendeguher gulçehreya nûrîngebeb
5. Gulçehreya eswed'uyûn dêmkewkeba walaşu'ûn
Xal'enberê saraburûn hemsengê erkanê edeb
6. Çun sengê maydanê şebat sîmurgê Qafê îrtibat
Şehbazê 'ezbanê welat yarê wefîy rehğîrîşeb
7. Yarê tebî'et hûr û şaf-elmasê mewwadê şifaf
Sersarê 'işmetdanê haf şîrînlîqa 'alîneseb
8. Şîrînzûqen mijgan çu tîr carek 'eceb em têne bîr
Ey dil çima nakî ji bîr hicra wê daye dil xeşeb
9. Dildadeê kul kir fûad zehrayeê sem pê gihand
Çerkab û xûnab tê cevand lewra dinalim roz û şeb
10. Lewra wereng dil bê qerar ma d' xelwetê şebhayê tar
Ez hicrê fettanê sehğar hildaye min şerm û edeb
11. Şerm û heya min qet nema berdîn ji min wan perçema
Dil dane ber tîr û rima seffak û rimbazê 'Ereb
12. Seffakê xeddarê felek gezme weşane dil gelek
Axir bi hicra çavbelek sohtîn û da me sed te'eb
13. Sohtin ji ma taqet birand cerhên di nû dîsan vejand
Meħbûb û ferma hem revand hiştim ji weşlê teşneleb

14. Hiştım hezîn û derbeder der bakê suflî bêmefer
Feryad û efgan sed keser hat ye'sê da'im çû tereb
15. Hat şamê ye'sa wuşletê şebr û qerarek min netê
Maîn di halê heyretê agahê hali her tu Reb
16. Agahê vî halî nîye her çî kê firqet nadiye
Şekwayê halet ba kî ye, ber kê didî destê teleb
17. Destê xwe bavê ey feqîr zincîrê wî şahê Xebîr
Cuz wî nehin kes destegîr xellaqê esbab û sebeb
18. Namî bi teswîdê xeber der tê ji dil dag û keser
Ma pê nizanî ev qeder zanî bi halet kes 'eceb



8. Ey dilo werda biçîn em rewzê ruxsarê hebîb

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Ey dilo wer da biçîn em rewzê ruxsarê hebîb
Tê bikin seyr û temaşa pur ji wî maîn gerîb
2. Lê biken geşt û guzarê gavekî ba zewq û keyf
Dîdeyan rewşen bidêrin em bi wan xeddê neqîb
3. Bîn bikîn keysûyê 'atîr biskê xweşbûyê herîr
Zulfê şebrenge mudehhen burhê çun qewsê qedîb
4. Dev bi ser cahê zeqen din, dest bi gerdanê şefaf
Çav bi wî wechê mubarek, mehferê pertew'ecîb
5. Perçem û xalên muselsel, mijeê ta ta û çot
Leb çû yaqûtê mulemme', bejn û balaê necîb
6. Pê geman ez hev belav kin qûtê ez dîdariha
Can bi an têt û tijî kin sari kin pihtê lehîb
7. Çendekî azade kin dil, em ji van derd û humûm
Çun nizanin ma ecel weqtê wî dût e ya qerîb
8. 'Umrekê dûtîr ji wê durdaneya 'alîsimat
Teşneleb maîn ji cama menhela tilyên çu zîb
9. Kuştîme tîra fîraqê ebrûwê yar şed meded
Tên ez an peygan peyapey min bi cerganê kebîb
10. Berq û lami' bê mehal têt ez şehabê îştîyaq
Dağidar im ez ji hicra lûliên walanêsîb
11. *Der şebê yelda û tarîk rahet û aram kocast*²¹⁷
Hellê mîmeynê me nakin şed fuhûl panşed edîb
12. Dê bidîm mujde rûhê şîrîn ku carek weşlê yar
Der heyatê faniyê ma ger ku dîsan bit neşîb
13. Merhema cerhîm li bal nîne welew Luqmani bît
Cuz Mesîhê leşîfa' û mehliqê diltebîb

²¹⁷ Dî şeva yelda û tarî de rahet û aramî li ku ye (tune)

14. Ez gemê hicran şikayet Namiya ber kê dikî
Gêmxwuret nîne çu kes belkî pê şad in reqîb



QAFIYETU'L-TA'

9. Şev hat ji bo ma ra xelat

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Şev hat ji bo ma ra xelat, çû min ji ber çavan celat
Ahîn ji dil tèn bo welat, ahi welat ahi welat
2. Ahîn ji dil tê her mudam, xew min li çehvan bû heram
Bê kam û pur mehrûm mam şubhê esîran der heyat
3. Ew zalima pur rîz xûn hicra wê em kirne zebûn
Nalîn ji ber wek ergenûn me'yûs man ez her cihat
4. Durdane û xweşdilber î, gerdensefaf, qencmenzer î
Çi b'kim welakin dilber î nakî bi ma ra îltifat
5. Nakî nezer ber halê ma pursek li mehrûman çima
Min dil di wertê hewlê ma pihtî li cergê ma werat
6. Çi dibet bikî carek nîgeh ey nazika rû muhr û meh
*Ya rewzete'l-amalî meh ezlim bike ya ze's-simat*²¹⁸
7. Bo çi tu vê cewrê dikî hetta bi kengê dê bikî
Nabit me jî dilşa dikî da ku bibinîn em necat
8. Hicra lebê yaqût genc daye me bêhed te'b û renc
Camên me noşîn zehr û benc meylak û ekbadê me pat
9. Ekbad û çehvên ba birîn wan tev be hev ra da girîn
Tîr tèn ji qewsê mehnewîn Namî li ber wan şaş û mat

²¹⁸ Ya baxçeyê daxwazên min êdê bes e ew çi tişt e te winda kiriye ey xwedî nîşan

10. Nezîre ber xezelê Se'dî

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Goftem bi hicret dilkul im derdê me ra dermani çîst
Goft an bi hicran dilkulan nîk haziqani dewa' nîst
2. Min go nihayet dê çi bit ev daê bê dermanê ma
Gofta muradê an çi bî dê an bibî tewqîri çîst
3. Goftem çi tedbîrek bikem der hicretê dilşozê can
Goft an bi pend im goşi de tedbîrê ber teqdîri nîst
4. Min go bi xakê dergehet danem heme goyet we ye
Leykê nemîdanem ke în payîzê bê weqtê me çîst
5. *Her çi ku mîdîdem bê bîdarîst û ya Reb yan bi xwab
Ey Yûsûfê te'wîlidan xwabê me ra te'bîri nîst²¹⁹*
6. Ger xwaz û qesdê tu bi ma garat û mehwe ey felek
Kuştin bi yek carî bes e în derbê pur-te'sîri çîst
7. Ev çend ji bo ma zalimi ez te'b û cewret taqetim
Qet'en nemaye sebrî kim bo kerdenet teswîri nîst
8. Ba qelbê sengînet ebed rehmi nekeft ber ma 'eceb
Zalet kê ber men 'adim e în 'edim ra te'xîri çîst
9. Madam bi ma ra kînê tu dê her wuha bê ta bi merg
Îmhaê lez ba men xweş est terzîlê ba teşhîri çîst
10. Alam û ekdarên di dil çûn der ji heddê hêjimar
Terqîmê wan nabê tu car an qabilê testîri nîst
11. Tezlîlê ma damel-heyat, can berde ber darê memmat
Mumkîn dibîtin jê necat berbadi ra te'mîri nîst
12. Berbadi şod meylak û dil, gerdabê xefdan gull û mil
Jê axifîn ez xamê kul în naleê cangîri çîst
13. **Bend kerde em** damê bela, destbesteê kafirdila
Tê ber serim gebrê cefa ber gerdenem zencîri çîst

²¹⁹ Her tişta ku dibînim bi halê hişyariyê ye yan bi halê xewnê
Ew Yûsûfê xewnşîroveker ji xewna me re şîrove nîne

14. Şeyyadê xûnrîzê dewwar, murxê dilê bê kam û zar
Şeyd kir bi keyberên di nar, dîsan dibê tehqîri nîst
15. Dil teşneê cama wişal, her dem li ser destî mefal
Herfên ku tên tev lam û dal fala me ra tefsîri nîst
16. Daleyn û lamatên keser, remz û îşarat û heder
Me‘na dibî xeylê sefer, ser abi ra ber zîri çîst
17. Çehvêni der xwabê ebed, sed pare kir cerg û kebed
Jê hat bi ser çavan remed, êdî me yek puştmeîri nîst
18. Lewra enîna dil ji kûr, têtin peyapey bê quşûr
Zanî me ‘illet ez duhûr reşbexteê şeşpîri çîst
19. An kes kê saûrê celad dî yû serî ber û nihad
Maî di wî halê neşad, xewfê wî ez şemsîri nîst
20. Ma goft ‘elamet ez xeyal, ahîn zi an qe‘rê melal
Cek pê tamam tarîxê sal hacet bi ebced seyri nîst
21. Şehbazê gerdabê gemîn, Namî çi hal e ev kemîn
Hezn û belaê **der gemîn** xaş in tu ra îksîri çîst

QAFIYETU'L-ŞA'

11. Bendeê wan rehruwan im zanî esrarê hedîs

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Bendeê wan rehruwan im zanî esrarê hedîs
Cur'enoş in bade' û abê subekbarê hedîs
2. Lem'eê nûra heqîqet da ez û ber can û lub
Kê li dil da şa'iqîn ebrê sihadarê hedîs
3. 'Aţir û pur te'minak in ey dila çendî divê
Qet ji destan bernedî wan sêv û hennarê hedîs
4. Şafîyyê zexmê elîm in darûyê derdê giran
Muxmidê pihtê derûn in mewcê enharê hedîs
5. Ew kesê dewlet di ser bê dê muqîm bit ew ji dil
Sail û racî di ber babê guherbarê hedîs
6. Luceê yemmê elem ra galibi bîdari nîst
Cuzqerîn û dilkuşayê bezle guftarê hedîs
7. Meşderê cezmê ruşûde mişqelê elbabê tar
Rasiyyê tabê medare şemsê îsfarê hedîs
8. Raĥet û aram divê ger dewleta cawîdi gel
Lazim e hemdem bî ba yarê wefadarê hedîs
9. Rewneqê şubhê medar û mikyelê rehîmê fezast
Miĥwerê nûra hîdaye şe'n û aşarê hedîs
10. Dewlemend in raġibanê van durê qîmetbulend
Cami'ê dûm û beqa ne bax û gulzarê hedîs
11. Şed xwezî ba an du çavê hişşeyabê nîkbext
Şod mukeĥĥel ez ġubarê an derîbarê hedîs²²⁰
12. Ahi z'în derdê nihanê me ji ber eşkê rewan
Me divê darû ji heywanê şîfadarê hedîs

²²⁰ Kildayî bû ji toz û xubarê ew derîbarê cihanê

13. Xûnê dil mihtin evan kafirdilanê bedsiyer
El meded ya menşe' û kanê mededkarê hedîş
14. Dîn û dil berdîn û qeşdê canê dîkin
Mustecîr im ey cihantabê şekerbarê hedîş
15. Ger divê ey dil muşeffa bî ji emrazê elîm
Dest tu bavê damenê Luqmanê bîdari hedîş
16. Ji ehadîş disualîn me ku bê remzê 'iber
Di hûdûşê me mudellel diye midrarê hedîş
17. Ku dîzanî me di dil de çi ye meqşûd û keşer
Ji evê şerh û edaya me çi îs'arê hedîş
18. Me divê sehmê ji mûçê segê dergahê hebîb
Destiyari heme dem dawerê ferxarê hedîş
19. Ger çi bê hed namidar in der musafê guftgoy
Şed hezar dahî esîrê destê kerrarê hedîş
20. Namiya destê du'ayê hilde ber kanê kerem
Bêj tu 'ebdê xwe nekê mehrûmê enwarê hedîş

QAFIYETU'L-CÎM

12. Nezîretun lî Ferezdeq

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Dîsa bi kel tê qulzema derd û humûmê ba emûc
Ehşa' û 'ezmê pur cefa ez pihtişan in der lu'ûc
2. Ev canê bê tab û seqîm hetta bi kengî dê wuha
Bi nale saz û derdînak der hâlê ye'sê bit numûc
3. Şûzane ez hicra gedar min dil di her an û luhûz
Bê yar muferreḥ nabitin ger kit be firdewsan welûc
4. Ew nar û serdaba dil e cuz û me yek meḥbûbi nîst
An nef' û îzrara dil e ber cism û can her an wedûc
5. Şed Zîn û Zeynê xûnşirîn bûyin xecîl ez lem'eyek
Da ez ruxê guldengê ma yan yek eşer ez an buhûc
6. Nê an tenê şed dilruba şed dilqerîn û dilkuşa
Şed dilnewaz û zerqeba, gerdensêfafê fer-meûc
7. Gerdenzucac î mehcebîn qamet çu tayê 'er'erîn
Gava xuya bî çun xweşem der dil vetên şerḥ û muzûc
8. Çavê **dilîra** dubirîn an qameta tûba-nihal
Yek yek mufeşşel jê xuya tev hey'eta çerx û burûc
9. Wan awurên çeşmê xumar dil girtî amancê riman
Ah û enîn lew tê ji ma bûn dasitanê ber luhûc
10. Ev dasitan der asitan ger bê ji ma şerḥ û beyan
Belkî ji şahan bê eman pê ma umîdek bê luzûc
11. Gencûrê van daê nehîn, Namî ji mêj şed aferîn
Ger tu nebî bê dilneşîn kes dê ji van ew ket xurûc
12. Qeṭ kes nehîn ez destê van, wê can bigê babê eman
Hetta nebî ew bê zeban mumkîn dibîtin wî neûc
13. Deng û şeda û ne'reyan bangê supehrê çilleyan
Gerdabê hicrê daneyan şohtin û tefandîn surûc

14. Dağ û birîn ah û enîn bûn mûnisê dil lê çevîn
Aya turab in dilneşîn dolab û **dildamîn** sucûc
15. Fehmî ji nadanê xeber go, pê rijand abê keser
Ger yek di vê me'na ji vê jî ev demûc heftê nuhûc



QAFIYETU'L-ĤA'

13. Bide cana ji 'eqîqê ergewan yek du qedeĥ

Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun

1. Bide cana ji 'eqîqê ergewan yek du qedeĥ
Ji Xuda ra tu ĥebîba kê bibîn şad û fereĥ
2. Bi kerem hilde niqabê ji mehê nû demekê
Bi hunavê peritî pê bireşîn abê neĥeĥ
3. Çi dibit luţf û kerem kî li gedaê xwe şeha
Ku vedit tabê wişalê li şevê ma bê şubeĥ
4. Ji dema rû te niqab kir bi ĥicabê te'eşşum
Li me kir emrê sukûtê bi îşaratê sebeĥ
5. Pelisîn û melisîne me **weda ser dilê** dest
Lîk me hîvî nebîrî hey ji te ey necmê semeh
6. Bi umîda te Humaê bi derê xeyri neçûn
'Icz û ekdarê evînê we beraştim bi eşşeh
7. Me ji 'umrê xwe çî mabit bi fîda kim çî dema
Vebide fecrê wişalet me bi afaqê qereĥ
8. Sa'etê berqê cemaleş de zi ebrê pêçiyân
Dê ji şehrayê elem dil fîrde bal qewsê qezeĥ
9. Min li bal te dil û can û heş û fikrin bi tevî
Ger çî şed merĥele ez tu çî be'îd in çî nezeĥ
10. Me bi ahên lehebê nale ye her şubĥ û mesa
Ne ĥuzûr û ne sukûn e ne ji ber wî me mezeĥ
11. Nezera rehîmê me ĥeq kirye ji zû bes ke 'itab
Veke dergahê wişala xwe li Namî be mereĥ

QAFIYETU'L-XA'

14. Bê 'eql û pur megrûr e ew, her çî ji dil bê yarê çerx

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Bê 'eql û pur megrûr e ew, her çî ji dil bê yarê çerx
Der 'eqdê xwe megdûr e ew, xefbesteê zennarê çerx
2. Ba şed esef bê nefî' bûn, sankî li دنیاê nebûn
Yek yek li dû hev mehwi bûn ba dilkulê simsarê çerx
3. Her çend dixûne şuhbetan, axir di bezm û 'işretan
Xerbeq dixî nêv şerbetan ev saqî û xummarê çerx
4. Ew şed neseq 'eyyariyê, datîne nêva yariyê
Her dem bi ev mekkariyê derban didit 'eyyarê çerx
5. Derban li nêva dil dide' dağan li cerhê kul dide'
Nam û nişanan hil dide' hellakê pur geddarê çerx
6. Heddamê ber seþhê zemîn, qettalê eqwamê berîn
Ba her kes e wê kerb û kîn, ser'eskerê seyyarê çerx
7. Nîne bi kes re domê wê, şamil bi her kes şomê wê
Ber her serayê bomê wê, goyan e ba azarê çerx
8. Yeksan nehin gavek ewê, vala nehin davek ewê
Naçit ji **bir** navek ewê, bê murwet e demmarê çerx
9. Ger kê te'qqul ya feta nahîjtin ber în cefa
Wê qet nehin dom û beqa îqbalê ra îdbarê çerx
10. Eşla nehin însafê wê, naê beyan ewşafê wê
Xûn rihtine eltafê wê, ev Rustemê edwarê çerx
11. An kes kê bî pabendê û, ez le'lê naz û xendê û
Noş kit nebatê qendê û, dê pê vedî reşmarê çerx
12. Der her zeman û her mekan, ez her cihat û xelwetan
Her an û her gav û deman, qet kes nebû bîdarê çerx
13. Dildade û dilber tamam, uftade û pêşrewqudam
Ferxendeên gembermeşam kerdîn heba midrarê çerx

14. Ber ʔali‘ û bextê kesî, ber kişwer û textê kesî
Ber dewlet û rextê kesî, şabit nehin rûzgarê çerx
15. Hoş û nezer de ber evan, berbadî bûyin tev çisan
Şahîbqeran û zerfeşan, ez gedrê vê diltarê çerx
16. Lazim tu bigrî Fehmiya, ‘ibret ji van bêkamiya
Hâlê xewaş û ‘amiya mêj dersê ser destarê çerx
17. **Bikro** meke ulfet bi an, ta zende bî der î n cihan
Heddar e muţleq pê bizan ev kunbedê dewwarê çerx
18. Dildade pur wê kuştine, xedgul ji xûnê reştine
Ma ehlê dil qeţ hiştine, sehharê pur mekkarê çerx
19. Dil tev bûye cerh û birîn, pê hilfirîne derkûbîn
Demsazê wan dagê nehîn dil girti ez newbarê çerx
20. Namî dibêjî her we‘îz, lêk pê tu nabî mutte‘îz
Dûr î ji halatê yeqiz, zinhar nebî xewwarê çerx

QAFIYETU'L-DAL

15. Merhema cerhê cîger bû, lew we dil dilber heband

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Merhema cerhê cîger bû, lew we dil dilber heband
Pertewê wechê qemer bû, cezbeya wê hûş revand
2. Cezbeyan hiş tar û mar kir, dil bi eşkê xûn qeşar kir
Ro bi ro sewda û har kir, ew bi yaban wergerand
3. Em bi yabanî revandin hem ji taqet jî birandin
Şubhetê mûman hebandin, asiyabê çep gerand
4. Can di gerdabê elem ma, saqîq ez dîna şenem ma
Dûr ji wan burhê qelem ma, çavê dil pê xûn rijand
5. Çehvê dil gava nezer kir, yar û mehbûbê sefer kir
Ma hezîn ah û keser kir, perdeya dînê qetand
6. Ez umîd şerfê nezer da, qulzema derdi wê kel da
Çarika şermê wê hilda, ah bi afaqan gihand
7. Ahê canşûzê medîde yek di pey piştê yekî de
Kes ez înbextê sufîde kêmi di cerhan de civand
8. Kêmi û zox têû we têtin her demê j' cerhan dizêtin
Dil ji ber rohnîk verêtin nameya xwazî şihand
9. Nameya xwazê j' Xuda ra an şehê bay û geda ra
Tê me go halê neyara, ma bi hal zencîr hejand
10. Min bi kul zencîr hejandî da nîşan şîşê tewandî
Ê di dil zalim qirandî, pê bellûrê hub şikand
11. Kaseya hubb û evînê bûye dalîça girînê
Qelbê ken bûye bi enînê, 'eql û îz'anim revand
12. Hogira 'eql û hewes bû, dilbera nûrîn meles bû
Esmerek gewherçîres bû quwwet û şebîm qedand
13. Reşremed daye bi çavan, naêtin bihna gulavan
Bang û ahîn tê j' hunavan sengê balî can tefand

14. Bêdilê “heyf e” nego qet, îksîrê hubbê dil gelet
Nasiy û xwandî ba remet, wê li min derdan vejand
15. Xameyet hilde tu Namî, teşneê camê meramî
Ger dibê derdan tamamî bê felek çerbek weşand



16. Îro li dil dîsa civîn gem bê şumar û la yu‘ed

Mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun

1. Îro li dil dîsa civîn gem bê şumar û la yu‘ed
Tên her peyapey ew lezîn ez destê wan dad û meded
2. Taqet nema dilmate ma ‘eksa fiğanan da sema
Ah û keser bûyin cema cih girtine wan der kebed
3. Kuştin bi derba keyberê hicr û firaqa dêmzerê
Carek tenê der pencerê bidya bi çavan qam û qed
4. Bidya me ew kewkebcemal bikra tewafê xedd û xal
Burhên kemanî wek hilal bes bû ji ma ra ta ebed
5. Çi b’kim me tali‘ ‘eksî ye nabit ji bo men carî ye
Dil gejduman zû gestiye me‘lûli maye pê cesed
6. Der întizarê hazîqan çehvnêrê luţfê muşfiqan
Tûtîyyê balê başiqan wan şeydê mekkarî kired
7. Der beynê ma û zatê yar perdatê qalîn bû zîhar
Kengî helîne perdedar nişan bi ma nemîde hed
8. *An kîsti ke z’ rûyê kerem ba min heqîrê dil bi gem
Xêrxwahi kerde fekkê fem ber halê gemxwarî koned²²¹*
9. Wan kîsti bo min tîbqê û hemdemme bit an şeb û ro
Merhem bikit cerhên nû her an bi feryadim resed
10. Luqmansîfet bê ber serim ez vê ji kes nê bawer im
Çûn ez felek xûncîgerim da beyn û ma û yarised
11. Naê hisab şed matê wê keskî bi mislê min nedî
Cewr û geder ez destê wê kêşaya ma efzûnê hed
12. Ev çend sitemkarî bi kes dergirtin û danî nefes
Ne meykerde cuz min bi kes berdane kî cotê esed
13. Saqî ji bo bedra cemîl bîne tu ekwabê seqîl
Dil min bûye zeyt û fetîl wê dûtê ber tarim resed

²²¹ Ew kê ye ku ji rûyê keremê li min belengazê dilbixem
Xêrxwazî kiriye û devê xwe vekiriye bo halê me xemxwariyê dike

14. Bê feşlê bo min camê mey îhsani kon pê dağ û key
Sar kin demek dil bit me hey lê şerç e tê da bî cemed

15. Namî ji dest bavê qelem dağê derûn naê reqem
Rebbet heye êdî çî gem ber û bişîn bangê meded



17. Şubhê Ye‘qûb dilo kan Yûsifet ey nûresîd

Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun

1. Şubhê Ye‘qûb dilo kan Yûsifet ey nûresîd
Tîbqê û mehzûni mayî nale ber ganet resîd
2. Hat beharê pur xeçaret bağibanê ma nehat
Ez dojhê hicranê û piht bi damanet resîd
3. Xurrem û xendan e her kes ez tenê mame ne şad
Leşkerê derd û geman hat û bi derbanet resîd
4. Sa‘iqên ebrê firaqê tèn peyapey bê mecal
Gestiyê marê şevînî zehr ber canet resîd
5. Neş‘e û aram reftin wê xuyan şeffê humûm
Mihnetê bêmunteha û heznê bêpayet resîd
6. Zewq û eyyamên surûrê xetim bûn ah û fîgan
Şem‘ê îqbalet tefaye newbê îdbaret resîd
7. *Seylê gem amed be nagah mulkê dil texrîbi kerd*
*Çûn me weşl û şadimanî suflê hergamet resîd*²²²
8. Coyê xûnînê rewan tèn ma ji çeşmê eşkibar
Mewcê tofanê durûdan wê bi mujganet resîd
9. Sîmurgê ber qafê durûdî xazinî gencê esef
Teşneê cama wişalê narê hîrmanet resîd
10. Subhê ‘eydeynê reqîban şamê dîdarê me hat
Rozê Newrozê neyaran ani cangahet resîd
11. Şorgul û sosin di bağan pişkivîn şînber geha
Sunbulê ma naxuya ne çagê efğanet resîd
12. Bulbulê xweşxwani ger dil neğmeyan sazende kon
Bêje eş‘arê di şûzan feşlê nakamet resîd
13. Namiya bêje bi wê re ahê canşûzê medîd
Ta qiyamet weşl naêt ‘eşrê hicranet resîd

²²² Sêlava xemê hat ji nagah û mulkê dil wêran kir
Ji ber wê ye hêza me ya pevgihîn û şadimaniyê nema

14. Şahê textê îftiqarî xusrewê mulkê nîşar
Muhrê nafîzet mehû şod xetmê goftaret resîd



18. Ey dila! çendî hezîn î gavekî nabî tu şad

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Ey dila! Çendî hezîn î gavekî nabî tu şad
Ma tuyê hetta bi kengî dê wuha bî namurad
2. An şeyê her pê dinalî çû nema êdî ku bê
Dîn û didarê ewan maye *ila yewmu't-tenad*²²³
3. Tu meşû gafil bi gem Iskender û Cemşîd û Cem
Ba hezaran şubhê vana Fatih û Sulţan Murad
4. Her peyapey hatin û çûne nihayet şab û şox
Terki dane ev defiyê maderî fisq û fesad
5. Bê wefa ye, pur cefa ye, zalim e, geddardar e, dîn
Hiç tîne qet ji bo kes rehîmê û hem 'edl û dad
6. Ma nizanî tu 'eceb ji kê ra dikî şekwayê hal
Zebî dikit nexçîrê ba hez, destê ba xûnê şeyad
7. Purpur û çîva tûyûran menzerê pur zewqê wî
Ger mişalek dî dixwazî gurrê ber dillê celad
8. Bîne bîr goftê neqiyê der xezîna Endûlîs
Ber kulahê şahî goftend Tarihê Ibnu Ziyad
9. 'Erzê halê xwe te qeşd e ger bikî 'erzê bi yek
Ba edeb hem bil tezerru' neqşê ke b' xûnê fuad
10. Bêj tu ya Cewwadê Qadir agehê halê me yî
*Qul minel-qelbî tewekkeltu 'ele Rebbil-'ibad*²²⁴
11. Mustezillê tairê **ûcê** berînê û bes me yar
Sayeê geyran nexwahim ez selaîfînê bilad
12. Min şehinşahêk mufexxem hest û tîrsê ma nehî
Qet ji van çûpanê setrencê bê beqaê gerdîbad
13. Namiya der şubhê û şaman tim şelewatan hedyê kon
Ber ewî serdarê hadî qet'î kon neqşê siwad

²²³ yewmu't-tenad: roja qiyametê

²²⁴ Bêje ji dil tewekuliya xwe didim ser Rebê evdan

QAFIYETUZ-ZAL

19. Kan dem û dewranê şadî, şuhbet û bezmê lizaz

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Kan dem û dewranê şadî, şuhbet û bezmê lizaz
Kan surûrê ber muradî, cunbuş û kedmê lizaz
2. Ber hewa şod xan û manî xatîrê zalê qudûm
Bûd û nabûd, mulk û eflakê dil û kexmê lizaz
3. Keyqubad û Xusrewê van 'ezmê bê tabê reqîq
Bûn esîr û zîrîdestê hadimê leşmê lizaz
4. Badeê kamê medarî xende û arami dan
Bûn mubeddel an bi zehrê rammê her demmê lizaz
5. Şed keser ba an demanê multefit bû murgîbal
Der newaz û pursiyarî ber me pev şermê lizaz
6. Ew du reşmarê li mil gava digestin cerg û dil
Wan du şehlayê xumarî ez mijan gezmê lizaz
7. Her ji wan qewsê hilalî berdidan la yenqetî'
Ber evî qelbê meê çalak ê pur te'mê lizaz
8. Namiya ah û keser ez tabê husna dêmdurran
Lew gêzel wurdê zeban û hem fikrê nezmê lizaz

QAFIYETU'L-RA'

20. Deftera meşqê evîn e fikr û danim serteser

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Deftera meşqê evîn e fikr û danim serteser
Ez esîrê turreê xalê siyah im bêmeqer
Qelb û dil vêkra birîn in selmiya eynel-mefer
Şed meded şîrînê zuqen feryad û efğan û keser
2. Agir û pihta nihanî cerg û dil kirye şedîd
*Kullema ezdet kurûben qale li 'indî mezîd*²²⁵
Gote min dê ez wucûda te bikim şubhê qedîd
Dabe dil tîra firaqê tê ji wê xûnê heder
3. Çeşmê cadû, zulfê hindû, rû çu gul penbe neseq
Wan hilanî zulmeta leyla qulûban wek şefeq
*Muttu fi behril-firaqî leyte li bedren feteq*²²⁶
Şefqe ber hali neda û zêde kir qehr û geder
4. *Der rehê yar û wişalê canê xwod kerdem nişar*²²⁷
Serteser dunyakê mulkê ma bî nakin îftixar
Ger bikin fîdye bi dîdarê hebîba çavxumar
Çunkê tabê dil me tê daim ji wî wechê qemer
5. *Leyse fihî hubbe xeyrin bel huwe qeşdu'l-fuad*²²⁸
Min ji û aramê dil tê bûme ew Nîlê murad
Dil yek e dê yari yek bî nabitin tê îzdiyad
Ger nedî agir bi zeytê qeş didê rohnî fener
6. Namî 'ebdal î li ber şaha leţîf û nazenîn
Cewr ez destê ewî 'edl e, bi çavê dî mebîn
Kîşweristanê wucûdê hubbê wî girtî yeqîn
Dilxweş im ez wî muhebbet hem ji wî bêtin keder

²²⁵ Kul û derdên min çiqas zêde be, dibêje li cem min pirtir heye

²²⁶ Ez di deryaya firaqê de mirim. Tuneye ji bo min hîveke nû ku derkeve û rohnî bike.

²²⁷ Di rêya yarê û pevgihaştinê de min canê xwe kir qurban.

²²⁸ Di hezkirina wî de başî nîne, belkî ew meqseda dilan e.

21. Dûr ez dîdarê yar im bejn û balaê kibar

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Dûr ez dîdarê yar im bejn û balaê kibar
Der dilim govan hezar in, dağ û key hem bê şumar
2. Dağ û zağê ateşîn kuştim beraştim bil-yeqîn
Bûne pê sewda û dîn, ah û fîğan û şed hewar
3. Şed hewar û şed meded, şed pare bû cerg û kebed
Zehra hilahil pê resed, mame 'elîlek pur-neçar
4. Mame 'elîlê bêdewa' megmûmê ebrûyê siyah
Mesmûmê efratê cuda, dil ma dişot hicra gedar
5. Dil ma qedand ey naxwiya ger tê hezar peygan bûya
Carek bi dînî şabûya mumkin bibûya weşlê yar
6. Mumkîn dibê qeç nabitin pihta di dil de sar bitin
Roja ku lê êvar bitin nûve bibîtin şu'ledar
7. Nûve bibîn rewşenbeşer, sakin bibîn tîrê heder
Badê nesîm bê der seher, vêra me jî şebr û qerar
8. Vêkra me tali' yari bit, nehsî ji teb'ê 'ari bit
Zewq û şefa' tekrari bit, mehzûni bin her çî neyar
9. Megmûmi bin ku ma reqîb merhem bikit cerhan tebîb
Aram û raHet bê neşîb, ber rûhê pur muhnet-medar
10. Bo tennê **jar û rezdirû** ez destê dilber camê nû
Bîn an peyapey zû bi zû der xilwetê şebhayê tar
11. Der xelweta şevtarîyan peyganê ber dil meykiyan
Derman bikî yar hemiyan, ron bin me çavê eşkîbar
12. Nûr jî bi qe'rê dil bigê derdê ku tê da jê derê
Ava heyat û kewşerê em jî vexwun carek du car
13. Em jî vexwun abê heyat ez çeşmeya feyzê necat
'Umrek nedamet pê nehat derbazi kin bê ah û zar

14. *Derbazi kin çend rozeha, ez qeydê muhnet bin reha*
Ahim bi afaqan giha, espê felek berdaye xar
15. *Espê murad pa lengi bû, meydan li wî pur tengi bû*
Şorgul me dî bê rengi bû, dil lew me bûye xakîsar
16. *Lew ez dikêşim çilleyan, her dem di nêv îşkenceyan*
Cama firaqa lûleyan tehrîqi da sîne çu nar
17. *Tehrîqi dan xanê wucûd vîra dikêtin tê wuqûd*
Xellişnî minhu ya Wedûd²²⁹ bêje tu Namîyê bêqerar

²²⁹ Ya Wedûd (hezkirox) min jê xelas bike

QAFIYETU'L-ZEYN

22. 'Endelîbê bagê derd im, 'aşıqê nalan im ez

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. 'Endelîbê bagê derd im, 'aşıqê nalan im ez
Ey kemanabrû, şehîdê xencerê mijgan im ez
2. Yek nigahet ey perî papendi kerdim wê bi zulf
Min diye feyzê huner ez tu, tu ra qurban im ez
3. Min 'elaqe ji masiwayê qeṭ'i kerdem cuz ḥubbet
Ez Xuda ra yek tereḥḥum ber me ke, ḥeyran im ez
4. Kakulê tarê tu ra peywendî kerdim can û dil
Men 'elîlê hicrê tu yem, ṭalibê derman im ez
5. Mestê le'lê nabê yar im, îltifat ber gewherê
Min nehin qeṭ'en we eşlen, dilkulê rindan im ez
6. Nailê abê ḥeyat im, min bi kewşer nîne meyl
Saqiyê dewran digel min hemdem e, sukran im ez
7. Qeṭ ne mes'ûl im bikim terkê wurûd û nafîle
Çunkê der şubḥ û mesa' wek bulbulê nalan im ez
8. Ger di hicran her seḥer badê şeba ber damenem
Ta esîrê ḥelqeê keysûyê mişk-efşan im ez
9. Lehze lehze tene peygan her ji qewsê malzirav
Lew her an efgan dikêşim tim bi dil giryan im ez
10. Min ji qessamê ezel wurdê evîn bûye neşîb
Nalesaz im lew di bagê ev dem û dewran im ez
11. Min dawaê derdi nîne cuz perî ruxsarê dil
Çun ji mêj ez malxerabê nêrgizê fettan im ez
12. Ew di çerxa vê cihanê gul, ez im lê 'endelîb
Şah e ew ez yek ḥeqîr û bendeê ferman im ez
13. Muhr e ew nisbetbûyî, ez meş'ela zeyt im li ber
Lê di eflakê evînê Behmen û Xaqan im ez

14. Wê bi wan zencîrê zulfê ta be ta dil bendî kir
Z' an nehin şebr û şebatim, sersemê hicran im ez
15. 'Umr û îqbal û se'adet min fidaê husnê wê
Arezûmendê rexê al û lebê xendan im ez
16. Bes nehin zehrabeê gem ey felek ber în dihan
Hürmetek lazim me ra, yek du şebê mihman im ez
17. Ey dila! Te'cîzi kerdî ez durûdan canê ma
Çaliben zanî kê şem'ê gelbeê eHzan im ez
18. Şed neseq dersê xeffî ez 'ilmê esrarê evîn
Daye ma ustazê 'eşqê, cami'ê derkan im ez
19. Fenn û tefsîrê rumûzê sihr û e'cazê soxen
Der kenîştâ pûtperestan xwand û pur'irfan im ez
20. Mestê fincanê elest im, nîne hacet min be mey
'Abid û ulfetperestî, surmeê çavan im ez
21. Zeyd û 'emr in der nuşûşê muşhefê husnê hebîb
Çunkê mecrûrê edatê gemzeê edhan im ez
22. Ateşê seyyalê ahet suhti can û dil yeqîn
Namiya bêj ez fidaê şerbetê lêvan im ez

23. Xitabkerdenê Namî bi naziranê herzeê Megmûr

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Fehmiyim ez an fehîmanê ferexfal nînim ez
Cahil û nadan û naşayesteê esrar im ez
2. Pur cehûl û bê tefekur gafil û edna û kem
Dûri ez derkê nizam û sencenê eş'ar im ez
3. Dûri ez fikrê deqaiq der heqayiqê edeb
'Ariy ez zeyy fendîdi der înfekar im ez
4. Min ji bo 'erzê huner telfîq neda ev reşbelek
Belkî pê zanî me her dem kemterê îs'ar im ez
5. Kemterê cumle nehengê qulzemê şî'r û gzel
Çakirê bê fehm û nayabê der înfazar im ez
6. Xamegîranê meşafê nezmê ra dîn im gelek
Bes edeb der goftem qe nîne mudrecê îhzar im ez
7. Min ji vê îhzarê meqşed şerhekî dagê derûn
Hem bi wê raciyyê 'eff û rehmetê gefar im ez

QAFIYETU'L-SÎN

24. Çira hinde xirabmal û perîşan î dilê bêkes

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

1. Çira hinde xirabmal û perîşan î dilê bêkes
Çûyem der sîneê bêtabê coşanî dilê bêkes
2. Sehergahan nesîm weqta ji alê gul'izaran bê
Wekî bulbul di bagê hicrê nalan î dilê bêkes
3. Di etrafê çîmenzaran fiğan keş şubhê tûtagê
Di deştê 'izletê her dem tu pûyan î dilê bêkes
4. Çira bes kerdî ez kaşane' û şadiyy û mexmûrî
Divê belkî şehîdê tîrê mijgan î dilê bêkes
5. Ji hubbê dilrubayan û şîrîn-edhan û guftaran
Yeqîn hêjan ji wê meyla xwe poşman î dilê bêkes
6. Nedamet faide nade di be'dê neqdê can daî
Di bazara sîmensayan bi nadan î dilê bêkes
7. Te can daye nişarî şuhbetê yaran ji zû sersem
Nuqûdê 'umri zayî' kir bi sukran î dilê bêkes
8. Te eħşae di min pehtin bi van ahê lehebsaz î
Di şozê tabê eşkan de tu punhan î dilê bêkes
9. Di noşê bade' û hubbê nigaran qeş nehim mani'
Ji min ev dem çira hinde gurîzan î dilê bêkes
10. Wereng şerrareê seyyalê ber hoşî çira dadî
Tu qey der lewhê vî singê me mihman î dilê bêkes
11. **Niyaz ber turfê ahûyan ji bo papûsi ra çendî**
Dikî dîsan di halê ye'sê giryanî dilê bêkes
12. Reha ke can ji qeyda miħnetê dewranê mehcûrî
Çi sermestê şeraba lebbê lualan î dilê bêkes
13. Tu cewlangahê eşwaqê supehrê şebçirağan î
Esîrê turreê wan newnihalan î dilê bêkes

14. Ji berqa lami‘a re‘dê muhebbet ta bi key ey dil
Şerarê atêşîn berdê bi daman î dilê bêkes

15. Mecasin ra çi meclûb î, re‘îsê heykelê şûr î
Digel Namî di vî halî ne şadan î dilê bêkes



25. Munacatu'l-Muellif

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Ey Xaliqê heft asiman dermande yim feryadres
Sazendeê çerxê cihan dermande yim feryadres
2. Rehmê tu ber cumle 'ibad dergahê tu kamê murad
Ey baniyê cah û ciyad dermande yim feryadres
3. Mewcûd bê bab û weled tedbîrê tu **natêne** 'ed
Rezzaqê cumle nîk û bed dermande yim feryadres
4. Eltafê tu naên qiyas darendeê ussu'l-esas
Layiq te ne hemd û sipas dermande yim feryadres
5. Ey şafiyê zexmê elîm ey sami'ê ahê Fehîm
Ey gafirê curmê 'ezîm dermande yim feryadres
6. Nîne meded cuz tu me ra xellaqê der her du sera
Cewwad î ey Rebbu'l-wera dermande yim feryadres
7. Cewwad û hem pur ekber î ber kullê zahir ezher î
Merd û muhibb û mehder î dermande yim feryadres
8. Me'bûd û mewcûd û yek î nabî çi weqît ger nekî
Emr û îrade şey'ek î dermande yim feryadres
9. Bê te tu meqşed naçe ser bê te qe hel nabin keser
Bê te ne mewcûd in huner dermande yim feryadres
10. Dağê di dil de barek in meşsulê meyla yarek in
Merg û muhebbet carek in dermande yim feryadres
11. Dermande yim ez tu teşeb meqşûdê dil her roz û şeb
Ey rafî'ê hemm û te'eb dermande yim feryadres
12. Fehmî çu tûle zarî ye der babê luţfê Barî ye
Ba in siyaqê carî ye dermande yim feryadres

QAFIYETU'L-ŞÎN

26. Çi reng teswîri da Xellaqê van xal û xuûtê xweş

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

1. Çi reng teswîri da Xellaqê van xal û xuûtê xweş
Di wechê van meleksîma û dildamê çu gul dilgeş
2. Mucsesem rûhek in bêjim ji wan ra qeç ne mes'ûl im
Rewa ye ber heme dîn û kitabên an perî-mehweş
3. Te'alellah çi bê perway di mest û nazê perwerdin
Di vî rengî we tezyîn da xiramîn serwê balayeş
4. Bi tûrfe ahûyan ra meşq nigahê pur funûn kerdin
Çi rengê pakîze nazik tenê sîmensefa bê xeş
5. Bidîta horiya rewzê cinan ez rişkê van xûban
Muheqqeq dê hesed bikra ji ruxsarê di meh nûgeş
6. Ji bo pabûsê racûyan niyazkar in perîzade
Xiraman her dema nêv baxê werdan bi qam nameş
7. Di ber qedên di re'nayê te bê gulxûn dil û wale
Ji te'sîra ewê wechê mucellayê şefeq pûyeş
8. Çi bêjim weşfê endamet qe têtin şerh û telwînî
Te îz'an û 'eqil ez min bir û hiştim çunan bê heş
9. Bi peyganê mijagan dil xeşeb kir dê bi yek awer
Me zanî ceste ber fewwareê abê heya rûyeş
10. Bi ma an qeddê mustesnaê xwe carek nişan **dayi'**
Bi nîm we'dî lebê le'lî bûyin sermest û hem serxweş
11. Di sayê ulfet asayî tu da heyfa nebûn mesrûr
Bi yek dem şadiy û xende nedî ez tabê goftareş
12. Çi şafî bûm ji an ayîneê endamê dil bendî
Derîga keftime damê muhebbet can me da muhreş
13. Di destek bade û yek gul xiraman ber me ra bêtin
Nevê min an kê der destan keder min zulfê hindûyeş

14. Xuda ra ey perîzade bi bîr bîne esîrê xwud
Were carek bi ser xakê şehîdê ھub bike yek meş

15. Çiqas bêjî tu ey Namî dihîle natuwan dilber
Bi engîştan îşaret ber leban da û dibêjit heş



QAFIYETU'L-ŞAD

27. Ciladarên cewahir da te ez le'1 û lebê meşûş

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

1. Ciladarên cewahir da te ez le'1 û lebê meşûş
Welakin min hunav û dil bi 'eksê pê bûyin meşûş
2. Ji qewşê her du ebrûyan peyapey berqê lami' tèn
'Elen-necfil-fuadî kullu ewqatî biha el-mexşûş²³⁰
3. Nehengê hubbê le'leynan di deryaê evînê ser
Berared ger çi wî emma me dil der zewreqên merşûş
4. Dikin seyranê ber yemmê ewê husna sifetzuhre
Bi çeşmê dil di vî halatê mebrûr in nehin menkûş
5. Bi dil şah in xwedanceyş in di Mişr û Medyenê hubbê
Eger çi kemter in der asitanê xusrewa merxûş
6. Umîdwar in ji ferwarê ewê şehzadeê carek
Kê bê merhem de kovanê evê balê me ê meğşûş
7. Îşaret ger bi destûra tewafê Ke'beê xalan
Bide ew werdê re'nayê dihen fermayê na menqûş
8. Bi vî 'ebdal û dilxûnê xwe ê bê tab û efserde
Qesem ber turreê zulfan didin can mujdeê mexlûş
9. Qesem ber ayeta husn we cemalê gerdana mişkîn
Nekim terka ewan le'lên 'esel famê ji gul memşûş
10. Tîlismê şebrê **perdazî** dilê mecrûhê gem sazed
Mehengê neqdê îdrakê evîn fetrakê z' in menşûş
11. Kê Namî her bi ekdarê ewan dilxûn û naşade
Bi hicranê di wan jar û qedîd û wale û meqlûş

²³⁰ Di kûrahiya dilê min de di her zemanê taybet de

QAFIYETU'L-ŽAD

28. Wellah ji ħubbê rindan min ħubbê canan e ġerez

Mef'ûlu fa 'ilatun mef'ûlu fa 'ilâtun

1. Wellah ji ħubbê rindan min ħubbê canan e ġerez
Nifret ji ziddê xûban ez meylê le'lan e ġerez
2. Ez meylê mehcebînan rûgewr û surşirînan
Leb-le'1 û nazenînan min mahê taban e ġerez
3. Ĥusna wê mahitabê dil girti încizabê
Destdade im rikabê min pûsê payan e ġerez
4. Pûsek ji pa û destan z' an qiblegahê mestan
Şifaya daê xestan jî luţf û îhsan e ġerez
5. Luţf û kerem ji rindê ya sohtime çu findê
Şebaz û serbulendê darûwê cerĥan e ġerez
6. Cerĥên ji ħubbê wellah taqet revan e billah
Cana kerem ke lillah dîdarê çavan e ġerez
7. Ez xûn û zoxê cergan nameê 'erziĥalan
Verêkîn balê sulţan pê 'erzê kovan e ġerez
8. Bi 'erzê kin durûdan z' an putgehê xumûdan
Me z' înan şerĥ û surûdan jî emr û ferman e ġerez
9. Fermanê dadê perwer ez lebbê le'lê gewher
Ber zexmê tîr û xencer darûyê Luqmane ġerez
10. Şerĥê evîn meĥal e bêtin ĥeddê mişale
Çun berqekî seyyale wê ĥerqê qelban e ġerez
11. Namî dewaê derdan ferwarê serbulendan
Nazê delal û rindan tezyîdê ĥubban e ġerez

QAFIYETU'L-ṬA'

29. Lami'a 'ewrê firaqê da li cergan bê remeṭ

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Lami'a 'ewrê firaqê da li cergan bê remeṭ
'Eql û îz'an û şebata dil bi wan bûye seqet
2. Ateşê hicr û evînê qelb û dil kirye şedîd
Eşkê seylab in ji çeşman kef didin teşbîhê şet
3. Wechê taban çeşmê fettan hemdemê fikra me în
Dağidarê ateşê nîranê hicrim lew me qet
4. Nîne jê şebr û qerarek daima me'yûs e dil
Wûrdê ber ezmanê maîn yadê lewhê xal û xet
5. 'Işwe û naz û edaê cangudaz û dilferîb
Dewrekî daim di xatîr kirne mu'tad çun 'eṭet
6. Xendeê gulfamê wê yara şepal û dilnewaz
Hale bestîn ber dimağê xûn û sewda wan gebet
7. Arizûyê weşlê wan le'lê şefafê sadenûr
Dê çisan her dil nekîtin der ez în halê guwet
8. Perçem û biskan xelek dane li ser dêma durrî
Qewsê ebrû wek hilalê mahê nû yin xet bi xet
9. Cunbuşê eşwaqê wê her ba'îşê coşa dil in
Ez rexê zîba û nişmê newnihalê 'işwe-beṭ
10. Tim xedengê xemzeyan têtin bi dil zehrîne ew
Wer dikêşîn em gumûmê dehrê cehrî ba qenet
11. Der ewê meḥremserayê 'işqê bûyan in mudam
Dilkuşa û mehliqaê ez nişat kerdim keşet
12. Ah ji ber vî ḥaletê dilsûz û mehcûrê mirin
Îktirab û îğtirabê tev li dil ah kir qibet
13. Ma li ber cewlan û îstignaê yara purcemal
Can kê bê tab û muḥeyyer îstiqamet kir gelet

14. Ber kemalê ‘ifetarayê hebîba çavbelek
Her kesî jê întifa‘ek dî, ji bo min bû qeçet

15. Şerhê ekdarê evînê min gelek kerdin beyan
Leykê dîsan nabitin tewzîhê amalim feçet

16. Namiya naê beyanê şerhê dagê der durûn
Pendê yaran e ji men bigre di sem‘an çun quret



QAFIYETU'L-ZA'

30. Di vê halê esefara dil û canî çî ye hez

Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun

1. Di vê halê esefara dil û canî çî ye hez
Ji heyatê bi nişara hiş û danî çî ye hez
2. Ku nebî perdenêşînê heremê şadiyê ezel
Bi emanet di derê bagê cinanî çî ye hez
3. Kê nedamet bê te incamê heme 'îş û xweşî
Tu bi 'unwanê çu Darayê zemanî çî ye hez
4. Kê nebit tab û qudûmek di nişatê ebedî
Ger bi malê xwe tu Qarûnê cihanî çî ye hez
5. Ji ezel ger tu nebî ayîneê şad û surûr
Be muweqqet kê bibit tab û tuwanî çî ye hez
6. Ebediyyet ku nebit der demê demdarê evîn
Bi mecazî du hezar salê şebanî çî ye hez
7. Dê nihayet ku melamet bi hubbê rendê we bê
Ji şîfatê beşerî hezzê besanî çî ye hez
8. Ku nebit sirrê heqîqet di mullaqatê wucûh
Di wişalê we hebê şekl û xeranî çî ye hez
9. Te nebit yarê wefadarê enîsî di deman
Te bi coşa dilê nal û xefeqanî çî ye hez
10. Nebitin 'eql û kebed ber şedefê şafê neşîn
Tu di gerdabê cihan Newşîrewan î çî ye hez
11. Hedefa tîrê qeza bit te eger ferq û berî
Te ji Lahûrê hebit tîr û kemanî çî ye hez
12. Kê nebit saqîê dewranê di bezmê te muqîm
Te ji ser çeşmeê abê heyewanî çî ye hez
13. Ku nebit nûrê 'inayet di şebê tari heval
Te di seyra evê deryaê 'Umanî çî ye hez

14. Ne Nedîmê feheşet bê te ku kerrarê fuhûş
Te mucerred bi şellaqê Teberanî çî ye hez
15. Çî ye lezzet venexwuy bade ez an le‘lê semîn
Ne ji wî sagîrê nûrîn be gumanî çî ye hez
16. Çî şefa dê hebitin der evê rozê bi gurûb
Bi gewaşî **dibetin** tab û tuwanî çî ye hez
17. Çî heye neş‘e di vê ‘umrê bi ahîn buhûrî
Bi teğaful ji keser eşkê rewanî çî ye hez
18. Qe ez î n medreseê çerxê fena dersê ‘eceb
Bi zemîr û heşê hilda peşîmanî çî ye hez
19. Be ‘edenkê tu derîn keşmekeşî kerdî huba’
Di hewa û hewesan ‘umr û cuwanî çî ye hez
20. Lezzet û zewq û surûrê ku nebin baqî be dost
Te bi şadabê çunîn kurt û wefanî çî ye hez
21. Tu nebit ger di kelimê udeba’ dersê ‘uqûl
Ji nukat û durerê remzê nihanî çî ye hez
22. Ger di şuffînê evînê tu be an seyfê burû
Ku nebî şahid û meşûdê **fennanî** çî ye hez
23. Kê bibê **rammeyekê** şahê der î n seþhê fena’
Nebitin ger ewî dadê ‘Umeranî çî ye hez
24. Tu nebit sehmê huzûrê li dilê jar û qedîd
Şeb û ro her we di kerb û xeleanî çî ye hez
25. Kê nedit faide pendê te bi te qeþ wê mebêj
Bi dilê ger ji gurûhê ‘uqelanî çî ye hez
26. Te di *Megmûrê* gelek herze beyan kerdî Fehîm
Te ji van herzeê bê reng û me‘anî çî ye hez

QAFIYETU'L-'EYN

31. Ey şebabet ey hevalê razê punhan elweda‘

Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun

1. Ey şebabet ey hevalê razê punhan elweda‘
Tu dimînî ez diçim bal şehre Pîran elweda‘
2. Çendekî hemdem bûyin der cumle anê dilxweşî
Haza firaqê beynena tabi qudûman elweda‘²³¹
3. Ez nehim rencîde ez tu, tu ji men rencîde î
Bo çira ez men dikî hinde şitaban elweda‘
4. Nabitin? Ger bê bi hev ra biçne ewcahu’l-hezên
Ey şifa û hem medarê hubbê xûban elweda‘
5. Dê gelo qeş min bi bîr bînî dema yarê di ger
Bigrê tu ey şebçiragê qeşr û eywan elweda‘
6. Ey enîsê dilrubayan ferr û tabê can û dil
Melceê renc û meşaqan rengê rûyan elweda‘
7. Ey emînê şeng û şoxê, ey şidaqê muhrişan
Musterağ û hem şuûnê keçkulahan elweda‘
8. Ey dilê saldıde û hûşê **perîşanê** ji mêj
Hemsur înan der zendeganî hem çu mihman elweda‘
9. Ey hunavê natuwan hatin li me weqtê xezan
Bulbulê gulşenserayê mulkê şî‘ran elweda‘
10. Genc û ebnarê durûd î bê şumar û layu‘ed
Hemneşînê hesret û kerba hunavan elweda‘
11. Elwida‘ Namî dibêjî lê pir in hogir heval
Elwida‘ ey aşîyanê mahitaban elwida‘

²³¹ Ji firaqê hêza qudûmê nema (da ez berpê biçim) elweda.

32. Te‘erref lî ela ya nûre erfe‘232

Mefa ‘ilun mefa ‘ilun fe ‘ûlun

1. تَعَرَّفَ لِي أَلَا يَا نُورَ أَرْفَعُ
حِجَابَ جِسْمِي مِنْ رُوحِي أَرْفَعُ

2. حِجَابَ الْبُعْدِ عَنِّ وَجْهِ الْفُؤَادِي
أَزْلُهُ بِنُورِ الْوَجْهِ أَنْفَعُ

3. تَرَحُّمٌ وَجْهٌ صَبَّ كَالْتَّفَاحِ
قَدْ إِصْفَرَ وَعَمَّهُ لَيْسَ يُرْفَعُ

4. أَنَا كَالْعَنْدَلِيْبِ فِي الصَّبَاحِ
أَنْوُحُ حَوْلَ وَرْدٍ قَدْ تَبَرَّفَعُ

²³² Min binas ey nûra bilind
Perdeya leşê min ji rûhê min rake

Perdeya dûriyê ji rûyê dilê min
Rake ji bo sûdê ji nûra rûyê

Rehmetê bike li aşiq rûyê wek sêv
Zer bûye û xema wî ranabe

Ez bilbil im di dema sibehê
Stêran dibarînim li dor bişkoja

Tu yar û celadê min î
Bi hatina te çavê min stêra dibarînin

Û xwesteka me ji herdu aleman
Cemala rûyê te ye ji xeyrî wê fayîde tune

Kî xwesteka xwe bi rastî bizanibe
Ji xeyrî wesla yarê qenaet nabe

Û mirîyê evînê bi dermanê reqîban najîn
Çunkî evîn nahêle

Ji mêj ve ez derdê dûrûyê dikşînim
Bi hemî êş û kul û derdan

Lê ez zanim şîfa bi dermanê talê
Ji bo şîfayê tê xwarin

Namîyo metirs û bi hêvî be
Çunkî jehr berî hinguv tê amadekirin

5. وَأَنْتَ الْفَاتِلُ الْمَحْبُوبُ عِنْدِي
نُبَّاراً لِفُؤُومِكَ عَيْنِي تَدْمَعُ

6. وَمَا الْمَطْلُوبُ فِي الدَّارَيْنِ إِلَّا
جَمَالٌ وَجْهَكَ لَا غَيْرَ يَنْفَعُ

7. وَمَنْ هُوَ يَعْرِفُ الْمَطْلُوبَ حَقًّا
بِلاَ وَصَلِ الْحَبِيبِ لَيْسَ يَنْفَعُ

8. وَلَا يَحْيَى بِتِرْيَاقِ الرَّقِيبِ
قَتِيلِ الْحُبِّ إِنَّ الْحُبَّ تَمْنَعُ

9. أَقَاسِي بِالْفِرَاقِ مَدُّ زَمَانٍ
لِأَلَامٍ وَأَكْذَارٍ بِأَجْمَعُ

10. وَمَعَ دَا أَعْلَمُ إِنَّ الشِّفَاءَ
مَعَ مَرِّ الدَّوَاءِ لِذَاكَ يُبْنَعُ

11. فَلَا تَجْزَعُ أَيَا نَامِي إِيَّاساً
لِأَنَّ السَّمَّ قَبْلَ الشَّهْدِ يُنْفَعُ

QAFIYETU'L-ĠEYN

33. Ba şefa hatî keremkanê muruwwet wek çirağ

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

1. Ba şefa hatî keremkanê muruwwet wek çirağ
Te rewşen kir derûnê tarê nasazê me ê pur dağ
2. Bi xêr hatî tu sersarê emacid durrê lahûtî
Şifaya balê menşûbê hewaê semmeê îlağ
3. Merheba ey şehriyarê mulk û eqtarê yeqîn
Merheba ehlen we sehlen menbe'a feyz û belag
4. Mu'emmer kir te ev meylakê nayabê çu efsurde
Muşeref bû bi teşrîfet evê kemxaneê berbadê bê îfraq
5. Bi eqdamê tenezzul da surûrek ber dilê gemgîn
Tu ey kemsalê mehpareşifet ber cahê gul eşdağ
6. Cilaya bin ji wan dêmên fusûnsari tu ey cana
Muşeyqel bûne ez le'lê nugûnet kafeê eşbağ
7. Sezaê dê bikim fidye heyat û dewlet û abad
Nişarê ber qudûm şaha digel bal û serî bê lağ
8. Fida bit min heme mal û menal û 'umr û şadabî
Be an cahê zenuxdanê te ê mişkînê pur ez yağ
9. Çi bêjim tête tedwînê sîmatê ekremê 'alem
Muheyyer ma der în ne'tê mubarek min hişê ba zağ
10. Şenaxwanê tu bin ger tev duhatê dil furûzende
Nikarin şemmekî husna munezzeh kin be cah îblağ
11. Dexîlek ya kerîmel-xelqê vî 'ebdê heqîrê xwe
Feramûşê nekî în Namiyê melhûfê şewkê rağ

QAFIYETU'L-FA'

34. Were der Namî ji garê hunerê berzê şeref

Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun

1. Were der Namî ji garê hunerê berzê şeref
Bikeşîn seyfê zebanê **xwe** çi lahorê 'ikef
2. Were meydanê edeb berzi bike destê huner
Qesr û eywanê soxen pur ke ji eşwaqê 'ecef
3. Ji evê me'şerê fikrê xwe bide meyyê edeb
Bi hemî ehlê muhebbet bike sukran û zefef
4. Tu helîn gebrê keder ez dilê dilxûnê felek
Bi evê badê nizamê ji dilan helde zilef
5. Tu derîn **wadiê** gerdabê meşakil qe mehîl
Eserê men'ê wişalê li fihamî qer û qef
6. Qe nehin mişl û zehîrê te di afaqê emel
Kê bi me'cûnê **'iber** zexmê cîger xweş ke bi lef
7. Kî bi mişlê te serî daniye rah û xeteran
Kî bi şubhê te li ber tîrê qizil sine hedef
8. Ku bikit serfê heyatê xwe li meydanê hidaş
Di qewa'idê nizam lef ke zeraifê ridef
9. Nebûya mani'ê fikra me humûmê di evîn
Weku mehcûrê nebûna ji gulên bagê guref
10. Me 'elem berzi dikir ber felekê nezm û neşir
Bi huner zebtî dikir 'alemê guftar û xetef
11. Kê me ew zulfê perîşan di xatîr nebûyan
Ne dikir hinde ji vî terzê beyanê xwe esef
12. Ji fer û tabê nişatê ezeli gencê durîn
Me ji ustazê rumûzê hunerî dersê bi xef
13. Der ewê medreseê derkê nezim girtiye zû
Digerin seyrê di elwahê beran 'eynê şedef

14. Ji ewî badeê le‘lê du leban mestê dilîn
Bi me da saqîê sîm saqê feraxê di ‘îtef

15. Meke bes terkê edeb fexriyê bê cahî Fehîm
Nezerek carê bide ber dem û edwarê selef



QAFIYETU'L-VA'

35. Ev sorgul e yan sûret e yan şûşê gulab e ev

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Ev sorgul e yan sûret e yan şûşê gulab e ev
Yan ħusn û anê fîret e ev, mah e yan mehtab e ev
2. Gewher-feşan, cana di can ebrû hilal, tuğra nişan
Yan zew'ê xurşîdê cihan meynû ye yan meynab e ev
3. Tûba-nihal, leb le'lê fam, dev-günçe yan 'er'er-xiram
Şîrîn-zeqen ya dil-kunam yan qaşimê elbab e ev
4. Sur-muşterî yan **felzê** dil peyker-perî ya çav be kil
Reşmarê wê lef dane dil, hubab e yan zehrab e ev
5. Zuhre-cebîn yan sîmê saq-ebrû ne yan mihrab û taq
Qews û qezeh bê îlti'aq, ev çerx e yan dolab e ev
6. Yekta-elîf yan qamet e yan serwê bağê cennet e
Yan damê mewt û miñnet e, ev ab e yan serab e ev
7. Ev gemrevîn yan geyn û şîn, wê b' gemzeyan dil kir birîn
Çerkabê xûnên jê dizên, tofan e yan seylab e ev
8. Durrî-şifet yan xweş-eda, gerden-zu'ac, camê şefa
Elmasê ber tacê şeha yan nergizên seyrab e ev
9. Yan da û hem darûn e ev, ev qamet û qeddên lihev
Sûzan e dil jê roj û şev, îltab e yan sertab e ev
10. Ya Reb çi tel'et-kewkeb e ev, mehfera kakul-şeb e
Serdabê 'eql û can tev e yan hadirê eqlab e ev
11. Ĥusna ezel bû ew meger, tîrêjê da qe'rê cîger
Nîlê ji çeşman tête der, surxab e yan germab e ev
12. Tîbtabê bextê serdirû her nexmexwanê baxê tû
Ey bê 'eqil gafil meşû ev 'alemê esbab e ev
13. Namî divê camê meram ez menhela tilîn-zumam
Her wî divê ev şubh û şam yan işm û yan şewab e ev

QAFIYETU'L-QAF

36. Pîr kırım hicran û ekdar û evîn der îştîyaq

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Pîr kırım hicran û ekdar û evîn der îştîyaq
Bes nebûn hêj ev kule dehem bi dil tîra fîraq
2. Kuştım û sohtım be lem'a muhbetê yekser hebib
Zêde kir vêkra hubabê îktirab û î'tilaq
3. Hêlqe bestîn wan li dor fikra me ya pur gâile
Perçem û xalên muselsel ebrûyên çun qewsê taq
4. Serteser şebr û sukûna dil birin çavê di reş
Wan ji ressamê zerafet girtine lewn û siyaq
5. Şûrîdeya gulşenmekanê zîwerê heffafê ber
Hiştıme wê ez di zîrê barê kulên malayutaq
6. Ev çı teşwîrek bedî' e ma di vê camê hedî
Naêtin heddê mişalan bîm tîrazê întisaq
7. Wale mayın hoşê dil û ma her di seyranê ziraf
'Eynê terkîbê gul e rûwê munewwer can şıdaq
8. Kewkebê se'dê şefeq ew necmê îqbalê 'uşşaq
Rewneqê leyla qulûban kirme halê îftiyaq
9. Em ji hicranê ewê yarê şepal û dilşikar
Şubhê barût in di topa fîrquetê der înfilaq
10. Hem şifetmecnûnê dewran in di **wadê** 'izletê
Nagihêtên kes bi me der în xîşalê îltiyaq
11. Ger çı der ayineê efkarê bedbînan wereng
Geyrê mebrûr in di eşkal û şifate îlti'aq
12. Ah çı bêjim ber cefa û mişnetê hicranê dem
Teb'ê efkarê selîm ez men birin cewrê nifaq
13. Zîhnê çalak em in er lê nebûna ev elem
Ger di nêv în asiyabê ateşên wî însihaq

14. Dî me ez gencê xiyalê xariqe bîna nîzam
Sed neseq eş‘ar û beytê dilkuşaê çun şelaq
15. Lê çikim dil min bi teşbîhê mekes ew ber nebat
Ber cemalê dilgudazan kirye carek îltîşaq
16. Can û dil hûş û ‘eqil hemyan digel hev wan qesem
Gohtine nakin ebed terka ewan le‘lê hîdaq
17. Ger çiqas bêtin ji alê dilrûbaê wan sitem
Dê şebatê **tim bikin** ber merkedê te‘b û meşaq
18. ‘Usr û yusrên pev muradif ba nişatê în umîd
Her çi reng mewcûdi bit der wesl û şadê î‘tîyaq
19. Lazim û melhûz e carek pêkve naza qendê leb
Kemtir e der asîtan ra dilnewazê ket wifaq
20. Bîne der vî girtiyê bê curm û heyranê cemal
Ew ji zindanê cefa ya meyl û şewqa îltîşaq
21. Ez kemerelmas û zêrîngoşiwara **sengidil**
Nîne meqşûd û keser min qet ji geyrê î‘tînaq
22. Bes ke Namî z’ în soxenhayê bisûzê ateşîn
Z’ an bi cergên ehlê dil **bêtin** elîm yek îhtîraq²³³

²³³ Bes e bêje Namî van gotinên sotîner ên agirîn
Ji wan bi cergên ehlê dil têtin eş û şewat

QAFIYETU'L-KAF

37. Kanê gelo mahê felek kan dêmdurra sîretmelek

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Kanê gelo mahê felek kan dêmdura sîretmelek
Jê ra dinalê dil gelek kan dilfirîba çavbelek
2. Kanê hebîba çavbikil kanê dihanê şubhê gul
Kan gemrevîna bal û dil kan biskê **qumralê** xelek
3. Kanê 'eceb yara şepal kan qameta tûba nihâl
Kan serwêbalaê cemal kan berhunavan çûn **mexek**
4. Kan ebrûyên şubhet keman kan gerdena sîmîn şeban
Hicra wê ez dil bir tuwan kanê besîma xweş-şenek
5. Kan xed-zerîfa mahitab kan saqiya camê hubab
Cergem ji hubbeş bûn kebab, şeq kir û pê werkir nemek
6. Kan bejn û balê wek elîf kan zend û bazê pur zerîf
Kan terfê şehlayê şerîf kan dursinanê der şebek
7. Kan le'lê famê 'enberê kan xweşxirama surperê
Kan şekl û sîmaê zerê serdeftera hûr û melek
8. Kan bedrê îqbalê dilan kan necmê bextê kamilan
Kan werdê yarê bulbulan sukranê vê husnê gelek
9. Kan zuhreya husna qedîm kan mehfera qelbê Fehîm
Kan ba'îşa zexmê elîm jê girtiye dil şemmeyek
10. Kan lefz û goftarên di xweş ew reqş û hem riftar û meş
Ew gebgeba nûrîn neqş kan dilşikara bê tufek
11. Kan reng û ruwê pur munîr nû kin di wan mijganê tîr
Dil da çûyin nakin ji bîr têtin me **bîrê** yek bi yek
12. Kan nîne bes ey rezqeba ev hicr û îb'ad û cefa
Kan 'ehd û peyman û wefa ahim ji esman ta semek
13. Bê hoşî kir tev ins û cin nifret dîkin êdî ji min
Kan soz û we'dê dayî min naên di bîret jê hinek

14. Kanê çira naên xiyal ey qumriya ferxende fal
Ba xendeê xurşîd mişal nabit me dil **xweşkê** demek
15. Kanê were ey mehcebîn halê esîrê xwe bibîn
Dil tev bûye cerh û birîn mexşûbê derba xencerek
16. *Meqtûlê seyfê ebrûyet dil bendê damê keysûyet
Leb teşnê camê meynûyet ez kes murad û meqşedek²³⁴*
17. Nîne bi cuz tu ez kesî ey kanê ferwarê xweşî
Mişbah û sertabê reşî dil nîne cuz tu merkedek
18. Em ‘abidê husna te ne ber asitan yek tûle ne
Amancê newbarên te ne ey şehsûwarê neh felek
19. Kanê bi Namî we‘dekî dayî zeman û weqtekî
Der gulşenê ber textekî yarê kerem ke pûseyek
20. Ez payê daim ber riqab ey menbe‘ê kamê hubab
Helde ji mabeynê hicab rewşenhîdeq bin sa‘etek

²³⁴ Kuştiyê şûrê birûyên te dil giriftarê dafika zulfên te
Lêv têhniyê cama zimrûda te ye nîne ji kesî murad û meqşedek

QAFIYETU'L-GAF

38. Dîsan ji qewseynê ebrûyan tîn cerg û mil tîr û xedeng

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Dîsan ji qewseynê ebrûyan tîn cerg û mil tîr û xedeng
Amancê wan tîrên nihan dil min nemaye lewn û reng
2. Zer bûne şubhê sunbulan ez firqeta şebra dilan
Der her seher çun bulbulan em nale-sazan in bi deng
3. Ez derd û heşret her demê tim natuwanê ser semê
Dûr in ji her keyf û kemê sukran û heyran û pereng
4. Şubhetê pereng û agir in nale ji hev qeş nabirin
Heşret di dil de wer pir in jê mest û serxweş in 'edeng
5. Serxweş û mest in bê xemir wan çeşmê cadû 'eqil bir
Şed pencere der dil vekir pê da teqand top û tufeng
6. Pê afirand peykerperî çavsurmeya dilmuşterî
Şehzadeê dil kir kerî tê da civand qınçarê jeng
7. Jenga humûmên firqetê benga bi'ad û hicratê
Heştin di halê heyretê durra dimagê kirye seng
8. Durra şu'ûr kir wê siya kerdin bi ab û kil teba
Şebr û sukûna dil reva nazikbeden heybetpileng
9. Heybethizebra çavgezal reyhanê rewzâtê cemal
Xurşîdê eflakê xiyal gerdenşemala şox û şeng
10. Gerdenzu'ac gunçedihan sertabê cergên natuwan
Gulabê fincanê dilan kuştim bi wan zulfê çeleng
11. Kuştim bi zerba xencerê şah û şepal û şehperê
Bê hal kirim wê dilberê talan kirim bê herb û ceng
12. Bê herb û ceng wê îstila kir mulkê eqtarê dila
Pur dane ber te'n û sera ser'eskera Rom û Fireng
13. Ser'eskera seyyarê hubb necma sema kubrayê dub
Ber dîn hilakê can û lub kir ber bi ba şubhê kereng

14. Bûn ber bi ba şubhê gubar qehr û ezayên dilşikar
Ten kir bi xwûnabê qesar êvar li min hat bû dereng
15. Hat şamê ‘umir der meraq meqtûlê newbarê firaq
Bes nîne ev te‘b û meşaq ber van esîran dil meheng
16. Bes ke Xuda ra zerqubab nazan li Namî malxirab
Dil min bûye ‘eynê kebab naê ji min yek şewt û deng



QAFIYETU'L-LAM

39. 'Ew'ewkerdenê Namî be dergahê Seyyidu'l-Enbiya

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Ya Resulellah dexîlek ya Ebel-Qasim dexîl²³⁵
Ya Hebîbellah dexîlek ya Ebeṭ-Ṭahir dexîl²³⁶
Muflis im hem mustemend im şahibê zenbê seqîl
'Aşiyê der qeyd û bend im qasîy û jar û kesîl
Milxûrek bê çare me deryûze û kemter zelîl
Rûreş û şermende û pur bê medar û hem sefil
Min penah geyrê te nîne ey Mudessîr ey Xelîl
*Ya Hebîbellah dexîlek ya Ebel-Qasim dexîl*²³⁷
2. Şafî'ê zenbê giran î hamiê roja 'esîr
Mehderê me 'aşîyan î bal ewî Şahê Qedîr
Ya Nebîyellah ricakar im nekî tu min ji bîr
Abê rûyê xwe me rihtîyye di van curmê keşîr
Min di dest nîne çiragê ta'etê Rebbê xebîr
Lê umîda min tu yî her ey Muzemmil ey Beşîr
Der ewê roja ku sultân û melîk tê da esîr
Ya Resûlellah dexîlek ya Ebeṭ-Ṭahir dexîl
3. Şermendeê xibşê **fi'al** im tairê ewcê berîn
Xatîe sûc û webal im îneke heblel-metîn
Ez kilabên asitan im ey Şehinşahê mubîn
Kelbê xwe mehrûm nehêlî ez şefa'et ya Emîn
Dê çi bî ḥalim ku mehder tu nebî ey Mehcebîn
Wey li ḥalê min heqîrî şed hezar ah û enîn
Der ewê cahê li her kes nû dibin cerḥ û birîn
Ya Hebîbellah dexîlek ya Ebel-Qasim dexîl
4. Zenb û curmê min giran in mişlê yek kûhê rişaş
Muflis im ez zadê teqwa nîne yek e'malê xaş
Tev evan ef'alê napakî çisan dê bim xelaş
Ez ewê nîranê muḥriq bê nihayet îftiraş
Hem li ber mîzanê e'malê nihayet derg û raş
Defterê xeyran ji **êdî** ba çi reng kim îftişaş

²³⁵ Ez xwe diavêjim ber dergahê te ya Hebîbellah ya Bavê Qasim.

²³⁶ Qasim navê kurê Hz. Pêxember ê herî mezin e, ji ber vê jê re "Ebû Qasim" hatiye gotin. Herwiha Ebdullah jî kurê wî yê duduyan e ku "Ṭahir" û "Teyîb" jî navên wî yên din in. Ji ber vê Pêxember wek "Ebû Ṭahir" jî hatiye navandin.

²³⁷ Ez xwe diavêjim ber dergahê te ya Hebîbellah ya Bavê Qasim

Ekremu'l-mexlûq û sultanê der an cahê fihaş
Ya Resulellah dexîlek ya Ebeṭ-Ṭahir dexîl

5. Nale û efğan û zarî her li ber dergahê tu
Bo resûlanê mewalî ewwel û uxra yî tu
Qefle salarê nebîyan, menbe' û mecra yî tu
Mewşûfê **lawlakê** Xuda, ekber û e'la yî tu
Durrê der behrê cemal î gewherê wala yî tu
Ez kullê mexlûqê hey ra seyyid û bala yî tu
Rûh û canê min fidaê an qed û sîmaê tu
Ya Hebîbellah dexîlek ya Ebel-Qasim dexîl

6. Şafi'ê zenb û xeta yî Ey Resûlê ins û can
Dafi'ê alam û ewda î şehê ba 'izz û şan
Nafi' û hem rehnuma î her zeman û hîn û an
Mani'ê zenb û weba yî ḥakimê ḥukmê giran
Cami'ê şidq û wefa î ummiyê gewher-feşan
Sami'ê lefzê Xuda î der serayê lamekan
Ma nesîni fil-hisabi nûre 'eyni el-eman
*Ya Resûlellah dexîlek ya Ebeṭ-Ṭahir dexîl*²³⁸

7. Puşt û 'ewna van 'uşatan her zemanî da tu yî
Der cihê nacih de bê hed bo me zarî kir li wî
Qedre tu zehf û bulend e mehder û melce' tu yî
Cuz bi te kî ye ku şahib bê li me dîsa tu yî
Xaliqê ekber şefa'et daye te **yebne Luwey**
Ez sekê dergahê 'alî me feramûşi nekî
Min di wertê xewf û bîm de wer nehêle bo xwe kî
Ya Hebîbellah dexîlek ya Ebel-Qasim dexîl

8. Mame der gencê gumûm der xelwetê şebhayê tar
Nîne cuz tu ferr û ferwarek şehê 'alî tebar
Pêl û emwacê durûdan kuştine ah û hewar
Tîgi hildane û rimbazê felek têtin bi gar
Yarê ma mehzûni kerdin zewqi dan ehlê neyar
Ma nedî aram û raḥet, kerb û ahîn bê şumar
Tim **me jî tirs e ku** pê gafil bimînîm biçme nar
Ya Resûlellah dexîlek ya Ebeṭ-Ṭahir dexîl

9. Namiya her çendi bêjî weşfê şahê nîki nam
Şed hezar ferdî bibêjî nabitin eşla tamam
Qeti' û cuz'ek fer ji ewşafê ewî fexrê enam

²³⁸ Min di roja hesabê de ji bîr neke rohaniya çavê min
Ez xwe davêjim degahê te ya Resûlallah ya Bavê Tahir

Ez ezel wî ta ebed tu her şev û rojan mudam
Bê sukûn goyende bî qeṭ mumkin e ḥellê muram
Erwuha zanî bi 'icza xwe şelawat û hem selam
Hedyeke jê ra we vêra neqşike lefzê xitam
Ya Hebîbellah dexîlek ye Ebel-Qasim dexîl



40. Saqî Xuda ra badeê bîne ez an le‘lê zulal

Mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun

1. Saqî Xuda ra badeê bîne ez an le‘lê zulal
Der zerfê an şehkaseê, dil teşneê camê wişal
2. Dil teşneê dîdar e her, muştaqê an gulzar e her
Der arzûyê dildar e her, eħya bike Luqman mişal
3. Luqman tu ez xeste em, ba damê keysû beste em
Ez marê şeb dilgeste em, derman me ra cuz tu meħal
4. Cuz tu nehin darûyê dil, ey şafîya cergên di kul
Dil daği kir tîrên qizil, min jî nema şebr û mecal
5. Ten tê nema tab û tuwan, ez fîrçeta hûra cinan
Kakul-şeba dil-aşîyan, sewda kırım bejna şepal
6. Sewda kırım simînberê, kuştım bi çerba xencerê
Feryad ji zulma dilberê, muxtel kırım fikr û xiyal
7. Muxtel kirî hoş û ‘eqil, reşmari berdane li mil
Şeb xewnê da ber qelb û dil, em dîn kırım ebrû hilal
8. Hêsîr kırım zulfê siya, hûr kir cesed da ber piya
Qeṭ guh neda ber zariya, wê lebluala meh-cemal
9. Wê lebzulala newnihal, wê dilşikara çavgezal
Wê qedgula mişkînfişal, devxunçeya ferxendefal
10. Devxunçeya gerden çu cam, şehzadeya ‘er‘er-xiram
Ken-haleyâ meyxweş-niyam hiştım di hicranê fişal
11. Hiştın di hicrana xwe da, tîr pê li meylaka me da
Xef bû di ‘eynê perde da, maîn di gerdabê melal
12. Maîn di gerdabê keder bê yar û dildar û mefer
Ez mêj reşın bext û qeder em bê xwedan in ey heval
13. Ez bê xwedan im bê kes im bê şewt û gulbang û hes im
Der ‘alemê xar û xes im îdbarê men geħha kemal

14. Gejya kemal îdbarê me îqbali zîra lazim e
Reftin sema efganê me borîn li min pur mah û sal
15. Borîn li min sal û zeman pur miḥnet û beste dihan
Der qeydê efkar in çunan bes nîne ma ev çend zewal
16. Bes nîne ey bê aşîyan der qehr û azarên giran
Zîr destê van kafirdilan rabe dilê sukran û lal
17. Rabe dilo xwe b' xer bibîn 'alem tijî ke ab û xwîn
Heyfa li ber maî helîn xal û xeṭan ke payimal
18. Bistîne heyf yan berde ser naên kişandin ev keser
Îbzazi ke destê huner î'lanî ke ceng û cidal
19. Î'lanî ke xwazê xwe tev gafil memîne roz û şev
Naên rehet em ber bi hev bê zor û ḥukm û îxtilal
20. Bê zor û ḥukm û xûnfeşan nail bi meqşûda dilan
Nabê muheqqeq vê bizan bê kuştin û qetl û qital
21. Bê zorê bazûyan ebed nagîjî burca xal û xed
Nabîni eşlen qam û qed 'umrê me çû bûm pîr û kal
22. 'Umrê me çû der gaile der kerb û firq û faşile
Der tîrs û xewf û haîle bîn lê nihayet bê mecal
23. Bîn lê nihayet malxirab poz daî ber xak û turab
Ey kundumê nêv asiyab furşet nema da min vemaal
24. Furşet nema nêz e ecel tersîn bike qeşrê emel
Xweş nîne mey qeṭ bê meḥel feyde nehin der îmtîşal
25. Feyde nehin bê faide xusran e bel ev qa'ide
Fertê îta'et za'id e bo xusrewa bê dad û bal
26. Bê dad û bal î ey heqîr rojek te qeṭ natîne bîr
Mijgan di dalan şubhê tîr sukran û mest in ey heval
27. Sukran û mest û ebter in ez kutleê 'alem der în
Bê ceşş û mulk û efser in bê keyf û zewq û hem peyal
28. Bê keyf û sağir bê tereb ba 'izlet in der roz û şeb
Kerdim ez în terkê ḥesab reftem bi ber çol û cibal

29. Reftim bi çol û wadiyan dûr im ji zewq û yariyan
Sewdaserê dildarûyan sukran û wê ruxsarê al
30. Mest im ji fincana ezel eyqanê ra ‘eksu’l-‘emel
Natîne qeç meyl û xelet ez xilqetê ma ev xişal
31. Mexşûş e **bel** şe’nê **me ra** der mişwerê în macera
Ger çi li min şebra dila kirye ‘itab bê curm û qal
32. Bê curm û sûc û bê guneh der hâlê hicran hiştîme
Vêra dikit nazan li me ateş feşan şerq û şimal
33. Ateş feşand an sengê dil kerdem ji yekser ab û kil
Aşûbê bazarê ‘eqil şaha li eqtarê qibal
34. Şaha li ber textê evîn hem afeta rûyê zemîn
Derd û bela ya dergemîn mayem di zîr barîn şîqal
35. Namî helîn êdî bes e xame ez în mumaris e
Nabin ebed muqayese şadiyy û talî der meal

QAFIYETU'L-MÎM

41. Ji nagah berqê bañin bû li dil da wî verandin em

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

1. Ji nagah berqê bañin bû li dil da wî verandin em
Ji ebrê hicrê mañin bû ji taqet wî birandin em
2. Me pê îdbarê kamil ma bi wî ra bextê kasil ma
Bi zâtê yarê naqil ma bi **musfayê** wî gehandin em
3. We vîra 'umrê 'acil şod bi kullê halê şamil şod
Li 'eksê pendê 'aqil şod bi yaban wî revandin em
4. Di yabanan kirin mecnûn di derbanan kirin mehzûn
Çu şetkefdan suruşkê xûn ji mehbûbi wî qetandin em
5. We hiştin ebleh û sewda bi huzna tim kirin mewda
Li min kir şed neseq **ewda** bi erdê ra kişandin em
6. Qesem ber zulfê yarê min nema d' gulzarê xarê min
Enîn û ah e karê min di hev da wî civandin em
7. Di dil de derdi şed bar in ji cerhan kêmi cobar in
Bi tîrên gem birîndar in **bikê** zexman nişandin em
8. **Bikê** zexm û birînan ez nişandin pê dewa kin lez
Ji can ra nîne yek merkez li hevdû wergerandin em
9. Hekîmek haziq û dana şifet-Luqmanê dil cana
Tedawiyê dil bikin vana demek belkê dijandin em
10. Dewaya wuşleta yarê qe têtin şehneya çarê
Ji nû 'Îsa kê bê xwarê dibê goh **berevandin** em
11. Newaê dê netê goş im divê ez belkî bê hoş im
Bi benca hicrê serxweş im çi san goşê bivandin em
12. Siyahpoş îñ bi çeşmê dil zehernoş îñ bi cerhê kul
Fîğanroş îñ wekî bulbul gulan ez dil hejandin em
13. Edaya qameta '**eylê** evîn zû muhbet û meylê
Kezeb danîne ser sêlê ji cî wan hilfirandin em

14. Ji cî wan hilfirandim ez, me ‘umrek hat bihûrî lez
Ji dest çerxê cefa **hergez** felek vêra bezandin em
15. ‘Eceb sermest û nalan im bi dil êşa xwe kalan im
Esîrê terhê xalan im firaqa wan helandin em
16. Firaqa çavkila gulrû tîr ez mijan keman-ebrû
Li min da û nehin darû bi gemxwarî mirandin em
17. Bi geflet ‘eqreban gestim bi dagên firqetê mest im
Hinan zanî kê vengdest im ewan lewra çixandin em
18. Tu ey can ba **dil î** tevde herin nik yarê puşt-perde
Birêjin lê kul û derd e bibîn Namî şihandin em



42. Bext û ali‘ me ne yar e ji ezel end feta bim

Mef‘ûlu mefa ‘îlu mefa ‘îlu fe ‘ûlun

1. Bext û ali‘ me ne yar e ji ezel end feta bim
Nayab im û her an ku iqas nûrê feza bim
2. Zehrabeê dilxûn im we reng der camê felek
Sukût û dehanbeste me ger endi deha bim
3. Dilxwahê mi ra nîne qebûl we tune rewac
Der nezdê bewabî ewî dilkam û ebab im
4. Ey badeê ahê meyê we cangahê ji mêj
Key wailê dîdarê te û ta bi liqa bim
5. Sed nale ji dil tèn me ji ber **pêta** evînê
Der wadeê amalê te ez xak û turab im
6. Wabesteê fermanê tu yim ubh û **mesaa**
Bes nîne ‘eceb ev te divê êdî awa bim
7. Mewcûdim we dilqê me di her new‘ê ‘edem
Der seneê ezwaqa tenê ‘eynê serab im
8. il sal bi hewarên me di vê halê elîm da
Burhan e ji bo sihetê de‘wa me kitab im
9. Seylabê humûman lê tenê waleê min bû
Diketin ço û xuroê gêj û mest û xerab im
10. Di qameê dîwanê surûrê dil û dan
Wer guh bide carek bi evê neyy û ribabim
11. Ey mehferê afaqa meramê dilê kul
Cuz tu ji kesî ra qe nehin erz û xitabim
12. Efganê ji qe‘rê evê cergê anîn
Mesûlê evîna te ne ey tac û qibab im
13. Gerdûnê heyatê li me ep fetlê didêt
Efkarê mufî me ne esbabê ‘itab im

14. Yek car nezerê te li evî jarê nekir
Ber şîşê **evînet** ez şubhê kebab im
15. ‘Umrê me bi ser çû di evan cewrê peyapey
Çavên te ji dîdarê nebûn zi der rikab im
16. Rojek ku ecel bê yekser biçme bi gorê
Der meħbesê hicra te eger meħw û fena bim
17. Ez ‘eynê kerem yek nezerek ber me dehem
Ji Xuda ra me feramûş nekî ‘umr û şebabim
18. Çi dema bêyî bi ser turbeê Namî bi xiram
Tu b’ lûfî xwe selamek l’ me ke barî ku şa bim



QAFIYETU'L-NÛN

43. Mersiyeê naçîzê meal ber şehadetê Şahê Delal

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Rewneqê fushetserayê Muştefa yî ya Huseyn
Werdê der gulşennewayê dilkula yî ya Huseyn
2. Saqiyê nîlê muhebbet rewşenê leyla-dilan
Şahidê rehmet nişarê kibriya yî ya Huseyn
3. Bulbulê xweşxwanê bagê 'Ednê durcê la feta
Tûtiyê newzendê an Xeyrun-Nisa yî ya Huseyn²³⁹
4. Serwerê koma şehîdan aşinaê qurbê heq
Şahibazê şahiqê alê 'eba yî ya Huseyn
5. Menbe'ê nehrê siyadet necmê burcê hel eta
Şehsuwarê zumreê pur-îbtıla yî ya Huseyn
6. Şebçiragê qeşr û eywanê sebat û me' delet
Şahizadê zatê leysê Murteza yî ya Huseyn
7. Murgê ber Qafê qena'et pêşrewê ehlê wefa
Sernihadê rahê heq efser-feda yî ya Huseyn
8. Dağê ber cerhê cîgerxûnê felek ez cewr û da'
Badiê xef newheyê erç û sema yî ya Huseyn
9. Ba'îşê xûndem'ê çeşmê **dûribînanê** duhûr
Pêşîwaê cumle merdên canfida yî ya Huseyn
10. Sengê meydanê şeca'et cûyê kanê me'rîfet
Şaxê şemşadê gulistanê sexa yî ya Huseyn
11. Ferxê şehbazê teyyarê sidre û her neh felek
Naheqan ra bexişkerdê textiga yî ya Huseyn
12. Çûn nehengê serberared ez yemmê şidq û riza
Der semaê rasîti sîwanveda yî ya Huseyn

²³⁹ Ji "Xeyrun-Nîsa" meqsed Hezretî Fatima ye. Yanî xêrdartira jinan.

13. Şîreê şaf û beraqî me‘serê Xeyru’l-wera
Rehrûwê xeylê şehîdên Kərbela yî ya Huseyn
14. Ahi ez an hesretê dilsûzê weqtê bêkesî
Ber heme qelban tu dagê ba cefa yî ya Huseyn
15. Wa dirîx û hesret û ah û enîn ez an zeman
Teşneganê Kərbela ra dilpena yî ya Huseyn
16. *Ah çi goyem hesretê leb-teşneê abê Ferat
În dilê bê tabi ra zehrê fena yî ya Huseyn*²⁴⁰
17. Ba soxen guften tamam nabin durûdên xûndilan
Leq leq çûn ne‘tê Namî ra seza yî ya Huseyn

²⁴⁰ Ah çawa bêjim hesreta lêvtêhniya ava Feratê
Ji vî dilê bê tab û qudûm re zehra tuneker î ya Huseyn

44. Bê tab û mest im ta ebed ez der firaqa tûtiyan

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Bê tab û mest im ta ebed ez der firaqa tûtiyan
Hat min bi ser çavan remed ew çeşmê şehla naxuyan
2. Ew çav û ebrûyên siyah bûn **badiyê** feryad û ah
Der her nefes dared şeda cerg û cîger xûn pê giyan
3. Cerg û kezeb tev bûne xwîn dil gestine marê şevîn
Tebdîl bi huznê bû evîn xew nakirin şev tîriyan
4. Xew nakirin ez cerhê kûr zexmên ku daîn dil bi şûr
Hicra xetî û xalên bi nûr em kirne tûtakên çiyar
5. Em kirne şeyda û neçar hat pê giha feşla behar
Şûna gulên de mane xar lew dil dikêtin zariyan
6. Lew dil dîkî ah û fiğan her lehze û gav û deman
Mijganê tîr burhên keman kuştîm bi derbên kaşoyan
7. Kuştîm bi derbên keyberan dil girt û da ber xenceran
Hicra hilalên ebrûyan jan da hunav û hestiyar
8. Jan da û pê rencûr kirin ba naleyan mecbûr kirin
Me'yûs û dil meksûr kirin **pey da me** şaha cindiyan
9. **Pey da me** û hiştîm gerîb bê hemdem û yar û hebîb
Der qehr û azarên 'ecîb xûn-eşkê şubhê kaniyan
10. Têtin jî çavan ew mudam heşretkeş în em şubh û şam
Sewda û dîn û wale mam teşbîhê mest û bengiyan
11. Mest im bi cama firqetê çeşmên di xwabê raşetê
Hiştîm di nêva zulmetê ta bi liqaya mehriyan
12. Ta bi liqayan çû gurûb cûş daye deryaê kurûb
Badê nesîm nakit hubûb ez alê wikrê qumriyan
13. Ez alê an gulşensera natêne şemmeyan seba
Z' an tîl'etê mahê liqa mehrûm heştîm gurciyan

14. Baġe cîger lêda xizam nalende em der şubh û şam
Aram û wuşlet kir qiyam lê hêj dikim ez şukriyan

15. Namî tu her çendî hezîn maî der î n sethê zemîn
Lakin heye yarek çunîn serdarê kullê hêviyan



45. Hey felek dîsa te kul kir cerg û nalanê di min

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Hey felek dîsa te kul kir cerg û nalanê di min
Agirek tê de te hil kir herîşîn kovanê min
2. Kel dide behra di dil de ew ji hicranê mudam
Lewra tèn saha qerarê ah û efganê di min
3. Ah û efganê ku têtin min ji ber sûzê cîger
Jê nema şebr û şebata 'eql û îz'anê di min
4. Kan felek durdaneya dil, kan le'lê enwerî
Cewhera min mihfera min qûtê dan û canê min
5. Kan ew ti flê me ê nûzad û me'sûm û neqî
Badeya qelbê muellem şebr û hoş û danê min
6. Kan ew çehvê reşhela kan zulfê ta bi ta
Kan cewa min kan kewa min kan lebê xendanê min
7. Kan an şaxê zerîn berkê dil nayabê çak
Zerçema bûye ji nageh gönçê werdanê min
8. Naxuyên êdî çima ew perçem û dêmê bi nûr
Hatika min rindika min merhema cerhanê min
9. Rindika çavsurmedayî fêkiya qelbê seqîm
Rûgeşa min bînxweşa min şerbeta lebbanê min
10. Badeya eşkê me ê gulgun têtin bê mecal
Dağê dil nû bûn me dîsa reş gerî dewranê min
11. Ev elemdarî ji bo min 'adetê eqdem wiha
Xerqê mayî di nêva taş û hincanê min
12. Namiya der kezebê çun agirek şûzan e ew
Her çîqa bêjî digel tèn eşkê seylanê di min

46. Fehîm rabe sivik dîno te nêzîk ma ecel bêtin

Mefa 'îlun mefa 'îlun mefa 'îlun mefa 'îlun

1. Fehîm rabe sivik dîno te nêzîk ma ecel bêtin
Wekî sayê wucûda te li pey te tim bi lez têtin
2. Xwe pêk bîne û hazir be derew nîne mebe gâfil
Mirin rojek muheqqeq tê ji kes re dostî nakêtin
3. Çira nakî tefekkur qeş zewada axretê kanî
Ji wê ra tiştê lazim bê di bîra te qe naêtin
4. Mexapîn dil bi lehwan her hemî pir kurt û fanî ye
Herî mayî ji bo wan ra te her dem neqşê navêtin
5. Gelek 'ar e kesê zana dibê kê m ji hevalê xwe
Nizanî van yeqîn rast in te şerm û fedî avêtin
6. Te perda şermê hildaye ji rûyê ebdî û 'eqlî
Dikî de'wayê zanaî bi servalaî nebêtin
7. Hilîn tîr û kemanê hiş bikêş meydanê merdane
Tirseke serkeşî şermî ev e sistî û dûravêtin
8. Hûşûla meqşedan ger te divêtin bo xwe ra çar kî
Tu berde qebliya weslê ebed kê mî di wê nêtin
9. Sivikbarî bi dilsarî meke hêvî ku haşil bê
Şugulgermî **di vê nermî** digel hem xûnê dil rêtin
10. Teemmul ferzekî 'eyn di her an û deman 'ebdo
Tu weqtek bê mirin eşla zeman nabî û naçêtin
11. Bimir berya mirin Namî bi vê merhem de kovanan
Kemala her du alîyan bi bê tedbîrî nabêtin

47. Mersiyeê Namî ber mergê bêweqtê birader

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Dil kul kirim cewrê felek ah û enîn ah û enîn
Kan naxuyan çeşmê belek ah û enîn ah û enîn
2. Şed heyfê lêvê şekkirîn çûn û we êdî naxuyên
Qelb û cîger pê bûne xwîn ah û enîn ah û enîn
3. Ah û fiğan û şed hewar gaziy û nalîn bê qerar
Dil xûn kirim hicra geddar ah û enîn ah û enîn
4. Zülma felek mehcûr kirim nalende û rencûr kirim
Anîm di hev de hûr kirim ah û enîn ah û enîn
5. Ey **dilbera** zalim çira hunda te kir şîrîn bira
Dilkul te hiştim bê çira ah û enîn ah û enîn
6. Cerg û dilê min kir birîn heştim wê **milxwar û** hezîn
Bûyin enîs derd û girîn ah û enîn ah û enîn
7. **Gelek** bedbextê bêwefa bo min bi kîn î her wuha
Carek neda min yek şefa ah û enîn ah û enîn
8. Cefadeh î bo min muqîm kerb û durûdên pur elîm
Xaş î ji bona î yetîm ah û enîn ah û enîn
9. Şefqet li min carek nekir her gav bi min ra hîle kir
Sebr û sukûna min ku bir ah û enîn ah û enîn
10. Înşaf û murwetê te ka ev çi ceza ye çi eza
Bes nîne êdî ev cefa ah û enîn ah û enîn
11. Ev çendi kîn ey bê edeb ev çendi zexm û renc û te' b
Şeq kir te pê cerg û kezeb ah û enîn ah û enîn
12. Mehcûriyê dil herişand şîşên di şor têda tewand
Ker kir cîger xoy lê reşand ah û enîn ah û enîn
13. Heşretkeş im wer ta ebed der dojhê firqet kebed
Ahîm bi afaqan resed ah û enîn ah û enîn

14. Min xûnşirînek xweş hebû bo xwazê min amade bû
Mêrek durust bê hîle bû ah û enîn ah û enîn
15. Şêrek şecî‘ namûskar şuhbetşirîn şahibweqar
Tiryaqê yar zehrê neyar ah û enîn ah û enîn
16. Xêrxwah û rast û pur emîn dana û çapik gemrevîn
Yarê şefîq benda metîn ah û enîn ah û enîn
17. Şohtim firaqa wî eman hetta hebin dewr û zeman
Nakim ji bîr burhên keman ah û enîn ah û enîn
18. Derdê mezin da min Xuda hemd û şena hemd û şena
Emret li ser çehvan Îlah ah û enîn ah û enîn
19. Ya Reb bi heqqê Muştefa min xatîê hem rû siyah
Meħrûm nekî rozê liqa’ ah û enîn ah û enîn
20. Namî ji mêj derdê dirêj muqedder est we bes bibêj
Danaê ger laliyy û gêj qafê ji ser kafê helîn

48. Can bê cemalê canan meyla cihan qe nake

Mef'ûlu fa 'ilatun mef'ûlu fa 'ilâtun

1. Can bê cemalê canan meyla cihan qe nake
Çi b'kim bi xan û manan yar lê deran venake
2. *Bê dost zendeganî zewqê çunan nedared*
Der in cihanê fanî dil lew me derdinak e²⁴¹
3. *Ba hîçi kes nîşanî z' an dilsitan nedîdem*
Cuz yarê dilşikarim an kîsti dil dewa ke²⁴²
4. Ma ra çû fûrê çeşme her an dihan şeker bit
Der halê gemkisarî derd û geman bela ke
5. Ba dil we reng enîsî bikit pê şefqewarî
Feyzê huner ku bêtin ber cismê xerd û xak e
6. Z' an dewlet û se'adet nehin sehmê me ey can
Yaret herûz xuya bit ez pace û şibake
7. Ez penceran xuya bin çeşmê şehîleê reş
Ba xendeê dilara dîsan dilê me şa ke
8. Xiyalê rûyê zîba meykerdi dîde pur xûn²⁴³
Hewayê zulfê tarî 'umrê me bir hilak e
9. Tên ez qewsên hilalî peygan muqîm li dû hev
Mijgan di dil de **çûyin** me wek tîrê Dêhak e
10. Kan dilbera perîrû şebra dilê **be** eş im
Ber men be **meş kê** bêtin biskên xelex li ba ke
11. Rû min ebed nebûyed neynik li çehreê bext
Bû pasupanê ferman nekir ku perde rake

²⁴¹ Bêyî dost zewqeke jiyanê a wisan tune

Di vê cihana fanî de dilê me ji bo vê derdnak e

²⁴² Min digel tu kesî nîşanek ji wê dilstanê (dilber) nedît

Ji bilî yara dilnêçîr ew kê ye ku dê dil dewa bike

²⁴³ Xeyala rûyê delal çavan tije xûn dike

12. Ew zalima kevirdil namê dîger felek bûd
Ez beynê ma' û tali' îqbalê came pak e
13. Yar bin ji bo me carek camek ji le'lê şafi
Noş kin bi zewq û aheng dil pê bê tabînak e
14. Deryaê dil bi coş hat ba mewcê atêşîn est
Vêra bi hev bi **kel tê** wê 'alem îstila ke
15. Luţfê tu Rebbê 'am est agahê halê ma yî
Namî ebed nexwahed ez kes meded **sîwa ke**



49. Dilo dîsan bi gem bûyî di alamên giranbare

Mefa 'îlun mefa 'îlun mefa 'îlun mefa 'îlun

1. Dilo dîsan bi gem bûyî di alamên giranbare
Bi dağan pur elem bûyî ze'îf û kemdem û jar e
2. Ze'îf û jar û hem nakam bi her new'ê kul û alam
Serapa mat û me'lûl mam me çû ba xûn cîgerpare
3. Vebîr bîne demê şadî di qeydên deftera badî
Heye qeş şanî yan hadî bi xweşî kerdî îmrare
4. Ji bextê kasil û nayar me afat û bela her car
Kişandin derd û kul şed bar felek yarî cefakar e
5. Nehin yeksan ebed halek muqîm namîne ehwalek
Nemaye der xweşî balek **peye** îqbalê îdbare
6. Wuhareng e eger zanî çira 'umrê bi erzanî
Didî bo luqmeê nanî dikî pê cem'ê ekdare
7. Dikî pê cem'ê alaman piyan pê tu dixî daman
Wekî nadan û pur xaman di nêv vê çerxê gerdare
8. Di nêv vê 'alema fanî tu zehmet pê didî canî
Te nîne fikrê însanî nizanî nefse bedmare
9. Nizanî ew çî nayab e bi geflet raheî nabe
Nihayet tehlî û gâb e dikit canan birîndare
10. Dikit her kes kem û naçar biçî axir tu xakê sar
Bikî zarîn di qebrê tar meke vî îşî înkare
11. Di cenga baniyê muhnet bibe şahid bike riqet
Li canê jar û bê taqet bi himmet ke tu ferware
12. Tu ferwarê bike ber can meşû gâfil tu ey nadan
Megir dunya mede eyqan bizan ev bî'ê xessare
13. Bizan ev rubhê bê kare ji min bişnew tu goftare
Felek na dost e bedyar e mebe vêra giriftare

14. Giriftar bê kesê ba an diçit rêza telixkaman
Di her subhê û di her şaman ber an espê felek gare
15. Bûyî espê muradleng e li wî meydan hero teng e
Çû teyrê bê per û çeng e di gerdaban elemdar e
16. Di gerdabê û gubara gem zelîl **bê dî** tu jî wer hem
Ku bê hevrê yû bê hemdem çikî der lehdê bê çare
17. Ji Namî guşî ke ey dil xwe hişyar ke mebe gafil
Bi cuz rehîma Xudayê kull nehin qeş kes mededkare



50. ‘Aşiqê şadiq ez im hem nêv ‘uşşaq merdane me

Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun

1. ‘Aşiqê şadiq ez im hem nêv ‘uşşaq merdane me
Qeşdê min gulşen nehin yek şem‘ê ra perwane me
Rindê ‘işq im zahida tu zen mekon dîwane me
Terk û tecrîd im tu min qeṭ zen neke wêrane me
Ez di baṭin kamil im lê şûreten aware me
Ferqê ma kes nakitin qeṭ ez çî me emma çî me
2. Ademê zatim ji mêj ez nusxeê kubra ez im
Şûreten nînim di mewcûd sîreten ‘Enqa ez im
Min di xilqet xelqi bûye hikmetê mewla ez im
Ê ji nar û bad û ab û xakê bû peyda ez im
Ez di baṭin kamil im lê şûreten wêrane me
Nakitin ferqa me kes qeṭ e’ j’ çî me emma çî me
3. Zen meke çun tu me zahid ser bi dîwar besteye
An Hebîbê Kibriya ra ‘eql û dil min besteye
Hem bi zincîrê qewiyyê neqşê kerden besteye
Min kê der babê rîza im ser bi îqrar besteye
Ez di baṭin kamil im lê şûreten dîwane me
Nakitin ferqa qeṭ‘en kes çî me emma çî me
4. Hem ez im Ferhad û Qeys û Mem ez im mi‘marê ‘eşq
Cur‘eya ‘eşqê me noş da lew ez im xemmarê ‘eşq
Bel ez im kenzê heqîqet ba min e esrarê ‘eşq
Ba min e sîrrê emanet gel min e enwarê ‘eşq
Kamil im lê ez di baṭin şûreten wêrane me
Nakitin ferqa kesekî ez çî me emma çî me
5. Qeṭre me emma yeqîn an behrê ‘umman ba men est
Ez bûyim ‘uzlet-nişîn muhrê Suleyman ba men est
Derdê ra nakim dewa’ eczayê Loqman ba men est
Nûrê çeşmim Namiya hey şebrê Rehman ba men est
‘Aqil im lê ez di baṭin zahiren aware me
Ferqê ma kes nakitin kê ez çî me emma çî me

51. Bextê min her çend reş e tali‘ di baþin yawer e

Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun

6. Bextê min her çend reş e tali‘ di baþin yawer e
Rehberê min pêşrewê min zâtê Şahê Xeyber e
7. Fexrê ‘Alem an Hebîbê Kibriya şafi‘ me ra
Naêtin weşf û beyanê ni‘metullahê ekbere
8. Tim sipasiyyê nihayet Heq li me luþfa kirî
Dewlet cawîd e ma ra ev yeqîn bawer e
9. Lewhê dil ez ‘eşqê wî belkî ji mêj gulgûn bû
Der dehan namê wî lewra min wurûd û ezber e
10. Nehê wêrane ra naberde Namî qelbê mehzûnet
Dil te **lê gencê** tetaqet sîne behrê gewher e

52. Canê can ez qeṭ nizamim te ji min meqşed çî ye

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Canê can ez qeṭ nizamim te ji min meqşed çî ye
Kuştine ey gewher-dehanim ya **gerez** şolek diye
2. Min nehin eşlen qebahet lew dikim ḥalê şikayet
Bes ke în curm û gëramet min ji te ev hêvî ye
3. Mest kırım meyya te da me ew meya bê ke's û came
Wê me dil şeḡ kir bi qame halê han kî dîtîye
4. Ev mişal halê te sazî her mudam efğan û gazî
Salekê ru'yet niyazî pê tebata dil çûye
5. Her çiqas xweş dilruba **yî deh wisan** avêt fezaê
Miḥnetê bê **munteha yî** hêj me dil pê razîye
6. Dilkulê berqên siyalim serxweşê dêmê lualim
Ta yekî dî ez binalim wer di ev bê kamî ye
7. Meḥferem hilde nîqabê dil te da şîşa kebabê
Dest bide neyy û ribabê lê bikim goşdarîye
8. Goşikim neġematê sazan qeṭ' kim raz û niyazan
Fir bidim teşbîhê bazan ser çiya û wadîye
9. Şadi ke rûhê bi miḥnet jê derê derdê di furqet
Tu kê der destê weslet nûr û nar û nîrî ye
10. Min di dil kovan hezar in cumle ez hicranê yar in
Lew me ez çeşman dibarin eşk şubhê tavî ye
11. Meqşedim şemek ji weşl e ez şeha nûranî eşl e
Ahûya walaê **hesle** bes ji bo min kafî ye
12. Zahida zinhar nebêjî ev qeder ezman dirêjî
Nîne ev bê hoş û gêjî fikrê sun'ê Barî ye
13. Behşê yarê **ferd e** û hem muşewwirê eşkalê xem
Bendeê bê hîlle û kem derê siyaqê carî ye

14. Namiya ev çend numayî sirrê e‘maqê guwahî
Kes li te kit dê **penahî** cuz wî Şahê ‘Alî ye



QAFIYETU'L-WAW

53. Namiya emrê muqedder layugeyer e gem mexwo

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Namiya emrê muqedder layugeyer e gem mexwo
Xaş nehin ew yek tu ra, bo teva ye gem mexwo
2. Firqetê her çend ji te taqet revaye ber şebir
*Daimen yeksan numaned halê dewran gem mexwo*²⁴⁴
3. Halê tu der firqetê dilsoz û aramê neyar
Cumle meydaned şehê şahan dizanê gem mexwo
4. Ey dil ez seylê fenaê gemrevînan bes binal
Der meyanê puxteganê gem tu xam î gem mexwo
5. Her kesê der 'alemê fanî nizanê gem çi ye
An nihayet tev bi gem we çûyin gem mexwo
6. Ger çi ez nadîdenê burhên kemanî ker bûyî
Dê çikî ber emrê wî Qeyyûmê Qadir gem mexwo
7. Dewrê gerdûn bê beqa ye ma nizanî bêguman
Lê çira êdî dikêşî xem ji bonê gem mexwo
8. Zewqê bê payanê xef der gem nizanê waridin
Ew şîrînî ez dîger zewqan ziyade gem mexwo
9. Leykê bû ezwaq şunasan e mudeqqiq aferîd
Mudrikê an derkê nînî lê we dîsan gem mexwo
10. Yûsifê dil berze bûye ber muşîbet sebri kon
Bîne Ye'qûbê Ken'anî bi firqet gem mexwo
11. Keştiyê xemmê tu ra ez şehneê dewran çi gem
Teşneê derd û firaqê hem bi hicran gem mexwo
12. Ba enînê dilxiraşî feydemend nabî tu qet
Şabirî çêtir ji bê şebrî nizanî gem mexwo

²⁴⁴ Her tim wek xwe namîne rewşa dewranê xem mexwe

13. *Ḥesbunallahu*²⁴⁵ *we kefa*²⁴⁶ bêj ayetên şebrê bixwûn
Şebrê bê payan ji wan tê pê bizan û gem mexwo
14. Qeşd û cehda te eger ez dil wuşûla dilber e
Her mededxwah be ji seyyarê felek bes gem mexwo
15. *Namiya der gencê hezn û xelwetê şebhayê tar*²⁴⁷
Tu bike wurdê zebaneş dersê Qu'ran gem mexwo



²⁴⁵ “Xwedê her besî min e.” Ev ayeta sebrê ye ku îşaretî sûreya Tewbe ayeta 129an dike. Ayet tev wiha ye: “Tevî vî awayî ger berê xwe biguherînin, tu ji wan re bibêje: “Ellaḥ besî min e, ji wî pêve tu îlahên din nînin. Min xwe spartîye wî, xwediyê 'erşê ezîm ew e.” (Abdullah Baykan, Sîwana Qur'anê, r. 208)

²⁴⁶ “Ew bes e”. Ev der jî ayeta sebrê ye ku îşaretî sûreya Ehزاب ayeta 3an dike. Ayet tev wiha ye: Tewekkula xwe bi Ellaḥ bike. Wekîltiya wî besî te ye.” (Abdullah Baykan, Sîwana Qur'anê, r. 419)

²⁴⁷ Namiyo di kuncê huznê û tenahiya şevên tarî de

54. Kan ‘eceb ew dem kê tê xaîr me her mesrûr bû

Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun

1. Kan ‘eceb ew dem kê tê xaîr me her mesrûri bû
Gem nizanî bo çi ye ma her demek yek fûri bû
Sernihadê emrê men ra dem wereng mecbûri bû
Şed xwezî ba an demanê bejnê yar menzûri bû
Bal û hiş min ba çiragê ru’yetan pur nûri bû
2. Dîdeyên qelb û zemîrim gerqê tabê yari bûn
Ger çi tîrên gemzeyan ber dil muqîm pur kari bûn
Tabê husneş ‘afîyet bexşî tenê bîzari bûn
Wan zemanan galîben hin ‘alemên dî wari bûn
Zewqê wuşlet raşetefzayê dilê rencûri bû
3. Min zemîr pur nûri bû ej pertewê husn û cemal
Rencûri bû ger çi me dil leykê rohnî bû xiyal
Bo me ra bêjin seza ye ‘alemek dî ey heval
Şem‘ê îqbalim mûzî û bext û tîali‘ der kemal
Hukmê fermanim rewan û qeşrê ‘îş me‘mûri bû
4. Çeşneê gemze hezar in meylê min tê pal veda
Günçeya xwazim elem xarê zeman te‘nê te da
Nîlê meqşûdê me ra dewran muxalif **nê dima**
Qeş muselleş nadibû gurdê felek îqbali da
Çehvê hasid çehreê bextê me ra bê nûri bû
5. Ba çiragê rûyê yar min her didî rahê wuşûl
Zulmetê hicran nebûwa ma dikir ber nûr hulûl
Pê ji ‘izlet ber herîmê qudsê per da zan duxûl
Hem çû Adem qurbê dergahê keramet dî qebûl
Bade leb gerden serîr û hemdemê min huri bû
6. Min ji Nîlê hubb û sewda cam tije abê umîd
Her demek ma ba hezar teşne dikir zewqê cedîd
Der durûnê gencê xusran min reqîb mabûn qedîd
Dem ji meşlûbê me ra ew zîrê dest bû wek ‘ebîd
Tehyê esbabê ma ra dehr û dan me‘mûri bû
7. Nûrê xettê muşhefa husnê dida ber canê tab
Ez ezel goya nebû qeş bo me ra yek îktirab
Qeş gunahên ma nebû kerdem heme fi‘lê şewab

Bê te‘ewwuq her nîyazim ew dibûn her mustecab
Bê teweqquf her temennayê di min mebrûri bû

8. Seyrê ruxsarê dida qûtê meserret canî ra
Yek yeqîn û zen nebû min qeṭ xerabê anî ra
Yek nigahê yar dida barî umîd ber danî ra
Derkê firqet qeṭ nebû min ‘unşurê şadanî ra
Ger çi xalif cunbuşê dewran bi vê meşhûri bû
9. Ta ji mêj evreng wefa nakit bi kes dewran û çerx
Camê dalan heldide zehrê dixit fincanê çerx
Sernigûn kerden gelek textê milûkan hane çerx
Çi dibit ger ma reha kî ez gemê hicranê çerx
Namiyê bê çare ew dem gafil û megrûri bû



QAFIYETU'L-LA'

55. Bi Xuda' kî were canê were malê were mala

Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun

1. Bi Xuda' kî were canê were malê were mala
Şeha gerdûnê zerafet ser refê gewr û delala
2. Ew çendi bi tayê siyeh zulfê xwe te bend
Kirine can û dilê min feşêrîne di newala
3. Buhurîne ji heyatê me kefen bestiye puşt
'Eziline ji sema û tûliy û keyfê hevala
4. Gorî aşvan û di sayisê me ê çagê berê
Gehijîne be mecalên şubehên 'îdê wişala
5. Negihîne bi muradiy û nedî anê nişat
Xecilîne ji 'itabên sekê bê eşl û cuhala
6. Te çima heyfî qe naê li vî halê me 'eceb
Ne me qeş tînî xiyal û ne esaîrê muşala
7. Di keriyî û ku te bêtin bi xewaîr selefîn
Ev e qey şe'nê muhubban di ser xeylê xiyala
8. Ma nizanî tu yî daim ji me ra xeylê teleb
Her çîqa dadî nedarî be me ez camê zulala
9. Li me borîne gelek sal û meh û lehze û dem
Qelebendîn û esîrin çi gulamê di xetî û xala
10. 'Elilîne di firaqê we sitembarî li mil
Herişîne me hunavên peritî şubhê şekala
11. Şeref û nam û neseb hem me serî daniye rê
Negihan xak û turabê qedemê ebrûhilala
12. Çi reş în ma ji ezel ev qeder û tali' û bext
Qe nedî faide ez tabê liqa hurî mişala
13. Çendi min se'y û teleb kir bigehîn mesnedê yar
Mani'an qehr û geder kir negihan karê xezala

14. Di sefliy û neçarî qediya ‘umrê ‘ezîz
Şed mirin min dî bi çavê ser û dil hatime vala
15. Kê zi î n dilqê tecemmul nedikim êdî çunîn
Ji neçarî reviyam û ketime çol û cibala
16. Te ji Namî çî divê dê bi fidaê te bikit
Çi dema ger tu îşaret bidî ez zerweê bala



QAFIYETU'L-YA'

56. Were ey pêçeya burc û serayê kişweristanî

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

1. Were ey pêçeya burc û serayê kişweristanî
Were ey gunçeya werd û kulilka bağ û bostanî
Kerem ke daneya durr û lualên behrê 'ummanî
Bimeş bal heps û serhengê te 'uşşaqê xwe tê danî
Tu nûrîn cameya 'eşqê û zulalê abê heywan î
2. Kê canbexşendeê can î di qanûnê ezel şaha
Dema tekwinê da 'alem di ber kul xelqê sîmaha
Xudaê lemyezel an dem hubet êxiste pur caha
Ji wî anî çu perwane me can ber şem'ê ilqaha
'Elîlê şedmeê hier in tu pendamûzê Loqman î
3. Me çil şedme û şed zexmîn li dil vêra mureddef bûn
Li ber tîrên di qewseyan çu amancê muheddef bûn
Be zîr destiyyê dildarî ji mêj rûhen mukellef bûn
Şehîdê remhê mujgan im bi înfet muşerref bûn
Esîrê turreê zulf im şehê eflakê gerdan î
4. Şehê ber textê buldanê zerafet xûb û zîba yî
Tu gewherdaneya sûkê evîn û ceng û gewga yî
Dihen gunçe enî wek meh bi nîşan turre tuğra yî
Çu tayê 'er'er î şeng î bi qamet serwê bala yî
Were ser de birîndarê xwe xef carek bi mihvanî
5. Bi dildarî were ser xesteê hicra **xwe wî** xweş ke
Bi camên lebbê yaqûtî ewî ehya û serxweş ke
Bi şewqa husnê Lahûtî şu'ûr û dil muşewweş ke
Bi te'lîfek ten û lewhê dilê gemgîn muneqqeş ke
Beşer sîmamelek sîretzeqen sîmabê dewran î
6. Bi sîret hûr û gîlmanê cînan î sade ez nûr î
Di lewhê sîneê çalakê sermeşqê xetî hûr î
Ji dil ra Ke'beê se'y û tewafê beytê me'mûr î
Di camên ke'sê ulfet da muheqqeq abê engûr î
Di meylakê me tîr bada çî reng cananê fettan î
7. Çî reng cananê gemmaz î bi awerkî dilan mecrûh
Dikî nalende çun saz î bi wan zulfê xwe yî meţrûh

Çu berqê ebrê îdrak î di emlakê dilê meftûh
Li dil berqa tecellaya te daye lew demê mesfûh
Kê cubar **in** ez î n meylakê bê kamê me punhan î

8. Şifaya derdê ‘uşşaqê bi dil giryan û nalende
Ez an le‘lê şemîn camê rehîq û safê bermende
Digel teqbîlê ez cahê zenuxdanê di tazende
Li mehcûrê xwe îhsan ke bibê dilşad û nûzende
Serapa mişkê efrûzê cilaya qelb û cergan î
9. Zereşanê bi wan lefz û eda û nîknamê tu
Bi muştâqî me dil daye fidaê le‘lê famê tu
Me ser daniyye ber rahê wicah û aşiyânê tu
Ji dil qeşd û emel min her wişalê xakipahê tu
Di hûsnê cewherek **ferd î** sezaê **goh** û weşfan î
10. Were bînahiya çavan ji le‘leyna bide camek
Bike pursek li gemxwarê xwe **yê** hempayê **dîdarek**
Gelek salî mulazim mam der î n dewrê nedî carek
Fe wellahî bi mişlê te nehin afet di eqtarek
Li ‘ebdalan cefakar î Hilakû Xanê qelban î
11. Tîlismê gencê Lahûtê di nesxa sîne mur’atan
Çiragê qeşrê Nasûtê di sehrayê xiyalatan
Bi çeşman sihrê Marûtê birim halê cemadatan
Bi tîrên mijeê cotî me ahîn çû semawatan
Bes e vê qehr û azarê li şeydaê xwe ke canî
12. Em in meqşûde ez tabê cemalet wer şebê deycûr
Dimagê sersem û wale bi dîdaret bikim pur nûr
Tewafê eswedên marî bi mehcûret bidî destûr
Dilê axefteê xûnîn bi îqbalet bibî mesrûr
Cunîn merhem de kovan **î** tebîbê da û derdan î
13. Du reşmarê li mil gestin we hem çavê belek Namî
Keser wan der dilet hiştin tu lew rengzêrd û bê kamî
Şehê kişwergê hîcrê çî pur ekdar û alam î
Şerîfê mişwerê hubbê meger her çendi bednam î
Heqîqetgofteê remzê derar **î** sengê dalan î

QAFIYETU'L-Ê

57. Hate min cana bi bîr çûm ber derê kaşaneê

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Hate min cana bi bîr çûm ber derê kaşaneê
Bit-teşaduf newnihala dil me dî l' ber paceê
2. Gote min jaro çi hatî ev seher dîsa li vir
Xwazê tu ez men çi ye ba î n fiğan û naleê
3. Têlbe û xwazê me ez tu ma nizanî ey şenem
Go were bêje binêrim 'erzê xwe durdaneê
4. *Qultu ya 'eyne'l-fuadî minke îhsanu'l-murad*²⁴⁸
Ber me 'ebdalê xwe ke ey şebçiraxa xaneê
5. Qût û pûta vî dilê naçar û jarê mahê rû
Ez Xuda ra wer qebûl ke vê rica û nameê
6. Gote min zanî çira min wer li te kerdem 'itab
*Der dilet men keşfi kerdem meylê cuz men baleê*²⁴⁹
7. Ba diger xûban binêrî ez ewan ulfet yeqîn
Ulfetê men ba diger ulfet qe naê çareê
8. Şed qesem ber zulf û xalên 'enberîn nakim ebed
Meylê xûbanê zemîn ez geyrê tu mehpereê
9. Go were destê me bigre biçne seyra gulşenê
Bes li te bê seb sitem kir ev cezaê madeê
10. Ez lebê le'leyn û şafi men du şê camê keser
Bigre û pê xweş bike dagên quyûd û raddeê
11. Dê her an luţf û newaziş kim kite ey gemzede
Wer ji bîra te bibim yadên firaq û maçeê
12. Ha helîn kamê ji heywanê te her dem xwazê bû
Bexşi kerdem pes tu ra cahê zeqen tev badeê

²⁴⁸ Min go ey eynika dilê min, ji te ye ew başiya ku meriv digihîne miradan.

²⁴⁹ Min di dilê te meyleke ji xeynî meyla xwe delalê keşf kir

13. Secdeya şukrê me derhal bir li wî cayê munîr
Bûsi da destê mubarek da bi ser fewwareê

14. Hemdê bê hejmar ji bona Xaliqê ‘usr û yusur
Namî ra ru’yet neşîb kir wê di piştî faqê



58. Ageh nebû min jê ebed qewsên ji reştûzên şemed

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Ageh nebû min jê ebed qewsên ji reştûzên şemed
Wê tîrekî **xefden kebed** pê kin rikaba rişletê
2. Heywax me dêmê enwerî ew xettî û xalên 'enberî
Bejna leîfa surperî poşî niqaba 'uzletê
3. Bê merhema qelbê seqîm bê darûya zexmê elîm
Bê rûyê zîbayê helîm min navê bagê cennetê
4. Dunya çi zindan e li min xweş naê jê tiştekan bi min
'Eql û xiyal û fikrê min bê hoşê benca ru'yetê
5. Kanê devê kenok û xweş, kan çavê şehlaê di reş
Kan reşheya qelbê nexweş hiştîm di kerb û hesretê
6. Asûde tev derd û kulan nalende me wek bulbulan
Xarman li şûna sorgulan ey dil bi çi qerya te tê
7. Bêj ke Namî jî bi wî gavek sukûn bê qelbê wî
Çun nûrekî nar e ewî hundur ji ye'sê wuşletê

8ê Kanûnê Sanî, sene: 77

59. Şev ji rengê zulfê dilber lew me her dem şev divê

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Şev ji rengê zulfê dilber lew me her dem şev divê
Rewneqa qelbê me ye herçend reş e renga şevê
2. Tariya wê tariya qelbê me hiltînet welê
Necmê îdbara me ye em kirne me'nûsê evê
3. Rohniya mehrê felek herçendi 'eksî rûyê tu
Hişşe û payek neda me jî te ey şîrîndevê
4. 'Eyd û newrozên wişala te hemî dilxweş kirîn
Ma 'eceb rojek ji wan 'eydan me parek nakevê
5. Sayeê lûfta te ey naziknihala nazenîn
Feydemend e her kesek jê her çi miqdar bivê
6. Der semaê **emlên kole** zemîrê dil in her
Zehre ey xwe 'alem î n ji te min kes nevê
7. Namiya bes ke ji van peyvê hezîn û bi keser
Belkî ʔali' be rûyê geş te derîne ji şevê
8. Xweş muradê we be şadî bikî emrar demek
Tu dibêjî ku dile yarê te rehmk bikevê

60. Pirsê ji dil ke ey delal teftîşê ke jê sirr û hâl

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

1. Pirsê ji dil ke ey delal teftîşê ke jê sirr û hâl
Remz û îşarat û mişal beş û beyana hicretê
2. Naê qiyasê qeş bi dev kerbek muqîm e roj û şev
Derdek ji mêj bê mişl e ev teşfîyye eşla nîne tê
3. Tiştek 'eceb pur îxtilac afet-numûn zor-îmtizac
Peyda li nik nabê 'ilac Loqman ji gorê rabetê
4. Berq û birûsk e her li dil zehra ye der kovanê kul
Naête hildanê bi mil bihtir ji tab û teqetê
5. Bêtir ji barê qudret e bedtir ji **geştê** 'illet e
Cewr û cefa û mişnet e **zerya** ye tîra firqetê
6. Êşek bi şubhê agir e jan û şewata wê pir e
Halek ji hâlâtê **pir der** e mayîn di hâlê heyretê
7. Ah û keser dil bû **du ker** kan mehfera re'na û ter
Nalên ji min lew bê qeder tèn nadine dil raşetê
8. Çû şebrê dil mam ez tenê **sêfil** di vê pîsa dinê
Dûr im ji her keyf û kenê hetta qiyam û sa'etê
9. **Sûkend** bi taqê ebrûyan feyde me nîne ji darûyan
Bê ke'sê weşla gulrûyan şem' û şemalên tel'etê

61. Soxengoftenê nezanî der mersiyeyê Qutbu'l-Ulema Şeyx Se'îdê Pîranî

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

1. Şumara ahê dil nîne elemdar im ji hicranê
Ji mehcûrî me dil ker bû dîkin lew ah û efğanê
2. Fiğan û naleyan her dem dîkit ev rûhê purmurde
Meded min dil ez înan ahan kebab e şubhê buryanê
3. Cîger şîşa kebabê ye li ser narê firaqa wî
Di hicranê lehebsaz im be'îdê rewşen û 'anê
4. Be'îd ez durrê yekta û we hem dîdarê fermah im
Şecî'ek na murad im ez gerîbê qurb û dîwanê
5. Li meylakêm dibarin tîr ji burca furqeda Palo
Enîsê balê feryad in wekî murgê şebustanê
6. Bi şubhê 'endelîb nalan ji ber hicra elemdare
Li ber sêpê hem çû canim esîrê hukm û fermanê
7. Çû pabeste û pur zar im di '**izlet xwoz** û bê yar im
Çikim ez puştê şad û sînan me'aş û debr û şadanê
8. Çi şadabî hebit êdî di puştê dağê fersûde
Li dil her an mureddef tîn di vê edna û kulxanê
9. Dilo ez tali'ê meş'ûm tebessum **manedê** carek
Hero der qehr û azar înan digel garat û talanê
10. Nişat û înbisatê dil bi şubhê bazê perwaz da
Me dîdara ewan xalan 'eceb tê çar û îmkanê
11. Bi dil giryan û nalende ji çehvan dem'ê xûnrîz im
Heme der **mewtê** alûde li min nakam û rencanê
12. Felek ez qehr û xwor nagh xedengê ateşîn berda
Peyapey badeya muhriq bi ser da tê ji gemxanê
13. Me eşkê xûn çu derya kef didin der qe'rê eşşâ im
Seciyy û gemzede maîn me şahê mulkê dil kanê

14. Ji tarîxê mucewher tu helîne herfê ser ey can
Gurûb kir şems û nûnê dil zewal da textê Îranê
15. Tu Namî bes ke teswîdê Xuda ra pur ke tehmîdê
Bi cuz wan mêrxasên Palo nexwahim sayê sîwanê



62. ‘Uzrxwahenden ez naziran der xatime

Fe ‘ûlun fe ‘ûlun fe ‘ûlun fe ‘ul

1. Hêmd û senaê neên hêjimar
Digel şed **supaşê** muqîm bê qerar
2. Ji bo Xaliqê qadir ê layenam
Muza‘if di hev da bibin ta qiyam
3. Şelat û selamê Xudayê qedîr
Tevî wan tehiyyatê ‘alî keşîr
4. Bibarin nebin munqeti‘ hîç dem
Li ser turbeê pakê erdê herem
5. Ku pê şadi bit ew xudanê ‘elem
Di rozê Qiyamet em jî herne cem
6. Ji min hedye û hem ji Rebbêm qebûl
Li rewzeê nûrîn bikitin wuşûl
7. Muza‘aif bibîn ew **şelewat** her weha
Ji îro hetta rozê der întiha
8. We hem boni al û şehabê di wî
Digel zewce û yar û ewladê wî
9. Tevî şî‘e û ‘itretê tabinak
Bigîje îla axirê ‘edimê xak
10. Ji bo tabi‘în û kullê mu‘minîn
We hem mu‘mînatan digel ecme‘în
11. Di piştî evana bizan ey delal
Di dil de hebû min kudûr û melal
12. Ji ber hin cihatê ku nabin beyan
Dilê min helîna di dewrê zeman
13. Hingê gezel min di weqtê cihê
Wuha naliyaq û serapa ne lê

14. Me anî berev kir di vê defterê
Neku min j bona beyana hunerê
15. Belkî ji min ev xatîre
Ji bona kesê wî di dil agir e
16. Di bîrê me bînin di weqtê nezer
Bikin ew li vê leqleqê ez keser
17. Bizanin me ev gotinê naliyaq
Bi hev xistine ew ji hicr û firaq
18. Bes e ev qeder gotinê bê kemal
Temam bû me ev herzeê bê meal
19. Bi ‘ewna Xudayê ‘ezîz û qedîr
Li ser destê vî Namiyê pur heqîr
20. Bi vê ez qe nakim bizan îftixar
Belkî boyê ‘erzê ba îftiqar
21. Dikim pê li nezdê ehlê edeb
Li min ‘eybê negrîn ku ew z’ î n sebeb
22. Çunkî ne layiq e bêtin huzûr
Ji min ra vekit babê te‘n û quşûr
23. Li ba fazîlanê qewî hoşiyar
Muheqqeq dihêle **emin** şermisar
24. ‘Uzrê xwe bêjim nuwîs kim li vir
Bi wî min gelek şermê rûyê xwe bir
25. Welakin me hêvî ji ehlê kemal
Negîrin li min ‘eybê der î n meqal
26. Ji fikra me ya cahil û bê ‘ulûm
Evqa dibêtin beyanê ruqûm
27. Dizanim ku ez pê dibîm şermezar
Çi bikim di destê nebû îxtiyar
28. Bi sewqên di geyrê tîbî‘î me ev
Nivîsîne ev reng lefandî li hev

29. Nebû qudretê fikrê min çûn edîb
Kitebet bikim nezm û neşrê ‘ecîb
30. Ji fikra me hat ev qeder întizam
Qebûl kin ji min me‘zeret wes-selam
31. Bes e êdî ey darîkê ser hesîn
Bike tengizarî tu ewqa li min
32. Wida‘ kim ji te û **muhberê** dil siyah
Li hîr em bibîn tev ji hevdû cuda
33. Binvîse êdî tu lefzê xitam
Bibêje bi wî ra we temmel-kelam
34. Îlahî bi heqqê şîfatê xwe kî
Ji rehma ‘emîma xwe mehrûm nekî
35. Min û da û babê di min el-eman
Tevî kafeê xelqê ehlê îman
36. ‘Efû ke bi lufta xwe ya zul-celal
Bide xatîrê serwerê pur kemal

DU‘A

Tehmîd ji bo Xaliqê zul-celal, temcîd ji bo Nebiyyê zul-kemal, te‘zîm ji bona şehabeyê guzîn, teslîm ji bona butûn tabi‘în, *emma be‘du mutewekkilen ‘ela Ellahê*²⁵⁰ me dest bi nivîsandina *Meğmuru‘d-Dewawîn* kir bi ‘ewn û ‘inayeta Xudayê mute‘al tamam bo nivîsana me di salê hezar û sêsed û heftê û pênc ji tarîxê Hicrî di mahê Şe‘banê şerîf di rozê Sebtê di weqtê zewalê Xuda bigerîne wesîle ji bo yadê katibê heqîr kemterê cumleê mu‘minîn Fehmî bin Eħmed bin Hesen bin Emîr Muħemmedu‘l-Pêçarî es-Suweydî di xatîrê birayê dîn ku ji du‘ayê di xwe ji bîr nekin fatiheyek ji me ra hediyye kin camêriya du‘ayan me hişt ji wan ra bêînşafê nekin gerek jimara ‘eyban negirin li min di nezmê çunkî cahilan hişse nîne ji Fehmî ev qeder îmkan bû ji min talaqet belkî bi nezanî û cehalet çend xeberê xwe yê bêmeal ba tekelluf me derxistin ji qe‘rê xeyal nîne di wan de qiymetek edebî bira ji min ev xatîre bê ji bo hemdem û nas û biran heçî zexmidar in ji cewrê zeman *innehu la yuzî‘u ecrel-muħsinîn*²⁵¹ *wela yezîduz-zalimîne illa xesaren*²⁵² Wes-selamu ‘ela minet-tebe‘el-huda²⁵³

²⁵⁰ Li pey vê, tewekkula xwe didim bal Xweda.

²⁵¹ Bêguman ew qenciya başan winda nake (Sûreya Hûd, ayeta 115an)

²⁵² yê zaliman jî ji wan re ji xeynî xesarê tişteki zêdetir nake. (Sûreya Îsra, ayeta 82an)

²⁵³ Selam li wan kesên ku li ser cadeya hîdayetê.

4.2.1 Helbestên Fehmî Beg yên li Derveyî Dîwanê



QAFIYETU'L-TA'

63. Hat buhara dil bi kaman, me buhara dil nehat

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Hat buhara dil bi kaman, me buhara dil nehat
Mane wer bindest û wale neyê dil sekn û tebat
2. Her sa'et tèn ahê arî me ji kûrê cergê dil
Xwîn ji çavê dil dibarî paşve dan Dicle u Ferat
3. Gav û dem carek me nîne bê xem û derd û keser
Der umîda pê gehajê dawîya 'umrê me hat
4. Tihne dil qelbê bi kul der bend azarê reqîb
Qê gelo nayê wî rojek mujde ya emrê berat
5. Teyrê can evqas di hebsa van xiyalên kûr û dûr
Ey gelo beriya mirin dê em bibînin roj hilat
6. Dil divê azadegî lê şaxê wê avxûn divên
Xwîn heder bûye ji ber êşa dilê bê keyf û mat
7. Gul tu car tene çinîne ger nexwî zexmê kelem
Jîn jixwe pevçûn û şîn e tê bi dest bê muşkîlat
8. Bê muradê serbixwoyî mane çil milyon çeleng
Tev bi yek derdî dinalin sed hezar kom û civat
9. Giş bi yek êşî nesax in keç û xortê Kurdistan
Ser li rê dane ne wek min, terkê dan xeml û xebat
10. Ger di cerda serbixwoyî bême kuştin rojekî
Nîne kuştin ew ji bo me belkî tîmar û xelat
11. Mest û bencê dûrîya newroz û sersalê xweyîn
Bes bibê Namî evana kî dibê dengê te hat

64. Rêwiyo ev reng mebore bê xem û azadeser

(Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun)

1. Rêwiyo ev reng mebore bê xem û azadeser
Evê dunya bêwefa nabe ji keskî ra meqer
2. Çendekî ez der heyatê cawîdane wek te bûm
Min nebû hayî ji vê bêweqtfiya 'umr û qeder
3. Ha ku dî nişka li min hat û geha tîra qeza
Nameşî dewran bi kes ra, qet meke wehmê di ger
4. Ez yekî xwenda û şa'ir katibek pur bihuner
Ma ji hicranê diyîna min hezar derd û keser
5. Der dilê cumle heval û qewm û malîyê di min
Zêdetir keç û kurên min noqê kuranê keder
6. Weqtê bê anî mirin qet fayde nade ey delal
Ger çiqas ew dem bikî tu bezlê komê sîm û zer
*
7. "Xerqê feh" bûne 'ilamet salê çaxê îrtihal
Çarê kanûnê yekem şeva pêncşem berya seher

²⁵⁴ Berî here ber rehma Xwedê, du kêlik amade kiribûn û li ser wan ev çend beytê şî'rê ku tîn, li ser wan kêlikên gorna xwe nivîsandibûn. Mixabin dema gora wî nûjen kirin, ew kêlikên ber serê wî şikestin.

Me xwest ku ew çend helbestana wenda nebin, lewma me li dîwana wî zêde kirin.

QAFIYETU'L-ŞÎN

65. Ey serê xwaza bi derdan tava hîva bextê reş

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Ey serê xwaza bi derdan tava hîva bextê reş
Wer li ser çavê birîndarê dîyî na xwe bimeş
2. Te j' me dil birye ji zûda dîn û jîn qerya dila
Lew wekî goyîn dinalin gav û dem bê tab û heş
3. Ger dikê pirsê ji van miryên di gorê de dijîn
Dê çikim ji dewleta te merhema cergê nexweş
4. **Hogirî** azade ne ew her ji qeyda hukm û zor
Em jî êsîr in ji mêjoka hezar ev qad û şeş
5. Sed xwezî berya mirin carek me bidya ew perî
Bejn û bala yê mubarek gotin û dîdar û meş
6. Gotina çendî mukerrer Namîya kî gav û dem
Qê bi rastî tê bi wan xweşyê cîger ar û keleş

QAFIYETU'L-KAF

66. Got were sola me dêne weqt e ey kurdo sivik

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

1. Got were sola me dêne weqt e ey kurdo sivik
Zû li navtenga xwe bijdîn çek nevê xeml û şirik
2. Çunkî dilxwazî qe nabê her dema meylek nebê
Meyl û mensûbê divêtin dil tu bişyênê hinek
3. Dil dibê ger ser neêşînê dibê ma serfiraz
Xeml û xêzê tim divêtin kisweê dîba keçik
4. Şêra mêra 'adetê mêj e li rê dênin serî
Ew heta gava herin tev em li ser avê bi zik
5. Ger bibêjin ta bikalin pesnê çalakê ciwan
Roj û şev her gav û dem pê wê bistirên xweşik
6. Qê tu bê destê me bigrî dê çibe ey bê kezeb
Biçe cenga şehsiwaran em bi govend û çepik
7. Zêr û zîv ger çi me nîne lê di dil sed xezne hey
Raketîne ta ku bê weqta biraqa nû perik
8. Bê eger bayê dema dil xweş dibê paxir me dur
Namî bejna dilrûbaya çek li wan têne gulek

QAFIYETU'L-W

67. Bixêr hatî Emîrzade li ser çavên xulamê xwo

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

1. Bixêr hatî Emîrzade li ser çavên xulamê xwo
Çi xweş dewlet bû ev rade me dî 'er'er-xiramê xwo
2. Me dî şîrîn kelama dil dewa û darûwê aqil
Rû wê neşmî wekî sorgul di vî weqtê nekamê xwo
3. Di vê anê tenê mahî ne zewq û suhbet û şahî
Ji dil her iltifatxwah î di halê der melamê xwo
4. Di halê ye'sê mexmûmî her ro her ah û medyûmî
Xeber gohî ne mefhûmî ji ber êş û xeramê xwo
5. Ji ber êşa dilê wale wekî pîrê dused sale
Fîxan û ah û her nale ji hicra leb çû camê xwo
6. Gihame 'îd û sersalê di burca çevbelek me lê
Wusûl û bûseya xalê me der nûr zelumê xwo
7. Me der nûra newîn made şîfaya qelbê ustade
Bi dil wî dil kirî şade bi yek pirs û 'elamê xwo
8. Di her êvar û şaman de tu wek can î di nêv can de
Çi îstêr î di burcan de bi le'lê can ku namê xwo
9. Bi le'lê sorê yeqûtî bi taê mijeê cotî
Di çeşmê sehrê marûtî kirim heyranê kamê xwo
10. Kirim sermest û dilşade ji qeyda bûme azade
Bi xef da destê min bade ji nû jandim diramê xwo
11. Bi wan çavê di fersûde me re her anî fermûde
Bi 'eynê bûd û nabûde bi fermanê hîmamê xwo
12. Bi ferman da me dizdarî bibe go qille ê şarî
Ji bil min nîne ferwarî ji wî re bes mudamê xwo
13. Ji wî ra em heta çendî bikin pirsî û berxwendî
Di reqs û ba û govendî di bezmê şûk û şamê xwo

14. Te Namî xwazî bû ev hal meke vê xilteê îxlal
Qet nakî mulheman îkmal bi van şî'ir û kelamê xwo



QAFIYETU'L-YA'

68. Kewekî min di rewaqa cigerê de bû firî

Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun

1. Kewekî min di rewaqa cigerê de bû firî
Me du çav mane li seyra ufuqan ka zivirî?
2. Buhurîn peyre gelek roj û meh û hefte û sal
Hê nehat şenga dilê jar û neçar û kesirî
3. Qediya sebr û qerara me ji hicran û xemê
Kêf û dilxweşî û zewqa me bi kerbê gewurî
4. Esef û tehlî û diltengî ye karê me her roj
Roj û gavê me qe neçin carek bê ah û girî
5. Dilê me j' derd û xemê bûye tijî dax û birîn
Bi evê zexmê nesax im ta bi kilke kevirî
6. Bêheşî dûriya wan çavên xezalî û reş in
Di heş û bîra me cî girtine wan dêmên zerî
7. Ji wê meh-tel'etê dîr im me nema sebr û qerar
Bi xiyal her me li bal in dev û lêvên şekirî
8. Kelemê cewra felek şax û gulî dane di dil
Kure û agir û pête di kezeb pê xewirî
9. Dil dibêje ez diçim rûh û aqil nadine rê
Bi hemî new'ê cefaê herişî bû du kerî
10. Me ji reşbextiyê jîn hîvî dikir çax û çilek
Ne kujandin û bi ser de ten û can tev biçirî
11. Bêçek in mislê xezalan mefera def'ê me bez
Dane ber te'n û seran Namî bezand û çepirî

مُنَاجَاتُ أَبُو بَكْرٍ الصِّدِّيقِ رَضِيَ اللَّهُ تَعَالَى عَنْهُ²⁵⁵

جَدُّ بَلْطَفَكَ يَا إِلَهِي مَنْ لَهُ زَادٌ قَلِيلٌ
مُفْلِسٌ بِالصَّدَقِ يَأْتِي عِنْدَ بَابِكَ يَا جَلِيلٌ

دَنْبُهُ ذَنْبٌ عَظِيمٌ فَأَغْفِرِ الذَّنْبَ الْعَظِيمُ
إِنَّهُ شَخْصٌ غَرِيبٌ مُفْلِسٌ عَبْدٌ ذَلِيلٌ

كَيْفَ حَالِي يَا إِلَهِي لَيْسَ لِي خَيْرُ الْعَمَلِ
سُوءُ أَعْمَالِي كَثِيرٌ زَادُ طَاعَاتِي قَلِيلٌ

قُلْ لِنَارِ أَبْرِدِي يَا رَبِّ فِي حَقِّ كَمَا
قُلْتَهَا يَا نَارِ كُونِي أَنْتَ فِي حَقِّ الْخَلِيلِ

²⁵⁵ Ev munacat wekî di serenavê de dinivîse ya Hz Ebûbekir e. Ev munacat di gelek keşkûlan de heye. Berhevkaran, dema ku helbestên şairên din wek keşkûl/mecmû'e berhev dikirin, ev helbest jî dixistin nav wan. Xuya ye Fehmî Beg ji ber xweşikbûn û manedartiya wê ew hildaye nav helbestên xwe. Lê ji ber ku ev helbest ya Fehmî Beg nîne û herwiha Fehmî ew danîbû dawîya dîwanê, emê jî di dawîya helbestan de bi cî bikin. Maneya wê:

Munacata Ebûbekir Siddîq, Xwedê Teala jê razî be
Ya Xwedayê min tu bi lutfê xwe comerdîyê li vî kesê kê-m-zad bike
Bi sidqeke saf bi derstevala hatime ber dergahê te ya Celîl

Tu ganêhê min efû bike çiku gunahê min pir mezin e
Ku ez kesekî xerîb im ebdekî zelîl û muflis im

Ya Xwedayê min tu 'emelekî min ê baş tune halê mîn ê çawa be
'Emelên min ên xerab zehf in zadê min hindik in

Ya Rebî tu di heqê min de ji agir re bêje bila sar be li ser min
Çawa ku te di heqê Îbrahîm Xelîl de gotibû "ya agiro sar be"

Ji min xeletî û jibîrkirin û isyanî pir çêdibin
Lêbelê ji dayina te ya mezin qencî û fezîlet çêdibe

Xwedayo gunehên min wekî qûmê bê hesab pir in
Tu bi qenciya xwe ya mezin hemî gunehên min efû bike

Milkê mezin (cennet) bide me û me xelas ke ji wî cezayê ku em jê ditirsin
Lewra tu qadiyê rasteqîn î û Cebrail jî gazîker e

Ya Rebî tu xezîna fezîletê bide me çiku tu comerd û kerîm î
Ya Rebî tiştê di qelbê min re derbas dibe bide min lewra tu bixêrtir delîl î

Tu yî şafi, tu yî kafi di karên min ên muhîm de
Tu Xwedayê min î, tu kafiyê min î, tu wekîlê min î herî baş î

Kanê Mûsa kanê Îsa kanê Yehya kanê Nûh
Ey Sidîqê gunehkar tobe bike li bal Mewlayê Celîl

مِنْهُ عَصِيَانٌ وَتُسْتِيَانٌ وَسَهْوٌ بَعْدَ سَهْوٍ
مِنْكَ إِحْسَانٌ وَفَضْلٌ بَعْدَ إِعْطَاءِ الْجَزِيلِ

قَالَ يَا رَبِّ ذُنُوبِي مِثْلَ رَمْلِ لَا يُعَدُّ
فَاعْفُ عَنِّي كُلَّ ذَنْبٍ فَأَصْفَحِ الصَّفْحَ الْجَمِيلُ

هَبْ لَنَا مُلْكًا كَبِيرًا نَجِّنَا مِمَّا نَخَافُ
رَبَّنَا إِذْ أَنْتَ قَاضٍ وَالْمُنَادِي جِبْرَائِيلُ

رَبِّ هَبْ لِي كَنْزُ فَضْلٍ أَنْتَ وَهَابُ كَرِيمٍ
أَعْطِنِي مَا فِي الضَّمِيرِ دَلِيلِي خَيْرُ الدَّلِيلِ

أَنْتَ شَافِي أَنْتَ كَافِي فِي مُهِمَاتِ الْأُمُورِ
أَنْتَ رَبِّي أَنْتَ حَسْبِي أَنْتَ لِي نَعْمَ الْوَكِيلُ

أَيُّنَ مُوسَى أَيُّنَ عِيسَى أَيُّنَ يُحْيَى أَيُّنَ نُوحٍ
أَنْتَ يَا صَدِّيقُ عَاصِي تُبُّ إِلَى مَوْلَى الْجَلِيلِ

²⁵⁶ يَقُولُ الْكَاتِبُ

وَيَقْنَى الْكَفَّ مَنِّي فِي النَّرَابِ

سَيَقْنَى الْخَطَّ بَعْدِي فِي الْكِتَابِ

دَعَا لِي خَلَاصٌ مِنَ الْعَذَابِ

أَلَا يَا نَاطِرًا لِهَذَا الْخِطَابِ

1375 h. / 1956 m.

²⁵⁷ يَقُولُ الْمُؤَلِّفُ

كل اثر العبد لا يخلوا من العيب

الا اثر الرب قد جل بلا ريب

Sene: 1375 h. /1956 m.

24 Mart

²⁵⁶ Ev helbest ya Fehmî Beg nîne. Danîna vê helbestê li dawiya metnan ji berê de kevneşopiyeyeke muntensixan e. Mustensixên berê li dawiya metna xilasbûyî ev şîir datanîn û li binê wê jî dîroka xilasbûna metnê dinivîsîn. Ji ber ku şairê me jî helbestên xwe bixwe nivîsîne ango katib bûye wî jî ev kevneşopî dewam kiriye û ev helbesta ku ji du malikan pêk tê li dawiya dîwana xwe zêde kiriye. Maneya wê:

Katib dibêje

Ev xetê min ê hanê di vê kitabê de wê baqî bimîne

Ev destê min ê ku kitab nivîsiye jî wê di axê de birize

Ey ew kesê ku li vê xîtaba hanê dinihêre

Dua bike ji min re ji bo xilasbûna ji ezabê

²⁵⁷ Her wekî malika jor ev helbesta jî ji kevneşopiya mustensixan e û ya. Ji ber ku şairê me bi giştî du caran dawî li dîwanê aniye, du caran ev şîirên bi vî awayî daniye. Helbesta li jor cara yekem û ev helbesta ji malikekê pêk tê jî cara duduyan digel dîroka xilasbûnê daniye. Maneya wê:

Nivîsevan dibêje

Her eserê ebd, ne bêrî ye ji eyban

Bes eserê Reb, tam-kamil e bêguman

ENCAM

Ji ber mercên civakî û siyasî em ji gelek şairên Kurd bêxeber mane ku her dema şairekî nû tê kifşkirin nirx û sînoredebiyata Kurdî baştir tê fehmkirin. Mixabin ku hêj gelek berhemên wêjevanên Kurd nedîtî mane yan jî di sindoqan û refên pirtûkxaneyan de tozgirtî disekin. Vedîtina van şairan ji bo tarîxa edebiyatê û xebatên zimanî têra xwe girîng in. Ji xelesa şairên Kurd ên ku heta niha nedîtî mabûn yek jî Fehmî Beg Pêçarî ye ku bi vê xebatê me xwest wî bidin nasandin û berhema wî bi lêkolînekê derpêş bikin. Navê Fehmî Beg yê fermî Hasan Akgül e. Wî di helbestên xwe de navê Namî wek mexles bi kar aniyê, lêbelê di çend helbestan de mexlesên “Fehmî” û “Fehîm” jî emilandiye. Namî digel ku kesatiyekî hevçax e, li pey şopa edebiyata klasîk çûye.

Fehmî Beg di ciwaniya xwe de rûxandina desthilata malbata xwe dibîne ku xwedî paşxaneyeke desthilatdarî bûn û malbat ji berê de mîr û beg bûn herêmê. Piştî bûyera Pêçarê (1927) dewlet dest dide ser mal û milkên wan û Fehmî Beg di emrekî pir ciwan de dibe berpirsiyarê malbatê. Piştî şewitandina gundê wan û qetla malbata wî ew digihîje hêzên dewama Hereketa 1925an ango hêzên Şêx Fexrî Bûkarkî û 5 salan li çiyayan dimîne û şerê çekdarî dike. Dûre tê girtin û 7 salan di zindanê de dimîne. Fehmî Beg di demeke wisa de dijî ku xweber xwe di nav şerekî dijwar de dibîne, lê paşê ji ber têgiştineke millî tevli bûyeran dibe. Ev bûyer û meşaqetên han xwe di helbesta Namî de jî xwe dide der ku mijarên helbestên wî bi piranî ev in; gazinda ji felekê, dûrî û hicran, evîn, cewr û stema maşûqê, hwd. Fehmî Beg di zindanê de dest bi nivîsîna helbestê dike û di zindanê xwe berheman dixwîne û xwe ji aliyê edebî ve bi pêş dixê.

Bêguman Namî ji hêla hêzdariya zimên û asta edebî ve dîwaneke hêja pêk aniyê. Wî di mektebên resmî de xwendine, lê li pey eşqa edebiyata klasîk çûye. Wekî em dibînin wî ji aliyê derekî û teknîkî ve hemû rê û rêzikên dîwaneke klasîk di berhema xwe de pêk aniyê.

Fehmî Beg di dema hînkariya xwe ya seretayî û navîn de perwerdehiyeke baş standiye, lê piştî wê ji ber bûyerên civakî -ku di beşa jiyana wî de hat gotin-

perwerdehiya wî qut bûye û wî dûre bi hewldanên xwe, xwe bi pêş xistiye. Wî bi zimanên Kurdî (Kurmancî û Zazakî), Farisî, Erebi û Tirkî di dereceye xwendin û nivîsînê de baş zanibûne û wekî em ji dîwanê dibînin ev edebiyatên han baş şopandine. Namî herçendî bi zimanên han ravek, misra û beyt di dîwana xwe bi cî kiribin jî ji bo îfadeya fikr û nêrînên xwe bi temamî Kurdî (Kurmancî) tercîh kiriye ku ji bilî helbesteke Erebi hemî helbestên wî bi Kurmancî ne. Şair ji xeynî vê dîwanê tu berhemeke din nenivîsiye.

Namî di helbestê de zimanekî nisbeten giran, bitûmtûrak û şikûdar bi kar anîye, lê wî di hin helbestên xwe de zimanekî sadetir û fehmbartir bi kar anîye. Bi giştî ew di helbestê de li pey fehmbarbûna helbestên xwe neketiye û di helbestê de bi fikara huner û estetîk tevgeriyaye. Lewra di helbesta wî de zimanê dîdaktîk û herwiha mijarên civakî nayên dîtin. Têkildarî vê mijarê, xuya ye navbera Namî û peyvên xweş bûye, meselen di helbestên xwe de digel pîrbûna peyvên zimanên biyanî, hin formên arkakîk yê peyvên Kurdî jî bi kar anîye. Herwiha hin peyvên Zazakî jî li dîwana xwe reşandiye.

Di vê xebatê de digel traskrîpsiyona metnê em li ser dewra şair, jiyana şair, ziman û kesayetiya edebî ya şair, vekolîna dîwanê hwd. sekinîn. Helbet ev dîwan ji aliyê tehlîlê ve jî xebateke berfireh dixwaze, lê ji ber ku sînorê xebata me bi vê sînardar bû, ew beş ma.

Dîwana Namî hem ji aliyê hunerî ve hem ji aliyê estetîka destxetê ve xwedî cîgehekî bilind e. Hêviya me ew e ku ev dîwan ji aliyê hunerî ve di xebatên edebî û zimanî de, herwiha ji aliyê xetê ve di xebatên hunerên ciwan de eleqeyeke ku şayan e bibîne.

ÇAVKANÎ

- Abdullah, Nejat, *İmparatorluk, Sınır ve Aşiret: Kürdistan ve 1843-1932 Türk-Fars Sınır Çatışması*, werg.: Mustafa Aslan, Avesta, Stenbol, 2012
- Adak, Abdurrahman, “Liceli Şairlere Genel Bir Bakış”, *Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri 05-06 Eylül 2008*, Şarkiyat Araştırmaları Derneği, Editör: Ahmet Erkol, Abdurrahman Adak, Mardin, 2012, r. 442
- Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, Stenbol, 2013
- Akkuş, Metin, “Türk Edebiyatında Türlerin Tasnifi ve Divan Edebiyatında Tasnif Problemi”, *Osmanlı Edebiyat Araştırmaları*, Atatürk Üniv. Fen-Ed. Fak. Yay. Erzurum, 2000
- Akşin Somel, Selçuk, “Taşranın Denetimi ve Asimilasyonu: Diyarbakır’da Sivil Devlet Eğitimi’nin Ortaya Çıkışı (1868-1908)”, *Diyarbakır Tebliğleri: Diyarbakır ve Çevresi Toplumsal ve Ekonomik Tarihi Konferansı*, HDV Uluslararası Hrant Dink Vakfı, İstanbul, 2013
- Akyürekli, Mahmut, *Şark İstiklal Mahkemesi (1925-1927)*, Tarih Külübü Yayınları, Stenbol, 2016
- Altınova, Ayşegül, *Osmanlı Modernleşmesinde Rüşdiye Mektepleri*, Teza Doktorayê, Gazi Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Bölümü, Ankara, 2010
- Averyanov, P. I., *Osmanlı İnan Rus Savaşlarında Kürtler (19. yy.)*, Avesta, Stenbol, 2010
- Baykan, Abdullah, *Sîwana Qur’anê*, Nûbihar, Stenbol, 2017
- Beyter, Önder, *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî (metn û lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind ya çapnebûyî, 2013
- Başbakanlık Osmanlı Arşivi (BOA)
- Brockelmann, Carl, *Emeviler Döneminde Şam ve Irak’ta Arap Edebiyatı*, werg.: Selman Yeşil, Bingöl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, jimar: 3, 2014
- Bruinessen, Martin van, *Ağa Şeyh, Devlet*, werg.: Banu Yalkut, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010
- Bruinessen, Martin van, *Kürdistan Üzerine Yazılar*, werg.: N. Kırac, B. Peker, L. Keskiner, S. Somuncuoğlu, L. Kafadar, İstanbul, İletişim Yayınları, 1993
- Bulut, Ali, *Belagat Meanî-Beyan-Bedî’*, çapa 5., Marmara Üniversitesi İFAV yayınları, İstanbul, 2015

- Bulut, Ali, *Belagat Terimleri Sözlüğü*, Marmara Üniversitesi İFAV yayınları, İstanbul, 2015
- Bulut, Ali, *Belagat-i Müyessera Meanî-Beyan-Bedî*, çapa 3., Marmara Üniversitesi İFAV yayınları, İstanbul, 2016
- Canlı, Cemalettin – Uçak, Halil İbrahim, *Hattın Dört Yanında Cemilpaşazadeler*, Dipnot, Ankara, 2012
- Bayramoğlu, Nejat (amd.), *Celal Bayar'ın Şark Raporu*, Kaynak Yayınları, Stenbol, 2009
- Cizîrî, Mela, *Dîwan*, transkrîpsiyon: Arif Zêrevan, weş. Nefel, Stockholm, 2004, r.28
- Çağlayan, Ercan, “16. Yüzyılda Süveydi ve Hoy Zaza/Dumbeli Emirlikleri”, *Osmanlı Devleti ve Kürtler*, editörler: İbrahim Özcoşar-Shahab Vali, Kitap Yayınevi, Stenbol, 2017
- Çağlayan, Ercan, “Hükümet Merkezi’nden Periferileşmiş Bir Köy’e: Genc”, 2. *Sosyal Bilimler Genç Araştırmacılar Sempozyumu Bildirileri 24-25 Nisan 2010*, Editör: Veysel Gürhan, Şarkiyat Araştırmaları Derneği, Diyarbakir, 2012
- Çağlayan, Ercan, *Cumhuriyet'in Diyarbakır'da Kimlik İnşası (1923-1950)*, İletişim Yayınları, Stenbol, 2014
- Çiçekler, Mustafa, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 35, İstanbul, 2008
- Dağılma, İbrahim, “Ahmedê Xasî'nin Hayatı ve Mewlid Adlı Eserinde Tema”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Entitüsü Dergisi*, s. 1, j. 1, 2015
- Dilçin, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 1983
- Doskî, Tehsîn İbrahîm (amd.), *Dîwana Melayê Cizîrî*, çap. 2, weş. Spîrêz, Duhok, 2005
- Doskî, Tehsîn İbrahîm (Berhevkirin) *Dîwana Ehmedê Xanî*, weş. Spîrêz, Dihok, bêdîrok
- Döger, Yusuf Ziya, *Şeyh Said Hareketi Sonrası Pêçar Tenkîl Harekatı/1927*, Nûbihar, Stenbol, 2018
- Ertekîn, Zahir, “Di Edebiyata Kurdî de Texmîs û Texmîsên Mela ‘Eliyê Baqustanî’”, kovara *Mukaddime*, jimar 6, sal 2012
- Ferezdeq, *Dîwan*, amd. Ustaz Elî Fa‘ur, Darul Mektebetul-İlmiye, ç. 1., Beyrût, 1987
- Feqîr, Şêx Ehmed, *Keşkûl* (di nava destxeta dîwana wî de), pirtûkxaneyaya taybet ya Hayrullah Acar
- Göldaş, İsmail, *Kürdistan Teâli Cemiyeti*, Doz, Stenbol, 1991
- Güngör, Şeyma, “Maktel”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, c. 27

- Hafiz, *Dîvan*, Teshîh û amadekar: Behram Eşterî (li ser nusxeya Xelxalî), weş. Ageh, Tehran, 1391/2013
- Hallı, Reşat, *Genelkurmay Belgelerinde Kürt İsyancıları 1*, Kaynak Yayınları, Stenbol, 2013
- İpekten, Haluk, *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, weş. Dergah, İstanbul, 2008
- İsen, M. - Horata, O. - Macit, M. - Kılıç, F. - Aksoyak, İ. H., *Eski Türk Edebiyatı El Kitabı*, Çapa 3., Ankara, 2005
- İsen, Mustafa, *Acıyı Bal Eylemek Türk Edebiyatında Mersiye*, Akçağ yay. Ankara, 1993
- İsen, Mustafa, *Divan Şiirinde Nazire Geleneği*, Ötelere Bir Ses, Akçağ yay., Ankara, 1997
- Jwaideh, Wadie, *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi-Kökenleri ve Gelişimi* (ç. 7.), werg.: İsmail Çekem û Duman, Alper, İletişim Yayınları, Stenbol, 2012
- Karademir, Nihat, *Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler*, Nûbihar, Stenbol, 2017
- Karademir, Nihat, *Sultan Abdulhamid ve Kürtler*, Nûbihar, Stenbol, 2016
- Kaya, Ferzende, *Mezopotamya Sürgünü*, Alfa, Stenbol, 200
- Kele, Hatice, *Salnamelere Göre Van ve Bitlis Vilayetlerinde Dini-Sosyal Yapı*, Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, teza lîsansa bilind ya çapnebûyî, Elazığ, 2009
- Keleş, Reyhan, "Örneklerle Türk Edebiyatında Medhiye", *Selçuk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 2009, jimar: 22
- Klein, Janet, *Hamidiye Alayları: İmparatorluğun Sınır Boyları ve Kürt Aşiretleri*, İletişim Yayınları, Stenbol, 2014
- Kurnaz, Cemal, "Dini Edebiyat Türleri ve Dini Edebiyatımızın Bugünü Hakkında Düşünceler", *Divan Edebiyatı Yazıları*, Akçağ Yayınları, Ankara, 1997
- Kurnaz, Cemal, "Osmanlı Şair Okulu", *Journal of Turkish Studies TUBA*, 2003, 27/11
- Kutschera, Chris, *Kürt Ulusal Hareketi*, Avesta, Stenbol, 2013
- Külekçi, Numan, *Açıklamalar ve Örneklerle Edebî Sanatlar*, çapa 7., weş. Akçağ, Ankara, 2016
- Macit, Muhsin - Soldan, Uğur, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı*, Grafiker Yayınları, 8. Baskı, Ankara, 2016
- Macit, Muhsin – Soldan, Uğur, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri*, çapa 8., Ankara, 2016
- Macit, Muhsin, "Münacat", *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, c. 31,

- Mevlevî, Tahir-ül, *Edebiyat Lügatı*, Enderun Kitabevi, İstanbul, 1994
- Mihemed Emîn, Salih, *Kurd û Ecem: Dîroka Siyasî ya Kurdên Îranê*, Nûbihar, Stenbol, 2017
- Mîrzengî, Xurşîd, *Sala Şewatê*, romana tarîxî ya neçapkirî.
- Olson, Robert, *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, wer.: B. Peker, N. Kıraç, Özge Yayınları, Ankara, 1992
- Özön, M. Nihat, *Resimli Büyük Türk Dili Sözlüğü*, Arkın Kitabevi, İstanbul, 1971
- Özsoy, Felat - Eriş, Tahsin, *Öncesi ve Sonrasıyla 1925 Kürt Direnişi*, Pêrî, Stenbol, 2007
- Pala, İskender, *Ansiklopedik Divân Şiiri Sözlüğü*, (çapa 20.), weş. Kapı, İstanbul, 2011
- Rûhanî (Şîwa), Baba Merdox, *Tarîxê Meşahirê Kurd, Emîr û Xanedanha*, Cild. 3, Amadekar: Macid Merdox Rûhanî, weş. Surûş, Tehran, 1371/1992
- Sadinî, Xalid (amd.), *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên wî*, çapa 5., weş. Nûbihar, Stenbol, 2011
- Saraç, M. A. Yekta, *Klasik Edebiyat Bilgisi-Belagat*, çapa 7. weş. Gökkuş, İstanbul, 2010
- Sever, Tahsin, *1925 Hareketi Azadi Cemiyeti*, Nûbihar, Stenbol, 2018
- Sezen, Tahir, *Osmanlı Yer Adları*, T.C. Başbakanlık Devlet Arşivleri Genel Müdürlüğü, Ankara, 2017
- Silopî, Zinar, *Doza Kürdüstan*, Stewr Basimevi, Beyrût, 1967
- Siyahpûş, *Seyfulmulûk*, amadekar: Celîlê Celîl, Institut für Kurdologie, Wîen, 2000
- Şeref Han, *Şerefname Kürt Tarihi*, wergera li ser Tirkî: M. Emin Bozarslan, Yöntem Yayınları, Stenbol, 1975
- Tarlan, Ali Nihat (Hazırlayan), *Fuzûlî Divanı Şerhi*, Akçağ Yayınları, Ankara, 1998
- Tigris, Amed, *Licê*, weş. Apec, Stenbol, 2008
- Varlî, Ebdullah M., *Dîwan û Gobîdeyê Ahmed ê Xanî yêd Mayîn*, weş. Sîpan, Stenbol, 2004
- Yazıcı, Tahsin, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 15, İstanbul, 1997
- Yıldırım, Kadri (çeviri ve analiz), *Ehmedê Xanî Külliyyatı, Dîwan*, weş. Avesta, Stenbol, 2014

Çavkaniyên Dîjîtal

Malpera Şiirên Farisî “Gencûr” (<https://ganjoor.net/saadi/divan/ghazals/sh114/>)

Canşad, Murad, “Pêçar”, www.zazaki.net

İslam Ansiklopedisi, Ferezdak (<https://islamansiklopedisi.org.tr/ferezdak>)

“Rûpelek ronîdayî ji dîroka wêjeya Kurdî: Siyahpûş”. www.welateme.net

Zuexpayic, Orhan, “Bingöl ve Çevresinde Halk Arasında da Kullanılan Kırdî/Zazakî Coğrafik Bazı İsimler”, www.zuexpayic.com

Zuexpayic, Orhan, “Farqin’li Şêx Faxrî Bukarkî’nin Yaşam Öyküsü”, www.zuexpayic.com

Zuexpayic, Orhan, “Medeni Bukarkî ile Şêx Fexrî Bukarkî Hakkında Röportaj”, www.zuexpayic.com

Hevpeyvîn


Hevpeyvîna digel Hîdayet Begê lawê Fehmî Beg, Diyarbekir, Sibata 2018an

Hevpeyvîna digel Mela Xalitê Licî, Diyarbekir, Sibata 2018an

Hevpeyvîna digel Xurşîd Mîrzengî, Stenbol, Gulana 2018an

PÊVEK





Pêvek 1 Rûpela yekem ya destxeta diwana Namî

دیباجه معرالدو اوپن


۱ لَوْنُ وِلْيَاقَتِ سَاوَهٗ جِبْرِ دَجِيمِينِ جَبَلُوَهٗ دَا
 ۲ اَرَامُ وَاِفْنَاءِ دِلَانِ خَفْدِ يَغْنِي بَرْدَهٗ دَا
 ۳ لَوْحُ حُرُوفِ مَعْدَلِ اَنِّ وِجُودِ وِنَطَهٗ دَا
 ۴ يَمُنْ جِلَادَتِ بِي جِنَانِدُوكِ اَفْيَابِ شَعْلَهٗ دَا
 ۵ بَرَفِ اَنْزُودِ نَعْمَهٗ دَالَانِ وِنَبْدِ اَلْمَعَهٗ دَا
 ۶ بَانَكُ وِصَلَاؤِ نَالِنَاكِ رُغْبِ مِلْبَاقِ نِسْعَهٗ دَا
 ۷ دَرَكَا هِنَانِ مَسْتِ وَاِتِ طَلْبِكِ لِبْدِ هَالَهٗ دَا
 ۸ يَادِ هِنَانِ مَا مَسْعَلِ كَوْمِكِ مَخَالِفِ حَلْفَهٗ دَا
 ۹ نَزَا عِنَادَانِ كَرِهْ سَرِجِي عِنَا صِرْفَهٗ دَا
 ۱۰ مَيْلَا اَفِينَا مَهٗ فَرْنِ لَرِي جِهَاتِ وِقْرَهٗ دَا
 ۱۱ يَكِ نَرَانِ مَائِدِ بَرْدَهٗ بُوِي كَسْبَادِ يَمِ قَوْمَهٗ دَا
 ۱۲ اَسَا يَسْرِجِي مَادَهٗ دِيغِنِ وِنَيْفِ اَيْبَهٗ دَا
 ۱۳ وَحْيَا اَفِينَا بَرْمَالِ حَوْنِدِنِ دَرَسِ وِجِدَهٗ دَا
 ۱۴ وَاِقِفْ دَمَا بُونِ دِلْوَرِ جِيدَانِ حَوْمِ حَسَهٗ دَا
 ۱۵ لَيْكِ مَانَهٗ دَا مَالِ فَرِيْبِ رَسَامِ نَقِيسِ رَجِهٗ دَا

۱ اَللّٰهُ جِهٖ دَا نَكِ قَادِرَهٗ مَاهِرِ دِنْدِيْبَرِ خُوْدَا
 ۲ لَامِيْنَ جَوْلَعِلِ دَرِ فِشَانِ اَسْوَبِ دُوْرِ زَمَانِ
 ۳ هَلِكِ زُوْرِيْ اَرِ دِلِ بَرِ خَلْفَهٗ اَبْنِ ضَيْكِ وِشَلِ
 ۴ طَرِيْحِ جَوْلِ لِي اَفْرَانِدِ بَا طَرِيْرِ دِلْ كَسِ نَقِشَانِدِ
 ۵ قِيْضِكِ بِيْهَانِ دَا شَعْلَهٗ اَقِيْبَهٗ پِشْتَا بَرْدَهٗ
 ۶ عَالَمِ هَمَهٗ كَرِ پَرِ خِيَالِ نَرَانِ قَطْرَهٗ اَفْتِ مِيَالِ
 ۷ اَرِيَابِ تَدَقِيْقِ نِكَا تِ مَائِيْ دِ سِدَانِ صِفَاتِ
 ۸ هِنِكِ هَمِشَبُونِ مَتَمِيْلِ نَابِنِ اَبْدِ اَوْ مَنَفْصِيْلِ
 ۹ سَرِيْبِ بَقَا مَا دَرِ جِيْگِ بِيْ خُوْشِكِرِنِ دَعُوْ سَرِ
 ۱۰ قَفْلَا طَلِشْمِيْنَ زِيُوْرِنِ مَادَرِ فِشَوْنَا اَفْسَرَانِ
 ۱۱ نِيْلِ مَنَاصِيْدِ نَهٗ هُوْشِ سَرِ اَبُونِ رَفِيْعِيْ يَادَهٗ نُوْشِ
 ۱۲ شَكْلِ خُوْدِ جَامَمِيْ دِيغِنِ دَمَا جُوْنِ سَجْدَهٗ
 ۱۳ اَلْوَانِ اَلْمِ وِصَالِ دَرِ نَصِيْ اَرْقَامِ حِمَاكِ
 ۱۴ هَامِيْ يَكَا يَكِ سَاهِيْبَارِ دَرِ كِشِيْ نَارِ وِنِيَارِ
 ۱۵ اَسْكَالِ دَرِ اَرْجِيْبِ دِيغِنِ بِلِ دَا لَوْحِ نَقِيْبِ

Pêvek 2 Dîbaceya Dîwana Namî

مُحَمَّدٌ رُبُّ خَالِقِ ذَوِ الْجَلَالِ ۝ تَجَبُّدُ رُبُّ نَبِيِّ ذَوِ الْكَمَالِ ۝ تَعْطِيبُهُ رُبُّ نَا صِحَابِهِ لَرَبِّ
 سَلِّمْ رُبُّ نَا بِنُورِ تَابِعِينَ ۝ أَمَا بَعْدُ مَتَوَكَّلًا عَلَى اللَّهِ مَهْ دَسْتِ بِنَفْسِنَا نَدَا مَعْمُورِ الدَّوَابِّ
 كَرِ بَعُونَ وَفِنَا تَنَا خَدَايَ مُتَعَالٍ تَمَامِ بُو نَفِيسَانَا مَهْ دَسَالِ هَزْرُو سِي صِدُو هَفْتِي وَبِخِ
 زِ نَارِ مِخْ عَجْرِبِ دِمَاهِ شَعْبَانِ شَرِيفِ دَرُورِ سَبْتِ دِوَقْتِ رَوَالِ خَدَا بَرِيهَةِ وَسِيكِهِ
 رُبُّو يَادِ كَاتِبِ حَقِيقَتِ كَرِ جَمَلُهُ مُؤْمِنِينَ فَرَهْمِي بِرِ أَحْمَدِ بْنِ حَسَنِ بْنِ أَمِيرِ مُحَمَّدِ الْبَلْخَارِيِّ
 السُّوَيْدِيِّ دِخَا طَرِ بَرِي دِينِ كِهْ رُدْعَانِي دِخُوشِ بَرِي نَكُونِ فَا تَحِيكَ شَرَاهِدِيَهْ كُونِ
 جَامِرِيَا دَقَا يَا نِ مَهْ هَسِيَتِ شَرُو نَزَا بِي انصافِي نَكُونِ كَرَكِ شَرْمَا سَعِيَابَانِ
 نَكُونِ بَلُونِ دِنَطَبِي چُونِكِهْ جَاهِلَانِ حَصَهْ نِينِهْ شَرِ فَرَهْمِي أَفْ قَدَرِ
 اِمْكَانِ بُو رِيهِنِ طَلَا قَتِ بَلَكِهْ بَهْ نَزَانِي وَجَرَالَتِ چِنْدِ
 جَبَرِي خُوي بِي مَأَكِ بَا تَكَلَّفِ مَهْ دَرِ خُسْتَانِ شَرِ قَجَرِ
 خَيَالِ نِينِهْ دَوَانْدَهْ قِيَمَتِكَ اَدَبِي بِرَا زِيهِنِ أَفْ
 خَا طَرِهْ بِي رُبُّو هَمْدَمِ وَ نَاسِ وَ بَرَاتِ
 هِي رَحْمَتِي رُجُورِ رَمَانِ اِنَّهُ لَا
 يُضِيحُ اَجْرَ الْحَسَنِينَ وَلَا يَزِيدُ
 الظَّالِمِينَ اِلَّا حَسْرَةً
 وَالسَّلَامُ عَلَى مَنْ
 اتَّبَعَ الْهُدَى

Pêvek 3 Beşa Duayê ya Dîwanê



Pêvek 4 Wêneyê Fehmî Begê Pêçarî (Namî)



Pêvek 5 (Lawê Fehmî Beg yê mezin) Hîdayet Beg û maliya wî Zînet Xanim

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
İNTİHAL RAPORU

TezBaşlığı

DÎWANA NAMÎ (FEHMÎ BEGÊ PÊÇARÎ): MEGMURU'D-DEWAWÎN (METN Û LÊKOLÎN)

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 232 sayfalık kısmına ilişkin 27.06.2019 tarihinde tez danışmanım tarafından turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 4

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dâhil

5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar

Açıklamalar.....
.....

Mardin Artuklu Üniversitesi Turnitin adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Yunus Demir

Öğrenci No: **16711002**

Tarih ve İmza: 27.06.2019

Programı: Kürt Dili ve Kültürü

Statüsü: Yüksek Lisans

Danışman Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman Adak



A.B.D. Başkanı Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman Adak

